

ZEND



PAYÎZ 1996
Sal: 1 Hejmar: 1 Buha: 250.000 TL

Xeleka Dojehî

■ MEDENÎ FERHO

Dîrok û Serpêhatiya Laşê Mirov

■ ŞAREZA AVER

Karnameyî Erdeşîrî Babekan

■ EHMED ŞERÎFÎ

Nêrînek Li Salnamê

■ FEQÎ HÛSEYN SAĞNIÇ

Çend Nuştey û Kitabê Kirdkî

■ J. ESPAR

Bingeha Çiroka Kurdî

■ ZEYNELABÎDÎN ZINAR

Dahûrîna li Ser Parkîtên di Kurmancî de

■ ZANA FARQÎNÎ

Di derbarê Mezopotamyayê de Bîbliyografya Gernamên Ewrûpîyan

■ MEHMET BAYRAK


Di Hunerê de Teşe û Naverok

■ SÛLEYMAN DANIŞMAN

Derheqê Rastnuştina Kirdkî (Kirmanckî) de Kombiyayîşê Stockholmî

■ CEMİL GÜNDOĞAN





E N S T Î T U Y A K U R D Î

Li ser navê **Musa Anter**
pirtûkxanekê ava dike.

Em tev bi hev re vê pirtûkxanê dewlemend bikin.

Kovara sê mehî ya lêkolîn û
lêgerînên zanistî
(Üç ayda bir yayınlanır)

Li Ser Navê Mezopotamya
Basın Yayın A.Ş.
Xwedî:
Yıldız GÜLTEKİN

**Gerînendê Giştî yê Weşanê û
Berpirsiyarê Nivîsaran:**
Raif YAMAN

Lijna Weşanê:
M. Şefik BEYAZ,
F. Huseyn SAĞNIÇ,
Felat DILGEŞ, Edibe ŞAHİN

Cihê Kargeriye:
İstiklal Cad. Turhol Han
No: 373 Daire: 2
Beyoğlu / İSTANBUL

Navnîşana Kovarê:
Atatürk Bulvarı.
Ceylan Palas Apt.
No: 154/12 Aksaray
Tel: 527 19 11
Fax: 527 61 49

Internet:
enstituya-kurdi @
info-ist.comlink.de

Çapxane:
Ceylan Matbaacılık

Sala Weşanê:
Payîz 1996

| | |
|---|-------|
| Xeleka Dojehî MEDENÎ FERHO | 3-10 |
| Halet û təkiliyên civakî aboriyê kifş dikin. HÜSEYİN DENİZ | 11-16 |
| Li gerdûnê, çavê me hubble çi dibîne? ŞAADET KOÇ | 17-18 |
| Dîrok û Serpêhatiya Laşê Mirov ŞAREZA AVER | 19-20 |
| Tîfo Dr. Î. OMERÎ | 21-22 |
| Bazirganiya Çekan ya Navnetewî û li ser Tenduristî Kelija wê WICTOR W. SIDEL | 23-27 |
| Karnameyî Erdeşîrî Babekan EHMED ŞERÎFÎ | 28-31 |
| Nêrînek Li Salnamê FEQÎ HUSEYN SAĞNIÇ | 32-33 |
| Hewkarî dewletanî dagîrker CABBAR QADİR | 34-35 |
| Koçberî KEREM SOYLU | 36-42 |
| Warê mirov ku der e? KUYAŞ ÖRS | 43 |
| Çend nuştey û kitabê kirdkî J. ESPAR | 44-48 |
| Bingeha çîroka Kurdî ZEYNELABÎDİN ZINAR | 49-52 |
| Hunerê Kirmanca de cayê kilaman 1 LERZAN JANDIL | 53-60 |
| Ziman û rêbazên zimanzanînê ÇETİN ÖZEL | 61 |
| Dahûrîna li ser parktîên di kurmançî de ZANA FARQÎNÎ | 62-65 |
| Çend nîşe li ser pêşveçûnên fonolojîk ên di kurdî de HAMİD MAHAMEDİ | 66-69 |
| Li Ser Alfaba Kurdî RAİF YAMAN | 70 |
| Di hiqûqa komara Tirkiyê de dij Kurdîtî ROBÎN REWŞEN | 71-74 |
| Di hunerê de teşe û naverok SÜLEYMAN DANIŞMAN | 75-78 |
| Bi Nihêrînek Gelemerî Sînema YILMAZ KELEŞ | 79-83 |
| Di derbarê gelên Mezopotamyaî de bîbliyografya gernamên Ewrûpiyan MEHMET BAYRAK | 84-88 |
| Derheqê Rastnuştên Kirdkî (Kirmanckî) de Kombiyayîşê Stockholmî CEMİL GÜNDOĞAN | 89-92 |
| Ripinê Gelan Bi Ziman Tê Nasîn TORİ | 93-96 |

Xwendevanên hêja,

Bi hejmarê yekem a Zendê em ji we re merheba dibêjin. Heta niha me du hejmarê ceribandî derxistin. Di van hejmaran de, gelek kêmasiyên me yên ji alî zengîniya naveroka kovarê û teşa wê ve hebûn. Di vê hejmarê de heta ji destê me hat, me xwast em van kêmasiyan ji holê rabikin.

Zend, di nav kurdên bakurî de, kovara yekem a akademîk û zanistî ye. Armanca me ew e ku, em nivîsen zanyarên kurd ên ku dixwazin bi zimanê xwe yê maderî. di warê pisporiya xwe de berhem bidin, û nivîsên bijarte yên li ser zanîna bi riya wergerê ji kovarên zanîna bigirin û bigihînin xwendevanên Zendê. Em hemî zanyar, lêger û lêkolerên kurd nivîskarên xwe yên sirûştî dibînin. Ji bo ku gelê kurd êdî kanibe ji dinya zanîna bi zimanê xwe haydar bibe, ji pênuşên kurd xwastina me ew e ku, di nav rûpelên Zendê de cihên xwe yên resen bigirin.

Di Zendê de nivîsên, li ser hemî warên zanîna tîn weşandin. Çîrok, kurteçîrok, helbest, stran, klam û senaryoyê listikên şanoyê, filmên sînemê û hwd. di Zendê de nayên weşandin. Lê nivîsên lêgerî û lêkolerî yên li ser van mijaran, di Zendê de tîn weşandin. Di dinê de her netewe bi zimanê xwe li gerdûna zanîna dijî. Pêwîste kurd jî, êdî bi zendî, bi zimanê xwe yê maderî, ji ronahiya zanîna para xwe bigirin.

Nivîs bi kîjan zaravê kurdî ji me re bê, em bi wî zaravî diweşînin. Heke nûserê me nivîsên xwe bi tîpên latînî û bi tîpnûsê an jî komputir binivîsin, çêtir dibe. Di Zendê de, tenê alfaba kurdî ya bitîpên latînî tê bikaranîn. Bi alfabên din nivîs nayên weşandin.

Di vê hejmarê de, ji bo ku xwendevan ji devokên kurdî yên cûrbicûr haydar bibin, û di derbarê nivîsandina kurdî ya îroyîn de rasterast bibin xwedî dîtinekê me redaksiyona nivîsan hema hema çênekiriyê. Li gel haydariyê, em dixwazin xwendevan û nivîskarên me li ser nûsîna nivîsên kovarê ji me re dîtin û ramanên xwe yên hêja bişînin. Di hejmarên diwarojî de, em dê redaksiyonê bê kêmasî çêbikin. Peyvên zimanên biyanî, em dê bi yên kurdî re biguherînin. Di şûna peyvên çêkirî de, em dê heta demeke dirêj ên biyanî yên tîn zanîna bikarbînin.

Heke nivîskarên me, di şûna peyvên biyanî de, peyvên ji zaravên kurdî bi kar bînin em dê bextewer bibin. Ji ber ku peyvên biyanî zaf bikartînin, peyv û tîgihên kurdî yên zanîna di zimên de zortir bi cih dibin û gelek kurd ên ku bi zimanên biyanî nizanin, di tîgihîştîna de dikevin tengasiyek mezin.

Hinek nivîsên me yên vê hejmarê ji kovarên zanistî yên bi zimanên cûr bi cûr ên welatên cihêreng hatine wergerandin. Hinek nivîs ji aliyê nûseran ve bi tirkî ji me re hatine nivîsandin, me wergerandine kurdî.

Di vê hejmarê de nivîsên li ser babetên cihêreng hene. Em dixwazin di demên pêşiya xwe de babetên nivîsan zêdetir bikin û kovareke ji her alî ve zengîntir û xweşiktir bigihînin destê we.

Zanîna li ser hînbûnê ye. Hînbûna bi ber, bi rûmet û bi ser bilindî tenê bi zimanê maderî dibe. Ji bo jînek zindî hûn bê zend û bazin bimînin jî, bê zanîna ZENDÎ nemînin.

Heta hejmarek nû, bimînin di xweşiyê de...

Berî ku em dest bi dabaşa mijara xwe bikin, divê ku em bizanibin aborî çi ye. Ev peyva fereh, têra xwe bi hejmar û îstatîstîk ku di nava bûyer û çalakîyên tevgera danûstandina komên xelkê de bûye stûna avahiya jiyane, çima rolek bingehîn dileyize? Bêguman her mirovê ku haya wî ji tevgera cihanê hebe, di derheqê vê zanîstê de, hindik-gelek hinek tiştan dizane. Nexasim di rewşa îro de û çalakîyên bazirganî ku li her çar enîşkên cihanê xefk û davik vedane, tixûb û sînor tevlihev kirine, komên xelkê berhimbêzî bandoreke nehêsan û girtîgeheke rekihek hesinî kiriyê, her kes xwedî ramanek e. Lê, guman dikim ku ne zanîstên vî mijarî, ne aqilmendên Kurdan û ne nivîskarên Kurdan bala xwe dane aboriya Kurdistanê. Ne bes zeviyên aborî beyar û bê gîsin û bê kesixandin mane. Civaka Kurd, di warê çandî de, ji jêr û jor, û ji kin û dirêjayî ve beyar maye... Bendeyî mêrên çê û cotkariya mêjî, kesaxa pênûsan, gîsimên lêkolîn û lêgerînan û mijûlbûna hewngirî ye...

Aborî = Şaxê zanistiya lêkolîn û lêgerîna tevgera danûstandina karûbar e...

Kin û bi zimanê zanistî mirov dikare bi yek hevokê bersiva vê gotinê wilo bide.

Lê, di vê mijarê de, em dê hinek dîtinên din jî diyar bikin, ji bo ev şaxê zanistî baş bête fam kirin. Weke ku Marx gotî: Çand û berhemên mirovan ku car din di nava mirovan de, bêyî îrada wan di nava sîstemekê de têkil û tevger dibe ye... Ev, bi mana problemên mirovaniyê yê bingehîn ku di hêla şiklên çand û berhemên de derdikevine meydanê û di warê şoreşî û kedxwarî de tê şîrove kirin... M. Bouver, A.Ibarrola û N. Pasqua-

XELEKA DOJEHÎ

MEDENÎ FERHO

relli bi yek devî wiha dibêjin: Di çand û berhemên komaleyê de, têkilî û danûstandin e... Yanî destûra zanîstê ya ferehbûnê têkilî û danûstandina komaleyê dîke...(1)

Bi Frensî: Economie
Bi Almanî: Okonomie
Bi Îngilîzî: Economy
Bi Erebî: İktisad
Bi Kurdî: Aborî

Ev peyv, pêşî ji teref feylesofê Yewnanî Aristoteles ve hate bi kar anîn. Di zimanê Yewnanî de: Destûra mal û malxwêfî ye. Ji du gotinan pêk hatiye. Beramberî mal û malxwêfî oîkos û beramberî desturê jî nomos...

Sala 1615 an de jî, Montchretien peyva politîka aboriyê aniye zimên.(2) Ev peyv ji bo di mijara komaleyê de hatiye bi kar anîn û ji bo aboriya komaleyê. Hinbihin bi şax û perr bûye, heya ku xwe di nava beşên teknîkî de dit... Di hêla tek-


nîkî, zanistiya Fizîk, kîmya, metalurjî û zansitiya cotbarî, yanî zevî û hwd. Lê, gotin û peyva aboriya komelayê di sala 1862 an de ji teref zanîstê Polonî Supinski ve hate bi kar anîn. Marksîsta namdar Rosa Luxemburg jî, di vê manê de peyva aboriya neteweyî bi kar aniye. Mixabin, di nava wê civaka ji hev û din hatî felîşandin û tertûbelakirin ya Kurd, ku xwe di nava çarşî û bazarên xwe de, bi rewşeke mirovanî û danûstandinek dilrehetî ya neteweyî ne dîtiye heya îro jî, mîna her hêlî: Dîrok, coxrafya, fizîk, kîmya, metalurjî, tip û hwd. Di warê hewngirî yanî zansitiya aborî de jî bê par maye.

Pîştî van ragihandinên kurt, em dê vegerin ser dabaşa xwe. Car din, berî ku em bikevina nava kûraya xêzîkan de, divim ku tiştêkî diyar bikim, bo xwendevanên me çêtir hewl bidine ser vê ramanê û bêhtir têbigihîjin bê armanca XELEKA DOJEHÎ tê çî manê û çî felek û dewranan li serê komên xelkê digerinê.

Yanî domination ku erka aborî ye... (3) Hêzên aboriyê yê organîze kirî ku bi biryarên yêkêlî û bi ramanên politîk û zora leşkerî bandora xwe li ser welatekî bike û bibe sedema guhertinên nû ku ev guhertin di hêla têkçûnê de be... Talaniya dewlemendiya wî welatî derdikeve meydanê û şertên bêzarî û belengaziye derdikevin ku koçberî û gîdîfî ya sêwîfî dibe jiyana rojane û derdikeve meydanê...

Tiştêkî balkêş e...

Ji ber ku ev tiştê han, di jiyana mirovan de, di jiyana komên xelkê de xwedî bandoreke pîrr mezin e. Tesîrê li ser her tiştî dîke. Çi civakî be, çî aborî be... Yanî ev tişt, em dikarin bişibînin birkê. Birka ku li ber ava herik tê çêkirin û avê dirawestîne, yan jî berê avê diguhere.





Ava li herik jiyana e...
Jiyana komên xelkê... Birk jî, ew tiştê balkêş ku em dikine dabaş...

Ku jiyana rawestiya, bêguman pêşketin û guhertin çênabin. Bazar û danûstandin jî miştî dimîne... Ya ku heye jî, diçilmise û bi hêz nabe.

Ev tişt îdareya orfî ve...

Yanî îdareya leşkerî... Yanî îdareya guvaştî...

Dêhna xwe bidine tabloya yekemîn...

(4) Bajaren Kurd yek bi yek nivîsîne û salên bi îdareya leşkerî jî hemberî wê nivîsandiye...

Stenbol ne di nav de ye. Stenbol, bajarê ku xwendevan û rewşenbîrên Kurd di nava xwe de ragirtine. Lewra jî, di dîroka Kurdistanê de bala mirov dikişîne. Li vî bajarê mezin û boş îdareya leşkerî, bi giştî bi qasî bajarên hêla Tirkîyan teva domandiye. 24 sal 2 meh û 10 roj... Li gorî îdareya orfî li Tirkîyê ku em van salan li deh salan bela dikin: Yanî her serê 10 salan carekê dewleta Tirk bi vî îdareya ne mirovanî û teva leşkerî, zilm û zordarî ye, derdikeve pêşberî me. Vêca ku em dêhna xwe didine bajarên Kurd îdareya leşkerî ya herî kêr û nîv in, ya herî zêde 15 sal û nîv in...

Serê bajêr kêr zêde 11 sal dikevin. Umrê dewleta Tirk 73 sal in. 10 salan carekê îdareya leşkerî tê, li gorî bajarên Kurd serê 6 û 6 mehan carekê îdareya leşkerî û guvaştî, di zikhev de, hatiye... Ev, di hêla tevgera civakî de, di hêla xwedanheva rastmalî, yanî vekirin û bikarxistina sazî û dezgehên û karbendî, her serê 6 salan hatiye rawestandî û jî hev û din hatiye felişandin, tertûbelakir-

rin. (4) Yek ji sedema rev û bazdana rastmaliya ji Kurdistanê ber bi Tirkîstanê û bi armancek zanîstî û hewngîrî pêşgirtin û nederketina burjuwaziya neteweyî ya Kurdan bû ye ev. Yanî rastmaliya neteweyî kuştîye... Ev bes yek sedem jê ye... Bêguman pirr sedemên ku bi destûr û bê destûr di vî hêlê de rol leyistîne hene.

Mînakek di nava parantêzan de: Dema ku min di televîzyona MED de bernamaya aboriyê hazir dikir, tiştê bala min kişand. Karbîdestiya Ewrûpa, yanî sanayiya Ewrûpa di demedorên sedsala 19 an de dest bi xwe û nûjeniyê kir. Di vî nûjeniyê de Ewrûpiyan mekînen xwe yên kevin teva birin Cîhana 3 yan. Karbîdestên Ewrûpî ew mekîneyên kevin ne êxistin embar û depoyan û li ber pêlên demsalan û zingarê nê hiştin. Heger di hêla gavên kolonyalistî de be jî, karbîdestî birin li Cîhana 3 yan bi cih kirin û ew welat bi mekîne kirin. Tevan jî bi alîkarî û piştgiriya dewletên xwe ev kar kirin. Lê dewleta Tirk, bi nûjeniya mekîneyên karbîdestî, di salên 50-60 î de kir... Mixabin, yek mekîne ji wanê kevin ne birin li Kurdistanê bi cî ne kirin. Ew mekîneyên kevin tev di embar û depoyan de rizandin. Ne hiştin karbîdestî li Kurdistanê bi cî bibe. Ku yek, dudu vekiribin jî, yên mîna febrîka alkôlê li Diyarbekrê ku maddeyên xaf, yanî xam maddê li wir hebûn vekirin.

Mînaka min li ser tiştêkî din e...

Pirr kes jî xwendevanan Prof. Dr. Yalçın Küçük nas dike. Ev mirov demek dirêj di organîzasyona Teşkilata Plansaziya Dewletê de (DPT) xebitiye. Weke tê zanîn ev organîzasyon karûbarê dewletê te-

vî hazir dike. Bingeha organîzasyonan, mezinbûn û ferehbûna pêşerojan hazir dike. Kesên zanist û pispor û xwe dayî qebûlîkirin tê de kar dikin. Mamosta Yalçın Küçük hevalê min yê girtîgehê jî ye... Têkiliyên min pê re demek dirêj hebû... Li derveyî welêt jî têkiliyên me berdewam dike... Min jî bo programa xwe pirs jê kir...

Pirsa min ev bû: Dewleta Tirk ev mekîneyên kevin ne birin Kurdistanê... Ku em dêhna xwe didine rastmalê, em dibînin ku ne li olan guhdarî dike, ne li netewan û sînoran... Ewrûpiyan, di dema nûjeniya karbidestîya xwe de, mekîneyên xwe yê kevin teva birin Cihana Sêyemîn bi cî kirin. Lê, dewleta Tirk ev jî ne kir, çima? Organîzasyona Plansaziya Dewletê jî di parvekirina hatina salane de, bes li nava Tirkan gav avêtine, berê xwe nedaye Kurdistanê, çima? Bersiva wî ciwanmêrî bû ev: Li Tirkiyê du tişt hene. Yek jê ew e ku di nava bendên destûran de ye... Ya din jî ew e ku derî destûran bi kar tê ye... Ya Kurdistanê di nava bendên duduwan de cî digire... Ew çî ye? Erka (hikmê) bi xwe dest e... Pêkarîbûn û zordestî ye... Fiştê ku min dît û bûme çavdarê wê, pîrr balkêş e... Bi rastî min giraniya xwe didanî ser herêma xwe... Yanî Antakya, mixabin tiştêkî derî çavan jî destên min nehat. Polîtîk û armanca dewleta Tirk di hêla Kurdistanê de ev bû: Dev ji wan berdîn... Bila Diyarbekrî pêxwas bimînin... Mêrdînî hemal bimînin... Sêrtî teşqelçî bimînin... Rehayî tirsîkçî, Çewlîgî rêncber, Elezîzî şivan... hwd. bi mînin... Ew tiştên ku hene jî, dive ku pêwistî bazdanê, yan jî dûrketina cih bibin... Dêhna xwe bide xetên hesin yê trêne... Teva, ji bo maden û dewlemendiya Kurdistanê ye... Xeta hesin di navbera bajarên Kurdan de nehatîye danîn. Du armanc di xeta hesin de diyar kiribûn. Yek: Birina ewlemendiya axa Kurdistanê... Du: Têkiliya bi dewletên cîran re...

Bi rastî jî, sala 1898 an ku ji teref mirovekî Alman, bi navê Hermann, zanistê ax û erdê ev proje ji bo dewlemendiya axa Kurdistanê û barkirinê hazir kiriye...

Piştî van ragihandinan em dê vegezin ser xalên bingehîn û gavên polîtîk...

Dîroka İktisadî ya Tirkiyê, li gorî zanistên aboriyê, piştî Meşrutiyetê ya duyemîn, yanî sala 1908 an û vir de, di 9 babet û mijaran de, yan jî deman de, tê dabeş kirin.⁽⁵⁾ Ku em dêhna xwe didine van demên ku hatin û rastmalî hatiye belav kirin û di hêla karbidestiyê de gav hatine avêtin, encama polîtîk li gorî hikumetan hatibe guhertin jî, di derbarê Kurdistanê de tiştêkî xêrê yê darîçav xuya nake. Herûher, Kurdistan bûye cihê talaniyê, bûye bazara frotina malê dezgehên Tirkan û bûye navenda kedê...

LI BAJARÊN KURDISTANÊ ÎDARA ORFÎ

| | |
|----------|----------------------|
| Semsûr | 6 sal 10 meh 23 roj |
| Agirî | 6 sal 10 meh 23 roj |
| Çewlîg | 13 sal 3 meh 22 roj |
| Bedlîs | 6 sal 7 meh 7 roj |
| Amed | 15 sal 3 meh 22 roj |
| Erzîngan | 7 sal 6 meh |
| Erzerom | 9 sal 11 meh 22 roj |
| Dilûk | 7 sal 2 meh 22 roj |
| Çolemêrg | 12 sal 11 meh 22 roj |
| Meletî | 9 sal 11 meh 22 roj |
| Mereş | 6 sal 10 meh 22 roj |
| Mêrdîn | 12 sal 11 meh 22 roj |
| Mûş | 6 sal 3 meh 7 roj |
| Sêrt | 15 sal 2 meh 22 roj |
| Dêrsim | 12 sal 11 meh 22 roj |
| Reha | 10 sal 11 meh 22 roj |

LÎ GORÎ HEJMARA SALA 1927 an DEZGEHÊN SANAYIYÊ LÎ KURDISTANÊ

| Bajar | ji 4 kesan zêdetir kes kar dikin | ji 4 kesan hindiktir kes kar dikin | Giştî |
|-----------------|----------------------------------|------------------------------------|--------|
| Meletî | 146 | 893 | 1.039 |
| Mêrdîn | 449 | 432 | 881 |
| Erzerom | 154 | 726 | 880 |
| Reha | 120 | 737 | 857 |
| Amed | 238 | 435 | 773 |
| Xarpêt | 110 | 477 | 587 |
| Erzîngan | 48 | 276 | 319 |
| Sêrt | 68 | 246 | 314 |
| Qers | 28 | 171 | 199 |
| Bedlîs | 22 | 141 | 163 |
| Wan | 10 | 70 | 80 |
| Bazîd | 5 | 27 | 32 |
| Giştî | 1.393 | 4.631 | 6.124 |
| | 13.675 | 51.582 | 65.257 |
| Pişka herêman % | 10,2 | 9,0 | 10,6 |

ÇAVKANÎ: Enstîtuya İstatîskê ya Dewletê (Hejmara Sanayiya sala 1927 an)


Ev 9 dem kîjan sal in û di çî warî de xwe dane xuya kirin:

1- Navbera sala 1908 û 1922 an...

Ev navber di dîroka İktisadiya Tirkan de salên şoreşgerî û şer in...

Lê, xususiyeta van salan ew e ku di van salan de dewlet di du tiştan de bazirganiyê dike. Yek: Maden... Du: Cotbarî û celebvanî ye. Malê cotbarî û zevîtiyê yê af (xam) û xilmetkirî ye... Ku em vê

G r nge



demê, li bajarên Kurdistanê û sazî dezgehên ku kar dikin û mal derdixine çarşî û bazaran dinêrin her tişt derdikeve meydana... (6) Yanî gotina min ew e ku mal teva, (xam û hazir) ji dezgehên bajarê Kurdistanê û bi keda mirovên Kurd derdikeve...

Lê, berî ku ez bême xala dudowan, divê ku bi yek hevokê nîşaneke navbera sala 1908 û sala 1918 an de bidim... Ev sîl bûne destpêka avakirina rastmaliya neteweyî... yanî Îtîhatçiyên hewl dayê de, piştî wan jî sala 1919 û sala 1922 an ku Kemalîstan jî ev politîka ajot, (ew jî berdeewama Îtîhatçiyên e) hewl û hêz danê de bo rastmaliya neteweyî ava bikin... Bi piştgiriya dewletê jî, rastmaliya neteweyî bi rêkûpêk bûye... Di navbera van salan de Stembol û derdorên xwe di warê bazirganiyê de pêş ketin, Kurdistan paş dikeve...

2- Navbera sala 1923-1929 an...

Ev dem, bi navê refêhê yanî xweşî û geşî ya cotbarî, yanî zevitî tê bi nav kirin... Ev, pêgiha dema xelasiya Osmanîyan e, despêka Cumhuriyetê ye...

Şer xelas bûye... Kes û kûsan cilên leşkerî jî xwe kirine û vegeyriyên gundên xwe, dest bi karûbarê xwe kirine. Hingî karûbarê dewletê jî %90 cotbarî, yanî xilmetkirina erdê û celebvanî ye...

Li gorî Çağlar Keyder, hatina salane jî %22 jî gundiya ne...

Di vê demê de transportê jî dest pê kiriyê. Di navbera 1923 û 1929 an de jî transportê, jî %14.4 hatina salane heyê...

Bi vê tevgerê re aboriya dewletê li hêla Tirkên jî 8.8 mezin û fereh bûye... Li hêla Kurdistanê jî, jî %75 qels û misrî bûye...

3- Di navbera sala 1930 û 1939 an...

Ev navber bi navê dewletçîtiyê tê nas kirin...

Salên hember Kurd û Kurdistanê têr


reş û beş in...

Di navbera van salan de dewletê dest li ser her tiştî daniye û destdirêjiya her tiştî kiriyê. Ji ber vê çendê jî, bûye salên karbidestî... Li Kurdistanê jî bûye salên koçberî û wêraniyê...

Di navbera sala 1932 û 1939 an de Destûra Teşwîkkirina Sanayiyê derxistin... Lê, serdarê artêşa dewletê Fevzî Çakmak jî bo febrîkeyek li Erzînganê neyê ava kirin wiha di got: **Dezgeh û saziyên ku bilî heremên Tirkên bêne avakirin, em nikarin biparêzin...** Ev reşû-beşek bû bo rastmaliya Kurdan û rastmaliya ku biçe Kurdistanê... Yanê weke ku Mamosta Yalçın Kûçûk got, tiştên ne di destûran de ku bi kar tên...

Bi kurtayî û hinek sergotinan be jî, di van salan de, ez dê behsa hinek kirin û destûran bikim...

- 1- Sala 1925 an Taktîrî Sukun...
- 2- Sala 1935 an Destûra Dêrsimê...
- 3- Sala 1934 an destûra Pêwistiya bi Cihbûnê...
- 4- Sala 1930 an de Politîka şimendîferê...
- 5- Sala 1930 an Bîrdoza Ziman û



Rojê...

6- Sala 1930 an Lêkolîn û Lêgerîna Dîroka Tirkên...

7- Sala 1934 an Destûra Karûbarê Polîsan...

Piştî van destûran ku bes bi armanca helandin û korîkkirina tuxm û hebûna Kurdan bû, bandora xwe li ser her hêlî kir... Çand û wêje... Jiyana cîvaki û hwd.

4- Navbera sala 1940 û 1945 an...

Ku ev sal bi navê badê-berdayê û çepeçûrî tê nas kirin in...

Dewleta Tirk, ne kete şerê Cihanê ye duyemîn... Lê, barê hatina salana teva danî ser piştî gundî û karkeran... Xwedî rastmal û bazirganên karbidest jî, bin xwe dagirtin û çepeçûr kirin. Destûra ku di sala 1942 an de bi navê Bêş û Baca Hebûnê yanî Varlık Vergisi Kanunu derket, rê li ber Tirkên vekir û rê li ber kesên ku ne Tirk in girt... Di van salan de kesên ku bês û baca xwe nedane, yan jî nikaribûne bidin ji teref dewletê ve birin li Aşkalê di madenên kevîran de şixulandin... Ev, xwêkiya bi destê dewletê û zora leşkerî ku di hate standin bû... Ji vê zordestiyê Ermenîyan, Rûman û Kurdan bi teybetî û giştî para xwe stand û pêwistî firotina mal û mewdanên xwe bûn...

5- Navbera sala 1946 û 1953 an...

Ku nîrê zêrîn ye cotbariyê ye...

Sala 1946 an rewşa politîk jî, ji yekrêxistinî dikeve pîrêxistinî de... Ev dem kevîrê mîhengê ye Îktisadî ye... Her tiştî tê guhertin... Rê û rêbûwar li ber komên xelkê divebin... Transport, ji hêla derve û hêla hundirû ve jî, dest pê dike... Lê, deyndarî û bandora rastmaliya derve jî dest pê dike...

Ji ber ku sala 1947 an, Tirkiye dibe endamê IMF û Banka Cihanê. Sala 1952 an jî dibe endamê NATOyê...

Rastmaliya biyanî û Ewropa tê Tirkiyê... Ferebûn û mezinbûna Karbidestî digihê ji %22-23 an... Di hêla cotbariyê de jî %13.2, di hêla karbidestiyê de jî, jî %9.2 ve... (7)

Ku di vê demê de belavkirina hatina salanê û rastmaliya biyanî di tabloya bi plan de bibînin, hûn dê hember Kurdistanê politîka dewleta Tirk bibînin... (7) Kurdistan dezgehên xwe winda dike. Cotbarî qels dibe... Celebvanî dikeve encama qaçaxçîtiyê de...

7- Navbera sala 1962 û 1976 an...

Dema mezinbûn û ferebûnê...

Politîka populîzmê hate guhertin...

Karbidest û bazirganên mezin, xwedî erd çûne parlamento... Di nava wan de kesên Kurd jî hebûn...

Modelek ku menfaata mezinan mezin dikir, menfaata belengaz û feqîran hindik dikir, derketê meydana... Rastmaliya Kurdistanê cih guhertibû... Sazî û dezgeh, bilî Entabê teva hatibûn heremên Tirkên... Erzîngan û Mereş di hêla karê

bedenî, yê destan, yanî karbidestiya bi-çûk ya destan de di cihê xwe de man, lê bazar û têkilî ne bi destên xelkê cih çêdibû. Ew têkilî û danûstandina karûbar di çarşî û bazarên heremên Tirkan û bi destên Tirkan çê dibû...

Kurdistan mabû pêgiha bazar û kedê... Komên xelkê jî, di karê qaçaxçitiyê de debara xwe ya rojane dikirin... Li bajarên Kurdan bedestanên danûstandinê cih danê pasajên qaçaxçiyân...

8-Navbera sala 1977 û 1979 an...

Dema reşiyê...

Dewletê, bazirganiya selef û deynan li ser milên xwe dît û hew dikaribû vî barê giran hilgire... Rewş giha wê deverê ku deynên derve bi petrol û malên xaf (xam) hatin dayin... Çarşiya reş, selefa bilind, tunebûna mal, bihawetina bihayê firaxan, enflasyon, pê re jî deweluasyonê dest pê kir...

Sala 1977 an de 1 dolar 19.25 lire bû...

Sala 1979 an de 1 dolar bû 47 lire...

Îro 1 dolar li dora 70 û 80 hezarî dileyize...

Rewşa Kurdistanê jî, her û her ber bi qelsiyê û ketina bin bandora bazirganiya Tirkan de diçû. Yanî ew gotina ku me berî niha anî ziman ya domination (erka aborî) dihate bi kar anîn...

Danûstandina komên Kurd jî, ji der ve hatin qutkirin. Komên Kurdan, bes bi karkerî li Çukurova û deverên ku fabrîka lê hebûn bûne karker û karê qaçaxê, di nava mayîn û tîlên dirihî de kirin... Gundî jî, nexwendî û dibêr şibaqa qaçorçiyân û memurên rêcê de man... Wilo nexwendî û bêzar...

Tiştê herî balkêş ewe ku dora bîstûnehî serhildanên Kurdan çêbûne. Tev jî hatine tefandin. Yanî Kurdistan ji terefê Roma reş ve bîst û neh caran hatiye xerakirin û wêrankirin. Helbet avakirin ne wilo hêsani ye...

9-Navbera sala 1980 û 1990 an...

Ev navber jî bo Kurdan, di hêla aboriyê de ya herî zor e...

Qerarên 24 ê Çile, bû nîrê zêrîn û rastmaliya derve. Vê demê Banka Cihanê û IMF'ê bandora xwe li ser her tiştî danî... Sazî û dezgehên gelî yanî KÎT hatin firotin... Lê ne bes KÎT bi tenê... Pîrr û baraj firotin... Pişt re bo domandina şerê têr qirêj li Kurdistanê (ku salê 7.8 milyar dolar in), xezîne par bi par danîne mezatê... Sertîfîk û bono, bi selefek bilind û demek kin derxistin borsayê... Îro, deynên hundirû li dora 3 katrilyon lira dileyize... Deynê derve jî, tiştê eyan 74 milyar dolar in... Li gorî pîsporên aboriyê ev hejmar li dora 100 milyar dolarî dileyize...

Goman dikim ne hewce ye ku ez bazirganî, cotbarî û celebvanîya Kudistanê ya îro binim mezatê... Dêrdê van salên dawî kuşinde ye... Ji ber ku Kurdistan tev di bin postal û agirê tank û topên roma reş de di nale... Dj van salên dawî de ku Kurdewarî kete jiyana rojane û bersiva xwe

bi bedelek pîrr mezin dît, dewleta Tirk bazirganên Kurd yê ku xîreta Kurdî û dilxwaziya Kurdewarî bi wan re hebû, kuştin. Hinek jî, bê silûk kirin û ew ronahiya di dilê wan de çirisanî tefandin... Hûn teva dizanin, hewce nîne ku em gotinê dûvdirej bikin...

Lê çend gotinên din, ku di hêla politîk û armanca dewleta Tirk de hene, pêwîst e bêne gotin û heşkere kirin...

Ji ber ku domination xwe bi XELEKA DOJEHÎ dide eyan kirin. Ev xekek ya mirin û tefandin û heladinê ye. Pêwîst e ku pîrr li ser bête rawestandin...

Di literatûra aboriyê de qeydeyek hate ku navê vê xelesa dojehî ye... Yanî çembera ceheennemî...

Dewleta Tirk, ev qeyde ji xwe re kiriye bigeha nêzîkbûna Kurdistanê... Helbet ev politîk e... Çiqasî, zanistên aboriyê, beşa aboriyê stûna koman û avaniya komelaxeyî ye, lê mixabin, zor û erka politîkî ya pêkarîbûnê ketiye destên kedxwaran û li ser hukmê aborî ne... Sedem ev e ku qerarên politîkî, rê û rêçikên aboriyê jî erê dikin. Navê vê qeyidê bi xwe jî cendereyeke teng û guvaştinê ye. Selef û bihabûna mal e, hember bihabûn û selefê, mafê kedê her şilûk û hindik dimîne... Tendurustî, perwedekirin û xwedî mal û mewanîya bazirganî, ya karbidestî dikeve bin sifirê de... Tevger û têkilî di tefihe û pûç dibe... Silûka koman namîne, xîreta mirovan xwe di hêlên din de diyar dikin ku digihe dozgera xwînê bi xwe... Lê, ev qeyide ne bi van çend gotinan tê zanîn... Çavên xwe li tabloyê bigerin û dêhna xwe bidine tevgera wê... Qeyidên ku di jiyana koman de û tevger û têkiliyên mirovan de cih digirtin bibînin...

Qeyidên ku jiyana mirovan bilind û qels dike ye...

Qeyidên ku mirovan dike wezîr jî, di-

- BIRINA JI HERÊMÊ
- ! DANA JI BO HERÊMÊ



Serdare Artêsa Dewlê Fevzi Çakmak

ke rezil jî...


Ku hûn xweş li tabloyê binêrin, hûn dê jiyana mirovan, jiyana koman, jiyana gelan di warê esaret û bêzarî û neçariyê de bibînin... Bê, armanca dewleta Tirk, di demên dirêj de li ser gelê Kurd çî ye, ku dixwazin çî afatiyan binin serê gelê Kurd, çawa gelê Kurd bê silûk û bindest bikin, hûn dê bibînin...

Ev tablo politîka dewleta Tirk, di hêla aboriyê de datîne ber çavan... Di literatûra aborî de navê vê rewşê XELEKA DOJEHÎ ye... Ku ev xekek hate lidarxistin, komên xelkê bê deng û bê teqandina ti-fingê tê windakirin û helandin...

Ev tablo, tabloya sermezariyê ye...

Bi vê qeyidê, dilê jiyane kurmî dibe...

Dewleta Tirk, bi vê qeyidê jî, dilê jiyana Kurdan kurmî kiriye... Jiyana sofî kiriye. Xencera xiyanetê di dilê jiyane de çikandiyê...



DEMÊN BI PLAN DI NAV DE BEŞ Û BAC Û MADEN DI NAV DE

| 1928-1940 | 1930-1940 | 1945-1960 | 1960-1980 | 1984-1990 |
|-----------------------------|---------------------------------|--|--|--|
| DI DEMA PLANAN YA 2 YEMİNDE | NİRE ZÊKÎN RASTMALIYA BIYANÎ TÊ | NİRE ZÊRÎN BERDE-WAMA TEKILDA FLORTA GERM BI EWROPA RE | NÛJENIYA MEXÎNEYÊN SANAYÎ Û BERDEWEMA NİRE ZÊRÎN | KAR ZEDA DIBE KED ERZAN DIBE DEMA FER-EZEND Û ÇAPQÛRE YE ABORIYA ŞER |

DEMÊN BI PLAN Û BELABÛNA RASTMALIYA DEWLETA TIRK

| | | | |
|-------------------|---------------|------|-----|
| Dema Plana 1. mîn | 36.576 mil. | 11.7 | 7.4 |
| Dema plana 2. mîn | 70.508 mil. | 12.0 | 8.3 |
| Dema plana 3. mîn | 342.541 mil. | 12.0 | 5.8 |
| Dema plana 4. mîn | 1.364.475 mil | 15.7 | 3.8 |

Cima Xeleka Dojehî?

Dewleta Tirk, bi armanca windakirinê û helandinê nêzikî Kurdan û Kurdistanê bûye... Ji ber ku dewleta Tirk, ne bes bav û birayên me, ne bes xwişk û dotên me kuştine... Bi xeleka DOJEHÎ, gelê Kurd bi giştî, bê çek û teqandina tivingê, hêdika, bê deng winda dike... Di helîne... Kor û kerr û çepel dike... Heya îro kesekî ku bikaribe mafê Kurdan û mafê Kurdistanê bi giştî biparêze tune bû...

Gelê Kurd bê leşker bû...

Gelê Kurd bê serdar û rêzan bû...

Gelê Kurd bê rêxistin û sazî û dezgeh bû...

Gelê Kurd bê rastmaliya netewî bû.

Tirkan çawa dixwest wilo gav diavêtin... Dewlemendiya axa Kurdan, çawa dixwest wilo talan dikir... Qerarên politîk û windakirinê distandin û pêk ji dianîn... Bi qerarên politîkî, rê û rêbûwar li ber pêşketin û tevger û têkiliyan û ragiştina koman digirt... Ku di rekihek hêsinî de ku her roj parîkî din teng dibû de hiştibûn... Kurdan nikarîbû bixwînin... Kurdan nikarîbû fêr bibin... Nikarîbûn goşt bixwin, şîr vexwin... Mirovên birçî, nexwendî nikarê tevgerê bikê, her tirsonek e... Tevgerê bike jî, girêdanên bi tayên xaf çêdike... Gotin û kirinên wî vala û pûç in...

Dewleta Tirk, Kurd çav miç û bê berxwedan hiştine... Rê çênekirine... Danûstandina seferiya bazirganî tefandiye... Rê nedaye, mefêr û mecal ne hiştine bo rastmaliya neteweyî çêbike... Bingeha karbidestî (biçûk.mezin)

dananiye... Febrîka û dezgehên biçûk vekirine, yên ku hebûn jî kuştine...

Elektrîk nedaye...

Dibistan ji bo helandina hewn û ramana Kurdî ava kirine...

Ku tevgera biçûk û mezin çênebe, dezgeh û febrîka di axa ku maden û dewlemendî tê de venebin û kar nekin, xelk jî, di warê aboriyê de, maden û dewlemendî jî, di hêla xizmetkirin û xizmetê de, pêwistî derketina ji welatê xwe dibe... Komên xelkê li derî welatê xwe dewletên xwe dipalîne, ji bo bersiva jiyane û hewceyiya rojane bibîne... Yan jî, koçberî cihên ku febrîka tê de hene dibin...

Ev, komên xelkê bê bingeh dike... Xelkê bê bingeh serkevtinê nabîne...

Ev, komên xelkê stûxwar dike... Bêzar û neçar dihête...

Ev, xelkê bê tevger û rêxistin dihêle... Xelkê bê tevger û rêxistin nikare li mafên xwe xwedî derbikeve...

Dewleta Tirk, bi vê sedemê du armanca dane ber himbêza xwe:

Yekemîn: Koçberiya gelê Kurd ji welatê wî...

Duyemîn: Xulamî û sêwîtiya demê deriyân...

Demsalên berê, Kurdan di cihê xwe de, li gund

û bajarên xwe, hewceyiya xwe teva pêktanîn. Ne bes hewceyiya xwe bi tenê, ya Emperatoriya Osmaniyan ji %100 bi giştî pêk aniyê. ⁽¹⁰⁾ Zêdetirîn jî mal ji bo firotina derveyî welat jî, ji dezgehên Kurdan derdiket... Nifûsa Emperatoriya Osmaniyan 12 mîlyonan ji dezgehên li bajarên Kurdistanê derdiket...

Heddad, mişeqa, terzî, sefarî, cumik (çêkirina qumaş), kulav, tevn (merş û tajiya jî ber), kils, kevir karbidestiya sifir (bakir) û hesin... Dêx û pez, rez û werz (bostan), xwê, zîvkerî, zêrkerî ku di bingeha aboriya dewletan de bi navê sekîh tê nas kirin, li Kurdistanê dihate bi kar anîn... Destên mirovên Kurd û keda Kurd sekîh dibirî... Ne hewce ye ku em li ser zêrê spî pembû rawestin.

Kurd, şewrexî segvan bûn...

Kurd xwedî dezgehên karbendî bûn...

Kurd xwedî karwanên bazirganî bûn...

Kurd xwedî xan û manên bedestanî û çarşî û bazaran bûn...

Ew xan û manên di kolanên bajarên de ku îro her yekî ji wan avayînek ji wan dîrokek e, cihê tirata bazirganiyê bû. Berî 70/80 salî, li bajarê Mêrdînê 800/900 dezgehên mal çêdikirinê hebûn. Wiqas jî li bajarê Amedê, wiqas jî li bajarê Erziromê, li Entabê, li Mersîsê, li Erzînganê û hwd, hebûn... Îro li Entabê sa-

nayiya modern li ser wan dezgehên berê hatiye avakirin. Karbidestiya karkerî li Mersîsê û Erzînganê jî wilo... Parîkî dêhna



xwe bidin ser tabloya li bajarên Kurdistanê û dezgehên...

Mixabin, rewşa Kurdistanê di nava 73 salan de bi carekê re hate guhertin...

Ew sekihê zêrîn... Ew keda hostenecari... ew dewlemendiya ax û avê tev bi talanî û weranî kete destên dewleta Tirk... Xwediyê sekihê zêrîn.. Xwediyê madenên dewlemend... Kurd bûne ê devê deriyê Çukurova û tevrikê... Bûne ê devê dergehê Stembolê, yên karûbarê qehwexanan, palên ber kolanan...

Rewşek wilo hate avakirin ku Kurd, ne bes di qonaxa aboriyê de girêdayî Tirkan bibe... Di hêla çand û politîk de jî hatin girêdan... Girêdana gelan di hêla aborî de, girêdana politîk, girêdana çand û wêje jî bi xwe re tine... Nêzikî sed salî ye ku Kurd di tengasiyek û bêzariyek wilo de ketine rekihek hesinî...

Em dê bi 3 bendan li ser vê sedemê rawestin...

1/ Ji navendê, bihayên ku li mal û mewdan dibe, di navbera herêman de jî û li belavbûna hatina salên ku li gorî şexsan bela dibe jî bandorê dike... Lê ev pirsgirêk di dîroka dewleta Tirkan de tu caran ne hatiye çareser kirin. Çareserî, bi destên dewletê çênebûye... şikestîk û nexweşî bi qestî û zanîn hatiye mezin kirin û kûrkirin... şikestîk û nexweşî di navbera komên xelkê Kurd de kûr û fereh kirine. Plan û programên têr xap û leystikên politîkî, di tevgera feodalîzmê (eşîrtî) de doza xwînê, qaçax û qereqol û qaçpor û bêşa rêcê û problemên malbatî û civakî, rewşa aboriyê û newekehevkirina Kurdistanê û Turkistanê dane ji bir kirin. Her dem girtin û kuştin, talan û wêranî, şelandin û bi van pêwanan jî, zordestiya romiyên pirsgirêk mezin û xilbe kirine...

Çiroka Şêxmûs Efendî pirr balkêş e... Şêxmûs Efendî li hêla Torê, li Mîdyadê katibê bac û bêsê ye... Berî dema danheva bac û bêsê bi çend mehan derdikevê nava gundan û peran berhev dike. Van pereyên ku berî demê berhev dike jî, didê bi selef û karê bazirganiyê... Lê, rojekê ku Şêxmûs Efendî derdikevê gundan, mirovek bi biwartî ve dibêjiyê de: Ez benî tu qet na tirsî ku hinek bikevine pêşiya te û te bi şelînin... Bersiva Şêxmûs Efendî dibê ev: Kurê min, ez li vir im, lê serçîçeqa duvê min li Ankarê ye...

Bersiv, bo pênc metelîan û wêrankirina gund û waran e...

2/ Xilmetkirin û hazir kirina mal, ji bo hewceyîya cih û herêman di cih de, di be sedema karûbar û danûstandina civakî û dibe sedema pêşketin û bikêrî xwe hatina bi xwe ser... Yanî azadiya aborî...

Ev sedem, 2 çareserî û îmkanan bix we re tine...

Yekemîn: Karûbarê şexsan... Hember kar pere... Hember kedê pere... Pere hember mal û hewceyî...

Duyemîn: Bi kar anîna maden û çavka-

| Bajar | Hejmara şirketan | Dolar | Beramber Perê Tirkî | Rastmal Bi giştî | Di rastmalê de Pereyên biyanî % |
|------------------|------------------|---------|---------------------|------------------|---------------------------------|
| Stembol | 64 | 59.404 | 486.775 | 1.231.426 | 39.5 |
| Kocaelî | 10 | 25.400 | 234.931 | 486.78 | 48.3 |
| Bursa | 6 | 13.636 | 1818.474 | 431.831 | 42.0 |
| Sakarya | 1 | 4.000 | 36.000 | 60.000 | 60.0 |
| Balikesîr | 1 | 67 | 600 | 20.000 | 3.0 |
| Herêma Marmara | 82 | 102.407 | 939.680 | 2.230.043 | 42.1 |
| Çiştî li Tirkîyê | 110 | 119.520 | 1.073.631 | 2.591.820 | 41.4 |
| Tirkîyê % | 74.5 | 85.7 | 87.5 | 86.0 | 41.1 |
| Stembol % | 58.0 | 49.7 | 45.3 | 47.5 | 39.5 |

ÇAVKANÎ: Mehmet ŞAHİN, Rastmalî

niyan, kar û pere...

Her du sedem û îman jî bi hev û din ve girêdayî ne...

Maden û çavkanî, beramber ked û debarê ne...

Ked jî, bersiva, beramber ked û debarê ne...

Ked jî, bersiva xwe dibîne... Karkerên di malbatê de ku keda xwe danîne û bersiva keda xwe standine, bêguman bersiva hewceyîya malbata xwe jî, bi serbilindayî dibînin...

Madenên ku ji axa Kurdistanê derdikevin jî, ji teref dewleta Tirk ve, li cih nayên xilmet kirin. Tevî bi rewşa talanî ber bi rojava de dibin. Ku maden li cihê xwe hate xilmet kirin fêda xwe jî, dide xelkên xwe. Lê dewleta Tirk mesrefa barkirin û guhastinê dide ber çavan û bi karê biçûk jî razî dibe, ji bo xelkê Kurd nebe xwedî tiştekan...

3/ Ku tevgera bazirganî, yanî ticarî nebe, maden û çavkaniyên aborî neyên vekirin, bazara mezin di nava komikên xelkê de nayên lidarxistin, kes jî, di vî warî de, di vî mijarî de nabe pispor û zana yên vî karî...

Nezanî, korîti, seqeti, bi kurtayî biçav û gavî ye...

Ku bazara mezin dinavbera herêman de hatiba lidarxistin, têkiliya Kurdan wê ne bes bi xelkê Tirk û bazarên Tirkan re çêbibana. Bêguman, têkiliya komên Kurdan wê bi derveyî welat re çêbibana... Danûstandin û têkiliya derveyî welêt guhertin û ferebûn û pêşketina gel bi xwe re tine... Bi xwe bawerî... Serbestî û azadiya aborî bi xwe re tine... Serbestî û azadiya aborî, bi xwe re azadiya mirovan tine... Mixabin, dewleta Tirk, ev rê û şivileyên pêşketin û azadiyê ji pêşiya gelê Kurd girtine... Bazirganên mezin, xwedî rastmalên mezin pêwistî reva nava Tirkan kirine... Ku Destûra Pêwistiya Bicihkirinê. **Mecburi Îskan Kanunu**, ya biçûk di sala 1927, ya mezin di sala 1934 an de derxistin, 2 arnmac dabûne pêşberî xwe...

Yek: Ji bo rastmaliya neteweyî di Kurdistanê de neyê damezrandin û burjuwaziya neteweyî çênebe...

Du: Kesên xwedî hêz û serokên Kurdan ji nava komên xelkê dûr bikevin.


Komên Kurdan bimînin bê serdar û şivan...

Gotina serdarê artêşa Tirkîyê Fevzi Çakmak ew gotina xwe got û heya îro jî, erka leşkerî ku li dijî Kurd û Kurdistanê ye bingeha politîka dewleta Tirkîyê ye...

Bêguman, paşdemana û feqîrî ne qeder e...

Mirovên ku di vê girava geş û ronahî ya pêşketî de, ku ne di bin zilm û zordariya kevneperestan de be, wê xwe pêwistî têkili û tevgera guhertinên komên xelkê bibîne... Helbet Cihan dizivire... Mirov jî, di vê zivirîna jîna xurt û dijwar de cihê xwe digire... Lê, mirovên ku di rekiha hesinî de bin, nikarin gavên xwe li gorî van guhertin û têkiliyên pêşdeçûnê biavêjin...

Bi sedsalan e ku Kurdistan bû ye rekihek hesinî... Di vê rekiha hesinî de, mirov, gel dê çawa bikaribe gavan biavêje û bigihê kesên ku bi çigavan dibezin... Guvasta naborî, bandora li ser hewl û mêjî jî dike. Çand û wêje çilmisî û misrî dimî-



ne... yanî bi lîteratura aborî be jî, bi lîteratura polîtîk be jî, bê bi nav kirin, emperyalîzma dewleta Tirk li ser ax û av û berz û gelê Kurd e...

Sala 1949 an de, bi piştgiyaya Amerîka Yekbûyî û rastmaliya Banka Cîhanê, banka pêşveçûna karbidestî li Tirkîyê hate damezrandin. Vê bankê, sala 1950 î de dest bi karûbar kir û bi alîkariya derve jî, 420 proje, bi 797 milyonî sazûman kirin. Ku di sala 1960 an de, bi alîkariya Amerîka Yekbûyî û Ewrûpayê 797 milyonî 420 projeyên karbidestî hatin avakirin: 205 proje li Stembolê, 39 proje li Îzmirê, 16 proje li Edenê, 17 proje jî li Enqerê hatin saz kirin. Yê din jî li nava axa Tirkan hatin bela kirin, yek proje li Kurdistanê nehate saz kirin. Dêhna xwe bidine tabloya demên bi plan...

Bilî van projeyan, em dê bi kurtayî li ser bankayên ku hatin damezrandin rawestî. Diyare ku banka stûn û bingeha ferebûna aboriyê ne û bingeha avakirina rastmalî û burjuwaziya netewî ne...

Sala 1944 an YapıKredi Bankası...
Sala 1946 an Türkiye Garanti Bankası...

Sala 1948 an Akbank...
Sala 1953 an İstanbul Bankası...
Sala 1955 an Pamuk Bank...
Ev banka tev bi alîkarî û piştgiyaya

rastmaliya derve û ya dewletê hatin damezrandin... Tev jî ya şexsan û rastmaliya netewî tînen hejmartin. Bêguman wilo ye jî... Mixabin yek bankê bi tenê, yek xwedî rastmalî bi tenê berê xwe neda hêla Kurdistanê...

Bi wê guhertina ku bi rêxistina Demokrat Parti ya Adnan Menderes û Celal Bayar re hat, mixabin, ji bo Kurdistanê tu gav neavêtin. Di programa vê rêxistinê de jî, ji bo Kurdistanê tu bend tune bûn. Di dema Adnan Menderes de 40 heb, ku bi navê Teşebbûsa Xelkê ya İktisadî, fabrika hatin ava kirin: 1 li Stembolê, 3 li Enqerê, û her 36 ên din jî tev li dora Ege û Marmarayê hatin ava kirin... Menderes bi daxwaz û sozdariya reforma axê dest bi polîtîka guhertinê kir. Ew û Emin Sazak serkêş bûn. Lê dema ku hatin ser hukim, kesên xwedî erd û ax bi xwe re birin parlamentoyê, li wan soz û peymanên xwe jî xwedî derneketin. Derew kirin...

Sala 1934 an ku plan û programên karbidestî yê 5 salane dest pê kirin, tu pişk li Kurdistanê ne ketin...

Di vê demê de 10 dezgehên bi şax û per hatine ava kirin.

1/ Karbidestiya Kîmya û Hevrîşim... Li Gemlik, Smîkok û Zonguldak...

axa gulê... Li İsparta...
Derbik, yanî Kîbrît... Li İzmirê...
Fosfat... Li İzmirê...
Klor û Sulfirikasît... Li İzmitê...
2/ Karbidestiya ji axê... Seramîk... li Kutahya...

Hesin... Li Zonguldak...
Şîşe û Cam... Li Paşabahçe...
Kaxez û selûloz... Li İzmirê...
Kukurt... Li Keçiborlu...
Sungergêçidî... Li Bodrum...
Qumaş... li Bakırköy, Kayseri, Ereğli, Nazilli, Meletî û Iğdır...
Kendir... Li Kastamonu...

Di nava hewqas bajarî de navê Meletiyê derbas dibe û hew... Ji bilî van, di navbera salên 1968 û 1977 an de li Tirkîyê erêkirina 4.235 projeyên din çêbû... Ji %80 pişka karbidestî bû... Di van erêkirinan de, pişka Marmarayê ji %39.2 ket... Yanî 1.661 heb dezgeh û fabrika li Marmarayê ava bûn... Pişka Stembolê, ji %23 ketin... Pişkên din jî, li Bursa, Kocaelî, Tekirdağ û Edirne ketin...

Di navbera salên 1978 û 1979 an de, dewletê erêkirina alîkariya 989 heb projeyên din qebûl kir. Ji van 989 projeyan, ji %38.8 li herema Marmara ketin... Yê din jî li derdorên Ankara, Stembol, Konya, İzmir û Behra Reş hatin avakirin...

Pirr kes, sedema tunebûna bê karbidestiya Kurdistanê di qonaxa coxrafîk de didine diyarkirin. Ne rast e, nêrinek çewt e. Bi armanca xapandinê ye... Coxrafya Kurdistanê ji hêla Behra Reş û Edenê ne asêtir û bêmecaltir e... Li tu welatên Cîhanê sedema coxrafîk nabe rawestandina cih û dezgehên karbidestî..

Mixabin, polîtîka li dijî Kurd û Kurdistanê bi zanistî û bi armancên demsalan hatiya damezrandin heya îro jî wilo didomîne... Min navê nivisandina xwe ne belaş û beletewş kire xelesa dojehî... Hêvî ew e ku zanistên aboriyê yê Kurd bêhtirîn û kurtirîn li ser vê rewşê rawestî. Yekemîn car e ku ez vî şaxê zanistî bi zimanê Kurdî di nava çarçova lîteratura wê de bi kar tînim. Kemasî û xeletî hene, çî di warê malxwetî muhasebê de, çî di hêla birêzkirina mijaran de, lê, ji bo demên pêşerojan de divê ku destpêk hebe... Ne ku zimanê Kurdî têra zanistiya aboriyê nake... Lê, xilmetkirin û bi kar anîn pêwîst e. Destpêk bingeha avakirina rastî û zanistî ye...


Ferhengok:

Rastmal: Peyvek Kurdî ve (etqasî Erebbi kar binin jî) tê maneya malê danhevî, hatî rastkirin û di destande.

Sermaye: Kare.. Peryên bi ser rastmal dikevin e... Yanî artûk deger...

Serwet: Peyvek Kurdî ye, (çiqasî Tirkî û Erebbi kar binin jî) têmana Mal û **Mewdan:** Zêr û zevî û pere û tirş, xanûman tev di nav de ye.

Domination: Erka Aborî.





Bingeha sinifandin û nasandinan gişkan anegorî rewşa aboriyê çêdibe. Rewşa halet û təkiliyên çêkirinê (berkêşî) bandorek mezin li rewş û hereketa dîroka mirovatîyê kiriye û dike. Têkiliya mirov û haletên aboriyê, bandorek mezin jî, li hişyariya mirov kiriye.

Sinifandin,

Zanyarê Kopenhagî C.J.Thomsen civakan, weke civakên dema Kevirxebitandinê (kevîrî), Tuncxebitandinê (tuncî), û Hesinxebitandinê (hesinî) vediqetîne. Zanyar John Lubbock jî, civakan anegorî qanûnên aboriyê disinifîne: 1-Nêçîrvanî, masîgirî, pincarvanî 2-şivantî, 3-Cotkarî (zîraet), 4- şaristanî (bajarvanî).

Edward B.Taylor jî; 1-Biyantî, 2-Hovîtî, 3-şaristanî; her wîha weke sê gavan vediqetîne.

L.Henry Morgan jî, di sala 1877 an da dîroka mirovatîyê anegorî təkiliyên ekonomîk û civakî sinifandiye:

a- Biyanîti;

1- Ji Heyamê (dema) Dîzikçêjirinê heta şivantîyê,

Halet û təkiliyên civakî aboriyê kifş dikin

HÜSEYİN DENİZ

Ji tirkî: M. Ali

2- Ji şivantîyê heta çêkirina Hesin

3- Ji xebitandina hesin heta derketina Alfabê.

Gordon Childe jî, di sala 1925 an da sinifandin anegorî xwarinan kiriye. Dema biyantî-paleolîtîk weke dema aboriya xwarin berhevkinê, dema neolîtîk (hovîtî) jî weke dema aboriya xwarin çêkirinê dibîne. Ji dema şaristanîyê re jî Dema Bajarî dibêje û vê demê weha disinifîne:

Bajarî dibêje û vê demê weha disinifîne:

1- Heyamê Tunc

2- Heyamê Hessin ê Pêşin

3- Feodalîzm

4- Burjuvazî

Marx û Engels jî aboriyê anegorî van deman dinirxîne, civakan li gor hêz û təkiliyên aboriyê (çêkirinan) vediqetînin û dinirxînin. Li gor vê veqetandinê civak wekî Civaka Komî ya Pêşin, Civaka Koledar, Civaka Feodal, Civaka Sermayedar, Civaka Sosyalîst (Komînîst) vediqete.

ABORIYA DESTPÊKÎ

Parçê dîrokê yê pêşin; çêbûn, pêşveçûn û rabûna sazûmana civaka destpêkê (paşdemayî) dinirxînin. Her çi qas civaka koledar, feodal, sermayedar û komînîst jî 5000 salî hinekî zêdetir bûbe jî, civaka destpêkî bi sed hezar salan kişandiye. Di destpêka Dema Çaremîn de protomirov ne wekî sewalên goştxwir zexm bû, ne jî wekî wan dikaribû bibezîya. Her dem li pêşiya wî birçibûn û êrişên sewalan hebûn. Di talûka jiyani de bû. Lê hema yên ku halet çêkirin jiyani û dewama wan domand. Bibe nebe vê jiyana wan bi saya yêkîtiya wan dewam dikir.

12-40 hezar sal berê pincarvanî jî neçîrvaniyê zêdetir bûye. Wê demê wekî ku têra derbasiya jiyani bikin halet jî hene. Lê hema hingî diçe, ji bo parastinê haletên neçîrvaniyê pêş ve diçin. Pêşdeçûna haletên neçîrvaniyê jî, dema pincarvaniyê dibuhurîne û her weha Dema Neçîrvaniyê dest pê dike.

Lê disa jî pincarvaniyê demeke dirêj dom kiriye. Ev dem wekî dema berî çêkirinê tê binavkirin. Vê demê hem erd û hem jî haletên çêkirinê malê tevayî ne. Sebêba vê yekê jî ew e ku, wê demê mirov tenê nikanin haletan çêkin, tenê kandin bi hev re çêbikin. Lewma haletên çêkirinê tevahî ne. Wê dema mirov mejbûr bûn ku bi hev re bimînin û bixebitin (pincarvanî û neçîrvanî). Wisa nebûya ne dikaniyên xwe biparastana û ne jî dikaniyên derbasiya xwe bikirana. Ji van yekan



bû ku haletên wan jî tevayî bûn. Weke ku dixwiyê halet û xebatên(ked) wan tevayî(kolektîf) ne. Ji vê tevayîtiyê ye ku çekirinên(berkêş) wan tevayî bûne. Vê yekê jî rê nedida kedxwariyê, disekinand û nedihîşt çêbe. Ev tişteki xweberê bû.

Ji ber guhertrin û sebebên biyolojîk mîr ji jinan zexmtir dibin û di karên ku zexmiyê dixwaze de, dest bi xebatê dikin. Her wiha mîr komê diparêzin û ji bo parastinê çekan çêdikin. Ev şixwil û çekirin, pisporîke wan(mêr) derdixe ku di civakê de pisporiya pêşin e. Ev berhema girîngtirin û pêşin e. Mîr ji pincarvaniyê derbasî nêçîrvaniyê dibin. Ev derbasbûn guherînên mezîna dixwe aborî û tîkiliyên civakê. Mirovatî dikeve demeke nû, dema Nêçîrvanî û Pincarvanîyê. Pêra pincarvaniyê demeke dirêj bi nêçîrvaniyê re kirandiyê.

Mîrov ji bo ku di ciyên germ de bijîn, heta dema ku ji şikeftan derdikevin, gelek xebat û tiştan dikin. Haletên pincarvanî û nêçîrvaniyê hingî diçe zêdetir û

haletên nêçîrê pisporiya mîran pêktîne. Jinan jî, li ser pincarvaniyê pêsta dibe. Her wiha cara pêşin parvekirina ekonomîk û civakî çêdibe. Ev parvekirin jî anegorî biyolojîka mirov diqewime. Xebat û tîkiliyên anegorî mîrtî û jintiyê vediqetin.


Mîran, pincarvanî û zarokxwedîkirin ji jinan re hiştin û bi xwe jî derketin nêçîrvaniyê. Gava ku mirov bi çaveki teknîkî li vê demê dinihêre; dibîne ku haleta çekirinê ya girîngtirin hestekevîrê tuj e. Mîran, ev kevîrên tuj weke kêrê dixebitandin. Jinan jî, yê weke lewhan yanî yê pehn dixebitandin. Li Australyayê jin û zarok pel-pincare berhev dikin û masîgiriye dikin, mîr jî nêçîrvaniyê dikin.

Bi pêşvaçûna nêçîrvaniyê, nêçîra sewalan zêdetir bû. Ev jî bû sebebê zêdebûna destxistinê. Parvekirina vê zêde destxistinê(artî ürûn) li jinan jî tesîr kir. Berê çî destdixistin; destra tev dixwarin, niha êdî wisa nakin. Bi hev ra dixwin û tevî jî naxwin. Heçiyê mayî jî li cîkî tevayî hildidin(vedişêrin). Destxistina zêde

çûn û guherîna haletan mejbûr dihişt. Rim û kevan jî, ji ber vê yekê derdikevin. Tişteki vê demê jî ewe ku, kuçik kerî(ke-dî) bûye. Ev tişteki civakî û ekonomîk e. Nêçîrvaniyê sewalên nêçîrê kêmkir. Kêmbûna sewalên nêçîrê jî bû sebeb ku mirov bigerin û xwarinên din bibînin. Ji bo wan fêkî û kurmik xwarin ne girîngbûn. Taybetiya klanê ew e ku, di dema xwe ya baştir de, endamên wê tev dixebitin. Yanî xebateke tevayî lê hebû. Weke nêçîra komî û bi torê masîgirtin.

Şixwilparvekirina Civakî ya Pêşin; pêstaçûna cotkariya destpêkî, ne ku xebata tevayî rakir, hê zexmtir kir. Bi haletên destpêkî cotkarî pir zor bû. Vê giraniyê hevkarî dixwest. Sistema tevxebitandina erdê, di gelên cotkar tevan de hebû. Weke Gîna Nu; mîrên Papau pêşiyê erdê bi haletên tuj diqelêşin, piştra jin bi meran lê dixebitin. Piştî jinan jî zarok, kestek û kevîran bi destên xwe derdixin. Ev xebata tevayî mulkiyeta tevayî zexm dike. Mirovên komê, ciyên nêçîrê weke erdê tevaya klanê dihesibînin û nahêlin ji derên din kes bikevê. Lê dîsa jî gelek halet xwemal(mulkiyeta kesî) bûn. Lê hema nedibû ku destxistin xwemal bibin. Kesê ku sewala xwe şerjê bikira mejbûr bû ku ji derdora xwe re goşt bişanda. Ev tev taybetiyên komunalê pêşin in. Tevayî çekirin û tev kirina şixwilê malê komunalê destpêkî temsîl dike. Gava ku civak ji komunalîyê derbasî koledariyê dibe ev rewş hê jî heye. Lê hema hingî hêzên çekirinê pêsta çû, çekirin jî ferdî bû. Ev jî bû sebebê jihevqetîna malên(klan) duserî. Lê dîsa jî, haletên çekirinê yê bingehîn malê komê(klanê) bûn. Taybetiya vê demê ya bingehîn, Dêmezînatîya civakê ye. Çimkî ziraet û firaq çekirinê rola ekonomîya jînî zêdetir dikir. Her wiha jînê di civakê de cîkî girîng digirt û pîrî caran jî ji mîr girîngtir bû.

Di desta haletên civakên Mezolîtîk de bi kevîrên hûr û tuj kirî re, haletên hestî û qloçên bizinkuviyan jî hebûn. Ev kevîr pîrî caran di haletên masîgiriye de jî hatine xebitandin. Masîgiriye êwirîna(rûniştina) mirov jî aniyê. Di vê demê de dîtîna necaxan jî pêstaçûna teknîka Mezolîtîkî ye. Hinek zanyar dibêjin ku necax ji bo daran bibirin û her wiha zeviyan çêkin hatiye xebitandin. Ji ber vê yekê tişteki pir girîng e. Ji bo çekirina çîten texte jî wisa girîng e. Tê bawer kirin ku, çanda Mezolîtîk bi tîr û kevanê jî Misîr û bakurê Afrîkayê derbasî Ispanyayê bûye. Ji wir jî çûye Awrupayê. Em dikarin vî jî bibêjin; civaka Mezolîtîk wekhevê û statîk(sekinî) e. Xebatkarî û pêşverûbûna civaka Mezolîtîk bi zordanên îklima(nebaş) Pêşrojhelatê pêk hatiye. Her wiha ji gîha(pincar) û sewalên kêrhatî feyde hildanê û ketine ekonomîyêke xebatkar. Vê demê zadên biyani kerî dikin. Ji bo zad jî heyamekî kifş li wî ciyî dimînin. Piştra jî diçin ciyên nêçîrê.



çêtir dibin. Ji ber vê yekê jî, yanî bi zêdebûna halet û şaxên şixwilan, rêxistina koma mirovên destpêkî hingî diçe pîralî dibe. Piştî vê rewşê, şixwilparvekirina pêşin jî, ancax di dawîya dema paleolîtîka pêşin de çêdibe. Ji bo haletan hestî madeke pir girîng bû. Ew di hate xebitandin. Wê demê wan hestî baştir dikaribûn bixebitandana lewma. Pêşveçûna haletan, çêbûna eşîretan derdixe. Hêzên çekirinê(berkêşî) hêdî-hêdî pêsta diçin û diêwirin (rudinên). Bi runîştinê civakî zexm dibe. Her wiha kesaniya sewalî jî disekine. Yanî weke berê najîn. Berê weke keriyê pez dijiyan. Koma destpêkî hingî çû ket û rêxistinên pêstaçûyî ketin şûnê.

LSB Leakley, mirovên hemdemê; weke awakî goştxwir, daseke ku şaxeke bivîrê destan (necax) e dibîne. Yanî dema ku ev das derketiye, mirovan baştir nêçîr kiriye û goşt destxistiye. Pêstaçûna Nêçîrvaniyê, ser çekirin û xebitandina

bû sebebê vê yekê. Vê yekê; destxistin, dem û enerjî zêdetir û zexmtir kir. Li cîkî civandina vê destxistina zêde, ji bo runîştina komê bû sebebê gava pêşin. Dîtin û kontrolkirina agir rastî vê demê tê û tîkiliya komê û erdê zexmtir dike. di li cîkî, bi alîkariya agir mirov him xwe ji sewalan diparêze û him jî xwe germ dike. Pisporbûna nêçîrvaniyê û zêdetirbûna destxistinê di civatê de rîya serdestiyê dixwe destê mîr.

Lê hema di dema Mezolîtîk de (vê demê klan herî pêsta ye) ku cemedî rûerdê vedihêle û av dikeşe, cî vedibe. Wê demê gelek komên gîhaxwir diqelînin. Her wiha gîha û dar hêşin dibin û daristan çêdibe. Li daristanê sewal kom dibin. Komên mirovan jî mejbûr dimînin dest davejin nêçîrvaniyê. Ser vê yekê mejbûr man li pey sewalên nêçîrê gerîyan. Gera wan komî bû ku ev jî bû sebebê koçeriya wan. Koçerî wiha derket. Zanyar dibêjin ku rewşa sewalan û nêçîrê, pêsta-

Ji Pincarvaniyê Derbasbûna Heyamê Kerîkirinê

Gîştane tê pejirrandin ku di vî heyamî de xebata jinê cîkî pir girîng digire. Ji ber ku kerîkirina çandinîya biyanî bi destê jinê bûye. Çandinîya biyanî bi xebatên jinê bûye çandinîya kerîkirî, yanî ya îroyîn. Tê zanîn ku jin li ser zeviyên piçûk û nerm, bi kulbe(çape) û tevr pincarê datînin û digihînin. Ev jî, zêdetir weke cotkariya tevr tê gotin. Zanyar dibêjin ku jin di ziraetê de xebitiye û mêr jî neçirvanî kiriye û sewal kerî kiriye. Lê hema zêdetir jî weke çandinîyeke koçerî hebûye. Çimkî, ciyên ku ji bo ziraetê vedibûn paşê bêkêr dibûn(tirlêç dibûn).

Parvekirina Karê Civakî ya Dudan û Mezin; Childe dibêje ku, bi awakî koçerî zevî çêbûne û her wiha cotkarî bi koçeriyê li dinê. Çandin him pincar/zad û him jî sewalxwedîkirin bûye. Her du bi hev ra çûye. Girantir sewalxwedîkirin yan jî zad çinandin(reshandin) jî hebûye. Vê demê cotkarî û sewalxwedîkirin pir zêde dike. Ev rengîni ewîrîn û şivantiyê tîne. Yanî civak dibe tu awa; ciyên avî cotkarî lê baştir dibe(devçem û hwd.), li wan deran gund çêdibin. Ev der dibin şunewar. Weke van şunewarên dêm(bê av) jî hene ku , li wan deran jî pêştacûna cotkariyê ji zexmiya erdê bû. Ji ber ku ax zexm bû, cotkarî lê dêm jî dibû. Ciyên ku ji ziraetê zêdetir kêrî sewal xwedîkirinê dihat jî, lê şivantî pêsta diçe. Civaka wan, anegorî wan rêxistine dibû: Civaka şivantî û Civaka wirî(Civaka Cotkar).

Civaka şivanî, ne civakeke hov e. Engels ser vê yekê derdixe ku karparvekirina vê civakê ne weke ya Klanê anegorî sal(temen) û mêr/jintiyê ye, parvebûna şixwilê civakî ya pêşîn û mezin e. Engels jî vê yekê re, îEşîrên şivanî dibêje. Hewqasî, ji civakên din zêdetir çêdike nîn e. Xwarinên din jî ji hovan zêdetir çêdike. Hingî diçe pincarvan û masîgir zêdetir têkiliyan bi cînarên xwe komên şivanan re datînin. Danûstandinên wan zêdetir dibe. Parvebûna karên civakî ya mezin û pêşîn bi van danûstandinan dibe. Wê demê cotkarî jî şivantiyê girantir e û weke şivantiyê jî serbest nîn e. Vê yekê mirov mejbûr(bêgav) hîştine ku ji herduyan bikevin yekî. Ji hev veqetîna şivantî û cotkariyê, careke din jî parvebûna karê civakî anî. Li ser vê qewimînê, jiyana şivantî û jiyana cotkarî sedîsed ji hev qetîyan. Her wiha Jiyana Rûniştî û Jiyana Koçerî jî ji hev diqete. Jiyana rûniştî û cotkarî awê civaka gundî yan jî civaka malê tîne. Jiyana Koçerî jî qebiletîyê tîne.

Ji Civaka Dêmeziniyê Derbasbûna Civaka Bavmeziniyê, pêşvaçûna şivantiyê (pêşvaçûna kerîkirin û xwedî kirina sewalan), cotkariya kotanî(saban) û parvebûna karê civakî ya mezin û dudan têkiliyên sazumana malê(malbat) guhert. Engels vê guhertinê weke şoreşa hundirê

malêî dinirxîne. Jin, heta dema cotkariya destpêkî malmezîna bû, yanî mezintiya mêr jî dikir. Lê hema ku cotkarî û şivanti, her yek weke şaxeke ekonomiyê ji hev diqetin serdestî dikeve destê şivan û cotkarên mêr. Li ser vê rewşê karê jinê hewqasî yên hundirê malê dimîne. Jin êdî dikeve hundir. Karên hundir yên meslekî jî, ji dest dertê û dikeve destê mêrên xwedî meslek. Hewqasî hinek karên hundir yên bêkêr dimînin ji jinê re. Engels wiha dibêje: Li mal jî rêberî kete destê mêr, qîmeta jinê nema û bû weke kola mêrî.

Koletiya Bavmeziniyê

Bi kotanê ajotina erdê û zêde xwedîkirina sewalan kar û berkêş pir zêdekir. Mirovan êdî ji bo xwarinê û gihandina zarakên xwe, zêdetir çêdikirin. Cotkar û şivanan jî masîgir û pincarvanan zêdetir destdixistin û berhev dikirin.

Çêkirinê û pêşveçûna zexmbûna kedê, hêjaya keda mirov zêdetir kir. Vê jî zêdeçêkirin derxist. Zêdeçêkirinê(artû ürün) jî kedxwarî anî. Yanî mirovek êdî dikaribû bibûya xwediyê çêkirinê zêde. Heta wê gavê ku şerê klanên çêbûya û dil bihata- na girtin, ew dil ji bo Xwedayê klanê dibû qurban. Lê pêştacûna şivantî û cotkariyê ev yek sekinand. Di şuna qurbankirinê de xebitandin. Her wiha koletî zexm bû û kole berekêva di zeviyên de xebitîn.

Sebebê pelişîna saziya Klan; pêştacûna hêza çêkirinê, cotkarî û sewal xwedîkirinê ye. Vê demê kîl ji bo avayan cîkî pir mezin digire. Ji qela û sifrê çêkirina tunc û bi tuncê jî halet çêdibin. Wî heyamî ev tiştne pir mezin in. Xebitandina kîl û tunc, xweşxebatê û çêkirinê pir pêsta dibe.

Çêkirinê, pêştacûna haletan zutir kir. Bi van haletan, xeradiyê zêdetir jî teknîka cotkariyê pir pêştabir. Piştî salên 2 he-

zaran dîtina hesin, li ser pêşveçûna mirovatiyê û têkiliyên ekonomiyê tesîreke pir mezin dike. Hesinê ku li Torosê dertê, him hêsan û pir heye, him jî ji kevîr hişkîr û tujtir e. Bi derketina hesin ra, teknîka avakirinê pêsta diçe. Ji hesin çêkirina haletên cotkariyê, cotkarî pêsta bir. Engels, vî heyamî, weke zexmtiya heyamê hoviye dibîne. Lê wekî din jî, weke Heyamê Hesinî tê navandin.

Pêşveçûna cotkarî û sewalxwedîkirinê, hevguhertina çêkirin jî serast kir. Berê jî guhertin hebû lê kêm bû. Hevguhertinê pişe(zenaet) jî cotkariyê qetand. Ji vê yekê re, hinekan parvekirina karê civakî ya dudan, hinekan jî ya sisiyan gotiye. Pişekar kesê pêşîn e ku kirîn-birîna çêkirinê kiriye. Xebatên bazirganî, zêdebûn û kombûna zengîniyê anî. Hildan-veşartina zad, fêkî, masî û berxwarinan pir zor e. Lê hema mirov; sewal, maden û malên hêja pir baş dikare biparêze.

Duşaxbûna çêkirinê; weke dezgahên piçûk û cotkariyê, rasterast ji bo guhertinê çêkirin derxist. Ev çêkirina mal(meta)î e. Çêkirina mal; ne ku bazirganiya nav qebilê tenê ye, destpêka bazirganiya deryayî ye jî. Vî heyamî madenên hêja weke pere tene xebitandin, lê hê pere derneketiye. Hewqasî weke giraniyên xwe beramber dibin. Anegorî Marks; bazirganî mal bi xwe na, beramberiyên wan veşartine. Yanî xistine pere yan jî metalên hêja û wisa veşartine.

Derketina Xwemaliyê

Pêşveçûna şixwil, ferdîtî û ferdîbûna çêkirinê hêsantir kir. Lê weke çêkirin û serastkirina cewên avê, hinek şixwil hê tevayî bûn. Çêkirin û xebata ferdîbûyî xwemaliya malbatî derxist. Bi vî awayê ekonomiyê, ku prensîbeke ekonomiyê ye, zengîni kete destê hinek kesan û her wiha ew zengintir bûn.



Qonaxên fêh û wurşa hêz û dewlemendiya axayeti ye.

Cotari destpêka
jiyana bi cihbûna
pêşin û mezin e.



Ekonomiya ferdî ji tribuyên(kom) ekonomiya şivani û cotkarî pêstatir çû. Sewal xwedîkirinê ji malbatan re destxist ku karibin li hember xwezayê berxwebidin. Yanî malbat hîni vê berxwedanê kir.

Çêkirin û xebata ferdî, çêkirina ji xebitandin(xwarin û hwd)ê zêdetir û li bal malbatan jî kom bûna vê zêdayê derxist. Hinek ji van malan pir zengîn bûn.

Zengîniya ferdî, xwemaliya ku kedxwir e, anî. Pêşveçûna çêkirina Komê, rê li gelek taybetiyên newekheviyê vekir. Di civatê de, hinek komên zêdepar û pêstatir derdikevin. Ev jî, ji karpavêkirinê çêbûye. Marks û Engels dibêjin ku vê karpavêkirina destpêkî saziya KASTian derxistiye. Ya rast jî ev e. Lewra karpav-

vekirina dudan, weke hesinkaran pişekarî xiste kastîek. Guherîna xwemaliyê parvekirina mal hêdî-hêdî(bergekêva) rakir. Her wiha ji zarokên wan re heqê mîrat-hîştinê derket û zexm bû. Ji van jî tê fêmkirin ku malbata piçûk yan jî ya ferdî di serdestiya mêr de ye. Wekî din jî; bavmezînatî, vênêvê(bibe-nebe), bûyîna zarokên bi dê û bav kifş dixwaze. Di nav klanê de, zêdetirbûna newekheviya malbatan klan belav kir. Malên xweser kû jî klanê derketin; pêşiyê tîkiliyên bi hev re parastinê lê ferqa zengîniyê û dubendiya zengîntî û feqîrtiyê ev parastin birî. Carna jî malên piçûk koçî klanêke din dikirin ku vê yekê belav bûna klanê qedand. Tevayiya destpêkî û tevayiya erdê jî her

wiha rabû. di civat jî tîkiliyên lêzîmi(eqrebatî) derbasî tîkiliyên civakî bû.

Ev tepbûn û kambaxbûna Klanê bi awakî xweş û aşîti jî nediqewimî. Malên zengîn, ji bo duma xwe rêxistineke ku rayê li kole û feqîran bike, hewce diditin. Karekî wiha mêrên civakê cara pêşin, weke karekî dizîkava kirin. Vê demê ku zengîni digihîje tangeke pir girîng, tev-bûna rêxistinên wiha êdî bi şahiyên dibê... Tev ji zengînan pêkhatibûn. Bi vê rêxistinê cara pêşin bavmezînatî û zengîni parastin.

ABORIYA HEYAMA BINDESTIYE

Koletiya pêşin, di dema bavmezîniya pêşin de derketiye. Di dema belabûna komelan de, tev malbatên bavmezînatî de kole û feqîr jî hebûn. Lê koletiya wiha nejiya. Sebebê vê yekê jî; hêza kedê ji koletiyê nedihat, koletî zêdetir ji hêşiran bû û bi çavê bazirganiyê li wan nedînihêrin. Lê dîsa jî dibû sebebê xwemalî û zengîniyê. Pêstaçûna civaka çînî û newekheviya çêkirinê madeyî gelek tişt guhertin. Koledaran, ji bo ku kolan bisekinînin û zengîntir bibin rêxistinên zexmtir û taybetî çêkirin. Çînen derdest jî bo kedxwarinê û kaşberkaşkirinê sistemek dîtin. Ev sistem DEWLETÎ bû. Ximên dewletê wisa hate avêtin. Liciyên weke Hindistan, Çîn, Misir, Babil, Suriye, Iranê jî ber ku kolêxebitandin jî bo serdestan tiştêkî tevayî bû guherîneke wiha derneket. Yanî ximên dewletê nehate avêtin. Lê li Roma û Yunanîstanê jî ber ku koledarî tevayî nebû, zutir dewlet çêbû. Li van deran xebat û çêkirina kole bingeha aboriyê bû. Koledariya vir bavmezînatî bû. Keda kole bû bingeha hebûna civakê. Bi hezaran kargehên mezin vebûn.

Li Roma û Yunanîstanê bi hezaran kargehên mezin bi kolan dixebitîn. Weke Latîfundiuma (li Romayê li ser ziraetê) Romayê û Ergasterîana (li ser kelmelan) Yunanîstanê bi hezaran kargeh hebûn. Li van deran bi hezaran kole xebitîne û ji bo koledaran malê zêde çêkirine. Bi keda kolan weke Dîwarê Çînê (çepereke li hember Tirk û gelên din), Perestgehên Yunan û Hind, tiyatroyên Romaê, rê û cewên avê, pîramîtên Misir, Guetemala, Hondurus û Peru çêbûne.

Vê demê kirînfirota kolan dibe, bi mal diguhierin. Kole jî bo koledar her tiştî dike. Lê koledar hewqasî ku nemre lê dinêre. Wekî din jî, keda kole jî koledar re dimîne. Çîna kolan wiha kaşberkaş dibe. Di vê civaka koledar de, koledar him xwediyê haletan e, him xwediyê keda kole ye û him jî xwediyê kole bixwe ye. Kirînfirota hewqasî ya kole û kelmelên konfor bûn. Çêkirinê zêde bi kole û kelmelên nû re diguhirîn. Zengîni wiha zêdetir dibû. Di vê saziya çêkirinê

de, kole mal(meta) e. Ji ber vê yekê hêza kedê ne mal e. Lê ku hêza kedê kirin be, hêza kedê dikare koledar ji çêkirina zêde bêpar bihêle.

Şaxên çêkirina(xebat) civaka koledar; cotkarî, sewalxwedîkirin, darxistina tevnan, firaq çêkirin, destarî, hesinkarî, dîzik çêkirin, aşvanî û xeradî ye. Pêştaçûna karpavvekirinê, pêştaçûna cotkarî û ya sewal xwedîkirinê ku zêdetir bû, têkiliya malî ûperê jî pêsta çû. A çêkirinê zêde cara pêşîn li kargehên weke Latîfundî û Ergesterai derket kom bû. Xwediyên van kargehan malên zêde xistin bazarê. Ciyên bazaran jî her wiha bûn ciyên huner, bazirganî û zanîn. Gelek bajarên wiha çêbûn. Lê hema, van xristaniyên kevn, ev yek bi keda kolan kirine. Vê demê kole firotin jî zêdetir dibe. Li ciyên weke Çîn, Yunanistan, Roma û Hindistanê hesin çêkirin zêdetir bû û li bazaran kete firotanê. Hev-guhertina mal jî, ji ber vê yekê hingî çû zêdetir hate kirin- firotin. Her wiha bazirganî pêstatir çû. Têkiliya mal-pereîû pêştaçûna bazirganiyê hingî çû sermaye bikir(tucar)ê sefedar(tefeakar) derxist. Çineke bazirganî wiha derket. Derketina vê çinê karpavvekirina sisiyan anî. Taybetiya civaka koledar; ferqa piçêkirin û xebata kole, kêma çêkirina gundiyan ne kole û kelmel çêkirinan e. Çêkirinê gundiyan ne kole baştir bûn. Li ser vê yekê gelek gundî bûne proleterên xweser (azad). Gundiyan azad, ji ber kedxwariy bajar, ketin bajaran. Lê hema piştra, kolên erzantir êdî hindiktirhatin kargehên mezin. Her wiha kole bihatir bûn. Ji ber vê yekê jî çêkirina zêde kêma bû. Van kargehan zirar kir. Piştî cotkariyê kelmel çêkirinê jî zirar kir. Kirin-firotin sekinî. Şênîyên (nifus) bajaran kêma bûn. Xebitandina kargehên piçûk kartir bûn. Ji ber vê yekê kargeh û cotgehên mezin ji bo karkirinê piçûk bûn. Erd parçe-parçe bû û heta bi kirê dane kolan jî, ji bo ku kar bikin. Hingî çû ev rewş xwirttir bû û vê jî dubendiya

nav çinan kurtir kir. Serhildanên kolan çêbûn. Ev serhildan bi gundiyan bê erd û yên ku kelmelan çêdikin re, li hember koledaran bû weke şerekî. Her wiha gelek şer çêbûn. Imparatoriya Romayê wiha hilçiya. Keda kole gelek tesir li jiyana civakê kir, dubendiya têkiliyan çêkirinê û civakê derxist. Ev sistem jî bi ranta (kirê) erdê dijiya. Lê ji koledariyê pêstatir bû. Her çiqas feodalîzm bi hinek riyên din derketibe jî, encam yek bû. Yanî tiştên weke tiştên dawiya heyamê koledariyê diqewimîn. Ev ji bo van karên xwe jî, ji Qral erdê distînin. Ji van re, mîrên feodal (di zimanê Awrupayê de: senyor, duk, kont û hwd) tê gotin. Pêra, mirovên ku li ser vê axê dijiyan jî, bûne malê van mîrkan. Her wiha serftî derdikeve.

ABORIYA FEODAL

Piştî hilçina klanên hinek malbatên zengîn dertên. Ji van ra senyor tê gotin. Ev zengîniya wan jî têkiliyan cînartiyê yan jî, ji cotkirina erdê dihat. Van malbatan yan jî kesan; ji bo ku li hember feqîran yan jî hovan zengîniya xwe biparêzin û zêdetir bikin rêxistineke eskerî çêkirin. Ev saziya ekonomiya feodal wiha çêdibe û dimeşe. Hingî diçe gundî dibin kole yanî serfî. Ev yek jî zêdetirbûna newekhevîyê derdikeve. Gundî(serf) dibin kolê senyoran. Senyor him xwediyê wan e û him jî xwediyê erdê wan e.

iha dixwiyê:î Çavberdana malên cînanan, her gav li wanên ku dixwazin xweberê bibin xwedî mal, xweş tê. Ev gelên hov in. Cerd û talan seva wan çêtir e ji qazanca xebatê(kedê).î

Taybetiya(xwenav) kedxwariya feodalîtê, hişê feodal e. Dest dide ser zêdetir çêkirinê gundiyan bindest. Hewqasî cîriya wan dide. Ev hişê feodal e. Ev çêkirina zêde guherî û bû weke kiriyar(rant/deman) erdê. Bingehên ekonomiya feodalîzmê; ji xebitandin û kaşberkaşkirina gundiyan ne azad malê zêdetir destxistin

e. Ev jî weke kiriyar erdê di destê wan de bû.

Ev kirê sê celeb bûn: Kiriyar erdê, kiriyar malî(aynî) û ranta pere. Bi pêştaçûna ranta pere, gundiyan malê zêde di şuna dayina sermal (aynî) de êdî pere dane axa yan jî senyorên xwe. Her wiha mecburiyeteke din jî derket. Gundî êdî mecbur bûn ku malê zêde vergerîne pere û wisa bide axayê xwe. Li ser vê yekê têkiliya gundiyan û bazarê xwirtir bû û ew gundîtiya xwe derdan. Mal çêkirina ji bo

bazarê hinek gundî zengîn kir û hinek jî feqîrtir kir. Pêra axayên feodal jî ketin bazarê.

Bi pêşveçûna bazirganiyê re fayîz jî pêşde çû. Deyndayiyên gelek pere deynî dane Dêr û axên feodal. Her wiha, wan jî bi riya deyndayinê keda gundiyan xwarin. Bi vê çûnê, di nav feodalîtê de KAPITALIZM çêbû û pêsta çû. Pêra li hember feodalan şer jî zêdetir bû.

Derketin û pêştaçûna ranta pere, bû sebêbê paştaçûna feodalîtêyê û dubendî kurtir bûn. Bi pêşveçûna bazarê re him bajarên ku berê paşta diçûn pêsta ketin û him jî bajarên nû çêbûn û geşbûn. Hingî çû bajar bûne ciyê bazirganî û hunerê. Li bajaran komên (rêxistin) esnaf û bazirgan bûne yek. Cara pêşîn koma esnafan di s.s.a 10 an de li Italyayê çêbû. Li ser pêşveçûna haletên malçêkirinê jî gundan dagerîna bajaran zêdetir bû. Gund di destê feodalan de bû û li bajaran serdestî dikir. Lê hema bajaran bi bihayê girantir, bêş, saziya koman (lonca), bazirganî û deyndayinê ked dixwar. Hingî diçû şênîyê (nifûs) bajaran zêdetir dibû. Ji sistema du-zevîtiyê derbasî sistema sê-zevîtiyê bûn. Teknîka metal xebitandinê pêşveçû. Bazirganî bû sebêbê belav bûna feodalîzmê.

ABORIYA SERMAYEDAR

Gava ku tesîra burjuvaziya li ser feodalan û rêberên dewletê zêdetir bû, kapitalîzm derket û pêstatir çû. Li ser vê yekê gundî û yên weke wan xwedî ked (xebatkar) jî haletên çêkirinê dîr xistin. Her wiha zengîntî, pere û erd kete destê komeke piçûk. Ev bû pêvajoya destpêka kombûna sermayê.

Li Îngîterê di dawiya s.s.ia 15 an de destpêkê û heta s.s.ia 18 an dikişîne. Destpêka -vê yekê; zêdetir ji xebitandina hiriyê û bihabûna hiriyê tê. Imalatxanan hirî dixiste caw(qumaş)î. Hewcedariya caw hingî diçû zêdetir dibû lewma. Vê yekê jî pez xwedîkirin zêdetir kir. Xwediyên erdan, gundî ji erdên xwe avêtin û erd xistin delaw, mêrg û çêre ji bo pez xwedîkirinê. Vê yekê gundî jî olamkariya feodalan derxist û xiste proleter. Ji bo derbasîy xwe mecbur bûn ku bixebitin. Di kargehên burjuvan de dest bi xebatê kirin.

Her wiha hingî çû xebatkarên mal ketin bin destê bazirgan. Berçav xwe-malên azad bûn, lê bibûn karkerên bazirgan. Piştî ku feodalîzma Awrupayê (dawiya s.s.ia 15 an, serê s.s.ia 16 an) ke-te heyamê belav bûnê. Li vir endustriya baraqa, manifaktur û koperasyon derket û pêsta çû. Ji bo kargehên sermayedar perki zêde dixwest. Her wiha çî perên li bal şaxan (hunermend, bazirgan, deyndayî) hebûn kom bû û ji bo van hate xebitandin.

Burjuvaziya nû gihîşt; bi talan, kedxwarî û koledariyê şênîyên Amerîka, As-



ya, Afrîka, û Australyayê epirze kir û her wiha zengîn bû. Ev yek di demeke kurt de qediya û bi milyonan kole qeliyan. Talan û cerd ji bo derketin û pêştaçûna sermayedariyê planne pir bê teşe bûn. Dema dawîya s.s.ia 17 an û serê s.s.ia 18 an civak ji feodalîtê derbasî sermayedariyê dibû. Vê demê burjuvaziyan ji bo ku hêza dewletê bixin destê xwe, li hember feodalan destskiya gundî û xebatkaran dikirin.

Piştî ku burjuvaziyan otorîta dewletê bi destxistin, zordariya li ser kedarên girantir kirin. Li ser vê yekê, ku karker jî dil berda rabûn burjuvaziyan bi feodalan re hevkarî kirin. Her wiha feodalan bi olam(angarya), hevparî û kedxwariyê re, bi awên burjuvaziyê jî kaşberkaş kirina gundiyan domand. Ya ku kapitalîzm derxist çêkirina meta bû. Çêkirina mal jî, bû xwediyê du awên dirokî. Ya yekan malçêkirina sivik ya gundî û kelmel çêkirinan; a dudan, malçêkirina sermayedar ya zengînên mezin û xwedî erdan û ya sisîya jî, hevaltîke erduyan e ku xwemaliya haletên çêkirinê zexm bû. Ferq jî, haletên mal çêkirina sivik berkêşên kedê, yên malçêker bû û her wiha rê tunebû ku

mirov keda hev bixwin. Di sîstema malçêkirina sermayedar de jî, mal çêkiriyê nerasterast(endirekt) ji haletên çêkirinê diqete. Mal ne ji wî re ye, ji xwediyê haletên çêkirinê re ye. Piraniya mal ji bo firotinê çêdibe. Marks, li ser zengîniya civakên ku malçêkirina wan sermayedar e wiha dibêje; malê wan bûye komeke pir mezin û nişana vê jî mal çêkirin eî.

Hevkariya sivik, sermayedariya koperasyon derxist. Ev yek di awên berî sermayedariyê de jî hebûn. Lê kapitalîzmê jî bo destxistina karê şixwilparvekirin xiste koperasyonan û dest bi manîfakturiyê kir.

Makinên pêşin di manîfakturan de bi dest çêdibûn. Paşê makinên makîne çêkirinê derketin. Her wiha malçêkirina makîneyî kete sermayedariyê. Li ser vê yekê bingeha sermayedariyê zexmtir bû. Ji manîfakturê derbasbûna mal çêkirina makinê pişekarî pêsta bir. Ev bû şoreşeke endustriyê. Serdestiya pişekaran kelmel çêkirin xist. Her wiha li bajar û gundan tîkiliyên civakî yên kevn şikestin, malçêkirina sermayedar mal çêkirina destan kuşt û şaxên endustriyê derxist û xiste destê xwe. Kargêhên mezin yên en-

dustri çêbûn. Li ser van apîtalîzmê anegorî serwxitiya xwe û bi hêrseke mezin rîya baştirîn dît ji bo mal çêkirinê. Bi sermayedariyê re du sîstemên civakê(çîn) derketin. Yek, civaka ku bi peran keda xwe difiroşe û ya din jî civaka ermayedar e ku vê keda wan dikire.

Pêşveçûna makînan xwarina keda karkeran zêdetir kir. Anegorî mezinbûna kargehan zêdetir mal çêkirina ku ji keda karkeran tê jî zêdetir bû.

Kapitalîzm anegorî pêşveçûna haletên çêkirinê her gav pêsta çû. Sermayedarên ku li nav dewletê bûn zêdetir kar dikirin. Ji bo zêdetir karê derketin welatên din jî. Her wiha cara pêşin dagirgeh çêbûn. Piştî ku ev dewlet yan jî ciyên dagirgeh ji dest derketin, wan îcar mal firotin wan û wisa kar kirin. Li ser vê yekê dagirgeh û welatên kêmpêştaçûyî ji wan re bûn bazareke vekirî. Hinek holdîngên mezin, êdî di suna mal de, sermaye îxrac kirin. Her wiha li dewletên din bi van peran kargêh vekirin û zêdetir zengîn bûn. Pêra hevparî jî kirin. Ev yek jî giştane bi bankanî pêktê. Her wiha sermaye malî jî(banka) gihîşte sermaye endustriyê. Bi vê yekbûnê Emperyalîzmî çêbû. Niha jî, bi sermaye şandina van monopolan mal çêkirin pirtir kete destê wan. Li ser vê sîstema bêperwe, êdî şirket li ciyên bi hezaran km dur van karên kedxwariyê dimeşînin. Ev demî rastî heyamê teknolojiyê jî hatiye. di di xebat û mal çêkirinê de komputer jî çêbû. Komputerê gelek mirov ji bê xebat hişt. Karektera vê sîstemê jî tengasiyên ekonomîk, bahatî û enflasyon e. Ferqa navbera keda mil û keda hiş jî, hingî diçe zêdetir dibe.

ABORIYA SOSYALÎST

Sîstema sosyalîst weke şikestina sermayedariyê tê dîtin. Rêxistina aboriya sosyalîst; rêxistina çivaka komunala pêşin ne tev, wekî din li dijî modelên aboriya civakan tevan e. Di modela aboriya sosyalîst de; xweserî radibe û haletên mal çêkirinê jî tev dibe malê civaka tevayî. Firotina kedê radibe. Koperatîf, kargêhên tevayî çêdibin. Xebatkar tev dikevin plankirina kar. Armanç jî hewcedarî û anegorî kedê heqdan e.

Çavkanî :

Siyasal Düşünceler Tarihi, Verso Yayınları
İlk Çağ Tarihi, V.Diakov, S.Kovolev,
V Yayınları
Ailenin, Özel Mülkiyetin ve Devletin
Kökeni, F.Engels, Sol Yayınları
Ekonomi Politik Nedir?, Sergei İlyin,
Bilim Sanat Yayınları
İlk Toplumların Değişimleri, Serol Teber,
Say Yayınları
İnsanlık Tarihi, Andre Ribard, May Yayınları
Kendini Yaratın İnsan, Gordon Childe,
May Yayınları
İlk Topluluktan Uygur Topluma 1-2,
Verso Yayınları



Dozkirinên teknîk û geşbûna zanistî serê sedsala 20'an de her tiştek bin hev re kir û reşwên mirov de pêşveçûyînek bi lez saz kir.

LI GERDÛNÊ, ÇAVÊ ME HUBBLE ÇI DIBÎNE?

SAADET KOÇ

Bilim ve Teknik, Hejmar: 338 Ji tirkî: M. Ali

Li gerdûnê çî diqewime? Gerdûn çend salî ye? Çiqas mezin e? Galaksî çawa çêbûn? Zanbaran ji bo van pirsan heta niha gelek teoriyên nêzikî aqilan çêkirine. Lê her xwiyaniyên ku ji Teleskopa Gerdûnê Hubble tîstîstî dîrî aqilan û pêştacûnên girîng derdixin. Riya tîstîstî nû vedike. Di 10.1995 an de komek lêgerên navnetewî bi Teleskopa Gerdûnê Hubble lêgerî-

nekê dikin. Hubble bi gelek pîvanan li ser salên Gerdûn û stêrkên herî kevn dixebite. Di navber salên Gerdûnê û stêrkên kevntirîn (ên ku heta niha tîstîstî zanîn) de dubendiyek pir mezin dertê. Ev yek tîstîstî pir mezin û pir jî balkêş e.

Teleskopa Gerdûnê Hubble, ji kûrahiyên gerdûnê gelek fotoxrafên nû li ser hev şandin. Xwiyaniyê bi ronahiya nûn e. Di navenda stêrkên nûçêbûyî de hêlwestiyên nukleer çêdibin. Li ser vê çêbûnê

tîrêjên wialixwiyaniyê (morotesi) çêdibin. Bi van tîrêjan xwiyaniyê mirov bîncîkî dikin. Ew resmên ku tîstîstî astronomên ji şaş dihêlin, ew ancax xwe digirin. Ew galaksiyên ku Teleskop fotografên wan dişîne 7000 saltîrêj (îşikyilî) ji dinyayê dîr in. Mezinkirina xwiyaniyên van fotoxrafan, deh car ji wan ên erdê ku ewqas rind in û zanistîtiya wan heye, zelaltir in. Anegorî wan ên erdê, du çêtiriyên din jî hene. Wekî ku tîstîstî zanîn atmosfera dinê, piraniya tîrêjên wî alî xwiyaniyê û wî alî sorahiya ku ji enerjîya ewrên gaz û stêrkên çêdibe derbas nake. Yanî enerjîya stêrkên û ewrên tozê tîrêjên wî alî xwiyaniyê û wî alî sorahiya derbasî dinê nedikirin. Lê, Hubble vê yeke diborîne. Wekî ku tîstîstî zanîn atmosfer ji bo jiyana dinê pewîstiya mezintirîn e. Ev atmosfer, hêlê ku em avabûna gerdûnê fam bikin. Lewra wan tîrêjên ku ji tîstîstîstîstî ne bernade. Heta niha teleskopên nikanibûn xwiyaniyê derbasî dinê bikirana. Gaz û enerjîya atmosferê yan wîndê dikirin yan jî pir xerab dikirin. Teleskopêk li jora atmosferê di xeta xwe de (yorange) be, ne ku hewqasî rengên çavên mirov dibîne, rengan tevî dibîne. Ji ber ku atmosfer qet nasekine, toz û mij e, teleskopên li erdê nikanin fotografan rast bikişînin. Fotograf tevlihev der tîstîstîstî her weha şaşî pirtir dibe. Teleskopêk li jor vê hewayê fotoxrafên wek kristal zelal dikane bikişîne û bişîne. Her weha hînek sirên Gerdûnê xwîya dibin.

Ramana ku teleskop here li gerdûnê fotoxrafan bikişîne, cara pêşîn di sala 1949 an de derketiye. Plan û çêkirina wê (teleskop) rastî salên 1970-80 yan hat. Dawiyê Hubble çêbû. Mekîka gerdûnê Discovery, di 25 ê avrêl 1995 an de Hubble bir li ser xeta wê bi cih kir. Cihê wê ji rûerdê 600 km. bilind e. Ev bilindahî li gor bilindahiyên cihê (yorange), teleskopên din nizm e; yanê kêmtir e. Gera (çap) neynika haletê 2,5 m. ye. Ji bo ku her gav û baştir fotografan jê bigirin divê cîhaz û komxebatên (ekîpman) wê bîstî parastin. NASA ji bo ku xerab nebe gelek xebatan dike, çûyîn û hatinan sererast dike. Nexasim, piştî şandina Hubble, di neynika wê de xetayek sivik a teknîkî çêbûbû. Ev yek, bûbû wek gumanbirînekê. Lê paşê rast bû û gelek tîstîstîstî baş li ser hev şand. Ji bo tamirat û lînihêrîna wê, NASA serwîsan dişîne. Serwîsa pêşîn mekîka gerdûnê Endeavour di 12.1993 yan de pêk anîn. Bi vê şandinê astronot jî diçin. Astronotan tamirat û peywendiyên wê qedandin û xeta neynikê jî rast kirin. Ev xebatên astronotan di dest re zindî diweşin dinê û gelek welat, li ber televîzyonan zindî lê dînihêrin. Ev xebata NASA'yê serfiraziyek mezintir bû. Rayedarên NASAyê diyar kirin ku çawa hatiye plan kirin wisa



ji dixebite. Fotografên ku Hubblê şandine van îspat dike.

Hubblê berê ji fotografên baş şandibûn. Xwiyanîyên ji Galaksiya M87an hatine diyar dike ku di navenda galaksiyê de quleke reş heye, delîlên vê yekê gelek in. Lihevketina planeta Jupîter û Shoemaker Levy-9 (Stêrka bi Boçîk), bi teleskopê bi her awayî gav bi gav gihîştin dinê, Hubblê ji bo dîroka astronomiyê gelek fotografên kuasar kişandine. Ev fotograf ji bo têgihîştina van yekan pir girîng in. Pîvanên Nû yên Nequhera Hubblê, Astronomên dîdevangeha Carnegie (Washington) Wandy Fredman, astronomê dîdevangeha Steward (Arizona) Robert Kennicutt, astronomê dîdevangeha Mont Stromlo-Siding Spring Jeremy Mould komek lêgerînê çêkirin û li ser galaksiya M100 xebitîn. Dûrahiya vê galaksiyê wisa rast derxistin, mirov şaş ma. Ev pîvan ji bo rast zanîna mezinbûn û salên gerdûnê tiştekî zaf sistematîk e, û karê pêşin e. Hêvî dibe ku ev dê ji bo hînbûna pîvana firehbûna gerdûnê tiştekî mezin be. Yanî dinya (çiqas û çawa) fireh dibe. Ev hesab weke nequhera Hubblê tê zanîn û tê binavkirin. Nequhera Hubblê di sala 1929 an de ji alî astronomê Amerîkî Edwin Hubble ve tesbît bûye. Edwin Hubble firehbûna gerdûnê dîtîye û pîvaye. Lewma jê re nequhera Hubble tê gotin. Hubble dîtîye ku, hingî diçe galaksî ji dinê dûr diçin; galaksî çiqas dûr be xiza (hiz) dûrbûnê jî ewqas mezin e. Matematîk-îfada wê dîtîne $v: H_0 \cdot r$ bi navê zagona Hubble tê zanîn. Di vê wêkhevîkirinê de v , xiza dûrbûna galaksî; r , ji dinê dûrbûna galaksî; H_0 , nequhera Hubblê diyar dike. Taybetiya vê zagona Hubble her dem freh bûn e. Ev teoriyek e. Anegorî vê teoriyê Teqîna Mezin çêdibe. Yanî gerdûnê bi teqînek mezin dest bi firehbûnê kiriye û her weha firehtir dibe. Ev yek îspatên teoriyê ne. Hesibandina nequhera Hubble, di derbarê sal, firehbûn (mezinbûn) û çêbûna gerdûnê de dê gelek tiştên hemî bide. Têkiliya vê nequherê bi salên gerdûnê re, bi hesibandinê dertê. Nequhera Hubble, $H_0: v/r$, ferqa di navber pîvana xiz (km/s) û dûrahiya kozmîk a ku bi megapersec (Mpc) (Megapersecek wekî 3.26 mîlyon saltîrêjê ye) tê pîvan de ye. Her weha pîvanga (olçut) wê km/s/Mpc ye. Gava ku Mpc vegere km yê û zelal dibe, pîvang-saniye ($1/H_0$) dê derkeve. Yanê pîvang dê bibe saniye (s). Ewê xwiya bibe ku ev hesibandina sivik demê dide nîşan. $1/H_0$ dê bide xwiyakirin ku galaksiyek ji bo ku bi xizek kiş mesafeyek kiş here dema pewîst e. Mirov dikane weha binirxîne. Li ser salên gerdûnê nequhera Hubble, girîngiya hesibandinê dide nîşan. Zago-

na Hubble têkiliyek Lineer dide pêşiya me. Mirov dikane bibêje bi vê formilê nequherê tesbît bike. Lê çî heye, pîvana vê nequherê karekî pir tevlihev e. Astronom ji bo vî hesabî du riyên newekhev hewce dibînin. Metodêk wan derxistinê ji dinê dûrbûn xiza galaksiyê bi metoda sortîrbûnê (kîrmızıya kayma metoduhingî diçe sortîr dibe). Ji bo kîşkirina navber galaksiyan û dinê jî sedî sed rast-pîvan pir diwar e. Ev karekî gelek tevlihev e. Galaksî çiqas ji dinê dûrbûn jî ewqas zor dibe. Lê, ji bo heyînen pir dûr jî, metodên pîvanê hene. Ev metod ne pê bawer in. Di sala 1912an de jinek Amerîkî Henriette Leavitt metodekî weha dît. Ev metod taybetî ye û bi guherînen Cepheid dibe, çavneriya ser stêrkan tê xebitandin. Guherînen Cepheid, biriqînên periyodîk dikin. Şemala stêrkê kê-m-zêde dibe. Sazperiyodên vê hereketê mirov dikane bihesibîne. Henriette Leavitt, digihîje ku periyodên vê guherînen li gor şemala (hêza mûltaqa şemaldanê) stêrkê ye. Komên stêrkan çiqas dûr dibin bila dûr bin, heke hebe, bi pîvandina Cepheid guherînen periyodan şemaldan û dûrbûna dihesibe (wekî ku tê zanîn, enerjiya ku stêrkek di saniyekê de dide û hevrîkirina enerjiya di saniyekê de ku di cm^2 yek teleskopê de dicive, kareya (X^2) dûrbûna stêrkê dide).

Berî çavneriyên dawiyê, komên ku ji bo hesibandina nequhera Hubble dixebitin pîvanên di navber 50-1000 km/s/Mpc dibînin. Di sala 1994 an de Michael J. Pierce û koma wî, bi teleskopa (li Hawai) [Amerîka, Fransa, Kanada (teleskop a van her sê dewletan tevan e)] di koma stêrkên Virgo de, fotografên Galaksiya NGC4571 î kişandin. Di vê galaksiyê de 3 guherînen Cepheid dibînin û pê dûrahiya galaksiyê û nequhera Hubble derdixin. Mehek paşê jî koma W. Freedman dest bi xebatan dike. Ev kom kamera teleskopa gerdûnê Hubble WFPC2 î dixebitînin. Bi vê xebatê jî koma stêrkên Virgo, 20 guherînen-Cepheid ên Galaksiya M100 dibînin. Hesibandina piştî van çavneriyan diyar dike ku Galaksiya M100 56 mîlyon saltîrêjê dûr e (± 6 mîlyon saltîrêjê). Astronoman li ser pîvanê derxistin ku gerdûn wekî 80km/s/Mpc ($\pm 17\text{km/s}$) fireh bûye.

Li gor vê nequhera Hubble (80km/s/Mpc) û standard modelên kozmolojîk gerdûn 8 mîlyar salî ye. Ev tiştekî texmînî ye. Hinek stêrk hene ku salên wan (texmînî) 6 mîlyar sal in. Mirov anegorî van dikane texmîn bike ku stêrk hene ji gerdûnê kevntir in. Lê he-ma tiştekî zanistî heye ku vê yekê napejirîne. Lewra stêrk di hundirê gerdûnê de ne. Ev tiştekî nabe ye. Lewra law ji bavê mezintirî nabe. Xwiya dibe ku şaşî hene. Ev şaşî yan di salên gerdûnê de ye

yan jî di salên stêrkan de ye, yanê jî hesibandina salên wan çêbûbe. Bi du riyan dibe: 1- Standardmodelên kozmolojîyê ku nequhera Hubble xebitandiye, pê salên gerdûnê hesibandîye şaş e; yan jî, 2- Di hesibandina salên stêrkan de şaşî heye. Astronom li ser hev, li van metodan dinîherin ka xeta çawa çêbûye. Gereke mirov pir serwext û hişyar be ku kanibe tesbît bike ka ev şaşî çima û çawa çêdibin, formula vê yekê çawa sere-rast dibe.

Galaksiya M100, galaksiya herî dûr e û bi guherîna Cepheid hatiye dîtîn. Ji bo sererastî (hemîni) ya pîvanga nequhera Hubble û salên gerdûnê gotî mirov nelezîne, bînteng nebe. Li hêvîyê bisekine, heta ku di pêşerojan de zanîn û fotoxrafên Hubble dişîne bibine, li ser lêgerînan bike û wisa tiştekî zanistî derbixe. Ev riyek bi aqiltir e.

Deh Sal Mayîna Teleskopê

Deh sal maye ku Hubble karê xwe biqedîne, êdî ji kar bikeve. Piştî wê demê di teoriyên astronomîk, der û pirtûkên astronomîk de guherînen çêbin. Hubble li gerdûnê çavtiya dinê dike, dinya bi Hubblê gerdûnê dibîne. Hubble tiştên derî xeyalan gav bi gav dide. Xwiyanîyên wisa dişîne ku heta niha ne yên wekî wan, yên nêzîkî wan jî nehatine dîtîn. Serwisên ku Hubble çêtir bikin, dê di salên 1997-1999 û 2002 an de bi rê bikevin. Xebatên Hubble fermî ne û di sala 2005an de diqedin. Heta wê demê jî Hubble êdî diperrite. Wê gavê xebatên nûkirina Hubble û dîsa xebitandina wê li ser NASA û Kongra Amerîkayê ye. Heke ew bipejirînin û bixwazin Hubble dê nû bibe, dîsa dest bi xebatan bike. Ku nepejirînin êdî naxebite (piştî 2005 an). Heta wê demê belkî teleskopên li erdê jî pêşta herin, zirardana atmosferê bê tesîr bikin û bi komputeran bixebitin. Heke teleskopên erdê ewqas pêşde herin, pêwîstî bi Hubblê namîne. Heta wê demê mesrefa Hubblê digihîje 5-6 mîlyar dolarî. Lê ew dê beranberiya vê maliyetê derbixe.

Çavkanî :

<http://www.stci.edu/pubinfo/HST.html>
<http://astrosun.tn.cornell.edu/students/lazio/sci/astro.8FAQ>
<http://stsci.edu/pubinfo/press.release/94-49.txt>
<http://antwrp.gsfc.nasa.gov/apod/a/p950810.html>
<http://www.stsci.edu/proof/edwin/html>
 Nature, cîld: 371 hejmar: 6500
 Nature, cîld: 371 hejmar: 6496
 Time, 20.11.1995
 Türkiye Bilimler Akademisi, Bilimsel Toplantı Serileri, Bilim ve Eğitim, Sayfa 11-13, 2-3 Aralık 1994

Dîrok û Serpêhatiya Laşê Mirov

ŞAREZA AVER

Bi destûra we, ez dixwazim bi çîroka bajarê Leydenê dest bi mijarê bikim. Leyden, bajarekî Îngilîstanê ye. Sal 1575 e, di navbeyna Îngilîzan û Spanîyan de şer derdikeve. Spanî êrişî Leydenê dikin. Gelê Leydenê li ber xwe dide û berxwedaneke dîrokî pêk tîne. Şahê Îngilîstan yê wê demê şah William Orange e. Key Orange ji bo vê berxwedan û serkeftinê dixwaze diyariyekê bide Leydenîyan. Bang li wan dike û dibêje, daxwaz ya we ye. Hûn dikarin ji bo deh salên pêşî bacê bexşbûna xwe bixwazin, yan jî, li Leyden xwedan nav û deng dibe. Bijîşk û bedenzanên mezin wek Francis Sylvius (1614-1672), Govert Bidloo (1649-1713), Peter Paaw (1514-1617)... û hwd. jê derdikevin (1)

Gelê me îro li ser piyan e, bûye rêbwar û rêwiyê serxwebûn û azadiyê. Zanyar û rawêşbîrên me pêwîst e ku şayanî vî gelî û tekoşîna wî bibin. Ger di pêşerojê de em ji çiyayên Agirî, Sîpan û Cûdî, ji Garê û Metîna mûşegan neşînin ezmana; welatê xwe nekin navenda zanyarî, çand û hunerê, navenda fen û fênkariyê em nikarin şayanî vî gelî û pakrewanên wî bibin. Riya pêşerojêke wisa di van rojan û van salan re dersbas dibe. A niha em bizivirin ser mijarê, ser serpêhatiya laşê mirov.

Li ser rîyê zemîn dîroka mirovahiyê digihêje sê milyon û nîv – çar milyon salan. Di nav van milyon salan de mêjî û hestiyên me, dest û piyên me, tenê me, azayên me yên hinavî hatine guhertin. Mîrov ji gagolekî rabû ser piyan, piyên pêşîn bûn dest, ji stûxwarî derket bû serbilind. Bi ked û serbilindiya xwe bû insan.

Gelo em ewan ji ku û çawa dizanin? Bê guman ji vî alî ve jî dîroka mirovahiyê, ked û xwedana wê, berhem û mayiyên mirovên kevnedem ji me re alifkar in. Zanistên nûdem wek mirovzanî (antropoloji), bedenzanî (anatomî yan morfoloji), arkeoloji rê vedikin.

Bijîşkî û bedenzanî ya kevin li Mezra-



botan û li Misirê dest pê dike. Bijîşkiya Mezrobotan digihîje salên 3000-2000 ên BZ. Di zagonên Hamurabî de xalên bijîşki henin. Lê belê, di wê demê de bijîşki yan jî tenduristî bi sihîrbaziyê re tevlihev e. Belam, dîsa rehên bijîşkiya bi zanîst digihîjin wir. Bijîşk û mamosteyên bijîşki yên Mezrobotan 2000 sal BZ. li ser tabletan kezeba mîhan çekirye. Bi rastî em hunermendiya wan diecibînin. Wêneyên wisa kevn nêzikî rasteqînê ne. Di Dema Mefreqê (Bronzê) de dîsa li Mezrobotan kezebek mefreqî ku ji mefreqê hatiye sazîkirin gihîştîya heta wê demê.

Em ji papîrûsên Misir û wêneyên şikeftan yên mirovên kevnedem li ser bijîşki û bedena mirov hînî gelek tiştan dibin.

Berbanga bijîşki û bedenzanî ya bi zanîst şarezayîya Grêka kevn e. Li gor Arîsto azayê ponijîn yê bedena mirov dil e. Lê mamosteyê wî Platon bi ramanêke rast endamê ponijînê mêjî pejirandiye. Dîsa Arîsto ji tiştên bê can heta mirovan li ser têkusbûnê (evolution) sekinîye.

Galenê Bergamî (129-199 PZ) pêşewê hemû bedenzanan e. Peyrewên wî, zanyarên bisilman, di şopa wî de çûne (2). Galen li Îskenderiyê li ser hestî û qerqot (îskelet) ên mirovan xebateke zanyarî pêk aniye. Li ser parxan û lem-lateyan (adaleyan) jî gelek rawestiye. Berhevdana lem-lateyan destên mirov û piyên meymûn yên pêşîn di xebata Galen de tê dîtin. Wî nêzikî û cûdatiya destên mirov û piyên Rhesus (celebek meymûn e) aniye zimên.

Di serdema Mesîhî de zanyarî dikeve xewneke giran! Pir mixabin piştî Galen nêzikî hezar û sêsed sal ji derî hinek xebatên zanyarên bisilman li ser bijîşki û bedenzanî xebateke yan jî lêkolîneke berbiçav tune. Ronesans yan jî bi peyveke Kurdî, Nûvesayîn, ji nû ve destpêka

bijîşki û bedenzaniyê ye. Zanyarên vê serdemê zanyarên pircîhetî bûn. Leonardo da Vinci bi wênasaziya xwe te naskirin. Lê bi rastî Vincî û hemkarên wî yên hemdem hem hunermendin hem jî zanyar in.

Gelo di dîroka mirovahiyê de laş û bedena mirov û azayên wê/wî çîqas û çawa hatine guhertin? Dest çawa bûye dest, mêjî çawa bûye mêjî? Guherandina zimên çawa ye, guhertin û têkûsbûna bingehîn kîjan e. Di vê gotarê de bi kurtasî em li ser wan bisekinin. Li gor zanîna têkusbûnê mirov ji nîfşa prîmatan tê. Di nav vê malbatê de ji mirov re meymûn nêz e. Bi gen yan jî kromozomên xwe, bi hestî û lem-lateyên xwe, heta bi guruba xwînê (Rh) ve meymûn nêzikî mirov e. Lê belê, berevajiyê wê nêzikî-hiyê gelek cûdatî jî henin. Di navbeyna bedena mirov û ya meymûn de sê cûdatiyên girîng û bingehîn henin.

1- Têkûsbûn û guhertina serê mirov: Mîrov bûye xwediyê çeneke piçûk, enî paşve kişiyaye û rû piçûktir bûye. Berevajiyê wê piçûkbûnê

2- Guhertina dev û zimanê mirov: Endamên axaftinê yên gewrî û yên nav devê li gor hewcedariyên peyvandin hatine guhertin. Diranên qil û kursî piçûtir bûne. Ziman bi hêsanî dikare nava devê de bilive.

3- Li ser du piyan sekinîn û xebitandina destanî Serbilindî û bikaranîna destan taybetiyên mirov yên herî girîng in. Di mêjiyê hemû mirovan de cihên hemû endamên bedenê henin. Herkes dizane ku dest çîqas û jî gewde piçûktir e. Lê di mêjiyê me de cihê zimanê jî wisa ye.

Goştpereyên (embrîyonên) mirovan gelek nêzikî cihê herî mezin yê wî ye, goştpereyên jîndar yên din in. Em nika-

1- Guthrie Douglas; A History of Medicine, Thomas Nelson and Sons Ltd. Çapa 1945

2- Singer Charles and Underwood E. Ashworth; A Short History of Medicine, At the Clarendon press, Oxford 1962

rin embrîyonên teze ji hev cûda bikin. Charles Darwîn di navbeyna bedena mirov û prîmatan, heta heywanên din de gelek nêzikahiyan dibîne. Belam, ew jî dibêje em nikarin goştpereyan ji hev cûda kin. Darwîn pêşengê zanîna têkûsbûnê ye. Ramana wî bi fen û zanîna îro jî, hatiye selmandin (îspatkirin). Li ser vê babetê em dikarin bibêjin ku nêzikahiya goştpereyan, nêzikahiya resen û nijada jindaran xwiya-dike (3).

Ne hewceyî gotinê ye ku em bibêjin guhertinên wilo di nava çend salan yan jî nava çend hezar salan de çê nebûne. Guhertinên xwezayî û yên civakî (kedî) di milyonan salan de mirov kirine mirov. Hinek zanyar dibêjin; dibe ku bi guherandina genan (bi mutasyonê) mirov rabûye ser piyan, serê xwe bilind kiriye û diaxive. Lêbelê ev raman cihê xwe nagire û ramanêke pûç e. Ger em bi xweşbîniyê vê ramanê binirxînin em dikarin bibêjin rastî tê de hebe jî, ramanêke qels û kêmtir e. Rastî ew e ku, bedena mirov jî deyndarê keda wî ye. Dik û mirîşk jî li ser du piyan digerin. Tûtî carna dipeyîve. Belam, beden û mêjiyên wan bi awayekî bingehîn nayên guherandin. Çima bedena me deyndarê keda me ye? Hemû kes dizane ku ger mehek yan jî du meh mirov destê xwe neşuxilîne yan jî nemeşe, dest û piyên wî jar û qels dibin. Ger em li ser karekî nexebitin em jî tiştek fam nakin û mêjiyê me wî nagre... hwd.

Li gor nîş û nijadan di navbera bedenên mirovan de cûdatî henin. Ango beden û hinavên mirovan hemû wekhev nîn in. Qerqot û mayiyên mirovên kevn çend celeb in. Qerqot û mayiyên herî kevn yê mirovên Pîtekanthropus in. Li girava Cawayê, li Afrika û Çînê qerqotên wî hatine dîtin. Pîtekanthropus nîş û malbata mirov ya herî kevn e. Serîpîçûk e. Ew ê ku cara yekem rabûye ser piyan Prîmatek e. Ji bo ku cara yekemîn serî hildaye dibe ku şoreşgerekî herî kevn be jî. Bêjn û qamên Pîtekanthropusan li gor piçûkahiya ser û mêjiyên wan ne ewqas kin e. Ev malbat pêncsed hezar sal berê jiyaye. Ji bo ku mirovekî têkus nîn e, jê re mirovwar (antropoîd, bi Tirkî însanimî) tê gotin. Yanî prîmatek bi şiklê xwe ve nêzikî mirovan e.

Pîtekanthropusên mirovwar bapir û dapîrên me nîn, yan ne? Li ser vê dabeşê gengeşî û guftûgo henin. Lê ramana gelemperî ew e ku Pîtekanthropus jiyaye, şopa xwe hiştiye û jî dinê çûye. Ji nîşê wê/wî kes nemaye. Bê guman Pîtekanthropus kordunda nebûye, lê netevaniye ji hemberê tundî û dijwariya xwezayê li ber xwe bide û xwe biparêze. Tenê maye û qerqotên wê/wî ji me re mane.

Di dîroka mirovatiyê ya têkûsbûnê de

helqeya duyem, yan jî malbata duwemîn mirovê Neandertal e. Neandertal li ser rûyê zemîn gelek geriyaye û belav bûye. Ji bilî parzemîna Amerîkayê, li herderê maye û qerqotên Neandertalan tîn dîtin. Komek Neandertal demeke dirêj li başûrê Kurdistanê li şikefta Şênîdar jiya-ne. Dîroka mirovên şênîdariyan li vir çandek a-firandiye bi zimanê zanistî jê re çanda Bradostî tê gotin. Li şikefta Karain ya ku li bakurê Antalyayê li quntara çiyakî ye, 50 000 sal berê Neandertalî tê de dijîyan.

Taybetiyên laşên Neandertaliyan ev in: Mirovên kin û xurt in. Sermezî in. Serê wan pehn e. Kemberê brûyên wan weka sengerê çawan e. Tûrikê mêjiyên wan qoq û qoq e. Bêvilmezî û bêvilpehn in. Çeneyên wan mezin, diranên wan girs û tûj in. Neandertalî di navbeyna xwe de dibin çend şax û her şax xwe-dan taybetiyên cûda ne, lê taybetiyên wan yê bingehîn wekhev in (4,5)

Mirovên Neandertalî jî şopa xwe hiştine û ev dinya terk kirine. Hinek zanyar ewan bapir û dapîrên me dihesibînin û dibêjin bi têkûsbûna wan em peyda bûn. Zanyar û mirovzanên din dibêjin dîroka nîş û nijada Homo Sapiens yanî însanê hemdem ne ewqas kin e. Li gor vê ramanê dîroka Homo Sapiens wek Pîtekanthropus û Neandertalî ji prîmatan dest pê dike. Hilbijartina xwezayî û kedê Homo Sapiens aniyê heta îro. Ra-


mana sêyemîn di navbeyna her du ramanên jorîn de cih digre. Li gor xwe-diyên vê ramanê, dibe ku di navbeyna bapir û dapîrên Homo Sapiensan û Neandertaliyan de têkiliyên zayendî çêbûne û em jê peyda bûne.

Zanyar L.S.B. Leakey di pirtûka xwe ya Kalikên Mirovan de dibêje; tu têkiliya Homo Sapiens ango mirovê hemdem û mirovwaran bi hev tune. Li gor wî zanyarî mayiyên Homo Sapiens digehîjin heta serdama pîtekanthropus (5).

Bê guman di navbeyna laş û bedenên Homo Sapiensan de cûdatiyên anatomîk henin. Tenên me, rengên porên me jî hev cûda ne. Hestiyên me ne wekhev in. Komek zanyar Homo Sapiensan dikin sê bir û ji wan her siyan re Cro-magnon, Grimaldî û şaşûlat dibêjin. Ew wan her sê celebên jî bi spî, zengî û zerikan ve girê didin. Lêbelê ji ramanêke wisa bîna nijadperestiyê tê.

Rengên tenan û cûdatiyên bedenî ji bo mirovatiyê ne girîng in. Di nav civakê yan jî neteweyekê de jî tenên cihereng tîn dîtin. Hinek însan bejnabala ne, hinek kin; hinek çavreş in, hinek çavşin. Çi ferq dike? Em mirov in. Pîvanên mirovahî yê hemdem ne ten û beden in. Pîvanên bingehîn çand û huner, zanyarî, şarezayî, taybetiyên çînî û netewî ne. Weka hozanê mezin Cegerxwîn dibêje:

Zencî û Hindî em hemû însanî (6)



3- Darwin Charles; Derketina însên, çapa Tirkî, Weşanên Onur, 1978
4- Kansu Aziz şevket; Çawkanîyên Mirovahî û şarîstaniyên Berê, bi Tirkî Weşanê Sazgeha Dîroka Tirk, 1991

5- Leakey L.S.B.; Bapîrên Mirovan, Çapa Tirkî, Weşanê Sazgeha Dîroka Tirk, 1988

6- Cigerxwîn; Sewra Azadî, Weşanên Deng, r. 345 Stanbul, 1992

T E N D U R U S T Î

Dema ku welatek tê dagirkirin; dagirker wî welatî ji her alî ve dimije. Ango, welatê dagirker, mêtîngeha xwe di her warî de bêkeye dike, dirûxîne. Xwîna gelê mêtîngehê dimije, keda wî dixwe, mêtîjyê wî gelî dagir dike. Hilberîn û dahatîna wî welatî ya sererd û bînerd bi lez û bez talan dike. Bi hêviyeke erzan, ango bi hestiyekî rût, ji wî gelî hevkarîna temîna dîke û wan li hemberî gelê wan, bi xîni-zî û cahşî bikar tîne. Hejarî, dijberî û nakokî di nava wî gelê bîndest û sîtembar de bi her awayî pêk tê. Heta dawiyê berde-wam dike. Mêtîngeh lawaz û gelê wê hejar û bêhêz dibe. Encama vê rewşa hanê, bêtenduristî ye. Bêtenduristî jî bandûreke gewre û berbiçav li ser geşbûna laş û mêtîjyê gel dike. Di warê zamyarî (siyasî) û aborî de li paş dimîne. Nexweşiyên cûr bi cûr, yên mîkrobîk bi xweş re tîne.

Xwendevanên hêja û birêz; Îroj mijara me nexweşiya tîfo ye. Ji ber grîngiya wê û nexweşiyên nola wê, mîna dizanterî, virîka havînê, ta, êşa zirav, kolera û zeri-k, li Kurdistanê, li qamê ye. Ev nexweşiyên ku jiyana gel tehdît dikin, ji mal heta salê berde-wam in. Gel bi her awayî teşqe-le û qir dikin.

Tîfo ji layê mîkrobê Salmonella Typhî, di rîviyên mirov yên barik (zirav) de pêk tê. Di dîwarê (çeperê) rîviyê, di sistema lenfê, li hundirê Sêlikên PEYER de bi cî xê dibe. Ji wir derbasî hinavên (organên) cîran û xwînê dibe. Xwînê jehr dike. Roj bi roj, hêdî hêdî rewşa nexweş xirab dike. Bi şanên; dil li hev ketinê, verişandin, ser û zik êş, pişt êş, bêteqetî, agirê bilind, zimanê zengî (zengarî), poz xwînbûn, por weşandin (alopesî), tachrose (kewên mîna gulê) werimandîna fatreşk û cerga reş, damar jendîna dubare (dikrot nebza), kuxik û xeça mirinê xwe nişan dide.

SEDEMKER (Patojenî):

Sedemker, mîkrobê Salmonella ye.

Salmonella, mîkrobek nexweşîçêker (patojen) mezinaya wî 1-3 mîkron, ji layê bikaranîna hewê, bi kêfa xwe ye. Ango, li gora herêmê aerob-anaerob e. (bi hewa -bê hewa dijî). Di her xwarinê de bi hesanî dijî, tê de zaûzê dibe. Salmonella, mîkrobek bê spor bê çeper e. Li hemberî ajanên fizîk û kîmya bê hêz û xwe negirt e. Xwedî antîjenê O-î (somatîk) û antîjenê Hî (Flagella) ye. Antîjenê Oî li ber germê qewî (bihêz) û li ber formol, bêhêz e. Lê antîjenê Hî be-rawajê vê ye. Li ber formol bihêz û li ber

TÎFO**Dr. Î. OMERÎ**

germê bêhêz e, sist e. Şikl û durûvên mîkroba salmonella gelek in. Yên ku li mirovan nexweşiyê çêdikin, sisê ne.

- 1- Salmonella Tiphî
 - 2- Salmonella Cholerasuis
 - 3- Salmonella Enteritis
- Koffman-White, ew kirine du kom:

- 1- Salmonella Tiphî
- 2- Salmonella para tiphî (para tîfo A û B). Ev her du şikl salmonella di êmên jar û hejar de jî dijîn; lê di êm û herêma AGAR de xweş dijîn û gelek zaûzê dibin. Komikên (koloniyên) gir (stûr) û piçûk pêk tînin.

Belavbûn (Epîdemiolojî):

Nexweşiya tîfo li dinê gişî belav bûye; namaze li welatên hejar û paşmayî, rohilata navîn, bakurê Afrîka, Başûrê Amerîka, Meksîka, rohilata başûr û rohilata dûr girseyên gel tehdît dike.

Mîkrobgirtin: Di riya dev re derbasî mirovan dibe. Bi xwarinên ku bi mîkrob gemarî bûne (kontaminasyon) û vexwarinên kontaminê mîkrobên nexweşiyê derbasî laş dibin. Bona ku nexweşî pêk bê; dive mirov 107 - 104 mîkroban bistîne. Pêkhatina nexweşiyê bi du xalan ve girêdayî ye.

1- Dema ku mirov gelek mîkroban bistîne, dibe egera nexweşiyê.

2- Dema benda (bariyera) asik (hûr) ji pêşberî mîkrob rabe. (bi vexwarina ava xilbe)

Piştî girtina mîkrobê 8-23 roj in.

Kurkbûn (Enkubasyon):

Nexweşî: Tîfo ji layê mîkrobê salmonella tîphy ve, di rîviyên mirov yên barik (zirav) de pêk tê. Di sistema damarên xwîna sipî ango di Sêlikên PEYER de bi cî dibe. Di riya vê sistemê re derbasî hinavên cîran û xwînê dibe. Pirzîkên kûr

di çeperê rîviyê de vedike. Gelek caran rîviyê xwîn û qul dike.

Mîkrobên salmonella sê şikl nexweşî çêdike.

a- Gastro-enterîtis: Jehrbûna bi xwarinê ye. (Asik-rîvî kulbûn)

b- Septîsemî (Gemarbûna xwînê bi mîkrob): Mîkrob derbasî xwînê dibin.

c- Enterîk Fewer (Agirê Tîfo) ye. Nexweşiya tîfo ye. Bi rastî ev jî tîfo ya ku em nas dikin. Nexweşî çar hefteya berde-wam dike.

● **Hefteya Yekem:** Agirê hêdî hêdî ku bi pêlikan bilind dibe. Di destpêkê de germa laş bi rêk û pêk bilind dibe. Êvarê bi ricfê, ferma laş hildide, sibehê dadigere. Her roj germaya laş bilindtir dibe. Dawiya hefteya yekem, germa laş hildikeşe 40-41 C (radeyan). Nexweşî, bêhal, qidûm şikestî, zimanê wî/wê mîna goştê li ser tirafê nivbirastî (zengarî), çêja devê nexweş tal dibe, damar jendin dubare (nebza dikrot) dibe, hêdî dibe; dadigere derdora 60/deg. Tansiyon dadigere 9-10 cm. Hg. Kuxik, êşa pişt û wer-selan jî heye.

● **Hefteya duwem:** Di herêma zik û sîngê de bi navê TACHE-ROSE kew ên sor gul, bi firehbûna 2-3 mm. niqteyên sor derdikevin. Dema tu wan bi tilîyê bidewîsîne, wînda dibin û dîsan rengê xwe distînin. Di wê dewrê de mîkrob ji çeperê rîviyê derbasî xwînê dibin; xwînê jehr dikin. Rewşa nexweş giran dibe, serêş, zikêş, verişandin heye. Kezaba reş û fatreşk diwerime. Germa laş gişê rojê bilind û berde-wam e. Nexweş ji xwe di-çe, tewşo mewşo dipeyive. Virîka mîna sorba soqilê derdikeve holê.

● **Hefteya sêyemîn:** Pirzîkên di çeper û dîwarê rîviyê de mezintir û kurtir dibin. Virîka bi xwîn pêk tê. Dawiyê çeperê rîviyê qul dibe; perîtonit çêdibe, nexweş dikeve talûkê. Mirin ji sedî 2-10 e (%2-10). Xaça mirinê (germa laş bilind lê damar jendin hêdî dibe) pêk tê.

● **Hefteya çaremîn:** Nexweşî, di vê hefteyê de jî berde-wam e, lê hêdî hêdî germa laş dadikeve û nexweş hêdî hêdî bi ser xweve tê. Ger nexweşî bi ser mehekê keve û berde-wam be toksemî (xwîn jehr bûn) dertê holê. Dawiya vê rewşê, KOMA (ji xwe çûn) e, mirin e. Ji ber ku di çeperê rîviyê zarokan de sistema lenfê ne sitewiyaye, zarok nexweşiyê sivik derbas dikin.

NASKIRIN:

1- **Miayene:** Bi şanên nexweşî yên fizîkî. Bi miayena bijîşkî

Agirê bilind, zik, ser û pişt û wersel êş, zimanê zengirtî (zengarî), poz xwînûn, por weşandin, tache-rose, werimandina fatreşk û cerga reş, damar jendina dubare (dîkrot puls) û xaça mirinê tê naskirin.

2- Laboratuwar (LÊHÛRBÛN): Verişandina xwîn û xwîavê û çandina (kultura) mîkrob e. Awayên lêhûrbûnê:

A- Çandini:

a- xwîn.

b- pîsî (gû)

c- Mîz

B- Aglutinasyon.

A- a. Di deh rojên pêşî de bi çandina xwînê, encameke erênî jî %90 tê sitandin. Piştî hefteya sêwemîn çandina xwînê nade.

b- Di deh rojên pêşî de çandina pîsî (gû) encameke erênî dide.

c- Hefteya duwem û sêyemîn encama çandina mîzê jî erênî ye.

B- Ji destpêka nexweşiyê, 7-10 rojên ewilî, di xwînavê de, li hemberî antîjenên Oî û Hî antîkor bilind dibin. Em ji verisandinê re dibêjin Aglutinasyon testî. Bi navê du mirovên zanyar hatiye bi nav kirinê.

GRUBEL-WIDAL Ev test di naskirinê de pirr bi nirx e. Dema nexweşî di-xuxule, antîkorên Oî û di vexweşiyê de, antîkorên Hî bilind derdikevin. Ji bona ku bi erênî bêne pejirandin, di ve anca-ma wan jî 1/60 piçûktir bin Ger vana encameke ber biçav nedin; ya berî rind û saxlem, çandina mêjiyê hestî ye. Enca-

ma wê her demê erênî ye. Ji bilî kêr dibe. Ji bilî zarokan, dema hejmara xwîna sipî pirr dibe, naxwe tîkêlî pêk hatiye. (nexweşiyek din bi ser de hatiye) Biopsiya cerga reş jî testeke giranbuha ye. Bi fonksiyona (jê kişandin) cerga reş (bi derziyek sitûr û qul fire) gelek mîkrob bi dest dikevin.

Naskirina Veqetandî: Divê ji para tîfo, leptospîrozîs, dîzanterî, kolera, Wermalîbî (miliyer tuberkuloz), ta, teya Malta û nexweşiya HODGKIN ya hundirîn (hinayê) bête veqetandin.

Tîkêlî (Komplikasyon): Menenjît, dîn bûn, kerr û lal bûn, zatûrye, kulbûna kîsikê zirêv, piyelonefrit (kulbûna gurçîkê), endokardît, kulbûna hestiyar, avêtina xwînê û kulbûna dîwarê rîviyê ye. Dema rîvî qul bibe û zû ameliyat nebe, nexweş jî dest diçe, dimire.

Riyên jê vegirtinê: Bi riya gû û mîzê ye. Dema ava selepê (kanalizasyonê) tevî ava vexwarinê dibe, xwarin û vexwarina ku ji ber nexweş dimîne û tê xwarin û vexwarinê yê ku nexweş hiltîne û datîne xwe baş naporêze, nexweşiyê zû distîne. Asîta asîk (hûr) zehf dijwar e, tûj e. Ji mikroban re bende, bariyer e. Nahêle mîkrob jî asîk derbasî rîviyan bibe. Germa havînê bi vexwarina ava pirr, asît bi av dibe. Bandûra xwe wînda dike, mîkroban nakuje. Mîkrob bi hêsanî derbasî rîviyên zirav dibin. Rîviyên zirav ji wan

re cihêkî berbihev e (musaît e) Li wir xweş dijin û zû zaûzê dibin. Zivistanan jî, ji serma mirov li odeyek malê dicivin, hevnezişk dibin. Bi riya xwarin, vexwarin û tîkiliyê, zêde mîkrob distînin. Bariyera asîk derbas dîkin. Bi vî awayî nexweşî li derdorê û li herêmê belav dibe. Tîfo, nexweşiyek bi jê vegirtin e.


Xweşkirin (Tedavî):

A- Tedawiya taybet,

B- Tedbîrên gelemperî.

A- Dewa (DERMAN): Îroj di destê me de gelek dewa (derman) hene. Dermanê herî baş û rind dîsan dermanê kevneşop Cloranfenicol e. Ev derman hem bi derzî û hem jî di dev re tê bikaranîn. Rojê 2 gr. Cloranfenicol, hefteyek berdewam dibe. Çar roj bêhnvedan, çar roj din, rojê 1,5 gr. tete dayîn. dema nexweş rind tedawî nebe lîvagerandin %8-15 ye. Dema rîvî qul dibe pîvana (doza) derman du qat pêwîst e. Ji bilî cloranfenicol, tamfenicol, Ampicillin, Ofloksasin û trimetoprîmz sulfonamid tînan bikaranîn.

B- Tedbîrên gelemperî: Bêhnvedana nexweş li nivînê, xwarinên kalorî bilind vîtamîn lîvînerîneke rind, paqiji û ava vexwarinê, ya rojane. Ango divê nexweş bê av nemîne. Ji ber serxwe çûn û verişandinê, derfetên av vexwarinê kurt bin di riya damarê re dana serûmê pêwîst e.



Bazirganiya Çekan va Navnetewî û li ser Tenduristî Keliya wê



Victor W. Sidel
Ji Ingilîsî Şereza Awer

Şerê Cîhanê yê Duwemîn di dinyê de bû bihara tevkujiya girseyî. Tevî leşkeran gelek mirovên neferma (sivil) di vî şerî de hatin kuştin. London, Dresden û Tokyo jî tê de digel girseyên neferma gelek bajar bi hêzên hewayî hatin bombekirin. Hiroşîma û Nagazakî dû çarê bombeyên dendikî bûn. Bi avêtina van bombeyan di cîh de bû sedema kuştina dused mirovan, qasî sed hezaran mirov jî birîndar bûn. Ji van birîndaran gelek kes di nava çend mehan de çûn li ser dilovaniya xwe. Beşek ji wan bûn dîn û dîvane yan jî saw li ser ketin. Li ser vî şerî re pêncî sal derbaz bûn. Lê dû şerê cîhanê bi taybetî ji sala 1950 î ve heta niha jî yê berê xurtir çekên dendikgermayî (termonükleer) derketin holê. Ev çek hêj nehatina bikaranîn. Lê neteweyên ku xwedî van çekan in, bi wan yê din ditirsin. Di nav çekên qirkirinê de yê kîmyewî û biyolojîk jî henin û carna hatine xebitandin. Cebilxane û embarê wan hene, lê gûya dê nehatibin bikaranîn.

Ji aliye din ve çekên ku bi navê çekên veturî=çekên klasîkî tînasandin, ji sala 1945 re heta niha bûne sedemê mirina 30 mîlyon mirovan. Mirina mirovên neferma di şerên ve demê de zêde bûye. Di van salên dawî de kuştina gelê neferma li şer, neh qatê leşkeran e. Ji bilî yê ku tînasandin, bi mîlyonan mirov jî encamên şer yê din, weka nexweşiyên têper û birçî-

bûnê dimirin. Yê ku çandîni û rezên wan, bax û baxçeyên wan hildiweşin yan jî bi dara zorê xaniyên xwe berdidin û koçber dibin, hejmara wan roj bi roj zêde dibe.

Bi rastî ji sala 1945 heta niha tevî şeran di welatên dinyê yê sêyem de derketine, piştgirên wan şeran gelek caran Dewletên Amerîka yê Yekbûyî û Şoreviya kevn bûn. Di van salên dawî de mirovên ku di şerên navxweyî de tînasandin hejmara wan roj bi roj zêde dibe. Sedemên wan şeran dijberî û nakokiyên dirokî yê netewî û nijadî, pest û pêkutina fermanrewanan (hukumetan) li ser dijberî yan jî pirsgirêkên erdnîgarî (coxrafi) ne. Aferînerên wan pirsgirêkan hêzên mêtinkar in.

Li ser tenduristî encamên şer, yê ku rasterast girêdayî bikaranîna çekan in.

Leşkerî û çekdarî û bikaranîna çekan, ji bo kuştin û seqetkirina mirovan e. Têkiliya tenduristî û çekan bi vî teşeyê li ber çavan e. Hinek serleşker ji dewsa kuştina dijminên xwe û mirovên neferma, seqetkirina wan çêtir dibînin. Li gor vî ramanê, bi vî şiklî dijminên wan naçar dimînin ku çavkanî û hebûnên xwe ji bo birîndaran xerab bikin. Çekên ku îro tînasandin di nav de mayinên mirovkuj (dijmirov) cihekîgirandin digrin.

Mayinên zemînî di nav wan de yê he-

rî xeternak in. Brînen ku bi vî mayinê dibin sedem dermankirina wan zehmet e. Gelemperî birîn ji yek zêdetir in û gend û gemar diçe û dest yan jî lingên wan tînasandin. Di sala 1980 de li ser çekên veturî bi navê Peymana Çekên Nemirovî peymanek çêbû. Li gor vî peymanê gerek mayin bi nîşan bin û dû şerê ji erdê bînasandin paqij kirin. Mercên vî peymanê zêde nayên cîh û goriyên (qurbanên) mayinan pîranî mirovên neferma ne.

Di nav deh salên dawî de hilberîn û çêkirina mayinan tev guheriye. Qalîk û teqemeniyên wan ji plastîkê çê dibin û bi kifşkarên (detektorên) lajwerd (metal) nayên kifşkirin. Têpinkên (mayin) piçûk û sivik in. Bi hêsanî tînasandin û gelek erzan in. Ji lew re ev çek delaliyên welatên ber bi pêşketinê ve ne. Ji aliye din ve jêkirina mayinan pir xeternak, zehmet û buha ye; hêdî dimeşe. Li bazarên Kamboçya tînasandin qasî 10 dolar erzan tê firotin. Lêbelê kifşkirina cîhê wê û deranîna wê sî qat ji buhayê wê zêdetir e.

Bi texmînî 100 mîlyon zêdetir mayin li bin axa dinyê cîh bûne. Qasî 100-150 mîlyon mayin jî, li cibilxaneyan li hêviya bikaranînê ne. Welatên dinyê yê ku li bin axên wan mayin henin şest zêdetir in. Welatên weka Efxanîstan, Kamboçya, Angola, Mozambîk, Iraq û Somalî bi gelek deverên xwe tînasandin. Tê guman kirin ku tenê di bin erdên Kamboçya yê de 9 mîlyon mayin hene.

Li der dorê dinyê celebek çekên din tèn pêşvebirin. Her çiqas ew gelek hatin tawandin jî hêj hilberîna wan didome. Bi fênên lazer tèn çêkirin û gavek tèn xebitandin dibin sedema korbûna mirovan. Çin di bihara 1995 an de çekên ku lazer lê perçîne li fuaran pêşkêş kir. Di gelawêja vê salê de Dewletên Yekbûyî yê Amerîka biryara hilberîna tîfingên lazerî da. Navê vê pêşnumayê (proje) Sazûmana Hembertevdîra Lazer bû. Artêşa DYA xuya kir ku bi van çekan bir 3000 feet (305 mêtro) dûr ve dikarin retîna çavên mirov bişewitînin û wan kor bikin. DYA di Cotmeha (Mijdar) vê salê de kurtayî li vî bernameyê anî. Lêbelê tê zanin ku ew xudan çekên din yê ku dijî dîtî in. Em jê bawer in ku hinek welatên din jî yan dest bi lêkolîn û pêşvebirina çekên lazerî kirine yan jî ew dê dest pê bikin. Fransa, Elmanya, Îsrail, Rûsya, Ûkrayna û Îngilîstan di nav van welatan de cih digirin.

Bê bikaranîna çekan li ser tenduristî kelîja wan

- Encamên hilberîn, azmûn û parastina çekan, heta avêtin yan jî xirabkirina wan li ser hawirdorê.

- Gefên ku jî bikaranîna çekan derdikevin dibin sedemên nexweşiyên giyanî, bedenî û civakî.

- Malbûna Çekan: Neteweyên ku çekan saz dikin yan jî yê ku wan distînin çavkaniyên xwe yê aborî û hewcedariyên din, yan jî pêşvebirina aborî arasteyî çekdariyê dikin.

Encamên çekdarî û leşkerî yê ne rasterast li ser tenduristî.

Eger çek qet nayên bikaranîn dîsa kelîja wan ya ne rasterast li ser tenduristî hene.

Pirsgirêkên hawirdor û xwezayê yê ku jî bilî ser çek dibin sedem, li ser wan em bi firehî agahdar in. Komeleya Bişîkên Navnetewî ya ji bo pêşgirtina şerê dendikî li ser vê pirsgirêkê disekine. Ev komel li ser hemû cihên dinyayê yê ku dûçarê gemariya çekên dendikî dibin bi kûr û fireh agahdarî dide. Pirsgirêkên hawirdorî yê ku çekên vetûrî dibin sedem gelek û girîng in. Di nav van gelemşeyan de bombekirin, napalm, pelweşîna dar û rêlê, xerabkirina çandin û zevîyan jî hene. Di serdema şerê Hindê-Çînî û Şerê Kendavê de pirsgirêkên wilo derketin.

Ger çek qet neyên teqandin jî, bi wan gef û gur dîsa tevane (dikare) êş û derd derdixe. Mînakên Gef yê bi çekên dendikî baş tê zanin. Encamên wan pirsgirêkên civakî û giyanî ne. Lêbelê gereke bê zanîn ku bi çekên vetûrî gef û hereş jî, gelemşeyên mezin dibin û kelîja wan demêke dirêj didome. Mînakê jî wan şerê kendavê ye. Di sala 1991 ango di serdema vî şerî de hereşeyên Iraqê bûn sedemên gelek pirsgirêkên jiyânî. Di wê hengemê de Iraqê got ku ew bi Mûşegên



Scud li hember Îsrail dij-kolinesteraz bi kar bîne. Ji tîrsa misogerbûna wê gefê gelek mirovan atîropîn li xwe dan û bi wê nexweş ketin.

Ji hêla pêşvebirina aborî ve ziyane çekan yê li ser tenduristî di belgeyan de kifş e. Dîsa barê wan li ser civakê bi şeweyeke ronî diyar e. Welatên dewlemend weka DYA jî, ji hêla xerc û mesrefên çekdarî xesarên aborî dibînin. Lê Welatên Dinyê yê Sêyem pirtir ziyankarên çekdarî û leşkerî ne, zêdetir dûçarî ziyane ne. Ji van sedeman pêşveçûna rewşa wan ya aborî radiweste yan jî paşve diçe. Xizmetên wan yê li ser xwarin

û vexwarin, avahî, perwerdeyî û tenduristî paş de dimînin.

Bazirganiya çekan ya navnetewî

Çekên ku li şer tèn xebitandin piraniya wan li welatên pişesaz (bi endustrî) saz dibin. Welatên Dinyê yê Sêyem ji wana gelek distînin. Li gor ramana welatên ku çek distînin li xwedîbûna çekên cewşenî (zirxî) nîşana hêz û qewetê ango pêşveçûnê ye. Ev raman bermayiya mêtinkarî ye ji wan re. Gelemperî bi van çekan zorbe (dîktator) ên ku li ser erkê ne tèn parastin. Carna ew çek dikevin destên hinek kesan û tolhildanên ne rêzanî yan jî karên taybetî de tèn şixulandin. Heta car-




na dikevin destên zarokan, ji bilî van tiştan, beşek welatên pişesaz wek DYA bi navê arîkariya derveyî, van tiştan ango bazirganiya çekan ji bo xurtkirina pişesaziyên xwe yên leşkerî bi kar tînin. Ew ji fermanrewayên (hukumetên) yarmetîgir (deyndar) re dixwazin ku tenxwahên (fonên) xwe ji bo çekgirtinê, bi taybetî ji pişesazên arizî re çekgirtinê de bi kar bînin.


Weka tê zanîn li ser çekan agahiya me girêdayî beyanê ye. Eşkera û vekiriye ku radestkirina çekan ji %90 destê pînc endamên Konseya (şûraya) Yekitiya Netewan ya Ewlekarî de ye. Ev welat DYA, Rûsya, Çîn, Fransa û Brîtanî ne, carna Almanya jî tevî wan dibe û dibin Şeş Welatên Mezîni. Rêxistina Yekitiya Neteweyan di sala 1988 de lêkolînek pêk anî. Li gor vê lêkolînê di sala 1960 de navbeyna welatên cûrbecûr de redestkirina çekan qasî 14 mîlyar dolar (9300 mîlyon pound) bû. Di sala 1994 de ev hejmar bûye 35 mîlyar dolar (23 mîlyar pound) Di salên 1980 an de DYA 134 mîlyar (89 mîlyar pound) çek û amrazên leşkerî frot. Di nav kiryanan de 160 zêdetir welat û tevgerên rêzani hebûn. Salên 1990 ji bo DYA zêdekirina firotina çekan bû. Di sala 1993 de çekên welatên Dinyê yê Sêyem: 73 ji Amerîkayê hatin standin. Piraniya hinartina çekên Amerîkî-gumana %85-diçin welatên ku ji derî demokrasî ne û bi gelemperî dikevin destên rejimên xwînxwar. Li Panama, Iraq û Somali ev çek li hemberî hêzên Amerîkî jî hatin xebitandin. Ji bilî van tiştan çekên DYA dibin sedemê pevçûn û diwarkirina nakokiyên herêmî. Rêvebirîya Clinton ji bo kêmkirina frotina çekan û têkûskirina wan tiştêkî ber bi çav nekiriye. Hinêk endamên Kongreya Amerîka ji bo kêmkirina frotinê li nav xebatek bûn, 1 ê hîlbijartina 1994 bû sedema sistbûna çalakîyên wan.

Hevbeşek mezin yê bazirganiya çekan Keyaniya Yekbûyî ye (Îngilistan e-w). Li gor hinêk gumanan bazirganiya çekan ya navnetewî de Îngilistan li dû Rusya cih digre. Di sala 1993 de qasî 2000 mîlyon pound (3 mîlyar dolar) çek hinartîye li welatên dûr. Dîsa di vê salê de biryara frotina 6000 mîlyon pound (9 mîlyar dolar) çek hat girtin. Welatên mêtîngêh yê berê weka Hindistan xwediyê pîrsgirêka pêsveçûnê ne, lê kiriyarên çekên Brîtanî jî ew in. Nola welatên ku ji Amêka çek digrin yê ku ji Brîtanîya jî distînin, ev çekan li dijî mirovatî û hemwelatîyên xwe dixebitînin. Endonezya, Afrîkaya Başûr ya berê û Nijadperest, Uganda ku demek binê serokatîya îdî Amîn de bû û Nijeryaya ku erkê wê destê leşkeran de ye ji van welatan çend mînak in.


Xuya ye ku Fransa jî, di bazirganiya çekan ya navnetewî de para xwe zêde dike. Di sala 1994 de Fransa bi welatên Dinya yê Seyem re qewlê frotina 11,4



Hawirde




Hinarde



Wêne 2- Guncayîştê bazirganiya çekên vetûrî, 1994. (Li gor buhayên 1990) yê hemû dinyê: 21 725 mîlyar dolar. Ev hejmar û reje ji Salnameya SîDRÎ tabloya 14 ya 1995 re hatin girtin.

Wêne 3- Di nav rêjeya giştî de, li ser mirina mirovên neferma.

(Çavkanî: UNICEF)



milyar dolar (7,6 milyar pound) birî. Di vê salê de Amerîka bazarê frotina 6,1 milyar dolar (4,07 milyar pound) birîbû. Berhevdayîneke wisa şaşîti jî derdixeholê. Lê gereke bê zanîn ku Fransa bi frotina sê komên çekan yê nê salê de xwedî milyaran bû û ew hercar dubare nabin. Şaşxuyatiya din ew e ku hejmarahinartina Amerîkî de Frotina pişesazên arîzî nîn e.

Li ser kutakirina bazirganiya çekan çalakîyên navneteweyî

Di sala 1991 de Encûmena Giştî ya Neteweyên Yekbûyî biryarek girt. Biryar li ser zelalkirina rewşa çekdarî bû. Li ser radestkirina çekên vetûrî bi vî biryarê riya qeydkirinê vebû. Lê bicihanîna biryarê ji xwastina çekfiroşan yan jî yê nê kiriyaran ve girêdayî ma. Ji aliyek ve armanc zelalkirina çekdarî, rastkirina çewtêgihiştinê û pêkanîna ji hev bawerî bû. Derheqê hilberîna çekan de pêwistiya damezrandina sazgehê hat dîtîn. Bi vî sazgehê Neteweyên Yekbûyî dê bikaribin bi lezgîni li ser hilberîna çekan xwedî agahdarî bin. Di sala 1993 de tenî çil endamên NY li ser çekan agahdarî dan. Hinardekarên navdar jî tê de, di van salên dawî de welatên ku derheqê mijarê de hevkarî dikin şeş dewletên mezin in. Lewre li ser çekfrotina van salan gelek agahdarî heye. Beşek dewlek, weka Koreya Bakur û Afrîkaya Başûr hêj jî hevkarî nakin.

Kongreya DYA di sala 1994 de li ser firotina çekan pêşnûmaya zagonek amade kir. Li gor vî pêşnûmayê, neteweyên ku mafên gelên xwe yê mirovahî berpa dikin gerek DYA çek nede wan. Di nav qedexeyên pêşnûmayê de mercên din jî ev bûn: yê nê ku mafên demokratîk red dikin, êrîş birin li ser cîranan yan jî gelên xwe dipercîqîn ango dermafê çekên xwe de agahdarî nadin Neteweyên Yekbûyî, pêwîst e dûçarî ve gemariyê bibin. Komela Bijîşkên ya ji bo Berpirsiyariya Civakî, bijîşkên Amerîkî yê nê ku girêdayî rêxistina ji bo Pêşgirtina Şerê Dendîkî Yekitiya Bijîşkên Navnetewî ne gelek çalakîyên baş li dar xistin. Armanca wan, pêşnûmaya ku li jor navê wê derbas dibe wê bidin pejirandin û kêmkirina çekfrotina Amerîka bû.

Di sala 1992 de, bi navê li Ewropaya Hêzên Leşkerî yê nê Vetûrî peymanek merî bû. Bingeh û mebesta vî peymanê li Ewropa taselekirina çekên vetûrî ye. Bi peymanê endamên, NATO û yê nê peymanê Warsawa berê li hev hatin. Qewl û hed dan li ser çekên giran yê nê vetûrî. Biryarê çavdêrî ya li ser çekan hat girtin. Ji bo ku li cîh çek bî taselekirin biryar hat girtin. Riya serperîştîya manewrayan û agahdariya danûstandina çekan vebû. Ji bo jî holê rakirina beş û celebek çekan darfetê çavdêrî derket. Cihanîna van biryaran girêdayî xurtbûn û çavkaniyên Welatên Şorevî yê nê berê ne.


Rêxistina Ewlekarî û Hevkariya Ewropa li ser lihevhatinek nû dixebite. Eger ev lihevhatin pêk bê herêmên ku lê mafên mirovatî tî nê bînpê kirin û gemaroya çekan li ser wan heye, şandina çekan li wan dera dê girêdayî hinek mercan be. Di van salên dawî de çend welatan qewl û hed dan li ser hinartina çekan. Meha Adar ya 1995 da Encûmena Belçîka bi dengê yekgirtî û yeksan biryarek girt. Bi vî biryarê hilberîn, xebitandin û hinartina mayinan hat qedexekirin. Welatêkî bi dîlsozî û biryarê encûmena xwe mayin qedexekiriye tenî Belçîka ye. Encûmena Norwêj jî bi awayek yekdengî li ser mayinan biryarek derxist. Bi vî biryarê ji hukumeta (fermanrewaya) Norwêj xwest ku hilberîn, emberkirin û danûstandina mayinê dijmirov (antîpersonel) bi tevahî bî qedexekirin. DYA, welatên Yekitiya Ewropa jî tê de bîst û şeş welatan qewl û merc xistine pêşiya hinartina mayinan. Li Keyaniya Yekbûyî jî aliyê gurubek li ser bazirganiya çekan çalakî tî nê meşandin. Navê gurubê li ser Mayinê Zemînî Gruba Xebatê ye. Gurub komeke cîhereng e. Di nav de rêxistina ji bo Ewlekarîya Gerdûnî Tevgera Tendurîstî, ji bo Pêşvegirtina Şerê Dendîkî Bijîşkên Navnetewî û hin kesên navdar henin.

Di meha Rezber (îlon) ya 1995 de li Viyana komcivînek pêk hat. Mijara komcivîne çav lê gerandina peymanê 1980 bû. Bi navê Peymana Çekên Vetûrî (Peymana Çekên Nemirovî) bû dabaşa komcivîne. Civin jî çend alî ve bi ser ne ket. Binkeftinek di dermafê jî mayinan parastina mirovên neferma de bû. Li ser parastina wan biryarê tevdîrgirtinê jî derneket. Di encamê de pêşewaziyek (protokolek) nû hat pejiirandin û bi wê xaleke nû tevî yê nê berê bû. Li gor vî xelekê bikaranîn yan jî frotin û danîna çekên lazerî yê nê ku mirovan kor dikin hat qedexekirin. Lê pêşewazî qedexeyek ne anî li ser hilberîna wan û jê dûr ma. Bi vî şeweyê keys dan xebitandina wan çekan.

Li ser lê dawî anîna bazirganiya çekan ya navnetewî pêşniyazek ji Komeleya Parêzerên Navnetewî yê nê Hemberê Çekên Dendîkî ve hat. Pêşniyazek herî xurt ew e. Naveroka wê de li ser çavdêrî, kêmkirin û danûstandina çekan, Cebûrxane û hilberîna wan pêkanîna peymanek heye. Li gor vî komelê hinek tîgîh pêwîst e bî nê zelalkirin û tevî peymanê be. Weka tîgîhê nê Hêzên parastinê yê nê zemînî, fitbûnî û pêkanîna bawerî û tevî wan guhartin û pêşvebirina rewşa aborî; ewlekarî bi şewekî çareyî gereke peymanê de cîh bigrin. Pêşniyazek din li wê pêşnûmayê cîh girtîbû. Ew jî li ser danûstandina çekan bi şewekî naçarî danîna agahdarî ye. Lê agahdarî hêj girêdayî xwestina çekfiroşan e. Xwestina din qedexekirin yan jî, jî holê rakirina guncana hêzên pelemarî (êrîşî) yê nê leşkerî ye. Li dewsa van hêzan de ji bo ewlekarîya ger-

dûnî sazkirina dezgeheke navnetewî tî xwastin. Şalyarê parastinê yê DYA William J. Perry di 1994 de pêşniyarek daxuyand. Bingeha vî pêşniyarê li ser himê zemînparastinê damezrandina sazûmaneke navnetewî ya ewlekarî û hevkarî ye. DYA William J. Perry di 1994 de pêşniyarek daxuyand. Bingeha vî pêşniyarê li ser himê zemînparastinê damezrandina sazûmaneke navnetewî ya ewlekarî û hevkarî ye. DYA jî tê de li hemû der û dorê dinyê kêmkirina hêzên leşkerî tevî pêşniyarê bû.

Bi navê jî bo Pêşveçûna Civakî Kopa (Zîrveya) Dinyayê li Kopenhag civînek pêk hat. Civin di Adara 1915 de bû û jî hemû welatên dinyê nûnerên fermanrewanan tevî vî civînê bûn. Bi navê biryara 9 biryarek hat girtin. Bang û naveroka biryarê ev bû: Kêmkirina sermayedarî ya ji bo hilberîn û pêşvebirina çekan û hin-



dikirina mesrefên leşkerî. Bi vê azîne xurtkirin û pêşvebirina rewşa aborî û civakî, li ser vê bingehe xurtkirin û sazîna ewlekariya netewî. Di civînê de li ser qasî %3 kêmkirina bacên leşkerî pêşniyarek derket. Mebest bi vî diravî pêşvebirina rewşa civakî û aborî bû. Lê bi avayekî yekdem di cîh de ev pêşniyar het paşavêtin.

Gelek netewe naxwazin li ser kêmkirina çekên vetûrî li hev bîn. Sedema wan ya girîng jî betalkirina çekên dendikî de dudîliya zilhezên ku lê xwedî ne. Ji bo hinek neteweyên xizan û belengaz, şûna çekên dendikî yê kîmyewî û dijçandari armanc in. Lê li Hevhatina Çekên Kîmyewî (1993) û Peymana Çekên Biyolojîk (1973) ev çek xistine derê zagonê. Di navbeyna pêşbazîya çekên dendikî û domandîna pêşbazîya çekên vetûrî de têkiliyek heye. Ev têkilî li peymanê pêşvegir-

tina çekên dendikî di xala VI em de hatiye pejirandin. Ev xalek jî bo betalkirina pêşvebirina çekên dendikî bangek e û jî bo bêçekbûna gelemperî û tevayî navbeyna her du celeb çekan de pêwendî dibîne. Komela jî bo Pêşvebirina Şerê Çekên Dendikî Bijîşkên Navnetewî û şaxên wê li ser çekberdanê dixebite. Mebest ev e ku heta sala 2000 Z. bigihêje encamê. Bi vê çalakîyê li ser bawerkirina hemû neteweyan radiweste û dixwaze ev bikevin û guftugoyê. Heta sala 2000 Z. jî bo betalkirineke gelemperî ya li ser çekên dendikî biryarek wê bir bê dayîn û dawî li wan çekan bê.

Heşt neteweyên gerdûnê xwedî li çekên dendikî bûna xwe dipejirîn. Tê zanin ku di destên sê neteweyên din de ev çek henin. Lê ew jî xwe mukir nakin. Di van salên dawî de li ser kêmkirina wan hinek xebat çê bû. Digel vê kêmkirîne hêj qasî 10 milyar ton bi hêza kawilkirina TNT yê cebirxaneyên wan de ev çek henin. Hêza van çekan jî yê ku Hiroşîma û Nagazakî kavi kirin bi milyonan qat zêdetir e. Li gor vê hejmarê para her mirovekî dinyê du ton TNT dikeve. Eger qewlên START I. û START II* bi temamî bîn cih (START II. hêj jî aliyê pîrmendên Amerika ve nehatiya erêkirin), dîsa jî bo her nîstecîhê dinyayê tonek TNT dikeve.

Rêxistina Tenduristî ya dinyê (WHD) û Encûmena giştî ya Neteweyên yekbûyî derheqê çekên dendikî de serî li Dadgeha Dadperweriya Navnetewî (Dadgeha Dinyê) dan. Mebesta serlêdanê pirs-girêka jî destavêtina çekên dendikî zelalbûn e. Her du rêxistin jî dadgehê bersiva vê pirsê niyaz dikin û dibêjin gelo di binê sîwana zagonekî navnetewî de, mebest tenî gef be jî, destavêtina çekên dendikî nêwa ye, yan ne? Ev gelş hêj li ber dadgehê radiweste û bersiva wê ne hatiye danîn. Bersiv û biryareke baş dibe ku li ser dewletên ku xwedî wan çekan in bibe pestekî sincî.

Bijîşk û karmendên tenduristî yê di derbarê vê mijarê de xudan berpirsiyariyek bi taybet in. Ji hemû kesan zêdetir em dizanin encamên çekdarî û leşkerî yê nebaş li ser tenduristî çî ne. Berpirsiyarên pêşvegirtina nûkirinê û xebitandîna van çekan berê hemû kesan em in. Di sala 1981 de bi hejmarên 34 û 38 de biryar li Encûmena Tenduristî ya Dinyê hatin pejirandin. Li gor wan biryaran: Rista bijîşkan û xebatkarên tenduristî yê din jî bo bangeşîya aşitî û tenduristîya hemû mirovan hêmaneke (faktoreke) herî girîng e.

Peymanên kêmkirina çekên artêşkarî angoy stratejîk.

Di ser de pêwîst e bi belgayan cî bidin kelîja bazirganiya çekan ya li ser tenduristî. Ji bilî vana li ser bazirganiya çekan û encamên wê agahdarî û perwerdeyîya karmendên tenduristî, ramiyar û rêzanan

û ya gel vatîniya wan e. Digel van kar û çalakiyan berdevkiya bêçekbûnê ya giştî, jî bo dawî lê anîna bazirganiya çekan tevdir girtin û betalkirina çekên dendikî di nav vê rist û berpirsiyarî de cih digrin. Eger em bibêjin em netevanîn vê berpirsiyarî binin cih, ev pejirandîna faşîlbûna jiyana nexweşên me û civaka nû dibe.

Têkiliya hawirdeya çekan û pêşveçûna mirovatî

Gelek welat hawirdeya çekên bi buha didomînin. Ev domandî digel hewcedariya wan li gelek tiştên bingeîn e. Li gor belgeyên Neteweyên Yekbûyî yê li ser frofîn û qewlbirînen çekan, bi şiklekî vekirî ev rastî xuya ye. Welatên ku hêj di riya pêşveçûnê de ne me ew kirin mînak û jî wan mînakî kirîna çekan girtin. Ev mînakên jêrîn yê li sala 1992 ne.

- Çîn- balafirên şer ji Rusya kirî. Bi diravên van balafirên dikarîbû jî bo 140 mîlyon mirov qasî salek ava zêl û paqij peyda bike, kê 20 mîlyon mirov hêj li vî welatî bê ava paqij û zêl in.

- Hindistan- Qewlê 20 MIG- 29 bi Rusya re hat birîn. Bi pereyên wan dikarîbû jî bo 15 mîlyon keçik yê ku ji perwerdeyîya seretayî bê par in, perwerde bike.

- Îran- ji Rusya du heb noqî (keştîyên binê avê-w) kirî. Dewsa kirîna wan dikarîbû jî bo hemû hemwelatîyên xwe çend car pêwîstiyên tenduristî yê bingeîn bîne cî. Tê zanin ku rêjeya: 13 mirov li Îran derê tenduristîya bingeîn in.

- Komara Kore- Bi DYA re qewlê kirîna 28 mûşegan (fûzeyan) dan. Bi diravên wan mûşegan dikarîbû jî zarokên bêdeq 120.000 an bideqîne û 3,5 mîlyon mirovan re yê ku ji ava xweşik dîr in, ava zêl û ewle peyda bike.

- Malezya- Bi Keyaniya Yekbûyî (Îngilistan) re qewlê standîna du keştîyên şer bir. Di dewsa wan keştîyan dikarîbû qasî bîst û pênc salan pênc mîlyon kesan xwedî ava paqij û zêl bike.

- Nîjerya- Ji Keyaniya Yekbûyî 80 tankên şerê stand. Li vî welatî qasî du mîlyon zarok bêdeq in. Bi perêyên van tankan dikarîbû hemûyan bideqîne, yan jî ji bo 17 mîlyon malê plana malbatî pêk bîne, kê 20 mîlyon zêdetir mal jî vê xizmetê der in.

- Pakîstan- Bi Fransa re qewlê kirîna 40 Mîrage 2000 E û sê Trîpartîte dan, ku her du celeb jî balafirên şerê ne. Bi dravên wan dikarîbû jî bo 55 mîlyon mirov ava paqij peyda ke, tê zanin ku ewqas mirov ava paqij peyda ke, tê zanin ku ewqas mirov jî aveke wilo der in. Yan jî xizmetê plana malbatî bide 20 mîlyon malê, ango 13 mîlyon mirov re xizmetê tenduristî û 12 mîlyon zarok re xizmetê perwerdeyîya seretayî bîne cîh. Ev hemû jî wan xizmetan bêpar in.

* Ev lêkolîn ji *British Medical Journal* hejmar 311 ya 23-30 ê Febrînarê 1995 hatiye wergerandin.



Karnameyî erdeşîrî babekan

EHMED ŞERÎFÎ



Karnameyî Erdeşîrî Babekan namilkeyê 50-60 laperî ye, ke le sedê şesumî zayînî da, le rûy pertûk we kitêbêkî le xoy gewretir be xet we zimanêk nusîrawe, ke lêsta be pehlewî navdar e.

Ew kitêbe giçke be ruwalet, basî çilonyetî pêk hatinî hikumetî sasanîyekan we ceng we neberdekanî Erdeşîrî Babekan, gerek zincîrê şayanî Sasanî dekat.

Belam le rastî da gencîneyekî pir bayexî dîrine, ke le çend cêge da basî Kurd we Kurdan dekat we Kurd we mad be yekdî dezanê.

Her wesan le ruwangeî zimanewanişewe lêcgar erzîşmende we deselmênê ke ew zimanê navdar be pehlewî eger Kurdî niho nebê cîyawazîyekî ew toy degel kurdî niye.

Belam le pêş eweyî da ke serincêkî tuwêyewani we ser karnameî Erdeşîrî Babekan bideyn pê m wa başeke sasanîyekan baştir binasîn. Axir be zor bîr we baweran ewaniş her kone Kurd in we ewe Erdeşîrî Babekan we mubîdî payeberîz kurdêr bûn ke ewe zimaneyan kirdote zimanî nûsîn we derbarî we paş lîslam kutupîr weşê ziman we xetî pehlewîyan be ser da bîrî. Dena le rastî da ew wext we zimane her xet we zimanî madekane ke Avêstai pîroz we espendî pê nusîrawe.

Sasanîyekan be bîr û barekî zorewe Kurd bûn. Le herêm Fars ke mekoy ser heldanî Sasanîyekan buwe her le konewe xêlat we tayefegeli kurdî lê bûwe. Le wanye le ser demî Kuruşî Hexamenîşiyewe Kurd le wê derê cêwar bûbin.

Waş wêdeçê ketenanet le derureî kembucîyeyî hexamenîşî da ke Mandanaî kiçî Astîyagî şahî madî xuwatuwe we bîrdüyete paris hêndê yafeye we xêlatî kurdîş le gel mandanaî şazade xanimî madî çübûne welatî paris. Le tablokanî textî Cemşîd da zor wêneyî madekan we ber çaw dekewin. Lew lewhe we nusîrawane da baskîrawe ke madekan le katî dirust kirdinî textî Cemşîd da le herême erkî suwanî Derwîşî hexamenîşîyan le ser şan bûwe.

Estirabon coxrafyanûsî be naw bangî yunanî baştan le beş sêy kitêbî 15î coxrafyakey da ke bo herêmi parsî terxan kirdûwe denûse: Tayfe we xêlat gelêkî ke de fars da dejîn, patîşxu warekan, hexamenîşyekanê muxekanê mertekan we kurtîyekanin. Beşê le tayefane be rêgirî we çeteyî dejîn we beşêkitîrîyan Merdar we werzêrîn.

Hêrodot mêju nusîtirî Yunan, Muxekan be yekêk le hewît tayefe we hozî Mad le qelem deda w be zor bo çunî dikêş (Mertekan) heman Med an Mad we mediyan kan in. Eger çî le ketîbe we tabilokanî Aşur da basî mertekan nekîrawe, belam yizin Fon be cengaweranî sipaî lêranîyan naw debat.

Estirabon le laperê 162î kitêbekey da Mertekan we kurtîyekan be xêlatî rewendî Atiropotîn naw debat. Bîlîlmus Mertekan

be cîran we hawsay kurtîyekan dadenê.

Estirabon le beş 15î kitêbekey da nawî her dû xêl we hoz le herêmi pars dadenê we nanenet hêndê le mêjûnusan kurdekan be kurî merdekan hisaw deken.

Rojhelat nasî be navdengî elman Marquwart wîşeyî (Mert-d) be şitêkî xirab dezanê we le ser em bawereye ke dejminanî kurtîyekan, bo sukayetî em wîşeyan be serda biriwin.

Bem cure derdekewê ke merdê mert we kurt we kurd her yekin we cîyawazîyan niye.

Be pêy tuwêyewani Reşîdî yasemî go-ran, yekêkitir le xêlatî kurd ke her le konewe le herêm pars da jîyawin, xêlî şuwan kare buwe.

Kurî Belxî (lîbinîbelxî) le kitêbî Farsname da, basî xêlî şuwankare we kurdekanî-tirî fars dekat we delê; Ewan tayefe gelêk bûn ke kar we pişeyan suwanî we merdari we dar şikênî bû... katê Ferzilewyê geri helda, ewaniş hawîyan hate naw nawanewe, we fer we şiko kewtin we jimareyan le ziyad bûnî da we hem kar we barî sipaîy we çekdarî fezilewyeyan kete ser şan we lîsmaicîlîykanîş her el xêlî şuwankare bûn.

Kurî Belxî her wa le laperî 186 da denûsê: Le rozgaranî pêşînda 5 reme we hozî kurd le fars da jîyawin ke her remeyek sed hezar kes bûwe ke bîrtî bûn le:

- 1) Remeî Ciloye:
- 2) Remeî ezywan
- 3) Remeî Ellwancan
- 4) Remeî Elkarîyan
- 5) Remeî Elbazincan

Kurî Belxî le zor cêyaitirî pertûkeke keyda basî meznayetî Kurdanî Fars dekat we be şan we bahoyan, be Fer we şekoyan heldelê.

Elî Kurî Mehemedî şuwankare le kitêbî Mecmeê el Ensabî şuwankare da denûsê: Tayefeyî şuwankare le xizme nizîkekanî Erdeşîr in. Nawî şuwankare katê be ser ew xêla da birake Sasan Hurnaî helgirt we çu-we herêmi Fars we destî be amêdarî kird.

Bem cure rewşin debêtewe ke kurdekan her le çax konekanewe le herêmi pars da jî yawin we şan be şanî hexamenîşiyekan bo ser berzilêranwîçe xebaşîyan kirdûwe we yekêk le xêla kurdaneş şuwankarekan bûn ke Sasan lewan we ser be wan bûwe.

Kurî Belxî le Farsnamekey da debêjê yekêk le lik we tayefekanî şuwankare Remeî Elbazincan yan bazirîngî bûwe.

Ser heldanî Erdeşîrî Papekan an Babekan katê dest pê dekat kê Goçerhî serokî xêlî Barzîngî Kurd le şarî Lîstexir fermanrewayî dekird. Lew kate da Sasan ke zêwanî Perstgeî xatû Anahîta le bazarî Lîstexir debê we le gel kiçêkî xêlî barzîngî be nawî Rambehêşt dezewcê we zemawend dekat we le zewcîne papek bedîdê we katê be herefî gencî dekat derfet le xizmayetî xoy be xêlî barzîngyewe werdegîrê we hêz wtan we sipayek bo xoy çê dekat we Erdeşîrî kurî dekate serokî hezî sipaî Daraw Kurd.

Paşan le salî 212 zaîyn da be ser wirdele şayekanî neçeyî pars da zal debê we qe-



lemrewî Fermanrewayetî xoy pere pe ded we serencam Goçehîrşa ke xizimîşî debê le çelaî sipîda dekujê we de bête Fermanrewaî seranserî welatî Pars.

Erdewanî pêncum şahî eşkanî ke eme dezanê nameyekî pir le cuwên we tewhîn be Erdeşîr we Kurdan bo Erdeşîr deşênê.

Teberî mējūnūsî ereb le kitêbî mējū-î teberîdaw kurî esîrî mējūnūsî kurdî ê ereb nūwîs le kitêbî Elkamil da her du deqî em nameyan bem cure bilaw kirdotewe. Enk qîd êudut Turk we Ectlbit htfk eyu-helkurdî el mirbbî fî xîyam elekirad min ezinlik Fî eltac ellezî libiste.î

Be kurdî yan: Pêt le bereî xot firetir rakêşawe we merg we nemanî le bo xo xuwastuwe, ey Kurd ke de çadir we xêwetî Kurdan da perwerde bûyî, kê lîzinî day ew tace le ser binêî?

Erdewanî eşkanî le seretaî hukumetî sasanîyekan da ew qîsanê be Erdeşîr kutuwe we be sukayetîywe be kurdî danawe, paş nizîkeî (400) sal katê xusîrew perwîz we baramî çubîne nêwanîyan têkdeçê, mējū dîsan dû pat debêtewe we baram be xusîrew Perwîz debêjê : Elmîrebî Fî xeîyam el Ekrad Ey perwerde buî xêwetî Kurdan.

Yaquî hemewî le kitêbî Muecem el Buldanî da celdî 7 lapere 413da denusê : Katê Erdeşîr destî be ser tîsvon da girt, hewil we teçelayekî zorî bo awedanî wênderêda, kirdîye 7 yerek we tax we axirin yerekî nêw na Kurdawa. Bem cûre rûn debêtewe ke bê hiç sik we yumanêk Sasanîyekan Kurd bûn we le Kurdanî herêmî Pars bûn. Muêynedînî Netenzî kitêbêkî gewreî sebareî be mîrayetî we hukumranî Kurde şuwankarekanî welatî fars nusîwe be nawî Milukî şebankare. Cîge leweş listaş kurd

le herêmî fars da her heye. Şar we bajarî Telxabî le nizîk şîraz be tewawî hemûî Kurde. Le naw şarî şîrazîş da du gerekî hewîtenan we çil Tenan zor beyan kurd in.

Em tuwêjewanîye mēj üyeş boye bû he-

ta çêyekî baştir le karnamekî Erdeşîrî Babekan wergrîn. Karnameî Erdeşîrî Babekan hete ew cêgayeî ez bizanim heta Lêsta (6) car le layen Farsekanewe kirawete Farsî we rave Kirawe. Belam, her be bo çunêkî Farsanewe seyîrî kirawe we şerîh dirawe em rave we şerhanêş bir we bawerêkî lêranî nîn we demargiraneî Farsane ye. Farsekan hemû mîraî dirînî Lêran be Samanî xoyan dezanin. Le katêka berdaştêkî wa xizmet be bujanewêî Ferheng we kultûrî Lêran nakat. Lêran her tenê zêd we welatî Farsekan nîye. Belku Lêran we Ferheng we kultûrî Lêranî le pêş da samanî Kurdin we bapîre gewreî Kurdekan wek keyanîyekanî osturefîy we manakan we madekanî mējuyî çend hezar sal ber le Parsekan le Lêranwîçe da hêwirîwin wakencîwin.

Belam be daawe demargîrî şîwonîsmî Fars bar we doxêkî pêk hênawe ke kurdî xawenî serekî welatî Lêranwîçe le hemû samanêkî Ferhengî we Kultûrî bê beş buwe. Em demarjîrîye puçêş le ser demî rezaxan we hemerezaî Kurîdu da goljo bû eyarçî paş ser kewtîni raperîn we çêbûnî Komarî Lîslamî, em demar girîye het ra dewekî zor le bawan kewil, belam sereraî ewêş lêstaş hêndî paşmawêî her le arada-ye.

Be her hal karnameî Erdeşîrî Babekan bo run kirdinewêî mējui Kurd le dewranî sasanîyekan da bayexêkî yekcar zor we mezinî heye, rastew xo basî Kurd dekat, wişêî Kurd dênê, nişanî de-dat ke le ser demî Sasanîyekan we tenanet le deuranî eşkanîyekan da Kurdêkî zor le herêm parse da jîyawin. Be aşkira Kurd we mad be yekdî dezanê we Pêkeweyan delkênê. Çend navdarî kurd ew çaximan pêdenasênê.



Êe kitêbe her wa le ruwange zimane wanîşewe yekcar zor girîng e. Runî deka-tewe ke zimanî Sasanîyekan yan baştir bêjim, şêwe zimanêkî ke ew kat pêvrawe çon buwe. Ew zimaneî ke kitêbî Karnameî Erdeşîrî pê nusirawe zortir le. kurdî deçê we nîzikayetî degel zarawekanî kurdî heye heta Farsî, tenanet detuwanim bêjim ke %50 wişekanî kurdî ye. Wek le nawero-kî karnameke derkewê ew kitêbe le pêş da nusirawêkî zor gewretir buwe. Paşan kurt kirawetewe we em deqeyan le ru nusîwetewe.

Karnameî Erdeşîr Babekan bem cure dest pê dekat : Pe karnamek-î ertexîşîr-î papekan, eîtun nepîştî. Yanî : De karnamek-î Erdeşîrî papekan evcure nusîya bû.

Lem risteye derdekewê ke nuserewe em namîlkeyê le ruî kitêbêkî renga gewretir nusîbêtewe we kurtî kirdotewe ke be daxewe deqe serekîyeye carê de deşt da nîye renga le beyîn çubê an Fewtabê.

Karnameke katê basî çilonayetî jîyan we gewre bûnî Erdeşîr deka denûsê :

... we ender Duş- xutaye-î, Elksender, ew werik we nihan roşnîye eîstat wa pak kurtîyan şepanan revit.î Yanî : we paş pa-dîşayetî, tuşî Eskender bû, ew we rê kewit nihan bû le ber çawan we le ber rewşena-î, maweyek le gel Kurde şuwaneke royî.

Karnameke paş dirêjedan be bar we do-xî jîyanî Erdeşîr we be şayetî geîştinî le herêmi Pars le laperê 29 da basî cengî Erdeşîr we Kurdan dekat we denûsê :

Eper karjar-î ertexîşîr epak kurtan we sitû bewtin-î ewî

1- Pes ez an wes sipah Gund zawil ew hemkirt ew kurtan-şemadîk firû revit. Wes karzar xiwên rîyîşnîye. Bu-wil we sipah ertexîşîr situbîyê. Pilgirîfit.

2- We ertexîşîr ez sipah-î xuiş neyayan ber bût, we ender şep ew we yapanî met, keyeş hîç ap, xorişt nî bût. Xût ez edîbaran we situran kaymen ew gurisnkey we tişnkey met.

3- Eviş ez dûr atexîş-î şepanan dît we ertexîşîr ew anod revit.

4- Mert-î pîr anod dît, epak juspendan, pe deşt kov bût end.

5- Erdexîşîr an sep anod Revit we roj ditger ez ewêşan ras xiwast.

6- Ewêşan Govit ko ez eîtir sê firseng rustak-î est-î, wes apatan we wes mertum, pît-şnîye-î, wesîyar est.

7- Ertexîşîr ew an dêye revit, merit Firistît we adîbaran-î xuiş, hemûyan ew der xiwast.

8- We sipah-î madan pe-eydaşt ku hêm ez ertexîşîr epîbîm, ber buitîn hem, çîye. Peste biye epay ew Pars revit.

Be kurdî yanî:

1- Pes ca ew sipayekî gund (gewre)î ew le zawil hemkirt. Ew bo karzarî Kurdanşaf madîk çû, bes karzarêkî xuwên rîza. Sipaf Erdeşîr we sitû hat petî esipî girt we revî.

2- We Erdeşîr ji sipah-î xoy tejiya, ber buwe biyaban. şew dahat hîç aw we xwardîpê nebû bixuwat. Le yaran we suwaranî dûr kewtibowe. Ew gurisine we tuşî-

ne bû.

3- Paş ji dur atexîşî şuwananî dît. We Erdeşîr bo evê revî.

4- Merdekî pîrî le wê dî, le gelş guspendanî lew deşt we kêve bû.

5- Erdeşîr ewê şewê lewê bû, we rojî dî ji ewanî rêge xuwast.

6- Ewiş gotî ku ji Lêrewe, sê firseng bewlawe rustayek hes bes awedan, bes merdumêkêî paşketeî wesîyariyan hes.

7- Erdeşîr ew kat berew ew dêye revî, merdekî firista (henard), we şuwên yaranî we bo wêdêrêî xuwastin.

8- We sipaf madan peyandaşt ke ji Erdeşîr rehiwin leyan buwe hemî heme we çîye çîye ewîş revîye Parsî.

Wek lem beşêî karnameke derdekewê şerêkî xuwênawî de nêwan Erdeşîr we Kurdan da ruîdawe. Kurdekan be şer sipaf

be basî em ceng we neberde dekat we denûsê:

Eper şebêxun kirtin-î erdexîşîr eper ser-î kurtan we situ bibinitin-î Ewê şan.

1- Ertexîşîr çêhar hezar mert epir ewêşan tayîş, şebêxun Girt we ez kurtan, mert ewak hezar ew zet.


2- Eparêk xistik destgîr girt we ez kurtan şe epak poseran, burateran, Firzendan wes hêr we xiwastik, ew Pars wesîye kirt.

Be kurdî yanî:

Der bareî şebêxunî Erdeşîr bo ser Kurdan we wesitu hatinî ewan.

1- Erdeşîr çêhar hezar merdî araste kird bo wan we tajîya serîyan. Ji Kurdanî hezar merd xist (kuşt).

2- Parêkiyanî be xesteyî (birindarî) des-gîr kird we ji Kurdanşaf tewawî kurekan,



Erdeşîr da zal bûn we le leşkirîyan taranduwe. Le beşêî karnameke da ne tenê raste we xo nawî Kurdan dênê we Kurd we madîş be yekewe nawdêr dekat we guman birî dekat ke hîç çeşine tofir we çiyawazîyek le nêwan Kurd we mad da nîye. Le cêgayek sipayekî ke de gelî decengê be sipaf Kurd naw deba we le cêyekîtir be mad.

Her wa surî dekatowe ke Erdeşîr bo xo-şî Kurd buwe. Katê deçête lay suwane wêlêî Kurd le ko we der we deşt we şei de gel derbaz dekat we beyanî rêgaî awedanî lê depirsê, diyarî deda ke her dukîyan be yek ziman axêvîwin we zimani yekdîyan zanîwe.

Belam, karnameke nişanî nad ke em ceng we şere le kuwê ruîdawe? Her le herêmi kurî Pars dabuwe yan le welaî mêdiyaî kon we Kurdstanî niho? Serokî sipaf Kurdekan le şere da be Kurdanşaf we Kurdanşaf madîk nawî hatuwe. Aya bêjî ke em Kurdanşafye xizim we kes we karî Goçêherî serokî xêlî barzengî Kurd nebê, ke papekî bawkî Erdeşîr helîdaye serî we kuştî we welaî Farsî le dest derhêna we Erdeşîrî kurî kirde şa!

Her çilon bê? Karnameke paşandirêje

biraderan we Firzendanî we ewanîdî bes girt we revaneî Parsî kirdin.

Erdeşîr paş şer ewel we têk şikanî sipayekî çuwar hezar kesî gird we ko dek we pelamarî Kurdanşaf dedat we têkîdeşkênê we kurekan we birayekan we zaroyekanî degirê we rewaneî Parsîyan dekat. Paş em şere Erdeşîr degel hevtan bexit nawê decengê. Lem şere da Kurdan yarretî Erdeşîr dedan. Wêdeçê şerî nêwan Kurdanşaf we Erdeşîr şerêkî seranserî nêwan Kurd we dewletî Sasanî nebubê. Belke şerêkî naw xo we malbatîyane bubê. Çunke katê Erdeşîr be ser Kurdanşaf da debê we kur we biraw xawuxêzanî degirê nayan-kujê we rewaneî Parsîyan dekat.

Karnamekêî Erdeşîrî Babekan le laperê 33 da sere raî ewêî basî şer we cengî hevtan bexit dekat dû serdarî kurdî çaxî Sasanîş be xuwêner denasênê: Yezdan-kurtî- şahirezûrîk epak wes siaph-î gund ey an kewat şehir ezûrîk metiran kirtik pe Ferman Bûrtar erîş met lîstat.î

Be kurdî yanî :

Yezdan kurdî şarezûrî le gel, bes sipayekî gunde we gewre, ke hîy kewat (qubad)î şarezûrî bû, peymanî Fermanberdarî girt (best) we am (hat) we wêsta.

Lem şereda sipaî Erdeşîr be hoyî kemî-yewe deşkê be pêy jimare we amarekêî karnameke, hevtañ bext bo xoy serokayet 5 hezar sipaî kirduwe. Hewit kurî hebûwe, her yekêî serokî hezar sipî bûn. Sipayekî gewre we giranî tazî we êmanîşpe ke le derîya depernewe be hîmdad dê. Le weha ziruf we barêkî berteng da serdar sipayekî Fars be nawî Mêhirekî noşzadî ce-hîrumî xeyanetî pê dekat we pelamarî koşk we baregâî Erdeşîr dedat we talanî dekat.

Belam paş çen şer we ceng be yarmetî serdaranî Kurd be ser dujminîda zal debê we hemuwan le beyîn debat we paşan deçête Kirman we Barzan.

Efîş sipah we genc ew gost, Kirman we karzar. Barzan met.

Yanî: Paşan, sipa we gencî guwastewe Kirman we hate karzarî Barzan.

Le hênaneweî em Fakite tenê mebestim Barzan e, ke le karmameke da hatu-dirînegî de gerêtewe bo pitir le sal lenmew ber. Ehmedî kesîrewî le wergêranî Karnameî Erdeşîrda denusê:

Barzan, goya nawî tayefeyek buwe. Cuxirafîya bariz le Kirmanda dekan. Renge ew kêw we şare be nawî ew tayefewe naw nirabê. (1) Jerenot

Qasimî Haşimî

Nejad denûsê:

Be bawerî nubîrg, ew xêla yan ewe çêgaye le xan lincanî Lîsfehandaye. (2) Jerenot

Sadiqî hîdayet wişêî barzanî be biluçan danawe. (3) Jerenot

Jerenot:

(1) Ehmed Kesîrewî - Karnameî Erdeşîrî Babekan. Taran 1342

(2) Qasimî Haşimî Nejad Karnameî Erdeşîrî Babekan Taran 1369

(3) Sadiqî Hîdayet. Zend Homen Yesen taran 1342

Ew zimaneî ke karnamekêî pê nusirawe lêsta le Lêran we cihan da bi zimanî Pehlewî naw bangî derkirduwe. Belam de rastî da ew zimane zor we kurdî we zaravegêî kurdî deçê. Be daxewe heta niho le leyen zanayanî Kurdewe hengawêk bo saxkirdineweî Ferheng we kultûrî Kurd pêş Lîslam helngîrawe, dena ez bawerim ke em zimane Pehlewîye her kurdî kone we bes.

Balêra da eweş jî bêjim, ke yekêk le gewretîrîn mubedekanî serdamî Sasanî Kurdên buwe. Kurdêr ke serokî giş mux we mubêdekan buwe, tewawî Avêstaî Zer-deştî le 21 cild da le ser Pêstî (2000) ya nusiwetewe, ke goya le nizik şarî şîz yan Gîz le nizikî textî Suleymanda şarduyetewe. Ev şuwên e lêsta le lay Ateşgâî Azergîşespi şarî Kurd nişînî tîkapî mukîrîyan daxe.

Bo eweî xuwênerî Kurd dilnîya bê ke Pehlewî heta çîradeyek we kurdî deçê ez Ferhengokêk ji ev beşêî karnameke çêdekem.

Ev ferhengoke Kurd Soranî we Pehlewîye we Kurmancî ye.

PEHILEWÎ

1- ew
2- eîstat
3- ej
4- ewî
5- efiş
6- ewêşan
7- eîtir
8- est
9- e pîbîm
10- eper
11- eparîk
12- bûtin
13- biwitin
14- burader
15- burtar
16- pak
17- pes
18- pîr
19- pe-eîdaşt
20- tişnek
21- tayşîn
22- şenpan
23- şep
24- sebîxwîn
25- se
26- ser
27- roşnîye
28- rişnîye
29- roj
30- ras
31- rusta
32- rewî
33- zet
34- dûr
35- dît
36- deşt
37- dê
38- deşt
39- dîst
40- xûwin
41- xîş
42- xoyî
43- xorîşt
44- xot
45- xwast
46- xeste
47- xeste
48- çênar
49- ferseng
50- firîst
51- firzend
52- karjar
53- keye
54- kuf
55- ku
56- kêw
57- kewat
58- kurd
59- kirtîk
60- kaymen
61- gurîsne
62- guspend
63- gofit
64- go
65- gir
66- mert
67- mertûm
68- metîran
69- met
70- nîye
71- werîk
72- winhan
73- westû
74- wes
75- wesîyar
76- yezdan
77- hemkîrit
78- hezar
79- atixîş
80- apadan
81- arast
82- eîwak
83- şehrezûr
84- pişîne
85- hemuyan

SORANÎ


ew
lîsta-westa
le
ewê
ewîş
ewêşan-ewan
eîyîr
hes-heyê
lebîn-lebîm
lepîr-naku
pareyek
butîn-bûn
bewitîn
birader
burdar
pak
pes-ca
pîr
pendaşt
tişne-tunî
tazîn-tajun
şew
şewêxun
sê
ser
rewşn
rijtîn-rijan
roj-roc
rê-êye
rusta-dê
royştîn
zed-zet
dûr
dît
deşt
dê
deşt
dê
dîst
dûş-tûş
xûwin
xîş-xoyî
xorîşt
xot
xwast
xeste
xeste
çîye
çûwar
fîrseng
firîst
firzend
karzar
kêye
kêf-kêw
kuwa
kêw
kewad
kurd
kirtîk
kaymîyan
gurîsne
guspend
got
ko
gir
mêrd
mêrdûm
metîran-peyman
ama-hat
nîye
werêketin
penhan
westûm
bes
wesîyar
yezdan
cemkîrit
hezar
agir-ateş
awedan
arast
pêkan
şarezûr
pêdejîn
hemuyan

KURMANCÎ


ew
rawesta
ji-ce
evê
ev ji
evan
eidî
heyê
devê wexitê da
vaya
pereyek
bûn
gotin
birader
burdar
gîş-pak-hemî
pes-paş
pîr-kal
peudaşt-guman
tuşne-tunî
tajên
şewan
şew-şew
şewêxun
sê
ser
rewşen
rijan
roj
rê-rêya
dê-gund
revîn
zet
dûr
dît
deşt
dê-gund
deşt
tûş-çetûn
xîwên-xivên
xoyî
xorîşt
xwet
xwast
zambar
mandû
çîye
çar
ferseng
henardin
firzend-zaro
karzar-karjar
keye-kêye
kêw-çîya
ku
kêw
qubad
kurd
kirtîk
kam
gurîsne-bîrcî
pez-gusfend
got-givt
go
gir
mêrd
mêrdûm
metîran-peyman
ama-hatin
nîye
rêkevîtin
nîhan-penhan
westan
bes-wes
wesîyar
yezdan
hemkîrit
hezar
agir-ateş
awedan
arast
vêkevîtin
şarezûr
vêdejîn
hemê

Nêrînek Li Salnamê

FEQÎ HUSEYN SAĞNIÇ



Salnameke zayîni kurdî û koçî ya 1985 an



Bircên Salê

Salname û serdestpêka wê: Serdestpêka salnamê, bi serdestpêka jîna civatî ra dest pê kiriye. Hemin e ku di wan demên berin da, salname ne mîna ya roja me bi rêkûpêk bû. Her weha ne tevayî bû jî. Di her herêm û bajarek da û di her eşîr, klan û qewmek da, gor dem û bûyerên girîng serdestpêka salnaman diguherîn. Dema di welatek an jî qewmek da bûyere girîng bihata holê (himatê), ew bûyer heya bûyerek din dibû serdestpêka salnama wî welatî an jî qewmî. Weke heja erdê (erdhej), xela, ceng, limişt, nexweşî, berf û barana zêde û êd. dibûne serdestpêk. Di nav hinek gelan da hê jî, ew serdestpêk bikartên. Wekî bizava Şêx Seîdê mezin ku di welatê me da bibû serdestpêkek wilo ku giraniya gelê me roja xwe bi wê didan nasîn û dinasin. Gava ez birefêhmê xwe bûm, tenê ew salname di gundê me da di hate bikaranîn. Wekok: Du sal berî bizava Şêx Seîd, deh sal berî bizava Şêx Seîd, pênc sal piştî bizava Şêx Seîd û êd. digotin. Dayika min, ji min ra; Tu salek piştî bizava Şêx Seîd bûyî digot.

Serdestpêkên wan salnamên ku Kurdan heya niha xebitandine: 1-Salnama Kurdî, ji roja damezirandina împaratoriya Medan dest pê dike. Ev salname salnama rojê ye û serdestpêka wê tam 700 sal berî zayînê ye. 2- Salnama Hicrî, ji roja hicreta Hz. Mihemed dest pê dike. Ev salname salnama hîvê ye û serdestpêka wê 622 ê zayînê ye. 3- Salnama Zayînî, ji roja bûyîna Hz. Îsa dest pê dike. Ev salname salnama rojê ye û serdestpêka wê sifir e. Ango roja bûna Hz. Îsa serdestpêka salnama zayînî hatiye pejirandin (qebûlkirin).

Çawa li jorê jî dixuyê ku serdestpêka salnama Kurdî ji damezirandina Împaratoriya Medya dest pê kiriye û rastî heftsed sal berî zayînê tê. Ne ku çawa hinek dibêjin, serdestpêka salnama Kurdî û roja

Newrozê 622 sal berî zayînê, ji roja fetha Ninowayê dest pê dike. Her çiqas ji alî hinek herêmên Kurdistanê ve fetha Ninowayê bi serdestpêkiya salnama Kurdî bikaranîne û hinek nivîskar, îro jî wisa dibêjin jî, lê tu gavî ev yek ji herêmiyê derbas nebûye. Belê fetha Ninowayê rojek pir girîng e. Bandor li Rohhilatnavîn hemî kiriye, dirok û cografîya wê guherandiye, lê nebûye serdestpêka Salnama Kurdî ya netewîya fermî. Ev roj, di nav wan rojên kifş da, divê bê dîtîna ku me li jorin minak jê dabûn.

Sersala Salnama Kurdî, roja yekê adara meha Kurdî destpê dike ku roja Newrozê ye û rastî roja bîst û yekê adara meha zayînî tê. Ev roja yekê sala nû ye, roja yekê biharê ye, roja sar e, roja serdestpêka rojên germ e, roja hakimîyeta firehiyê li ser tengasiyan e, roja hakimîyeta Kurd li ser marên Dehaq e, roja bilindkirina ala (derfêşê) Kawa ye û êd. bi kurtasî roja serdestpêka hemî karên qenc li ser yên xirab e. Lewra rojêke piroziya wê jê bistîne, an jî ji holê rake.

Navên Mehan

Navên mehan Kurdî hemî bi Kurdî ne. 1. adar, 2. avrêl, 3. gulan, 4. pûşper, 5. tîrmeh, 6. gelavêj, 7. rezber, 8. kewçêr, 9. sermawez, 10. berfanbar, 11. rêbendan û 12. reşemî. Ev navên han, beşek jê di nav gelê bakurê Kurdistan da bi dest û beşa din ji salnama başûrê Kurdistanê hatiye girtin û ji alî Enstîtuya Kurdî ya Stembolê ve hatine pejirandin.

Hejmara Rojên Mehan

Di salnama Kurdî da hejmara rojên mehan bi vî awayê jêrîn in: Meha adar, avrêl, gulan, pûşper, tîrmeh û gelavêjê sî û yek didomînin. Meha rêzber, kewçêr, sermawez, berfanbar û rêbendanê sî roj in. Meha reşemiyê jî bîst û neh roj dajo. Tenê di salên zêdedar da, meha reşemiyê jî sî roj didome. Bi vî awayî salên Kurdî têne himatê.

- Beranberîya mehan Kurdî û yên zayînî:
- 1- Roja yekê adara Kurdî bîst û yekê adara zayînî ye,
 - 2- Yekê avrêla Kurdî bîst û yekê avrêla zayînî ye,
 - 3- Yekê gulana Kurdî bîst û dudê gulana zayînî ye,
 - 4- Yekê gulana Kurdî bîst û dudê gulana zayînî ye,
 - 5- Yekê tîrmeha Kurdî bîst û sisiyê gulana zayînî ye,
 - 6- Yekê gelavêja Kurdî bîst û sisiyê gelavêja zayînî ye,
 - 7- Yekê rezbera Kurdî bîst û sisiyê rezbera zayînî ye,
 - 8- Yekê kewçêra Kurdî bîst û sisiyê kewçêra zayînî ye,
 - 9- Yekê sermaweza Kurdî bîst û dudê sermaweza zayînî ye,
 - 10- Yekê berfanbara Kurdî bîst û dudê berfanbara zayînî ye,
 - 11- Yekê rêbendana Kurdî bîst û yekê rêbendana zayînî ye,
 - 12- Yekê reşemîya Kurdî roja bîstê reşemîya zayînî ye.

Wezre (werze) û salnama Kurdî

Wezre (bi mehên salnama Kurdî ra ahengî ne. Ne mîna salnama Rumî di heştê mehan da û ne jî mîna salnama zayînî di bîst û yekê mehan da wezre dest pê dikin. Vajiyê van, di salnama Kurdî da wezre di serê mehan da dest pê dikin û di dawiya mehan da diqedin. Roja yekê adara Kurdî bihar dest pê dike û roja sî û yekê gulana Kurdî diqede. Havîn ji yekê pûşperê heya sî û yekê gelawêjê didomîne. Payiz di navber rezberê û siyê sermawezê da ye. Zivistan ji roja yekê berfanbarê heya roja dawiya reşemiyê dajo. Weke ku dixwiyê di her wezrekê da sê mehên bi serê xwe hene. Ev jî taybetiya salnama Kurdî ye. Ango gor wezrê mehên salnama Kurdî saz bûne yan jî gor mehên Kurdî wezre tespît bûne. Dibe ku wezre ji alî Kurdan ve hatibe çêkirin.

Birc û Salnama Kurdî

Di astronomiyê da birc jî bi mehên Kurdî ra ahengîn in. Her mehên Kurdî di bircek da dest pê dike û diqede. Roja yekê adara Kurdî Roj dikeve birca beranî û roja sî û yekê adarê jê derdikeve. Roja yekê avrêlê roj dikeve birca ga û sî û yekê adarê jê derdikeve. Ji roja yekê gulanê û heya dawiya wê di birca cêwikan da ye û êd.... Qenc bala xwe bidinê, rojnâmên Tirkiyê falên stêrkên (yek-du çewtî tê da) gor mehên salnama Kurdî bikartînin û serdestpêk jî, ji sersala Kurdî dest pê dikin.

Navên Bircan

1- Adar birca beranî, 2- avrêl birca ga, 3- gulan birca cêwikan, 4- pûşper birca kêfcalê, 5- firmeh birca şêrî, 6- gelawêj birca sinbilê, 7- rezber birca şêhînê(terazî), 8- kewçêr birca duvpişkê, 9- sermawez birca kevanî, 10- berfanbar birca giskî, 11- rêbendan birca bêdrokê, 12- reşemî birca masiyê. Di wêja (edebiyat) me ya kevin da, ji birca beranî ra ibirca bere(rex)î û birca berxî jî hatiya gotin.

Di Salnama Kurdî da Newroz

Hinek mirov serdestpêka Newrozê, 612 sal berî zayînê, roja fetha Nînovayê nişan didin. Hinek 700 sal berî zayînê roja avabûna împaratoriya Medan e, dibêjin. Hinekên din jî heya 2500 sal berî zayînê dibin û roja Kralê Gutîyan e ku jî çiyayê Zaxosê hatiya Babilê dibêjin. Di vê mijarê da gotinên curbecur ne wekehev hene. Lê ji ber tengasiya çî, em nikarin da başa hemiyar bikin. Bi hêsanî vê yekê dikarim bibêjim ku berî fetha Nînovayê û damezirandina împaratoriya Medan û hatina Cemşîdê kralê Gutîyan Newroz hebû û di hate pîrozkirin jî. Di zanîna min da Newroz ji tarîtiya dirokê tê. Lewra serdestpêka wê tam nehate zanîn. Yeka tê zanîn ku, ev e ku di demên kevnare de, di nav gelê kurd û pêşî kurdan de rojek wuha pîroz her hebûye û di hate pîrozkirin jî. Belê sersala kurdî roja Newrozê ye. Ev sersala di hinde herêman da di hate pîrozkirin û serdestpêk jî fetha Nînovayê hatibû girtin ew jî roja Newrozê ye hatina Cemşîdê kral jî, roja Newrozê bûye. Dê

bibêji ev çawan dibe? Di vê yekê da du ihtîmal hene. Di her dukan da jî roja Newrozê jî xwe hebûye. 1- Ev rojên kêfxweşî û ev bûyerên girîng ji bo mesrefa wê pêşkêşî roja Newrozê kirine. 2- Pêşî da amadiya xwe kirine û roja Newrozê îlan kirine, an jî qedandine.

Bi peywendiya vê mijarê carek belgeki bi dest min ket. Di wê belgê da weha nivîsandîbû: **48 roj berî Newrozê Nînowa hatibû fethkirin. Asûrî jî serayê derxistibûn. Nobedar danîbûn ber derê serayê. Nedihîştin kesek bikeve hundir. Bi vî ewayî, heya roja newrozê rawestan. Gava ew roj hat, jî nû ve êrişî serayê kirin, şewitandin û navê wê Agirê Newrozê lê danîn. Bi vî ewayî wê rojê fetha Nînowayê hate qedandin.** Newroz cejnêkê pir hêzdar û manedar e. Hêza wê wûsan zêde ye ku gelên cînar jî, mîna gelê kurd pîroz dikin. Wûsan hêzdar e ku farişan du sed salan pê ra şer kirin, nekarîna rakin û paşî jî xwe ra cejintî pejirandin. Ji bo rakirina wê, ereban têkoşînek giran li dar xistin û ev têkoşîn sêsed sal domand. Lê nêrin ku bi tu awayî ranabe. Navê wê danîna Cejna Ecemanî û dev jê berdan. Osmanî jî gelek li rakirina wê xebitîn û pê ra şer kirin, lê çara rakirinê ne didîtin. Paşî jî xwe ra cejntiya biharê pejirandin. Vayê çendî çend sal in ku Tirkiye Cumhuriyetî li rakirina Newroza me dixebite pê ra şer dike, qedexe dike, cejna ermeniyar e, dibêje û pê ra sereder nekir. Vêca bi alî pejirandina wê ve gav davêje.

Newroz, ji du peyvan hatiye himatê. Her du jî bi kurdî ne: New = nû, roz = roj, Newroz = Nûroj, ango roja nû. Belê roja nû. Roja salê ya nû, roja meha adarê ya nû, roja biharê ya nû, roja serkeftina rojên germ ya nû, roja fîlitîna ji zivistana reş ya nû û êd. e...

Salnama kurdî ya îsal, heya roja dawî, ya meha reşemî ya kurdî bi vî ewayî tê danîn: 2695. Ji yekê adara meha kurdî paş dibe 2696. Bi vî awayî di navber salnama kurdî û ya zayînî da 700 sal tê himatê. Hemîn e ku di salnama kurdî de meha yekemîn adar e. Roja yekemîn jî roja yekê meha adara kurdî ye ku roja Newrozê ye jî.

Di Salnama Kurdî da Têkûzî

Ew salnamên me kariye li ser wan lêkolîn bikin hemî jî olî ne. Lê salnama Kurdî tenê netewî ye. Sersalên wan salnaman jî olî ne. Lê rojên cejnên Kurdî jî netewî ne. Halbuku ola Kurdañ pir kevrî ne ye jî. Lê Kurdan her dem olî di çarçova olî da rawestandine.

Di salnama Kurdî da tekuziya rojên serên wezran,

Dîsa ji wezra pêşî, meha pêşî û roja pêşî dest pê dikin. Roja yekê meha adarê sersal û Newroz e. Çira sersal e û di xwezayê da çî diguhire? Dikarim bêjim ku xweza bi xwe jî diguhire. Weke ku şev û roj dibin wek hev. Tav germ dibe. Barana germ dibare. Rûwek dirûwike (hêşinayî hêşin dibe). Li çiyân jî berf dihele. Heywan diçine çêre. Bi kurtasî tentêla heyberan hemî hêdî hêdî diguhire.

Wezra duwemîn, roja yekê meha pûşperê: Roja ji hemî rojên salê dirêjtir e. Şeva ji hemî şevên salê kurttir e. Bihar diqede û havîn destpê dike. Roja serê çilê havînê ye. Hişkbûna erdê dest pê dike. Çandinayî û meywa ber bi gihîştinê ve diherike. Xebata karker û rênçerban zêde dike. Ba kêmbê dibe. Barana normal radiweste. Ji germê acizayî dest pê dike. Herkes alaza hênikayî û zozanan dike. Hêdî hêdî li berojan gîha hişkolek dibe. Bi kurtasî wezre havîniya xwe, bê kêmasî nîla me dide û roja rojvegera havînê ye.

Wezra sêyemîn, roja yekê meha rezberê: Roja wekhevubûna şev û rojan e. Havîn diqede û payiz dest pê dike. Roja beranberdanê ye. Ji vê rojê ra cejna beranberdanê jî tê gotin. Lewra xwedîpez di vê rojê da cejnêkê fêris li dar dixan. Amadiya zivistana dest pê tê kirin. Normal çîniya rezan destpê dike. Hêdî hêdî cihan ber bi sermayê ve diherike. Herkes xwe-amadiya parastîna barana payizê dike. Carna baran dibare jî Belê pelên daran ber bi zerbûnê ve diçin. Bi kurtasî cihan xwe amadiya pîrbûnê dike.

Wezra çaremîn, roja yekê meha berfanbarê: Roja rojvegera zivistana ye. Roja ji hemî rojên salê kurttir e. Şeva ji hemî şevên salê dirêjtir e. Roja serê çilê zivistana ye. Roja tewawbûna peymana şivan û gavanan e. Serdestpêka rojên serma, bager, bapêç û dijwariyê ye. Roja destpêka barîna berfa diwar e. Qerisîna av û erdê jî normal di van rojan da ye. Di van rojan da, divê herkes xanî, derî û pencerên xwe saxlem bike. Nexwe divê em xwe amadê cenga zivistana reş bikin. ...

Rojên Mehan û Werzan

Rojên meha avrêl û pûşperê, di salnama Kurdî da ji salnama zayînê guherti 31 in. Ev yek jî pêwistiya xwezayê tê: 1- Ji roja wekhevubûna şev û rojan ya yekemîn (1 ê adara Kurdî- 21 ê adara zayînî) heya roja rojvegera yekemîn (1ê pûşpera Kurdî 22 ê pûşpera zayînî) 93 roj in ku jê ra werza biharê tê gotin. 2- Ji rojvegera yekemîn heya roja rojvegera şev û rojan ya duwemîn (1 ê rezbera Kurdî 23 ê rezbera zayînî) 93 roj in ku jê ra werza havînê tê gotin. 3- Ji roja wekhevubûna şev û rojan ya duwemîn heya rojvegera duwemîn (1 ê berfanbara Kurdî 22 ê berfanbara zayînî) ku bi Payizî tê navandin û 90 roj tê da hene. 4- Ji roja rojvegera duwemîn heya roja wekhevubûna şev û rojan ya yekemîn ku jê ra zivistan tê gotin 89 roj tê da hene. Tenê çar sal carek ango di salên zêdedar da hejmara rojên wê werzê jî dibin 90 roj. Bi kurtasî rojên werzan hemî ne wekhevdu nin: Rojên werza bihar û havînê jî rojên werza payiz û zivistana 6 roj zêde ne. Ev yek jî rastiya xwezayê tê. Vaye salnama Kurdî bê kêmasî vê yekê dide diyarkirin.

Ji vê mijara li vir û di vê nivîsê da bi kurtî hatiye şrovekirin jî, têkûziya salnama Kurdî û bi xwezayê ra ahengiya wê, bi hêsanî tê dîtin. Tenê bi balkêş xwendina vê nivîsê divê. Di xweşiyê da bimînin.

Hewkarî dewletanî dagîrker

1- Pêşkerî:

Peywendî nêwdewletî le Rojhelatî-Nawerast da hemîşe û be şeweyekî rastewxo karî kirdote ser jîyanî siyasî gelî Kurd û welatekey, çünke hoyekî serekî trajedîyay Kurd û Kurdistan lewe daye ke welatî Kurdan be dirêjayî mêj û hemîşe nawçeyekî sinûribûwe le nêwan da yaxud zêtir empratorî û dewlet û hêzî nawçeyî da bûwe be gorepanî dijayetî û şer û ajawe û pilan gêran le nêwan ew dewlet û hêzan da û hemîşe hevşil dîrawe Kurd be kar bihênrê lê pênavî berjewendî bêgane da.

Encamekanî ew şer be yekdadaname hemîşe dabeşbûn û layengîrî kirdinî şerek hoz û axa û mîranî Kurd lem dewlet û ew dewlet û be hêz kirdinî sistemî feodalî xêlayetî û lawaz kirdinî hestî yekêti neteweyî û diwa kewtinî prosey damezrandinî binkey neteweyî û dewletî serbexo.

Hemû Kurdêk û hemû kesê peywendî be dozî Kurdewe hebê, dezanê ke Tirkîye û Îran û Iraq û Suriye ke deyankeşe û çîyawazî aburî û mêjûyî û sinûriyan le nêvîsan da ye. Belam beramber be Kurd û daxwezekanî Kurd û bizavî rizgarîxwazî Kurdistan hemîşe yek in û amadeyî hewkar in - lem baware da.

Tenanet şerêkî wêrankarî wêkû şerî Iraq û Îranîş nebûwe hoy goranî helwêstî (birayaney) ew du dewlete dijî gelî Kurd be taybetî diway westanî le salî 1988 da.

Hewkarî ew dewletane be hemû şeweyek xoy niwanduwe. Çi be bestinî peymanname û rêkewtinname û protokol bê û çî be pilan gêran dijî bizavî rizgarîxwazî Kurd le parçeyek yaxud ziyatirî Kurdistan bê û çî be hawkarî û beşdarî rastewxoy serkut kirdinî raperîn û serhildanî Kurdan bê.

Seyr lewê daye ew helwêste ke ziyatir le heftê sal e, le layen ew dewletanewe peyrew dekirêd, be hemû ew goranane yî be ser ew welatane û nawçewke û çîhan da hat. Goranekî ewtayî be xo we nebînî. Le goranî rejimî paşyetî be komarî le Iraq da û ne be le nêwçûnî rejimî Şahînsahî û damezrandinî komarî Îslamî le Îran da û ne be goranî sistemî partî taqane be rejimî fire partîfî û nîmçe parlamentarîzm û hefî muzîk bunewey sextekarî le sistemî ewrûpayî le Tirkîye da nebûne hoy destberdan le siyaseti hewkarî dij be gelî Kurd lew welatan in. Tenanet doranî rejimekanî faşîzn û nazîzm le şerî Diwemîn Çîhanî da le katî xoy da û branewey şerî sard le kotayî heştakan da û şerî heşt saley Iraq û Îran û şerê Kendaw û hewlekanî kotayî hênan be kêşeyî Rojhilatî Naverast û aştî bûnewey welatanî Ereb û Îsraîl û deyan rûdawî tîrî

CABBAR QADIR

mezin lem çîhane. Berîne da gelî şitî gorî, tenha neytuwanî hendê le dijimîyayeti ew dewletane beranber be. Gelî kurd kem bikate be.

Le gel ewey dijminayeti xwestekanî gelî kurd le layen dewletanî Osmanî û Îranewe û Zil-hêzekanî sedey nozdemîn û seretay sedey bîstemewe wata Rûsya û Îngilistan û Almanya û Fransa kirawe, ême lêre da le serdemî hawçerxî em hawkarîye dikolinewe be taybetî le salî 1926'an we, lew salewe binaxey harîkarî û hevalbendî le nêwa dagîrkeran Kurdistan da katra û em sîyasete tawe ku emroj le gel goranî form û roxsarî derewey da peyrew dekrê. Pêş ew sal e, wata pêşewey biryarî diwayî li Mûsul bidrê, rastir meseleyî le kandinî Kurdistanî Başûr be Iraqewî be hoy serhildanî mezinî salî 1925'ewe le Kurdistanî Bakur, îngilîz û kemaliyekan le gorekanî dozî kurd da ember ûewberyar dikirt û hewlî be karhênanî dixwazîye rawekanî gelî Kurdiyan le bakur û başûr bo wedihênanî berjewendiyekanî xoyan deda. Belam, diway serkut kirdinî raperînî salî 1925 le bakur û serhildanekanî başûr û baranewey kêşey Mûsul, herdu la geyîştine biryarek ewîş ewe bû ke debê hemû layekewe hewlekanîyan yek bixin dijî raperîn û serhildanekanî gelê kurd û sinorekan, ke be maweyekî kem be xo yan kêşebûyan û rastexo dijî hemû berjewendiyekanî gelî kurd, bikin bi rastiyek le dil û mêjîkî hemû Kurdek da.

Her lew sale dabû komelê peymanamê û rêke kewtinname û protokol le nêwan dagîrkeranî Kurdistan da mor kîran ke hemûyan le hewlî çespanî sinorekan û hewkarî dijî serhildawanî kurd û alîkarî asayîşî da le nawçe sinoriyekan da yek nawerokîyan heye.

Be hoy raperînekanî gelî Kurdewe le sê parçeyay Kurdistan da (Başûr û Bakur û Rojhilat) dagîrkeran bo yan derkewt ke hemûyan le meseleyî kurd da debê. Yek hal hêlwestîyan hebê û be hemû layekewe dijî biwestin, çünke hewlî bekarhênanî Kurdan dij be yektir be ziyânî hemû layek degerêtewe. Lêre, da wîtakanî rojnamey (Dûnya) yî Turkî ke pêş 32 sal nûsîwîyeyî delê men hemû yek hereşe û metirsî balî kêşawe be serman da û hemîşe hemûman girodeyî yek gerdûn).

Rûdewekan be reşîkawî derî dexten ke em welatane çarenûsiya yek e û hemîşe naçar in û debê hawkarî bikenî. Pêş ew gotaney ew rojnameye be 40 sal û duway ew wîtaney be 30 sal, hawkarî hevalbendî dî dewletanî dagîrkerî Kurdistan tenha

malwêranî û azar û eşkenceyî be gelî kurd beşîwe. Katê mirov le alîkarî Tirkîye û Îran û Iraq û Suriye dijî gelî kurd dekolêtewe, debê hemîşe be xalî bîngêhî feramos nekate: Yekem- Gelî kurd welatekey be zor û narewa û dij be wîst û awatî ew gele be ser ew welatane da dabaş kirawe û be hîç şeweyek berjewendî etnikî û aborî û ramyarî û komelayetîyekanî nek tenha le ber çawnegirawûn, belku xirawnete jêr pê we û kirawne be qurbanî berjewendî ew dewletan û zilhêzekan ke le pişteweyan bûn.

Em rastiye way kirdiwe ke gelî Kurd hewlî dawe ew bare rast bikatewe, emeş rastewxo dijî berjewendî ew dewletane ye ke le lay xoyanewe hewlî û teqelayan bo eweterxan kirdiwe be hemû şeweyek û zor bê bezeyane hemû cîmuculekî Kurd le lanekda le gor nê.

Duwem: Wêkû berjewendî Kurd le ber çaw negîra, le hîç yekêk lew welataneş da sistemekî demokrasî nehate kayawe, belkû detwanî bileyn ke dirindetîrîn û gendelîrîn rejimekanî em ser zemîne lew welatane sergan-helda û tawekû emroj berdeyam in. Le saberi ew care rejîmaneda çawerûwan nakrê sîyasetekî nawxo û derewe le berjewendî gelan û aştîda peyrew bikrê, belkû debê tenha çawerûwanî sîyasetî zordarî û serkut kirdinî cemawer le nêw xo û pilan gêran û şerxwazî û dijayeti rizgarî û azadî gelan le derewey ew welatane bikeyn, boye debînin ew sîyasetane wa ziyatir le 70 sale berdewame û lem salaney diwayî da be çostîr û be tîntir debî.

Be boçûnî min şikirdinewe û lêkdanewey em babete nek tenha girîngî û sengêkî zanistî meşûyî heye. Belkû detwanîm bilêm bayexekî sîyasîşî bo tègeyîştin û helsegandîni stratejî û helwestî dujminîkaraney ew dewletane beramber be gelî Kurd û bizavî rizgarîxwazî Kurdistan heye.

Hêze sîyasîyekanî Kurdistan detwanî ber reşneyî ewcare-îekdanewe û lêkolînewene da stratejî neteweyî gelî Kurd dabîrêjin û be sîyasetî manore kirdinî zanistîyan bidin û le aloziyekanî barî çîyopolîtîkî û berjewendîye lêk alîkawekanî welatanî nawçe û zilhêzekan kelk wergirin. Bê ew care lêkolînewane bizavî Kurd hemîşe helekanî meşûyî dîr û nêzikman du pat û sed pat dekatewe.

Tenanet ewaney emro rolî opozîsîyon dijî rejîme siyasekanî dewletanî Kurdistan degêrîn. Lê helwestîyan beranber be gelî Kurd û hewkarî nêwan ew dewletane dijî gelê Kurd çîyawa-zîyekî ew toyan niye.

Her ke basî dostayeti le nêwan ew welatane da dekrê. Yek mana degeyenê, ewîş hawkarî û hawpeymaneti ye dijî gelî Kurd û welatekey. Le ber roşnayî ew fakterane-

da lère de le mejûyî harîkarî hawal bendîfî Tirkîye û Iraq û İran û Suriye beramber be gelî Kurd dekolînewe. Nûserî em çend dère natwane be hiç şeweyek lafi ewe lê bidet. Ke hemû layekanî babetekey lêkda-wetewe û le ber hoyekî asayî ewîş eweye lawane ye û gûma-îm leweda niye kedeyan rêkkewtinname û protokolî nihênî le nêwan ew dewletane da mor kirawin û taweku emro rûnakiyan nebînîwe.

2- Harîkarî dewletanî dagirkeranî Kurdistan le salanî 1926- 1945 da: Le kotayî şerî Cihanî yekemewe ta biryarî komeley gelan le dîsemberî 1925 derbarey Kêşey Musil, İngilîz û kemalîyekan hewlîyan dida heryekeyan le lay xoyewe xwast û awatekanî bizavî rizgarîxwezî gelî Kurd le bakûr û başûrî Kurdîstanda bo xizmet berjewendeyekanî xoyan be karbînî. Tenha bo numûne Ingilîzekan berpobûnî raperînî 1925 û serkut kirdinî bê bezeyaney le layan Kemalîyekenyan çak be karhêna wekû belgeyekî gûman lê nekîraw bo narezayî Kurd le siyaseta Tirk û pêwistî likandinî Kurdîstanî başûr be Iraq ewe. Çûnke ew sehildane wîtekanî şandey Tirkîya bo Konferansî Lozan. Ke deyqut guwaye: Kemayetîye neteweyekan be çarenûsî xoyan le sayey rejimî Tirkîye da bextewarin be dîro dexistewe.⁽¹⁾

Ser kut kirdinî bê bezîyaney raperînî 1925 tîwanay yarkirdin û helxeletandinî le kemalîyekan sendewe. Itir layengîranî harîkarî kirdin le gel kemalîyekan le Kurdîstanî başur diwa henaseyn dekêşa. Le layekî trîşewe tundûtîjî dagirkeranî Ingilîz dijî raperîn û serhildekanî Başûr gumanî lay Kurdî başur nehêşt ke emanîş ciyawazîyekî ew toyan legel dagerkeranî nawçeyî danîye. A bew şeweye derkewtinî rûy rasteqîney dij be Kurdanî Ingilîz û Kemalî û berpabunî zincîreyek le Bakur û Başur û le Rojhelatî Kurdistan da dagirkeranî welatî Kurdanî le yek nêzik kirdewe û biryarî siyaseta kî hawbeşî dij be bizavîrizgarîxwezî gelî Kurd dira û rikeberî û dijayetî û yarî bekarhênanî dij be yek be lawênîra. Kate metirsî û xeternakî em siyaseta bo hemû layek derkewt.

Girîngîrî helqey em siyaseta. Peymannamey 5'î Hezîranî salî 1926 le nêwan Britanya û Iraq le layekewe û Tirkîye le layekî tîrewe ke le Enqere mor kira.

Goftûgokanî nêwan herdu lay bo bestinî ew peyman le dîsembirî 1926 da destî pê girt Wate her lew mangle da ke komeley gelan biryarî diway le barey kêşey Mûsil ewe da. Bi giwêrey em peymannamey herdu lay le ser sinûrî nêwan dewletî Iraqî bin mendatî Britanî da û Tirkîya rêk kewtin û kotayîyan be kêşekanî nêwanyan hêna û le ser siyaseta kî hawbeşî dij be bizavî rizgarîxwezî gelî Kurd rêk kewtin. Ke be aşkira le bendî 12'î ew peymannamey da derdekewê, lew bende da herdu la gift û peyman be yek dedem ke xoyan dur da girin le hemu peymendîyek ke şeweyekî dîplomata û fermî hebê le gel serok hoz û şêx û endamanî ew hozaney hawelatî wela-tekeytirîn û lew katey ew peywendîye le-gelîyan debestrê le ser xakî em da dijîn.

Herweha herdu lay be hiç şeweyek rêga naden le nawçe sînoriyekanda be hiç çore

rêk xiraw û propagande û kobûneweyek ke dijî yekêk lew du welate dekrê.⁽²⁾

Lère da aşkira ye kê le nawçe sînoriyekanî Iraq û Tirkîye da dejî û kê komele û rêkxirawê û kobunewe saz dekat û dijî ew du dewlete xebat dekat.

Bendekî peymanekêş 10%î ew dahatey Iraq le kompaniyay newtî İngilîzî-Turkish Petroleum Company- destî dekwet dabwaye bo nawey 25 sal be Tirkîye bidrê. Belam Turkekan ew mafey xoyan be 500 hezar pawendî îsterînî kaş gorîyewe.⁽³⁾

A bew şeweye baziganî be Kurdistan dekira û dagirkeran be yekîyan defroşt û nîrx ew bazirganîşew le newtî Kurdistan bû. Wate bazirganî be xakek ke kesîyan xawenî nebûn û mafî bazirganetîyan û qiruşekîş le girtanî zoyanewe dernedîçû.

Em peymannamey be seretayî harîkarî Iraq û Tirkîye dijî gelî Kurd û bizavî rizgarîxwezîyê dadenrê û diplomate Ingilîzekan westayane bendekayan darîştiwe.

Serbarî ew peymannameyêş, çendîn protokol û rêketinnamey tîrîş le nêwanherdu lada lae barey xebat dijî tewanbaranî û be destewe danyan û gorîneweyan mor kira.⁽⁴⁾

Lem protokolneda xebatgêranî Kurd le dijî dagirkeran û azadî Kurdistan be tewanbar û cerde û çete û rêgir mawîyan debra. Emêş nek tenha beramber be gelî Kurd, belkû hemîşe dagirkeran bew çawe nerîte xebatkeranî azadî û serbixoy gelanî jêr deste.

Lew katewe tawekû emro zorbey caran Tirkîya xawen înfîyatîff buwe be karî hawbeş û harîkarî dijî gelî Kurd. Her lew kateda le du lay tîrewe le kar û çalakî dabû bo durîstkirdin rizgarîxwezî gelî Kurd. Berhemî ew çalakîyanêş du peymannamey heman çêşîn û nawerokbûn. Ke legel İran û Suriyey bin mendatî Fransada bestî.

Le 26. 4. 1926 da le Taranî Peymannamey dostayetî û parastinî asayîşî le nêwan Tirkîye û İran da mor kira. Bendekanî em peymannameyêş hewlî derîştinî siyaseta kî hawbeşî dij be Kurd û bo serkut kirinî bizavî rizgarîxwezî gelî Kurd deda.

Be giwêrey bendekanî debiwaye herdu lay mor kerî peymannameke îrêga nedin bew komel û rêkxrawane ke amancîyan şewendînî aşî û asayîşe le welatî yekêkîyan da, yaxud hewl deden rejimî siyasî ew welate bigorin. Her weha nabê rêke bidrê hewaney ke be pir û pagende yan be her şeweyekîtir xebat dijî ew dewlete dekenî bendî 5î.

Be giwêrey bendî şeşemîn peymannamekêş herdu laî Gift û peyman deden herçî le tîwanayan da heye biken bo ewey kotay be ajawe nanewe û tawankarî û plangeran bîni ke hozekan le nawçe sînuriyekan da berpay dekan û amancîyan şewandinî asayîş e. Lem dîw û ew dîwî sînûrî. Bendî hewtemîş be aşkira basî hewl û çalakî hawbeş dijî yek girtinî bozekanî Kurd le herdu lay sînûr deka û delê Debê herdu la kar û çalakî hawbeş bigirne berbo lenêw birdinî ajawelanî ser sînori⁽⁵⁾

Lêreş da serhildan û raperinanî Kurd be ajawe nanewe û plangeran û şewandinî asayîş û hemînî le qelem dirawin û be aşkira bendekanî em peymannameyêş dijî biz-

wî rizgarîxwezî gelî Kurd le bakûr û rojhelatî Kurdistan da xoyan denîwînî. Emêş karekî nihênî û şarawe nebû. Tenanet dîplomatekanî Elmanya le payîtextê Tirkîye le raporte kanî ew rojaneyan da ke bo Berlinyan denard. Basî harîkarî Tirkîye û İranyan dijî serhidawanî Kurd dekirî.

Tenha bo nimûnenameyekî şandey Almanî da ke salî 1926 bo Berlinînardîwe delê Tirkîye be harîkarî hukumetî Fars parastinî sînorekanî Kurdistan legel İran da behêz dekat, em kareş be hoy bujanewe û ser le niwê serhidanew bizawî Kurdekan peyrew dekrê. Bestinî peymanî niwê le nêwan Tirkîye û İran da berbarey karî hewbaş bo çareserkirdinî awaje sînoriyekan dijî serhildanî çaweruwaw kirawî Kurdekan e. Şayanî gotine ke peymannamey Musil ke le nêwan İngilîz û Tirkîye da mor kira. Hukumetî Bexdad naçar dakat. Rêga le Kurde bizawekan bigretaweke le sînorekanî nêwan Iraq û Tirkîyawe neperînewe.⁽⁶⁾

Lère da pêwiste rexneyekî tund le(Xoyîbûn)bigirîn. Çûnke diway bestinî ew peyman be salêk Xoyîbûn basî birayetî legel İran da dikird dey wîti: Debê peywendîyekî birayane legel hukumetî İran û gelî Fars da bibestîn ... bew mafaneş qeybin ke hukumetekanî Suriya û Iraq be Kurdîyan dawewê.⁽⁷⁾

Em wîtekanê le jêr perdey rîyalîstewe dewitra tenha Kurdînanî Xoyîbûn derdexa û tenegeyîştinî hewl û mercekanî xebatî neteweyî û pêwistî darîştinî stratejîkî Kurdistan le layen serkîrekanî yekem partî nasonalîstî Kurdewe. Em peymannameyêş nêwan Tirkîya û İran û ewey nêwan Tirkîya û Iraq be raşkawî ewe dexene rû ke binaxekanî siyaseta kî hawbeşî sê qolî dijî gelî Kurd û bizawe rizgarîxwezîyê damez İran.

Wate diyarkeranî Kurdistan gelê zûtîr le gelî Kurd derkîyan be pêwistî darîştinî siyaseta kî stratejîkî hawbeş Kurd kird û le siyaseta rojaneyan da wa ziyatîr le 70 sale peyrewî deken.

Legel ewey stratejîkî neteweyî bo Kurd ewendey ewe û bigre ziyatîr pêwistî le be sud e. Keçî takû êsta ew stratejîya neteweyîye le dayik nebûwe.

Be heman şewêş nêwan Suriyayî bin mendatî Fransa le layekewe û Tirkîye le layekî tîrewe berew pêşewe deçûn. Le 30 Mayîsî 1926 da Tirkîye û Fransa wekû dewletên xawen mendat be ser Suriye da, rêketinnameyekan be nawî Dostayetî û Peywendî Dirawsêy île Enqere mor kird. Lêreş da herdu la le ser ewe rêk kewtin ke dijî kesane û rêkxrawane biwestin. Ke dijî yekêk lew da dewlete xebat dekin û hereşeyan lê deken û hereşeyan debene ser.⁽⁸⁾

Lère da hiç hoyek nebû. Ke Tirkîya gumanî le helwestî dostaney Fransa beramberbew hebê. Çûnke Fransîyekan le kafî raperînî salî 1925 da yarmetîyekî çarenûsazaney supay Kemalîyekanyan dijî serhildawanî Kurd da. Katê rêgayan pê dan be xakî Suriya da hêzekanyan binêrine ser Kurdekan. Ew kareş bûwe hoy serleşewanî serhildawekan û bar û sengî serbazî be lay Tirkîya da gorî û yekêk lo ho serekîyekanî jêrkewtinî.

Kurd bi piranî li Rojhilata Navîn dijîn. Gelên misilman jî bi piranî li vê derê dijîn. Ji ber vê sedemê li ser koçberiya misilmanên ereb ên dema destpêka ola îslamê hatiye sekimandin. Di navber koçberiya wan û koçberiya gelê kurd de gelek wekhevî hene. Ji bo ku koçberiya gelê kurd ji alî dinya îslamê ve jî rast were tegihîştin, em bi giranî li ser van her du mijaran sekinîn.

Dema ku peyxamberî di sala 61 lê zayînê de ji Hz. Mihemed re hat, gelê Mekê û Cezîra Ereban di feodalî û keşmekeşek mezin de hukumranî dikirin. Dema koletî û feodalîyê zilm û zelûltiyê bi helwestek pir mezin didomand Resûlî Ekrem (Hz. Mihemed) rewşa Mekê û zilm û zora dewlemend û feodalên Mekê li ber çavên xwe dît, pêşiyê li ser mafên mirovan sekinî û bi kole û xebatkaran re peyivî. Ji wan re ola îslamê teblîx kir û got ku; Îslamiyet di pratîkê de, berî her tiştî li hember zilmê derdikeve. Mafên mirovan diparêze. Însan çawa ku çêbûna wan ji hev cûda nîne, wisa jî kes ji kesî cûda nîne û mezintir nîne. Dewlemend, axa, serok, kole feqîr xebatkar li cem xwedê yek in. Lê belê bi qencî û xerabiyên ji hev û din cûda ne. Kî xwe ji nepakiyan biparêz mafên mirovan qedexe neke, li hemberî zilmê derkeve, ê herî qenc ew e.

Bi vî awayî Hz. Mihemed teblîxa ola îslamê dikir. Lê, ji berê ve bi dizî dikir. Ji ber ku zilm û zora dewlemend û zordarên Mekê pir dijwar bû, têkoşîna bi eskere bi rê ve nedibir. Tim hevaltiya kole û xizanan bi wî qencir bû.

Rojekê, gava ku tavê da ser Mekê, dirokê nihêrîna xwe da nîşandayîn ku hinek axaftin gotegotên pir nexweş di nav gel û qebilên ereban de digeriyan. Lê, mirovan tu caran bawerî bi wan gotegota nedianîn. Dema ku axaftin bi wan gotinan bihata kirin, dilê mirovan dipitpitî û pêl dida. Aqilê mirovan disekinî, pûrta wan li serî dibû şûjin. Li pey van gotinan qebîla Qureysîyan bi gelek kesan kom dibû û pilepil dikir. Li dor Kabê bi dizî dipeyivîn. Hinekan digotin, qey ewê dijminêkî mezin bê ser Mekê. Lê belê, qebîla Qureysî û wan serokên wan ên xirab û zalim nedixwastin ku kes pê bihese. Pişt re hat zanîn ku wan kole, feqîr û xebatkaran Mekê hinek maf dixwastin. Nefsa wan bilindî hinek tiştan bûye, dilê wan hinek tiştan dixwazê, zimanê wan gelek tiştan dibêje. Di demên berê de tiştne weha ji wan nehatibû sehkirin.

Wan feodal û dewlemendên Mekê nihêrîn ku kole û xebatkaran dilê xwe bi azadiyê xweş dikirin. Kêfa wan dihat ku ji koletiyê xelas bin. Di nav hev de diaxivîn, digotin; em ji patronên xwe piçûktir nînin û em jî mirov in, mafê jiyane jî me re jî heye, em jî bi bejn û bal û bi sûret wek patronên xwe ne. Temamê gelan ji heriyê çê bûne, ew dê bibin herî. Çaxa

ku mirov ji diya xwe dibe laşê wan mîna hev e, çaxa ku dimire jî laşê wan mîna hev e. Lê, di navbera bûyîn û mirinê de, nefsa mirovan û dilê wan bi kirinên wan jî hev cûda dibin.

Wan kolan ev tim weha dianîn zimên, digotin; li gorî qencî û xerabiyên mikafat û ceza tenc standin. Mealê vê ayetê han digotin: "Kî ku bi qasî misqale zerekî xêrê bike, ew dê bibîne, û kî ku bi qasî misqale zerekî şer bike ew dê jî bibîne" û dom dikirin digot: Azadiya mirovê azad û patroniya wî nabe sebeba mezinahiya wî ya li ser mirovên din. Ger mirov xwe qenc û mezin bihesibîne, gerek mirovan bi dest, dil û zimanê xwe neêşîne, nede eziyetkirin.

Dema ku roj bejnekê bilind bû, koma Qureysîyan li mescidê kom bû, tu kes li ser bazirganî û kirin û firotinê nedixawî. Di wê demê de Yaser bi zûka berê xwe da mescîda Kabê û gihîşt bal Benî Mexsûmiyan, silav da û rûnişt. Lê, wek caran rûçikên gel lê pak xwiya nekir. Dengê xwe ji silavan wî re bilind nekirin. Hinek jî wan bi hêdîka silavan wî lê zivirandin. Yê din mîna ku silav qed seh

KOÇBERÎ

KEREM SOYLU

nekiribin xebardana xwe domandin. Lê, Yaser bi dizî di dilê xwe de girt. Pozbilindiya Benî Mexsûmiyan pir jê girt û rabû çû nav Qureysîyan ji nişkave rastî Emroyê Kurê Huşam hat. Emro jê re got: "Tu çira xwe ji me digirî û dereng têy cem me?" Yaser jê re got: "Pêwîstiyek min ez ji hatinê dereng xistim, ya Ebel Hakemî." Emro hêrsa xwe di xwe de veşart û got: "Belê pêwîstiyek min jî bi te hebû, min dê tu bîdîtayî. Yaser: Xêr e? Ew çi bû?" Emro: "Tu qed nêzikî xudayên me nabî. Min nedîtiye ku tu xudayên me bi qencî binî zimên" Yaser: "Qed we bihistiye ku min bi nebaşî ji xudayên we xeber dabe?" Emro: "Ma çi ye kurê te ye Umar bi Mihemed îman anîye, ji ola bavê xwe derketiye?" Wê çaxê rengê Yaser xirab bû. Rûçikê wî zer bû. Dengê wî kêm bû. Şilayî bi eniya wî ket. Di wê demê de Emro hucumî ser Yaser kir ku eziyet bidê. Wê çaxê apê wî ye Welîdê Kurê Mûxîre jê re got: "Tu çi dikî? Ji vî kalî çi dixwazî? Lê şefqetê bike. Kurê wî çil salî ye. Wî bi xwe qedera xwe nas kiriye. Xêr û gunehên wî ji wî re ne. Dest ji Emro berde." Lê belê Yaser jî cihê xwe rabû berê xwe da Emro jê re got: "Ez helwesta kurê xwe îro du roj e

nizanim çi ye? Lê belê tu seyîdê Benî Mexsûzîmiyan î. Haya te jî Erqem heye ku pêşiya Umar ji ola bavê xwe derketiye. Mala xwe kiriye êwirgeh û cihê Muhemmed. Muhemmed di wê de hevalên xwe dibîne. Doza xwe di wê de belav dike. Di wê de temamî xerabî pîsiyan tîne ser îlah û pûtên we. Lê tu ji Erqem û Benî Erqemîyan ditirsî. Çimkî kurên bavê wî li pişt wî sekinîne." Ev gotin gotin û ji dewsa xwe rabû çû. Dema çû mala xwe dît ku jina wî ya Summiyeto pir kêfxweş e, rengê wê pir geş e. Seh kir ku ew du rojan di îşkencê de maye. Dîsa jî pir kêfxweş bû û rahişt stûyên Yaser û Umar. Bi wan re kêfxweş bû. Yaser got: "Ka bibêjin ev çi bûye ji we" Semmiyeto got: Yaser, Umar tiştêkî wisa dîtiye ku xêra me ya dinê û axîretê tev tê de ye. Yaser got: "Erê, Umar tu jî ola bavê xwe derketî?" Got: "Bavo min xêra dinê û axîretê tev dîtiye. Ew xudayê ku erd û asîman, roj, hîv, stêrk çêkiriye, ez teslîmî wî bûme. Wî Muhemmed şandiye bal me. Muhemmed jî pir tiştên rast dibêje. Mafê kole û feqîran diparêze, li hember zilma kedxwaran derdikeve. şerabê, qumarê, zînyê û qetlê qedexe dike. Sero-katî û mezinatiya dewlemendên zalim û barbaran qedexe dike. Di navbera gelan de wekhevîyê diparêze. Dibêje ku mezinahî bi tenê bi exlaqê pak dibe. Kolekî Hebeşî yê mafparêz û exlaqaqîj ji van eşraf û dewlemendên Mekê çêtir e. Tenê ev doza Muhemmed dê me derxîne rîya rastiye û ew dê ji tarîtiyê me derxîne ronahiyê. Ku doza wî bi ser bikeve edî koletî radibe. Herkes dibe xwediyê mafên xwe. Her kes dibe wek hev. şerîf û mezin bi hunerên xwe ew dê derkevin dereceyek mezin."

Bi van gotinên Umarê Kurê wî Yaser hinek nerm bû hinek jî hişê wî ji serê wî çû rûnişt. Umar diya xwe ya Summiyeto dest û eniya wî mist dan. Yaser tim weha digot: "Kurê min ez bawer in, çawa ku Mihemed ji te re gotiye, ez jî wê dipejirînim. Doza Mihemed rast e. Ew li aliyê feqîran e: Li Mekê mafên mazlûman ew dê biparêze" got û dîsa ji xwe çû. Demek buhurî, dîsa ji nişka ve Ebû Cehîl (Emroyê Kurê Huşam) dihat bi wî re gelek ji xort û kalên qebîla Mexsûmiyan hebûn. Umar, bavê wî ye Yaser û diya wî Summiyeto girtin birin û avêtin îşkencê. Bi şîşên sorkirî pê îşkence kirin. Bi erdê ve kaş kirin. Agir diavêtin ser wan. Temamî xanî û avahiyan Yaser şewitandin. Di wê gavê de Yaser ji jina xwe Summiyeto re digot: "Agirê ku min di xewna xwe de dîtûbû, va ye îro min dît." Bi wî awayî Ebû Cehîl bi hevalên xwe ew bi erdê re kaş dikirin. Umar jî tim gazî dikir: "Bavo li ber xwe bide, piştî wî cezayî mukafat heye. Netirse, serkeftin a me ye. Di pey tengiyan re firehî ne. Em bimirin jî, em şehîd in. Miheqek di pey me re ew dê doza Hz. Muhemmed bi ser bikeve. Kole û belengazên Mekê ew dê di pey me

re bigihîjin azadiya xwe.

Li aliyê din, cematek mezin ji Qureyşyan li mescîdê civiyan. Wan ji kirin û nepakiyên ku xortên Benî Mexsûmiyan kiribun dipeyivîn. Ew îşkence û hesabdayîn û malşewitandin, îşkenca mêran û jinan ya bi hesinên sorkirî ku heya niha li vî şehrê pak nehatibû kirin, nedipejirandin, digotin van mirovan ne mêr kuştine, ne dizî kirine, ne jî zîna kirine; çima bi vî awayî tîn îşkencekirin.

Welidê kurê Mûxîre ji Ebû Cehîl re dibêje: "Ya kurê birayê min te tiştêkî wisa nebaş li vî bajarê hanê emîn peyda kir, ku heya niha ji Qureyşyan tu tiştêkî weha çênebûye. Tu bi hewa nefsa xwe re bûyî yek. Te pir quretî kir. Hinek mirovên sefik, hinekên ehmeq, hinek jî ji kolan bi te re bûn yek. We ev çalakiya pîs kir. Ez ditirsim di pey vî pisitiyê re, êdî tu kes newêrîbe were Mekê. Kes êdî mîna berê bawer nabe ku qesta siya Kabê bike were û ji nexweşiyê pak be, zikê xwe têr bike, ji îlahên me re îbadet bike, bazirganiya xwe bike û here." Heya ev gotegota bê kirin ku di Mekê de mirov tîn ezabdayîne, bi şîşên sor tîn daxkirîne. Xaniyên wan bi serê wan û zar û zêçên wan de bê şewitandinê tu xêrek ji me re nema. Weha digot: "Wey li minê, ev çi bû hat serê me." Sefik û xortên Qureyşyan pozbilind bûne; bi gotina bav û kal û mezinên û cemata xwe nakin. Fikrê insan û zanayên hunermend napejirînin. Li gorî bilindahiya nefsa xwe bi rê ve diçin. Ji cînar û bindestên xwe re tu dilovanî û hurmeta insanî nişanî mirovan nadin. Ên xwe bispêrin wan, mêraniyê nişanî wan nadin. Di pey van


axaftinan re daxwaza min ji Benî Mexsûmiyan ev e ku van hêsîran berdî. Ez di vî warî de ji te û hevalên te daxwaziya însafê dikim.

Dema ku Welidê Kurê Muxîre weha got, çav li Ebû Cehîl sor bûn. Dengê wî vixevix jê hat. Şer û nepakî ji ser çavên wî dibarî; "Na na, ez bi lat û pûtan sond dixwim heya qevdika vî şûrî di destê min de be, tu carî hûn nagihîjin bal wan hêsîran. Ez dizanim ku min di vî şehrê emîn de tiştêkî nû peyda kiriye, lê ew bê hemdî min e. Apo, ma tu dizanî ku Muhemmed di vî şehrî de tiştêkî nû peyda kiriye ku tu soz û peymanê gelê vî şehrî pê tune ye." Welid: "Muhemmed ne kesek bi şîşên sorkirî dax kiriye, ne jî xanî û zar û zêçên xelkê şewitandine." Ebû Cehîl: "Apo, apo wî tiştên pîstir di vî şehrî de pêk anîne. 1- Temamê kolên me rakirine ser serê me. 2- Temamê gelên bindest jî rakirine ser serê me. 3- Kole û bindest bi îlahên me tinazan dikin. 4- Çavên wan li mal û milk û serweta me ye. 5- Çavên wan li mewqî û meqam û selteneta ku bav û kalên me ji me re milk hiştiye ye, da ku ji me bistînin." digot û weha dewam dikir: "Apo, ma qey tu nizanî ku ew ên ku bûne alîkarê Muhemmed dibêjin: Em jî wekî we ne. tu cûdahî di navbera me de nîne. Mafê ku ji we re heye, ji me re jî gereke hebe." dibêjin Em li cem xuda ji we pir çêtir in. Lat, uzza û Hubel nahebînin û nakin şîrikê xudayê xwe. Dibêjin: "Em ji we qenctir in, hûn sefik û ehmeq in. Wey! ji te re be apo, ger hûn pêşiya van negirin ew dê doza Muhemmed pêş ve bibin. Ew dê Mekê ser û binî hev bikin. Jor bînin jêr,

jêr bibin jor. Hûn dê temamî berjewendiyên xwe bi der bidin. Ew dê mal û milk û mezinatî, şeref û temamî seltenetê, ji we bistînin. Ka bibêje kîjan şer e? Şerîfên Mekê wan kole û sefikên ku terbiye bikin çêtir e. Anku kole û rezilên Mekê di sibehê de bibin mezin, mezin jî bibin kole. wan îlahên me yên ku gelên dinê ji çar alî tîn ziyareta wan a hecê bibin rezil, xelk pê tinazan bike. Na hûn nagihîjin bal wan hêsîran."

Bi kinayî Ebû Cehîl tevli hevalên xwe yên zalim çûn cem hêsîran ew jî zîndanê derxistin dan ber sîngên hespan ezîyet li wan kirin bi rîma li wan dan ser û çavên wan tevda xwîn kirin digotin poşmaniye bi pejirînin emê we berdî lê hêsîran bersîva wan nedidan wê demê Ebû Cehîl hicûm da ser hêsîran û rûyê Yaser digirt kaş dikir rûyê Umar û porê Semiyetoyê di rûçikandin li nav soqaqê Mekê digelandin ezîyet li wan dikirin nişanî insan didan û ew teşhîr dikirin lê hêsîran gotinên xwe kiribûn yek ku zîmanê xwe bi qefilînin tu demê qir nekin êş û jana xwe neynin zimên bi wî awayî dom kirin çûn heya li newalekê rast hatin peya bûn, Ebû Cehîl ji Yaser re got: Tu hîn li ser sonda xwe yî, yan ne. Yaser got: "Pisitiya te em ji sondê dûr kirin" Wê demê de Ebû Cehîl wisa li Yaser da ku ser û çavê wî di xwînê de ma. Di pey re Ebû Cehîl bang li kole û parêzvanên xwe kir û got: "Lan biavêjin erdê û şîşên sor bînin eniya wan rûyê wan û sîngên wan dax kin di pey re bi agirê daran bi kewînin" Wan timên taybetî û cerdevan wilo gotinên wî pêk anîn. Di pey re got, ku: "Kevirên sorkirî bînin bidin ser sîngên wan û avê pêda bikin wana wilo kir di pey van kirinan de Ebû Cehîl guhê xwe da nale nala hêsîran û pê pir kêfxweş bû parêzvan dan ber wan di wî halî de hişt û çû. Wanên bi Yaser re hatin îşkencekirin 1-Suheybê Rûmî kole bû 2-Ebu Fekîh zanîst bû 3-Lebîne 4-Zenîre 5-Nehdiye 6-Ummuebs van tevda carîye bûn 7-Bîlalê Hebeş kole bû 8-Ebuzer 9-Zûbeyrê kurê Ewam vanan tev li malbata Yaser hatin îşkence kirin û ezabdayîne.

Bi rastî dema ku hûkûmranîya dewlemend û şerîfên Mekê didomand di civaka wan de gelek mirovên barbar û bê exlaq hebûn hinek jê diz bûn; wek Ebû Cehîl ku heykeleke xezalan yeke zêr ji xezîna Keebê dizibû. Hinek ji wan xumarbaz bûn, hinek derewker bûn, pîrî wan kedxwar bûn, mafên mirovan nedipejirandin. Hinek ji wan qatîl bûn, hinek li pey alema jinan û şerab vexwerinê bûn. Bi kurtayî, şerîf û dewlemendên Qurêşyan, her yek ji wan xeysetekî wan a pis hebû. Ji vî sedemê, nedixwestin ku doza Hz. Mihemed pêsta here. Dizanibûn dema ku Îslamiyet were, ew dê tev, eyb û xirabiyên wan wê derkevin derve. Ji bo vî yekê bi temamî hêz û zordestiya xwe, li hemberî şoreşa Hz. Mihemed de didan pêş. Yanî berda radibûn.



Lê hema ew eşref û dewlemendên Mekê çiqas zor didan Hz. Mihemed û hevalên wî, wan bêhtir doza xwe bi rê ve dibirin û li berxwe didan. Bi wî awayî kuştin, îşkence, xwîn xwarina Qureyşiyân li Mekê neqediya. Hevalên Hz. Mihemed, di bin barbarî û zordestiya wan de pir zulm dîtin. Qurêşiyân, hêz, quwet û alîkarên xwe tev seferber kirin. Bi şev û roj dewam dikirin. Hevalên Mihemed di xanî û êwirgehên wan de dida ezab. Malên wan tev talan kirin û şewitandin. Zilm û zor roj bi roj pêsta diçû. Wê demê Hz Mihemed bangî hevalên xwe dike û weha dibêje: "Hinek ji we yên ku zêde kifş bûne (deşifre) bila koçber bibin û herin Hebeşistanê."

Li ser vê gotinê, koma pêşin ku koçî Hebeşistanê bû, 12 mêr û 4 jî jin bûn. Van, di pênc saliya hatina pêxemberiyê meha Recebê de koçber bûn. Bi dizîka çûn qeraxê deryayê. Wê demê, gemîke Hebeşistanê hazirbû. Ketin gemiyê û çûn. Qebîla Qurêşiyân her çiqas pey wan ketibin jî, ew neqefilandin. Ewên ku cara pêşin koçî Hebeşistanê bûn, ne tenê feqîr bûn, zengin û serekên qebîlan jî hebûn. Wêk Osmanê kurê Efan ji Emeyyan bû. Zubeyr û Mûsûbê kurê Umeyr ji malbata Hz. Mihemed bûn. Ewdurîmanê kurê Ewf û Ebûbekrê xwedî meqam û mewqî bûn. Lê, ji wanên ku pir hatibûn îşkencekirin, dişa ji neçûn koçberiyê. Wêk Bîlalê Hebeş, umar û Yaserê bavê wî neçûbûn. Baweriya wan pîrî bi dozê zêde bû, bi Hz Mihemed re dixebitîn û li dewsa xwe man. Mirin dane ber çavên xwe, li hember zaliman li berxwedan û bi zimanê hal wiha digotin: "Ew zilma ku me ji we dît, hêsrên ku çavên me barandin dilê me jê rihet e. Lê belê yên biyanî zewqê ji tîrên we nabihîzin."

Koçberên cara pêşin li Hebeşistanê gelek rihet bûbûn. Melîkê Hebeşistanê Necaşî miroveki dilovan bû li koçberan gelekî xwedî derdiket. Rewşa koçberan pîr baş bû. Dema ku rewşa koçberên cara yekem bi ser Hz. Muhammed û hevalên wî yên di Mekê de çû ji boy cara duyem qafilêkî ji hevalên Hz. Muhammed xwe jiboy koçberiyê amade kirin qefla diwemîn ji ya cara yekem pirtir bû. Serokê qafilê Cehferê Birayê Hz. Alî bû. Bi gotina İbnî Huşşam hejmara qafila diwemîn 90 heb bûye. Ji wan 77 mêr, 13 heb jî jin bûne. Koçberên Hebeşistanê bi her du caran hejmara wan ji sedî derbas bûye. Dema ku Qureyşiyân seh kirin bi sedan zêdetir misilman koçber bûne çûne Hebeşistanê û lê temaşe kirin ku rewşa wan a wê derê gelek baş e, tevger û civaka wan pîr pêş ve diçe, Melîkê Hebeşistanê Necaşî jî, ji wan re alîkar e, faşîstên wan rabûn ser xwe civin kirin, biryar dan ku komîtekê daynin, gelek zêr û zîv bikin bin emrê komîtê, û komîtê bişînin Hebeşistanê. Ji bo ku Necaşî û meclîsa li dor wî bi hinek xelat şabaşan bidin guhertin, hevalên Hz. Mihemed ji

Hebeşistanê bidin qewitandinê. Serokatiya wê komîtê ji Abdullahê Kurê Rebîe û Emroyê Kurê Es pêk hatibû. Ev komîte bi xelat û şabşên bi qîmet ketin rê û çûn Hebeşistanê. Dema ku çûn ji ewil ve bi Necaşî, bi ehlê serayê (meclîs) re têkilî çêkirin. Di pey re bi rîcalê rûhanî (oldarên fermî) re hevdiñtin çêkirin. Di dema têkiliyan de, pêşiyê bi navê ziyaretê çûn, dû re ji tevan re xelat û şabaşên bi rûmet birin. Piştî wê, dest bi têkiliyên xwe yên ramyarî kirin weha gotin: "Ev hevalên Mihemed mirovên kêma aqil in; olek teze ji ber xwe derdixin. Mezinatiya ola bavên me înkâr dikin. Ev tev dîr in, canî ne û asî ne. Xwastina me ev e ku em dê serê sibehê bi Necaşî re biaxivin. Hûn jî alîkariya me bikin. Belkî em wan ên ku ji ola bavê xwe derketine ji Hebeşistanê jî biqewitînin. Heya ku ola bavê xwe nas bikin."

Roja din serê sibehê komîte ji aliyê Necaşî ve hat pejirandin. Her du birêveberên komîtê ji Necaşî re ev pêşniyaz birin: "Gerek e ku tu van gunehkaran teslimî netewa ereban bikî." Di wî warî de temamî wezir û mirovên Necaşî yên xwediyê gotinan bûn piştigiriya Qureyşiyân kirin. Lê, Necaşî got: "Gerek ez bi Mihemediyân re biaxivim. Mirovek şand cem wan. Ew anîn, pê re axivî û got: Çewtiya we bi ola xirîstiyanan re û pûtperestiyê re çi ye? û ka ola we çi ye, wî jî bibêjin. Birêveberê qebîla Qureyşiyân birayê Hz. Elî, Hz. Cafer ji Necaşî re got: "Ya Melîk em qewmekî cahîl bûn, me pût diparastin. Me cendekê birayên xwe dixwarin. Her cûrê bê exleqiyê me dikir. Me tim nepakiya cînarên xwe dixwast. Me zilm û zor li birayên xwe yên jî dê û bavekî dikir. Mirovên me yên zordest yên di bin xwe de diqurçandin. Kes li kesî xwedî dernediket. Belengaz di bin piyan de diperçiqin."

Garantiya namûsê di Mekê de tune bû. Zarokên qîz dema ku ji diya xwe dibûn, wan bi saxî dikuştin. Ferman tenê di destê zordestan de bû. Di vê demê de yek ji nav me derket, pîr bi rastî û emîniyatiya wî em beled bûn. Navê wî çawa ku di nav pûtperestan de jî Muhammed E-min e, em jî weha pê bawer in. Wî ji bo îslambûnê bangî me kir. Xweparastina ji pûtan hîni me kir. Xwînrêtin qedexe kir. Rast û durustî nîşanî me da. Dest-dirêjkirina malê sêwî û belengazan ji me re qedexe kir. Em ji nepakî û ziman-dirêjkirina li bal jinan ve dan parastin. Bangî me kir û got Nimêj bikin û zekata xwe bidin feqîran, li feqîrên xwe xwedî derkevin. Wê demê me jî pê bawerî anî. Em niha pîr bi aram û kêfxweş in. Ji bo van yekan, Qureyşî bûn neyarên me. Zilm û îşkence pîr li me kirin ku em poşman bibin. Me Koçberî tercîh kir û em koçber bûn. "Li pey van gotinan Hz. Cafer ji Necaşî re, ji sureyê Meryemî çend ayet xwend. Necaşî ji van ayetan gelek diltenik bû û wiha got: "Ez sond dixwim

ku Kitêba Pîroz û van ayetan ji yek kanîkî ronahî didin. Di pey re Necaşî ji wan zordestên Qureyşiyân re got: "Hûn dikarin bizivirin welatê xwe. Ez van koçberên mezlum teslimî me nakim. Ew li ser rastiyê ne, nebaş û ne pak her hûn in, rabin ji bal min derkevin" got û berî wan da. Demeke kurt koçberan li Hebeşistanê jiyana xwe domandin. Ji nişkêva hate gotin ku Qurêşiyên Mekê tev Misilman bûne. şahî kete nav wan, koçber tev rabûn û pir kêfxweş bûn û ketin rê, ber bi Mekê çûn. Lê dema nêzikî bi Mekê kirin, bihistin ku tişteki wilo tune û ew planeke Qurêşiyân e. Wê demê koçber bûn du alî, aliyek ji wan qiyafetê xwe guhertin û çûn nav Mekê. Aliyê din jî vegeriya Hebeşistanê. Ev bûyer dide zanîn ku dijminê koçberan her gav ji wan re kompo hazir dikirin. Lê belê hevalên Hz Mihemed, doza xwe bi awakî zanistî û siyasî didomandin û nediketin tu dafîkan. Demekê li Hebeşistanê man.

Rewşa Hz Mihemed li Mekê wiha bû: Çiqas mirovên Mekê gazîkir bi bal Îslamiyet û insanîyetê ve dişa ji feyde nekir. Hema wisa bi şîrqîna şûran dihat pêşber kirinê. Di wan demên ku, êdî hevalên wî yên ku koçberî alê Medîne ve bûbûn, bi hêsanî li Medîne dijiyan. Wê demê êdî Mihemed bi nefa xwe bûbû hedefa Qurêşyan tevan. Wî bi serê xwe bi wan re micadele dikir. Ji bo koçberiya xwe li benda destûra Xwedayê xwe bû. Piştî sêzdeh saliya pêxemberiya wî, li pey ku hevalên wî jî, du pay wan koçber bûbûn. Wê gavê Xweda (CC) destura wî ji bo koçberiyê dide. Wê gavê gazi Hz Elî dike û dibêje: "Ya Elî! Tu dê çend rojan li Mekê li dewsa min bimîni. Tu wan emanetên ehlê Mekê yên li cem min teslimî wan bikî." Dema ku Hz Mihemed biryara koçberiya Medîne dide, Hz Ebubekir pê re hevaltiyê dike. Di rêwîtiya wan de gelek teşqele tîr serê wan. Çaxa ku herdu heval dizîkava ketin rê, Muşrîk bi wan hesiyan û dan pey wan. Wan herduyan tu mecal nedîtin, ançax xwe avêtin şikevtê. Wê demê dijmin li derdorên wan diçûn-dihatîn. Nişkêva ricafek dikeve nav dilê Hz Ebubekir û ew ditirse. Dibêje: "Ya Hz Mihemed dijmin pê bi pê nêzikî me ne, wê me bigirin." Hz Muhammed dibêje: "Netirse, netirse li berxwe bide. Em li ser heqiyê ne, Xweda bi me re ye." Wan ev tengasiya çend rojan kişandin. Di pey re gihîştin Qebayê. Ew der sê mil ji Medîne dîr bû. Di berî hatina wan de, hinek hevalên wî jî hatibûn, li wê derê ewiribûn. Alîkaran li wê derê ji wî û hevalên wî gelek hez kirin. Pîr alîkariya wan kirin.

Li Qebayê Benû Kelsûm, Benû Hêdem, Emroyê Kurê Ewf û gelek malbatên ji alîkaran jiyana xwe berdewam dikirin. Koçberan ji ewil ve, li şûna xurmên Benû Kesûmîyan mescîd çêkiribûn. Civaka xwe ji ewil ve li wê kom kirin. Hz. Muhammed doza xwe di wê da anî

zimên. 14 rojan li wê derê sekinîn. Di pey re hereketî Medîne kirin. Dema ku gihîştin nêzikî Medîne derdorê riyân tijî mirov bûn. Kêfxweşiya xwe nişanî wan didan. Malxalanên Hz. Mihemed Benî Necar jî tevî wan bûn. Ji Qebayê heya Medîne gel bi wan re meşiya. Serokên malbatan jê re digotin: "Em bi tevî dê û bavên xwe fedayî te û hevalên te bin ya Mihemed. Va ye li ber we ye xanî û qonaxên me. Mal, milk, rez û canê me tev de ji we re amade ne." Hz. Muhammed ji wan re spas dikir û dimeşiya. Dema ku ket nav Yesribê (Medîne) jin û zarok rabûn ser xaniyan, helbest digotin:

*Hiv li ser çiyayê Wedayê der ket
Şukur li ser me wacib e
Dema gazî xweda bikin gazîker
Çekikan ji bi vî tewrî bang dikirin.
Em çekikên Benî Necar in
Zaf zaf xweş e cîrantiya Muhammed*

Di vê demê de, Ebûbekîr pir kêfxweş bûbû. Gotina ku Hz. Mihemed gotibû: "Li berxwe bidem Piştî tengiyan firehî ne" hat birê.

Koçber dema ku li Medîne êwirîn, li wê jî mescîd dan avakirinê. Di pey re karê Hz. Muhammed yê pêşin bi hev danasîna muhacîr û ensaran bû. Hevalên wî yên ji Mekê pê re hatibûn, ji wan re gotin koçber, ên ku li Medîne niştecih bûn, ji wan re gotin alîkar. Di demek nêzik de biratî di navber koçber û alîkaran de da çêkirin. Koçberên Mekê ji wan gelek dewlemendtir bûn. Lê çî ku ji ber zilm û zorê revîn temamî mal û serweta xwe li Mekê hiştibûn, gelek ihtiyacıyên wan hebûn. Ji ber vê sedemê ji malî alîkaran feyde diditin. Lê tu çaxê destê xwe dirêji kesî nedikirin. Fitre, zekat, sedeqe tu demê nedipejirandin. Dixwestin ku bi keda milê xwe jiyana-xwe bidomînin. Ji ber vê hincetê, Hz. Muhammed ji wan re li çavkaniyên qezencê geriya. Civînek li mala Enesê Kurê Malik li dar xistin. Peyivî û got: "Geli alîkaran, koçber birayên we ne. Îro mêvanên we ne. Divê ku hûn li wan xwedî derkevin. Di qezenc û baziraganiya xwe de wan jî bidin hebitandin. Hem berjewendiyên xwe, hem jî ên wan bidin ber çavên xwe. Bi hevdu re jiyana xwe bidomînin. Ez ji vir pê ve biratiya di nav ber we de îlan dikim." Di pey re ji alîkaran Sadê Kurê Rebî ji koçberan Abdurrahmanê kurê Ewî bi biratî ji xwe re dipeljirîne û dibêje çiqas serweta min heye, ez bi te re nivî dikim. Bi hevaltî û biratî ez û tu em dê bi hev re baziraganiyê bikin. Di pey re Saad bi destê Abdurrahman digire û dibe mala xwe. Wê demê Abdurrahman jê re spas dixe. "Ez tişteki ji mala te daxwaz nakim. Lê qenciya mezin ew e ku, tu riya çûyîn hatina sûkê nişanî min bidî. Hinek metodên baziraganiyê bi min bidî naskirin." Dibêje li pey çend rojan Abdurrahman li sûkê şîr û penîr firot. Wan ên din jî bi keda milê xwe

bazirganî dikirin. Ebûbekîr kinc difirotin. Osman di çarşiyê de xurme difirotin. Omer di navber bajarên de bazirganî dikir. Heya Îranê diçû û dihat. Demek derbas bû, koçberan ew mal erazyên ku ji alîkaran girtibûn paşda dan wan. Di rewşa aborî de, epey bi ser ketibûn. Lê, Hz. Muhammed bi tevî hevalên xwe pêwîstiya wan bi bal gelek mirovên teknîkî, bazirganî, ramyarî û qumandarên artêşê hebû. Bi sedema xebat û têkoşîna.

Hz. Muhammed civak û biratiya di navber koçber û alîkaran de gelek sazî û komîte çêkirin. Wan di navber xwe de organîze pêk dianîn û ji bo her qedemê qadro çêdikirin. Hz. Muhammed cihên girîng nişanî wan dida. Însanên pêkbûyî bi wezîfên girîng wezîfedar dikirin. Di vê dema kin de, rewşa Medîne pir hatibû guhertin. Yekitiya di navbera koçber û alîkaran de bûbû sebaba hezkirina wan. Rewşa aborî û ramyarî pir pêş ve çûbû. Dema ku biratî di nav wan de çêbû, her kesî ji xwe re birayek bijartibû. Brayê alîkar yê koçber di warê aborî de organîze dikir. Yê koçber jî, yê alîkar di warê ramyarî de organîze dikir. Çend heb biratiya koçber û alîkaran weha bû. Bîlalê Hebeş û Ebû Redîhe; Selmanê Farisî û Ebû Derda; Omerê Kurê Yaser û Uzeyfê Kurê Yamanî û hwd. Bi hev û din re yekitiya olî, ramyarî û aborî didomandin. Di Medîne de grûbek gelek mezin hebû, tim Qureysiyên Mekê bi wan re têkilî datanîn. Dijberî û nepakiya xwe bi alîkariya wan didan kirinê. Wan grûban tim xusûmet, suîqest û cûrên din ên xerabiyê li dar dixistin. Piştî ku misilman koçberî Medîne bûn Qureysiyên Mekê ji bo hukumraniya ereban di Medîne de bê îlan kirinê ji Ebdullahê Kurê Ubeyo re nameke şandin. *Her tişt gereke di seroktiya erebên Medîne de bê kirin. Em dibihîsin ku hûn alîkariya wan qaçaxên me dikin. Em sond dixwin, ya hûn dê ewil Muhammed bikujin, yan jî hûn dê ji nav xwe derxînin. Ger hûn wilo nekin, em dê bi we re şer bikin, heya ku temamî cengawerên we bikujin û temamî jinên we têkin dest xwe.* Hz. Muhammed pê gumana bû û çû cem Abdullaha, jê re got: "Ger tu xwastina Qureysiyên bipejirînî, ez û hevalên xwe, em dê li hemberî we derbikevin û bi we re têbikoşin." Ebdullah fam kir û got ku: "Ez gotina Qureysiyân napejirînim."

Bûyerên ku li Medîne bûn, tezgahên ji terefê Qureysiyên Mekê ve hatin li darxistinê pir bûn. Lê, pêwîst e ku em bi kurtî bibêjin ku Hz. Mihemed bi tevahî hevalên xwe bi terzek sistematîk xebitî, şoreşa xwe tim dianî ber çavên xwe û ji bo fetha Mekê plan û proje amade dikirin. Civak û cemaeta xwe bi nihêrîna li bal mekê ve dida zexmkirinê. Tim ji heval alîkerên xwe re digot ku: "Pêwîst e ku hûn her tim nimêjen xwe bi cemaetî bikin ji bo ku hûn pêwîstiyên xwe yên aborî, ramyarî û olî bi hev û din bidin za-

nîn, di wan waran de hûn hev û din re bibin alîkar. Hem ji bo pêwîstiya ku koçber dîsa vegezin warê xwe, divê ku komel û civakên me her tim zexm bin, em tim werin cem hev, hedefa me fetha Mekê be."

Di sala diwemîn a salvegera koçberiyê de du heb tiştên girîng di navbera Hz. Mihemed û hevalên wî yên koçber de hat pejirandin.

1- Misilman êdî dikarin şûrê xwe bikîşînin

2- Guhertina qiblê: Di vê mijarê de di Pirtûka Esra Saedetê de bi zimanê Osmanî weha hatiye zimên: "Temamî zûmrên bi civak, temamê netewan, temamê olan, her yek bi taybetiya xwe şî-arek wan heye; ew netewe û ola bê şîar serbixwe nîne. Şîara îslamiyetê bi taybetî qible ye. Qible gelek tiştan tîne zimên; yekitî, wekhevî û rihê komel û netewan di yek xalek dîtîne de dide nişan. Di dema nimêjê de bi hezaran însan mil didin hev, ji bo ola xwe û ji bo netewa xwe li hedefekê dinihêrin." Dema ku mirov têkoşîna ola îslamê baş bixwîne, li ser baş lêkolînan bike, wê çaxê rewşa têkoşîna netewan, girîngiya yekitiya wan ka çî ye, baş tê famkirin û wê çaxê mirov baş dizane ku doza têkoşîna netewa parçeki pir girîng e ji têkoşîna olî ye. Minak li ber çav e. 4- Dema ku Hz. Mihemed tevî hevalên xwe têkoşîna şoreşa îslamê di Mekê de dikirin, pir hatin îşkencekirinê. Rewşa wan wilo xirab bû ku êdî nikaribûn li Mekê bisekinin, wê çaxê Hz. Mihemed ji bo koçberiyê bangî wan kir. Cara yekem li Hebeşîstanê, cara diwemîn, dîsa li Hebeşîstanê. Bi dû re jî, ji bo koçberiya Medîne bang kir. Hevalên wî tim bi hesreta Mekê bûn. Bi hesreta cih û warê xwe bûn. Tim destên xwe bilind dikirin, berjorî xwedê dibûn. Berê wan tim li Mekê bû. Di pêşniyazên xwe de tim digotin: "Ya rebbî, tu me bi saxî bigihîni ser cih û warê me. Mafê me yê ku ji me hatiye standin, bi alîkariya xwe tu me bigihîniyê. Ya rebbî, tu me li xerîbiyê nekuji. Em serxwebûn û serfiraziyê ji te dixwazin." Daxwaza Hz. Mihemed jî, tim ketina Mekê bû. Çûyîna bal warê bav û kalikê wî Hz. Îbrahîm bû. Ev daxwaz tim ji xeyalên wan dernediket. Di pey van daxwaziyan de Xwedayê dilovan ayet jê re şand ku êdî qibla wan bibe mescîta Mekê. Li ser vê jî ayet hat. Di sureya Beqere ayeta 144 an xwedayê mezin weha ferman dixe: "Tu berê xwe bizivirîne bi aliyê Mescîda Heremê ye Ya Muhammed. Hûn li ku derê dibin berê xwe bidin wî alî da." Ev ayeta pîroz mizgînî bû ji bo serkeftina wan. Pir kêfxweş bûn û baş dizanibûn ku ew dê di doza xwe de pêş ve herin, ew dê şoreşa xwe pêş ve bibin. Di dema guhertina qiblê de, êdî meke bi hevalê Hz. Mihemed bêtir şêrîn bû. Bi vê sedemê jî, bi rewşek girîngtir şoreşa xwe berdewam kir.

Dem hatin borîn, têkoşîna koçberan berdewam bû. Her tim çavên wan li çûyîna Mekê û fetha Mekê bû. Armanca Hz. Mihemed Kaba ku Bavê wî Hz İbrahim ava kiribû gerek ji pûtan bida pak kirinê, îbadetên xwedayê xwe tê de bikira. Ew kedxwar û faşîstên Mekê bidaya îslahkirinê. Ji bo ku ew kole û feqîrên Mekê bigihîjin maf û azadî û serfiraziya xwe ji xwe re peywirek pir girîng didît, tim lê difikirî û bi taybetî biryar da ku ew dê herin ser Mekê ku fetih bikin.

Sala 8ê Hicretê meha Rojîyê, 630ê zayînê (mîladê), Kanuna Dudan biryar hate dayin ku herin ser Mekê. Ew artêşa ku Hz Mihemed jî bi wan re çû, hejmara wan 10 hezar kes bûn. Heya ku çûn, konaxek mabû bigihîjin Mekê, bi tev bûna gelek mirovên eşiran hejmar zêdetir bû. Artêş li wir êwirandin. Dû re Ebû Sufyan û hinek hevalên wî, bi casusî hatibûn ku rewşa artêşê hîn bin. Lê hema parêzvanên misilmanan Ebû Sufyan naskirin û girtin anîn cem Hz Mihemed. Wî emir kir ku Ebû Sufyan bibin ser girekî bilind ku rewşa artêşa İslamê bibîne. Dema ew birin, wî artêş bi hêz û hunereke mezîna dît û wê gavê bû misilman. Demek paşê, Hz Mihemed bi wan hevalên koçber re, ew daxwaz û hesretên xwe yê bi salan ku di dilê xwe de êwirandibûn bi cih anîn û Meke fetih kirin. Temamiya xwestek û niyazên xwe pêk anin.

Li pey fetha Mekê Hz Mihemed xutbeke xwend: "Hey Gelê Mekê! Hûn pir rind bizanibin ku ji bilî Xwedayê ku erd û aşîman çêkiriye tu reb tunîne. Di Xwedatiyê de, tu heval û alîkarên wî tunîne. Ew peymana ku dabû pêk anî. Alîkariya ebdên xwe kir. Wan dijminên ku li hember me gelek kîn û haset civandibûn, tev bin ve kirin. Temamî dozên mêr kuştin û yê aborî di bin lingê min de bûn. Gelî Qureyşîyan! Xwedayê mezîna xeysetê we yê cahilî bi İslamiyê guhert. Hûn tev wekhev in, mirov tev jî dê û bavekî ne, tev ji Adem in û Adem jî, ji xweliyê yê." Piştra ev ayeta pîroz xwend: "Gelî insanan, me hun ji mêr û jinek çêkirine. Me hûn gerandine bi êl û eşîr ji bo ku baştir hev binasin. Bi taybetî qencê we yê herî mezîna li cem Xweda, ew" ên ku xwe ji nepakiyan diparêze.

Di xutbê de, gelek xalên girîng hene, lê bi kinayi wiha nin:

1- Doza mêr kuştinê di bin lingên min de ne. Yanî temamî mêr kuştinê di dema cahiliyê de êdî xeysetek nebaş bû. Dijminatiyek gelek nepak bû. Dijminatiyê heta kurê kuran dikişand. Ji bo vê, min ew da bin piyê xwe. Hûn tev li hev biborin. Ji vir pê de İslamiyê hinek rêzikan bîne.

Mijara aborî jî wek ya mêr kuştinê ku di dema cahiliyê de bi cureyên listik û xumarê, insanan di warê aborî de bi hev re kar kiribûn û hinek ji wan ketibûn bin deynên mezîna. Ji ber ku bê dadî bû, Wî

got ew jî, li bin piyê min bin, yanî li hev rûnên İslamiyê di wî warê de jî rêzname bîne.

3- Ji xutba Hz Mihemed tişt girîngtirin ew e ku xutbexwendin di nav wan eşref û dewlemendên Qureyşîyan de wiha tîne ziman: Gelî eşref, mezin û dewlemendên Mekê! Hûn jî vê pê de, êdî xwe bilind nebînin. Xwe li ser mirovên din mezin, xwedîrûmet û bi qîmet nebînin. İnsan bi mal, milk, serwet û rewşa aborî xwedî rûmet û qîmet nabin. Lê mezinatiya insanan bi xwe nizmkirina jî insanan re ye û bi dayîna mafên mirovan çêdibe.


Di deverên dinyayê yê din de jî wek Cezîra Ereban çînayê di holê de bû. Gelek eşîr û qebile bi hev ve girêdayî bûn. Xwe li ser wan ên din mezin dikirin. Şeref rûmet didan xwe. Ew ên li hemberî xwe bi cûreyên xirabiyê nepak dikirin. Bi hêz û giraniyên xwe yê serdest ew di bin xwe de di perçiqandin. Ji xwe re didan xebitandin. Mafên wan dixwarin. Ew di dewsa insanan de

nedipejirandin. Çawa ku tê zanîn di navber hîndûyan de çar hep çîn hebûn. Yek ji wan bi navê şûdra ye. Hîndû bi cûdahî wek heywanan li wan mêze dikin. Qebîla ku navê wan Brahem in şûdra di çavê wan de ji heywanan pîstir in. Tu mafekî jiyan û insanîyê ji wan re nas nakin. Ev rewşa han bêtir li Cezîra Ereban hebû. Bi teybetî li Mekê zêdetir bû.

Ji dawiya xutbê ev dihat famkirin; qencî, başî, mezinatî, rûmet, şeref bi tenê bi yekitiyê, bi wekhevîyê çêdibe. Ereba- Ecem, zengîn-feqîr, reş-spî, azad û kole tev yek in.

Dema ku şerîfên Mekê ev xutbe ji Hz. Mihemed seh kirin, di dilê xwe de pir qehirîn. Dît ku ew poza wan a berê li cem wan nemabû. Hew dikaribûn dengên xwe derînin. Bi made û mirûzê pis berê xwe dan malê xwe çûn.

Rewşa misilmanan weha bû. Ji ewil ve bi bîr û baweriyek pir mezîna dest bi têkoşîna xwe kirin. Di îşkencê de li ber xwe dan. Bi zor hatin koçberkirin. Ji bo



vegera welatê xwe têkoşnek pir rind dan, Meke feth kirin. Bi ser ketin. Ev rewşa wan bi bawerî di pey Hz. Mihemed de bi qendî sî salî dewam kir. Lê mixabîn di pey re bû seltenet, li ser rewşa xwe ya berê nema. Îro jî rewş malûm e.

Di dîrokê de gelek pêxemberên din jî, ji destê zilm û zora qewm û malbatên xwe koçber bûne çûne bal deverên dinê yên cûrbecûr. Wek Hz Îbrahîm, Hz. Lût, Hz. Mûsa û gelekên din jî. Çi ku mijara koçberiya wan gelek fireh e, di vir de îmkana belavkirinê nabe û nayê nivîsîn.

Pêwîst e ku koçberiya van salên dawiyê ku kurd pê hatine ezêbdayîne bibe mijara nivîsê. Ji ber vî qasî, ew koçberiya piştî destpêka Komara Tirk heya îro ku di Kurdistanê de Kurd pê jiyane û derbeder bûne, çûne metropolan û Ewropayê pêwîst e ku bê zimên.

Pirtûka Dr. Belec Şerko ku navê wê Pirsgirêka Kurd (Qediyetul Kurd) bi navê sergotara Koçberiya bi zor û

Qirkirin divê agirê cemaeta kurda ye ku di sala 1925an de vêketibû, tirkan digotin Me ew temirandiyê. Ji cemaeta xwe re jî tim weha didan xwiyakirin. Di pey re, biryara qirkirina kurdan bi hinek metodan û bi riyên cûda dan.

Meha berafanbar û rêbandanê di Kurdistanê de, ser ber bi jêr dikeve 30 û 40 derecan. Gelo bi zorê koçberkirina kurdan di van mehan de, wata wê çi ye? Bi taybetî tirkan dizanibû ku ji Bazîdê bi hezaran mirov di dema çele de bi zor bête koçberkirin, herin rojavayê Tirkîyê, bajarê İzmirê, bi taybetî ew dê gelek mirov jê bimirin.

Tirkan wê salê koçberiya fermî bi cih anîn. Gelek zarok û kal û pîr bi rê de ji serma û ji birçîbûna telef bûn. Wan kurdên ku bi awayekî fermî biryara koçberiya wan nehatibû dayîn, ew jî bûn hedefa top û tîfîng û balafirên dewleta tirk. Ew jî, ji destê zilm û zor û talankirin û malşewitandina eskerên Romê revîyan çûn metropolan. Li wan deran jî ketin bin destê dewlemend û

wezîfedarên wan. Herçî tiştên di dest wan de hebû, ji pere û ji tiştên bi qîmet ew jî ji koçberên kurdan standin. Feqîrî û xizaniya kurdan li wan dera ji Kurdistanê bêtir bû. Ew li metropolan bêtir belengaz bûbûn. Mêrê 25 malbatan ji kurdên wî bajari ku di bakurê derya Wanê de cih digire ji destê zilm û zora tirkan revîyan bi çîyan ketin. Esker û wezîfedaran hucumdan ser jin û zarokan, bi temamî qir kirin, nehiştin koçber bibin. Di sala 1927an de Mustafa Beg, pêşevanê Firka 41î ya eskerê tirk rabû temamê gundên Dara Hênê kirin mahserê. Bi top û tîfîngan bi balafirên bombe kirin. Yê ku hatin kuştin, yê din jî her yek bi aliyekî ve revîyan, koçber bûn.

Di vê salê de, bi vî terzî, li Erxeniyê û gundên Erxeniyê jî kirin. Di van hereketan de zarok û kal û pîran nesibên xwe jê zêdetir hildidan. Di van deverên ku em jê axivîn de 430 gundên avakirî hatin xirabkirin. Ew gundên ku binecihên wan kurd bûn, bi ecêb 50 heb mirov ji top û fîrokan xelas bûbûn. Eskerê tirk bi şîşikên tîfîngan zikê zarokan diqelaştin û diavêtin nav êgir.

Bûyerên îşkencê pir bûn. Yek ji wan ev bû; serokê eskeriya siwarî Begbaşî Haydar Beg avêt ser bajarê Erxenî û Madenê bi şikberiya kurdayetiyê mirov girtin. Ji wan Yûsûf Efendî, Abdurrahman Efendî, Mistefa Efendî û hinekên din dan ber singên hespan, birin. Bi qendî mehekê, ew bi xwe re gerandin. Bi lêdan û her tewrên ezêbdayîne pê îşkencekirin. Li her êwirgehekê, bi şev her yekî ji wan sî heb dar an jî jop li wan didan. Xwarin û vexwarin bi hindikayî didan wan. Heya mehek temam bû, di pey re emr kir ew bi ezabên cûrbecûr kuştin.

Hejamara wan însanên ku di vê demê de koçber bûbûn bi zor û îşkencê ji pongala xwe hatibûn qetandin, ji warê xwe raşehitbûn milyon û hinek bû. Lê belê wan koçberên ku bi zor li metropolan hatibûn bi cihkirinê hejmarek fermî di dest me de tune ye. Lê em rind dizanin ku di dema koçberiyê de bi rê de gelek mirov ji destê serma û êş û nexweşiyê hinek ji lêdana singû û şîşikên tîfîngên eskeran mirin. Ev hejmar pir bû.

Nivîskarê pirtûkê bi kurtahî weha dibêje: Tirkan ew terzên îşkence û mezîlmê ku di şerê Cihanê ya Ewil de li ermenyan kiribû bo temamî ew metodên îşkence û koçberiyê li ser kurdan jî dan meşandinê.

Ew cetwela ku Dr. Şerko di pirtûka xwe de bi kar aniye, di wê de devera Licê, Dara Hênê, Erdîşê, Çepexçûr, Nisêbîn, Hebab, Elyan, Mîdyad, Bacerîn, Kerboran, Hesenkeyf, Diyarbekir, Genc û ew ên din 8757 kuştî, 15206 xanî mal şewitîne.

Lê di Kurdistanê de bi hezaran şewat û koçberî çêbûne qed hejmarê wan



nehatiye tesbîtkirin. Di dema ku em pîvanekê di navbera hinek büyeran de çê bikin ew derkeve holê ku di dîroka 1925 û heya 1928an bi milyonan kurd bi destê zorê hatine koçberkirin û kuştin.

Bi kinayî dewleta tirk bi gelek metodên xapînok gelek zagonên koçberiyê derxistin (Tehcir Kanunları). Bi van zagonên ne li rê, kurd koçberî metropolan kirin.

Bi rastî aramanc bi koçberiyê qirkirina kurdan bû. Ev tiştekî li ber çavan e ku kurd di rê de zivistanê ji destê sermayê, havînê jî ji destê germê bi hezaran qir bûn. Ew ên din jî derece, derece li metropolan telef bûn. Gelek ji wan jî heliyay û wenda bûn.

Di pey van zagonên koçberiyê re di sala 1950î de demokrat Partiyê dest pê kir. Ji ewil ve DP yê dîn îstîsmar kir. Çar salên ewilîn li gor tebaqa gelê saf îdara DPyê rind derbas bû. Lê di demên dawîn de serokwezîrê dewletê bi wezîrên li dor xwe ketin qirêjîyê gelek nepak. Dizî, kedxwariya belengazan rişwet, pêşqitandina mirovan û bi xwarina malê xezîne ketibû nav astengekî mezin. Artêşa tirk dest da ser hikumetê û xirab kir. Gelek ji wan girtin birin Yassi Adayê. Serok wezîr û du wezîrên wî bi darda kir. Lê ev tiştekî pir balkêş e ku yê nesibê xwe jî koçberiyê hildan bi piranî kurd bûn. Hejmarek hindik jî karker û xwendevanên tirk bûn. Di vê koçberiyê de zagonên fermî nehatin xebitandin. Bi piranî mirovên xort û xwendevan revîn metropol û derveyî welêt. Hinek malbatên kurdan jî bi temamî revîn li metropolan bi cih bûn.

Di dema 1980 yî de ku artêşa tirk hukumeta Demirel wergerand di wê de jî dîsa kurdan bi piranî nesibê xwe jî girtin. Vê carê jî koçberî fermî nebû. Lê gelek ciwan û xwendevanên kurdan di vê demê de, ji destê zilm û zorê reviyar Ewropayê. Koçberiya Ewropayê dewam kir qed nesekinî. Bişavtina kurdan, di Ewropayê de, ji ya metropolan bêtir bû. Ew xort û ciwanên kurd ên delal, ew ên ku xwedî bîr û baweriyên qenc bûn dema ku çûn Ewropayê hinek ji wan mixabin heliyan.

Komara tirk di pey derba 1980yî de du salan di destê artêşê de ma. Di pey re artêşê kiras guhert. Ji bo ku xwe di nav civak komelên dinê de bide pejirandin hilbijartin çêkir. Kenan Evren bû serokkomar. Bi navê demokrasîyê ketin rê. Bi dewletên derve re ketin tîkiliyan. Rewşa xwe pir baş didan xwiyakirin. Temamî medyayê jî bo berjewendiyên xwe didan xebitandinê. Ji bo avakirina xezîne, bi hinek lava û metodên xapînok ketin pey dewletên dinyayê.

Di pey derba 1980 yî de xebatkar û xwendevanên ji bo rewşa aborî û siyasî weha gotin: "Ev demokrasîya Komara Tirk tim tîne zimên, pêwîst e ku em jî berjewendiyên xwe di bin vê

demokrasîyê de bi cih bînin. Karkerên tirkan ên ku senadîkayî ne, wan jî hinek maf ji xwe re xwastin. Kurdan jî, ji bo xwe mafên xwe yê netewî û çandî xwastin. Dema ku Komara Tirk bi van tiştan hesiya, gelek zagonên xwe guhertin.

Di dema derbê de gelek xalên zagona 1961î guhertibûn. Di vê demê de, pir zû zagona Herêma Waliyê Awarde anîn holê. Naveroka zagonê kifş bû. Ev zagon bi temamî ji bo kurdan hatibû çêkirin û li ser kurdan dihat meşandin. Komara Tirk temamî raye û selahiyeta xwe da waliyê herêmê. Bi van selahiyetan tîmên taybetî û cerdevaniya gundan hat holê. Bi van saziyan re cerd û terora li ser gelê kurd zêdetir bû.

Bi rastî xwastina kurdan wekî her demokrasîyê dîsa bi riyên demokratîk û siyasî çareserkirina pîrsgirêkê bû. Lê Komara Tirk jî wekî her carê dîsa, bi riyên leşkerî û hêzên xwe yê qirker êriş ser gel kirin. Hemî awayên îşkence li ser girsên gundî û bajariyên kurd bi karanîn. Bi awakî girseyî bi taybetî ev îşkence li gundiyan kurd ên tevî jin, kal, pîr, zarokan dikirin. Li gundekî Cizîra Botan kumandanekî leşkerê ku bi gundiyan gû dabû xwarin, rutba wî hat mezin kirin û bi vî awayî ha mukafat kirin. Bi navê ceza jî tenê cihê wî guhertin. Li gundê Vartinîsê ku li ser bajarê Mûşê ye, di sala 1993an de minakekî din ê hovitiyê pêk hat. Leşker diçe gund dişewitîne. Di xaniyekî de 7 mirovî dişewitînin. Di wê demê de zarokê 6-7 salî derdikeve ber pacê ku xwe biavêje der. Leşker bi qondaxên tîfingên xwe lê didin, bi milê wê digirin diavêjin nav êgir. Bi dehan gundî bi şev û rojan li ser berfê îşkence dîtin. Gelekên wan hatin kuştin. Dest avêtin namûsa wan. Ev çend minak ji hezaran minakên hovitiyê yê li ser gelê kurd hatine bikaranîn û hêj dewam dikin tenê çend hej in. Ji bo ku gundî ji gundên xwe koç bibin, bi vî jî nesekinîn gundên wan şewitandin. Derdora gundên wan mayin kirin. Derketin û ketina nav gud bi destûra qereqolan ve hat girêdan. Li ser xwarina wan ambargo hat danîn. Ev kirin bi temamî îro hêj bi awayên xedar-tir dewam dikin. Bi vî awayî bi milyonan kurd ji warê xwe derbeder bûn.

Kurdên ku kêm zêde derfetên wan hebûn reviyar metropolên Tirkiyê. Girsên derbederên kurd bi piranî li Eden, Mersîn, Stenbol, İzmir û li herêmên cûr bi cûr ên Tirkiyê belav bûn. Rewşa kurdan a li metropolan zaf nexweş e. Dema ku koçber dibin tîm bi rojan malên wan li ser qamyonan dimîne. Xanî bi dest wan nakevin. Gelek ji wan jî bi mehan di çadîran de dijîn. Li hinek deveran gelek malbat mejbûr dimînin ku di xaniyekî de bi hev re bijîn. Rewşa wan a aborî zaf ne baş e. Di mehê de 9-10 rojan kar dibînin, 20 rojan betal dimînin. Ji %80 dixwaze

ku şertên li welêt baş bibin û hema vegerin gundên xwe. Zarokên wan ên piçûk tev bi helbesta **kulîlkên welat sor bûn** radîzên û şiyar dibin.

Li gor qeydên İHD û HADEP'ê ji 1990î vir de 3000 gund hatine şewitandin, 3000 000 însan koçber bûne. Li gor hinek çavkaniyên din ev hejmar zêdetir e. Di vî warî de ne saziyekê ne jî kesekî lîkolînek tîkûs nekiriye.

Ji bilî koçberiya ber bi metropolên Tirkiyê, 16 000 mirov koçberî Başûrê Kurdistanê bûn. Ev mirov niha li Kampa Ertüşê dimînin. Jiyan wan jî di bin zilm û zorê de didome.

Di derheqê kurdên ku koçberî Ewropaya û hinek deverên din ên dinyayê bûne de, li ser hejmara wan tu tesbîtek tîkûs tune ye. Lê wisa tê xwiyakirin ku bi milyonan kurd koçberî welatên cûr bi cûr bûne. Bi piranî koçberî Almanyayê bûne. Ji dewleta alman re gelek xebitîne. Di pey re hinek mafên xwe yê însanî xwastine. Di vê demê de bi tîkiliya dewleta tirk û almanan gelek sazî û rêxistinên kurdan qedexa kirin. Lê, kurdên Almanyayê di warê civakî de gihîştî ne. Li hember zilm û zorê derdikevin û mafên xwe baş diparêzin.

Rewşa koçberan ya li metropolên Tirkiyê de ne baş e. Tîkiliyên wan bi hev re tune ye. Saziyek di warê aborî de di nav koçberan de nehatiye saz kirinê. Kurdên ku rewşa wan a aborî baş e, ew jî di vî warî de tu grêdayînekê çênakin.

Rewşa koçberan a siyasî hinek pak e. Dem bi dem pêş ve diçe. Di vî warî de tîkiliyên zaftir bi HADEP ê re çêdibe. Çiqas girevên birçîbûnê, şahî û pîroz kirin çê dibin bi kîf û şahî diçin temama wan.

Lê, heya îro tu saziyekê li gor pêwîstiya koçberan û ji bo vegera wan a welêt alîkar nebûne.

Di pey van gotinan re, pêwîst e ku koçberên kurdan ji bo vegera welatê xwe, xwe amade bikin. Pêwîst e, li metropolên Tirkiyê bîm cem hev, sazî û rêxistinên pêk bînin. Li der û dora saziyên heyî jî bicivin. Bi kurdên li derveyî Tirkiyê re tîkiliyan çêbikin. Ji bo vegera welêt divê kurdên Ewropayê li koçberên metropolan xwedî derbikêvin. Divê bi taybetî sazî û rêxistinên kurdan li pîrsgirêkên koçberan xwedî derbikêvin.

Ji bo ku pîrsgirêka kurdên koçber ên li Tirkiyê çareser bibê divê, dewleta tirk guh bide bangên aşîtiyê û di vî warî de dereng nemîne.

ÇAVKANÎ

- 1- Tarîxa İbnû Huşam
- 2- Tarîxa Teberî
- 3- Esra Seadet
- 4- Qediyeul Kurd
- 5- Wedûl Haq

Warê mirov ku der e?

Kuyaş ÖRS

Bilim ve Teknik

Hejmar: 338 / Ji tirkî werger: M.Ali

Li Çînê, di derbarê guherîna çebûna mirov de nîşanên nû; warê mirov ku der e? Cara pêşîn mirov li ku çêbûye û li ku guheriye?

Îro ji alê zanyaran ve wisa tê zanîn ku cihê çêbûn û guherîna (evolution/evrim) mirov Afrîka ye. Li Kenyayê rastî homînîdên (proto mirovê pêşîn) kevntirîn hatiye, dema ku meşiyaye her du piyên xwe xebitandine, ev tiştekî ku cara pêşîn hatiye zanîn e. Li Etiopyayê wersela (sikelet) Lucy (australopithecus aferensisek) hatiye dîtin ku hinekî ji australopithecus anamesis 4.1 milyon salî piçûktir e. Lêgeran ew zanîn û nîşan gelek nixandine û gihîştine hinek encam (dawî) ên texmînî. Anegorî van texmînan nêzikî du milyon û nîv sal berê, ew ê ku pêşiya mirov tê zanîn (australopithecus) bûye wek momo (protomirov). Zanyar li ser ve yekê hemfikir in. Qebul dikin ku heta du milyon û nîv sal berê, homo derketiye. Homo habilis, ji cinsê homo endamê pêşîn e. Taybetiya vî jî, hewqasî xwedî mejîkî mezintir nîn e. Yanî ne tenê xwedî mejîkî mezintir e; ew êdî dikare pergelan (halet) çêke û bixebitîne. Dixwiye ku guheriye (evolution derbas kiriye) û ji bavê xwe pêşde çûye. Ev hominîdê pêşîn e. 2 milyon sal berê jî homo erectus derket ku mejiye wî êdî mezîn bû. Fikra ku heta niha derbas dibe ew homo erectusê ku mejî mezintir û dikaribû halet çêkera (wekok: bivirên dualî çêtir û hwd.) ji Afrîkayê li dinê belav dibe. Bingeha vê teoriya jî ew e ku, belavbûnên dûr û dirêj ancax bi van taybetiyan pêk tên. Yanî ancax bi van taybetiyan mirov dikare bibêje wiha bûye. Bi awakî din jî, mirov dikare bibêje; ew mirovê (homonoid) ku cara pêşîn li Afrîkayê çêbûye, hewce bû li ciyê çêbûna xwe bimîne li wir bişide û zexm be ku karibe li dinê belav bibe li ciyekî biêwîre. Afrîka ji bo vî protomirovî (yanî van proto mirovan) dergûş bû. Çawa ku zarokê heta dişide givrik dibe û bi çalepîka diçe hewceyî dergûşê ye, ew jî wisa hewceyî Afrîkayê bû. Çima ku Afrîka dergûşa wî (wan) bû.

Di zanîne de gelek tişt peşde çûn. Van, hinek pirs di derbarê vê demajoya

guherîni de derxist. Fosîla australopithecusekî 3-3, 5000 000 salî li Çadê tê dîtin. Vê yekê, ew kesên digotin homînîdan (proto mirov) guherîna xwe a pêşîn li rojhilatê Afrîkayê qedandine şaş hiştin. Li ser vê, tiştê girîng ew e ku ev çirokek tevlihev e. Wekî din dîrahîya di navbera cihê Lucy û Çadê (cihê ku lê nû tişt derketine) de jî 5400 km. ye. Lê tevlihevî girîngtir e. Anegorî teoriya berê Afrîka navenda protomirovan bû. Par, li Jawa û Gurcîstanê lêgerîn tên kirin. Van lêgerînan daye nîşan ku, tiştên li vir derketine û hatine zanîn gelsên teoriya Afrîkayê hene. Zanînen nû xizmeta teoriya Afrîka navenda protomirovan e, nake. Anegorî teoriya Afrîkayê milyonek sal berê proto mirov ji Afrîkayê li dinyayê belav bûye. Lê, lêgerîn û lêkolînên ku li Gurcîstan û Jawayê çêbûne didin xwiyakirin ku 1.8 milyon sal berê homo erectus (protomirov) li van deran hebûye. Ev 800 sal ferq (xarîn) ji gelşek dîrokdanîne zêdetir, dibe ku hinek tiştên din kifş dike, grîngtir bû.

Encama lêgerînek nû weşiya (11.1995) ku ev mînaqêşe girantir kir û hinek aliyên nû jî tev kir. Komek zanyarên rojavayî û Çînî, li navenda Çînê li ser homoyan bi hinek metodên dîrokî lêgerînek çêkirine. Ji haletên destpêkî jî feyde hildane. Yanî xebata xwe anegorî van haletan (ew haletên ku homoyan xebitandine) jî kirine, dêhna xwe dane van jî. Bi vê riyê, pê derxistine ku homoyên pêşîn 1.7-1.9 milyon sal berê hatine navenda Çînê. Ev zanyar, bi vê teoriya xwe destekiya teoriya 800 sal xarîniyê dikin. Anegorî van zanyaran wekî ku tê zanîn ne homo erectus e ku ji Afrîkayê derketiye û li dinê belav bûye. Ew dibêjin yê Afrîkayê berî homo erectus hebûye û ji ber ku berê jiyaye jî, êdî qelstir bûye, êdî nezantir bûye, êdî paşdemayîtir bûye, ji nifşek wisa bûye. Tiştên ku heta niha tên zanîn, ji alî anatomiyê ve guherîna homînîd ji ya homo erectus paşdemayîtir e. Haletên ku homînîd xebitandiye jî, dişibe haletên berî haletên ku homoerectusên Afrîkayê xebitandine. Encama ku ji vê der tê, teoriya koma zanyarên Çînî û rojhilatî destek dike. Yanî anegorî vê destekiye homo erectus ne li Afrîkayê, li Asyayê guheriye. Bi awakî din jî, mirov dikane bibêje, homoerectus endamêkî ji mabata mirovên hemdem ên Afrîkî zêdetir, dibe ku ji pêş-homînîdekî Asyayê çêbû-

be. Li ser van teoriyan gelek şîrove hene. Tê gotin ku ev zanîn bi destekên nû hêj neciviyane û nebûne yek. Hêj nebûne teoriyek bingehîn ku piraniya zanyaran bipejirînin. Lê dikanin teoriya ku heta niha dihat pejirandin û hêj niha jî derbas dibe, bihêjînin û zededar bikin.

Di sala 1980 an de, du pisporên Enstituya Paleontolojiyê û Paleoantropolojiyê Huang Wanpo û Gû Yûmîng li herêma Çînê Sîşuanê lêgerîn kirine û gihîştine vê teoriyê. Paşê jî, ji Unîversîta Iowa Russel Ciochon tevî vê xebata zanistî dibe. Ev xebata kolektîf wisa dikîşîne. Lê heta 11.1995 an kes bi van xebatan nahese. Paşê, yanê di 11.1995 an de zanyar pê dihesin. Kolanên ku li şikefta Longgupo tên kirin gelek tiştan diyar dike. Li vê şikeftê gelek hestî; du haletên kevir, didanekî tûj ê çena jor û parçekî çeneke dudidanî yên homînîdan tên dîtin.

Zanyarên Çînî berî her tiştî metodên nû û zanistî xebitandine. Metodeke wan ew e ku, warê manyetîka dinyayê ya kevn ku li ser rûyên fosîl şan rêçek hiştiye analîz kirine. Bi vî metodî gihîştine gelek destekan. Warmanyetîk her dem ne wek hev e. Di demajoyê de berê xwe diguherîne. Xebatên li ser vê guherîne dane nîşan ku ev hestî û ên din (tiştên hatine dîtin) 1.77 milyon û 1.95 milyon salî ne. Paşê, dîsa di vê şikeftê de, rastî hestiyên pezkoviyekê tên. Li ser hestiyên vê pezkoviyê metodek din dixebitînin (Electron Spin Resonance). Ev metodek dîrokdanîne ye. Wê metodê jî daye nîşan ku hestiyên vê sewalê ji 750 hezar salî kêmîtir nabe, lê nêzikî milyonek salî ye. Wekî din jî, girîngiya fosîlan; ji kevntiya wan zêdetir, li ser şeklên wan e. Şeklekî pir paşdemayî ye. Anegorî Ciochan, girçikên didanên duşax yên ku kursiyên mezîn û piçûk (didanên kursî) dişibe taybetiyên cinsê berî homo erectusê Afrîkayê. Ev jî tê wê manê ku; mensûbên şikefta Longgupo yan nêzikî homo habilis (şaxa herî kevn) yan jî nêzikî homo ergasterê bavê (Pêşî) homo erectusê Afrîkayê ye.

Rêça derbên li ser haletan destekiya dîtinên berê dike. Anegorî vê yekê, ji keviyekî volkanîk hinek parçe tên hildan. Li ser van keviran xebatên tên kirin. Destekên ku jê derdikevin dişibin yên ku ji homînîdê Avtenga (Boğaz) Olduvai hatine girtin. Lê ji bo homo erectus jî zêde sivik tên dîtin.

Çend nuştêy û kitabê kirdkî

J. ESPAR

Redaksiyonê kovara Zend ra yew embazî mi ra waşt ki ez kitabên û nuştêyanê ebi lehçeyê Kirdkî (Zazakî) ser o maqaleyêk binûsa. Seki yeno zanayîş hetanî nika û illehîm zî nê vîst serranê peyenan di ebi Kirdkî gelekî çiy nûsiyay. Ebi Kirdkî şîrî, hikayey, vîriameyenî (xatirey) û gelek babetan ser o meqaleyê nûsiyay; xebatê folklorî û gramerî estî, ziwanañê xerîban ra berhemê (eserê) edebî tadiyay. Cuwera kes nişno meqaleyêka anasarên di qalê hemîni biko.

Ez nê serranê peyenan di gelek raşt ameya ki Kirdê ma zor û zehmeteya wendiş û nuştîşê Kirdkî ra zaf lomey kenî û materyalê nuştêki persenî. Aw semed ra mi gore bê fikrê xwi tanî nuştêy û kitabê vicinay û ez wazena tiya di derheqê nê kitabên û nuştêyan di me'lumat bida, yîni wendoxan vîr fina û aktuel bika. Ez tecrubeyanê xwi ra zana ki eke kes raşt zî nê kitab û nuştêyanê ki ez tiya behs kena biwano û biney serey xwi pa bidejno, gelekî asan şeno Kirdkî biwano, binûso û heme şîweyanê Kurdkî weş fahm biko.

Bi kilmey ez tiya yew nuştêyo infor-matif nûsena yanî ez nuştêyan û kitabên rexne (krîtik) nêkeno. Heta bîni ra ez wazena Kirdan ra vaja ki eke raşt zî nêti ma esto ma bimusi, qandê nê gurî rê şima çendi vajî endi, ebi Kirdkî, materyola nuştêki esto.

TEKSTÊ KIRDKÎ YÊ VERÎNÎ

Ebi Kirdkî tekstê verînî ki nusiyay û

ewro ma dest di yî, tekstê ki Peter Lerchî arê day. Peter Lerchî nê teksrî fekdê tayn Kirdan ra nuştî. Nê Kirdî, cengê Oris û Osmanîyan di hêsir kewtî destê Orisan û Orisan yê xwi reyra berdî Rusya. Nê tekstî, ebi yew ferhengê Kirdkî-Oriskî, 1857 di, Petersburg çapi ro ginay. Dima nê tekstî tercumey Alman-kî bîy û newe ra çapi ro ginay. Tira pey nê tekstî nuşttox Malmîsanijî ebi alfabe-ya Kurdkî ye ewroyini newe re çap ker-dî (1)

KITABO KIRDKÎ YO VERÎN

Kitabê ma yo verîn, kitabêko dîni yo. Namey nê kitabî "Mewludê Nebî" yo û nuşttoxê yê zî Mela Ehmedê Xasî yo. Xasî no eserê xwi 1899 di Diyarbekir di çap kerdo. Mewludê Nebî 16 qismî yo. 14 qismê yê Kirdkî yî, di qismê peyenî yan zî 14 rêzê peyenî, Erebkî yî. Mewludê Nebî heme 746 rêzî yo. Hergû rêzî 11 hece ya û qafiyeyin a Fethullah Hesbî zi peynîya mewludî di 10 rêzî yew teqrîz nuşt. Malmîsanijî Mewludê Nebî herfanê Erebkî ra tadayo alfabe-ya Kurdkî ya ewroyini.(2) Fîrat Yayınları no mewlud 1994 di Estembul di newe ra çap kerdo.

Mela Ehmedê Xasî, 1867 di yan 1868 di yew dewa Licê di, Hezan di maya xwi ra biyo. 18.02.1951 di dinay xwi bedelnaya. Yê medresan di wendo û yew deme miftiy Licê biyo. 1909 di Dewleta Osmanî yû surgunê Rodos kerdo. Yê ziwanañê Kurdkî (Kirdkî, Kurmanckî) ra teber Tirkî, Erebkî û Fariskî zanaynî. Ebi Tirkî, 'Erebkî, Kurmanckî şî-

îrî nuştî. 1986 di tayn manzumeyê yê heze kitab ebi herfanê Erebkî amey çapkerdiş. Yê yew xezeli ebi çar ziwanañ yanî 'Erebkî, Tirkî, Fariskî, Kurdkî (Kurmanckî û Kirdkî) nuşt. (3) Ebi name bê "Cengnamey Kirdan û Armeniyan" yewna kitabê yê zî esto.(4)

1903 di Usman Efendiyê Babijî, ebi name bê "Biyîşê Pêxemberî" yewna mewludê Kirdkî nuşt. Usman Efendî nuşt, labelê si'ûdê yê sey Mela Ehmedê Xasî çînîbiyo ki mewludê xwi cadi bido çapi ro. Yê mewlud qandê çapkerdişê erşawito Diyarbekir, la qando ki kes nişiya biwano çap nêbiyo. Dima Melatya di kewto destê qeymeqamê Puturge, Faiz Beg Bedirxanî, yê xwi reydi berdo Estembul ki bido çapi ro, labelê tiya zî keso ki biwano peyda nêbiyo û çap nêbiyo. Peyniya peynî, yew serri mergê Usman Efendiyê Babijî ra pey, yanî 1933 di Şam di, Celadet Bedirxanî no mewlud çap kerdo. No Mewlid 391 rêzî yo û hergû rêz 11 hece ya û qafiyeyin a. Celadet Bedirxanî meselaya nê mewludî ser o hûmara 23 ina kovara Hawar di yew nuşte nuşt. Yê, nê nuştî di meselay mewludê 'Usman Efendî derg dila nuşt. Dima no nuşte ebi alfabe-ya Kurdkiya ewroyini reyra kovara Hêvî di ameyo çapkerdiş.(5) Mewludê 'Usman Efendî zî Malmîsanijî herfanê 'Erebki ra tadayo alfabe-ya Kurdkî ya ewroyini û mewludê Mela Ehmedê Xasî reyra 'eynî hûmara kovara Hêwî di ameyo çapkerdiş.(6)

GRAMERÊ KIRDKÎ SER O XEBARA KURDAN

Alimê xerîbî gramerê Kirdkî ser o xebetiyay. Labelê semedo ki nê xebatê yî-

1. Biewnî Arêkerdax: Peter İvanoviç Lerch, "Qawxê Nêrib û Siwani", Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî) Hejmar 3, (Parîs, Sebat 1985) r. 109-111

● Arêkerdax: Peter İvanoviç Lerch, "Qawxê Nêrib û Hênî", Hêvî (Kovara Çandîya Giştî), Hejmar 5, (Parîs, Gulan 1986) r. 88-91

● Arêkerdax: Peter İvanoviç Lerch, "Çend Tekstê Dimilkî (Zazakî): 1897", Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî) Hejmar 6, (Parîs, Tebax 1987) r. 69-79

Malmîsanijî nê tekstî corênî hetey muhtewa ra analiz kerdi. (Biewnî Malmîsanij, "Ondokuzuncu Yüzyılda Kırd (Zaza) Aşiretleri arasındaki Çatışmalar" Studia Kurdica, No 1-3, (Parîs, Nisan 1985), r. 72)

2. Biewnî Ehmedê Xasî, "Mewlidê Nebî", Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî)

Hejmar 4, (Parîs, Celon 1985) r. 75-97

3. Biewnî M. Malmîsanij, "Şî'reke Ehmedê Xasî Bi Tirkî, 'Erebî, Farisî, Kurmanckî, Kirdkî (Zazakî)" Çıra, (Kovara Komeleya Nivîskârên Kurd li Swêdê Hejmar 3, (Stokholm, İlon 1995) r. 44-45-

4. Derheqê Mela Ehmedê Xasî di hina vêşî m'elumat nê nuştîy di esto. ● Malmîsanij, "Derheqê Mela Ehmedê Xasî di", Armanc, No 146, (Stokholm, Çileyay Paşin Sibata 1994) r. 10

5. Biewnî Celadet Bedirxan, "Zarê Dimilî û Mewlûda Usman Efendî" Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî) Hejmar 2, (Parîs, Gulan 1984) r. 77-85

6. Biewnî 'Usman Efendî, "Biyîşê Pêxemberî (Mewluda Nebî)" Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî) Hejmar 4, (Parîs, İlon 1985) r. 98-110

nî ebi Almankî û İngilizkî yî ez behsê nê xebatan nêkena.

Kurdan bi xwi zî gramerê Kirdkî ser o kar û xebat kerda. Celadet Bedirxan û Qanadê Kurdo, zaf kemî bo zî Kirdkî ser o guriyay. Xebatanê nê herdi ziwanzanayoxanê ma ser o Malmîsanij wina vano: Celadet Bedirxanî Mewludê 'Usman Efendî ser o yew nûşte (pêşgotin) nûşt û Dimilkîya Sêwrek û Paluy pê ver o nay û bi nê wîrdî şeweyan yew tekst verniya Mewludî di nûşt. Qanadê Kurdo zî 1936 di nîzdî şaristanê Batûmî di yew dewa Dimilîyan (Zazayan) di tay tekstî nuştî. Hewna Qanadê Kurdo lehça Dimilkî ser o çend meqaley nuştî. Qanadê Kurdo merdîşê xo ra çend serrî ra ver zî yew kitab nûşt û no kitab di Dimilkî û Kirdasî (Kurmançî) pê ver o nay, muqayese kerdî. Vatişan gore Henefî Celeplî nîzdîyan ra nê kitabî çap kenî!(7)

Dima Malmîsanijî na xebata Celadet Bedirxanî herfanê Erebkî ra tadaya alfabe ya Kurdkîya ewroyinî û newe ra çap kerda.(8) Tekstê ki Qanadê Kurdo arê day, yê zî newe ra çap bîy.(9)

Xebata verîni ya ki gramerê Kirdkî ser o Kurdistan di biya, kovara "Devrimci Demokrat Gençlik" di çap biya. Na kovarî aşma (menga) Sibati 1978 di Estembul di veciyaya. Hûmara yewndesinî ra pey kovari nêveciyaya. Yew xebata gramerî ebi name bê "Dil Konusunda Bir Araştırma" nê heme yewndes hûmaran di çap biya.(10) Hûmara hîrin di, nûstox him Kirdkî xwi miyan di û him zî Kirdkî û Kurmanckî miyan di vuriyayîşê herfan ser o vinderto. Mese-la herfa zî senê tanî şeweyanê Kirdkî di biya "s,j,c." Yan zî herfa jî senî tanî şeweyan di biya "c,s,ş." Nê vuriyayîşê ebi mîsalan amey îzehkerdîş. Tanî mîsalan di Kurmanckî, Sorankî û Kirdkî pê ver

o nay, muqayese kerdî. Heme mîsalan di me'nay nê kelîmeyan ebi Tirkî nûsta.(11) Nûstox hûmara desinî di Kirdkî di rengdêran (sifatan) (12) û yewndesinî di Kirdkî di û pronavan (zamîran) ser o vinderto (13). Analîzê nînan kerdo û ca bi ca Kurmanckî reyra muqayese kerdî.

Gramerê Kirdkî ser o çend meqaley kovara Tîrêj di zî nusiyay. Tanî xususiyetê na kovari estî ki ganî kes vajo. Na kovari Kurdistan di kovara verîni ya kulturi ya ki tena ebi ziwane Kurdkî (Kirdkî û Kurmanckî) veciyaya. Tîrêji di hinda Kurmanckî, Kirdkî zî nûsiyayo.

Zazakiya Ezirganî û Diyarbekirî, (14) ebi nê namî yew meqala hûmara hîrina Tîrêji di nûsiyaya. Na meqala di Pankisar Zertengî (15) Kirdkîya dormarê Diyarbekir û Erzînganê pê ver o nay, muqayese kerdî. Verî vuriyayîşê vengani ser o herdi şeweyan ra vatey pê ver o nay, dima pronovî, lêkerî muqayese kerdî û çiyê ciyay îzeh kerdî.

Hûmara çarin a Tîrêj di ebi name bê Zazakî Di Pronav (Zamîr)î yew meqalaya M. Brîndarî çap biya. Na meqala di "pronovê kesî", "pronovê nêtarî", "pronovê nişanî", "pronovê arrizî", "pronovê pêgihî" (girekî), "pronovê pirsyarî", "pronovê nebinavkirî" (nependî) ebi mîsalan amey analîzkerdîş. (16)

Malmîsanijî ebi name bê Dimilkî de "Lêkerê Hevdudanî (verbe composé, filî murekkeb)" yew meqalaya derg nûsta. Yû na meqala di heme hîrê grubanê lêkeranê hevdudanîyan ser o vinderto. Na xebati di heme şeweyanê Kirdkî ra mîsalî amey dayîş. Heme mîsalan di Kirdkî û Kurmanckî, tayn cayan di Kirdkî, Kurmanckî û Hewremankî muqayese kerdî. (17)

Yewna meqalaya Malmîsanijî kovara Hêvî di veciyaya ki Dimilkî miyan di

ciyayeya vatişanî ser o ya. No nûşte di nûstox verî ca dano cayê Kurdkî te de qisey beno. (18) Babetê bîni ki na meqala di yî nê yê: "Ca ra ca ciyayeya me'na", "Ca ra ca ciyayeya nerey û maykeyî", "Ciyayeya vatişî" (Ferqê telaffuzî), "Cay xo bedelnayîşê vengani", "Kewtişê vengani yan zî vind biyayîşê vengani", Bedeliyayîşê vengani (Vuriyayîşê vengani). Na xebati di şeweyanê Dêrsimî, Çewligî (Bingolî), Siweregî, Ezirganî, Gêlî, Pîranî, Paluy, Hêni û Çêrmûgî ra kelîmey amey pêveronayîş.(19)

Malmîsanijî edatanê (preposition, daçek) Kirdkî ser o zî yew meqala nûsta. Na meqala di, herdi tewirê edatê Kirdkî analîz kerdî. Yanî edatê ki yenî vernî yan zî peynîya nameyan (subsantive) û edatê ki parçe yî û him yenî vernîya nameyan (postposition). Nê edatî heme heze mîsal cumleyen di gurênay û parantêzî miyan di me'na yîni ya Kurmanckî zî nûsta. Peyniya nê nûstî di edatê Kirdkî û Hewremankî pê ver o nay, muqayese kerdî.(20)

Gramerê Kirdkî ser o Lerzan Jandîlî zî çend meqaley nûstî. Yew xebata yê lêkeranê (filîlanê) Kirdkî ser o ya. Qismê verîni na xebati di tanî çimeyanê nûstekîyan ra çend lêkerê şeweyanê Kirdkî pê ver o nay, muqayese kerdî. Qismê peyeni di, lêkerê mintîqa Gimgimî (Vartoy) ebi heme wextan (tempus) yîni nûstî. (21)

Lerzan Jandîlî yew meqala zî ebi name bê "Zaravê Dimilî de Name" nûsta. Na meqala di nameyan (subsantive) di nerey û maykey, yewhûmarey û zafhûmarey û azafî ser o vinderto. Seki yê zî nûsto, na xebati di yê şeweyê xwi heze binke giroto, labelê ciyayeya cayanê bînan zî ebi notanê bînanan nawita. (22)

7. Biewnî Roportajkardox J. Espar, Malmîsanij, "Kam nêşino se, di sey, heta panc sey kelîmanê Dimilkîya mintîqa xo binuso?" Berbang, Hejmar 57-58 (Stokholm, Gulan-Hezîran 1989) r. 35-38

Mi no roportaj 1989 di kerd. Kitabo ki Qanadê Kurdo nûsto û Malmîsanij vano Nîzdîyan ra çap beno zi heyf ki Henefî Celeplî hema çî çap nêkerdo.

8. Biewnî, Celadet Bedirxan, "Zarê Dimilî û Mewlûda Usman Efendî" Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî) Hejmar 2, (Parîs, Gulan 1984) r. 77-85

9. Biewnî Qanadê Kurdo, "Dimilkî (Zazakî) ya Batûmî", Hêvî Kovara Çandîya Giştî, Hejmar 5, (Parîs, Gulan 1986) r. 85-87

10. Biewnî Malmîsanij, "Bîbliyografîyaya Dimilî (Zaza): 1858-1995", Hêvî Kovara Çandîya Giştî, Hejmar 3, (Parîs, Sebati 1995) r. 114-117

11. Biewnî Malmîsanij, "Dil Konusunda Bir Araştırma", Devrimci Demokrat Gençlik, No 3, (İstanbul, Nisan 1978) r. 11-12

12. Biewnî Malmîsanij, "Dil Konusunda Bir Araştırma", Devrimci Demokrat Gençlik, No 10, (İstanbul, Kasım 1978) r. 13

13. Biewnî Malmîsanij, "Dil Konusunda Bir Araştırma", Devrimci Demokrat Gençlik, No 11, (İstanbul, Aralık 1978) r. 12

14. Biewnî Pankisar Zerteng, "Zazakîya Ezirganî û Diyarbekirî" Tîrêj, Hejmar 3, (İzmir, 7.8.1980) r. 7-15

15. Malmîsanijî ebi gelek nameyanê (pseudonyme) ciyayan nûstey xwi nûstî. Pankisar Zerteng zî yew nameyanê yê ra yo. Yê ebi nê na-

meyan, nûstey xwi nûstî: Malmîsanij, Pankisar Zerteng, M. Brîndar, Dewij, M. Dewij, Roşan Barîçek, Mehmet Pîran, M. Pîran û Mehmet Malmîsanî. Biewnî J. Espar, "Malmîsanij Kam o?" Welat, (Rojnameya hefteyî) Hejmar 4, (İstanbul, 14.20 Adar 1992) r. 6

16. Biewnî M. Brîndar, "Zazakî Dir Pronav (Zamîr)î" Tîrêj, Hejmar 4, (Stokholm, 1981), r. 54-58.

17. Biewnî Malmîsanij, "Dimilkî de lêkerê hevdudanî" Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî) Hejmar 1, (Parîs, İlon 1983), r. 67-82.

18. Hina vêşî me'lumat derheqê cayê ki te de Kirdkî qisey beno, nê nûsteyanê cêrênan di esto.

● Biewnî Malmîsanij, "Bazî Yörelerde Dimilî ve Kurmançî Lehçelerinin Köylere göre Dağılımı", Berhem, (Kovara Lêkolînê Civakî û Çandî) Hejmar 2, (Stokholm, Gulan 1988) r. 8-17. Hejmar 3, (Stokholm, İlon 1988), r. 62-67. Hejmar 4, (Stokholm, Sibati 1988) r. 53-56.

19. Biewnî Malmîsanij, "Dimilkî Miyan Di Ciyayeya Vatişan" Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî) Hejmar 2, (Parîs, Gulan 1984) r. 86-103.

20. Biewnî Malmîsanij, "Dimilkî Di Daçek" Berbang, Hejmar 15/83, (Stokholm, 1983), r. 15-17.

21. Biewnî Lerzan Jandîlî, "...Û Êndî dest Berzîme Cî", Rewşen, (Kovara Yekîtîya Rewşenbîrê Welatparêzên Kurdistan) Hejmar 10, (Bonn, Sibati 1993), r. 97-108.

22. Biewnî L. Jandîlî, "Zaravê Dimilî De Name", Rewşen, (Kovara Navenda Çanda Mezopotamya) Hejmar 7, (İstanbul, İlon Cotmeh 1992), r. 19-27.

Yewna meqaleya Lerzan Jandîli pronovan (zamîran) ser o ya. Yê na meqala di pronavê Kirdkî analîz kerdî û şîweyê xwi ra teber zî vatişê ciyayan ra numûney day. (23)

Lerzan Jandîli, yew xebata derg û dila lehçeyanê Kurdî ser o kerda. Na xebata ki kovara Lêkolîni di ebi name bê "Zaravayên Kurdî" çap biya nê babetê estî: "Namê zaravanê Kurdî", "Têverşanîtena qesan" (Pêveronayîşê qiseyan), "Vernamê Kurdî" (Zamîrê Kurdî), "Ezafê, Lêkerî". Seki namedê nê nûştî ra zî fahm beno, na xebati heme hîrê lehçeyanê zîwanê Kurdî ser o biya. Nûştoxî her babetê xebata xwi di Kirdkî, Sorankî û Kurmanckî pê ver o nay, muqayese kerdî. (24)

Haydar Diljenî, Kirdkî di nerey û maykey ser o yew meqala nûşt. Nameyan di nerî û maykî, sifatan, zamîran û lêkaran ser o tesîrê nerey û maykey babetê na maqala yî. Na xebatî şîwayê Sêwreg ser o ya. (25)

Babetê nerey û maykey ser o yew meqala zi Mûnzûr Çemî nûşt. Xebata yê şîweyê Dêrsimî ser o ya. (26)

Kirdkî di yewhûmarey û zafhûmarey ser o zi Haydar Diljenî yew maqala nûşt. Yû, bi kilmey nê babetan ser o vinderto: nameyan û sifatan di yewhûmarey û zafhûmarey, lêkeran ser o tesîrê zafhûmarey. Na xebati zî şîweyê Sêwreg ser o ya. (27)

XEBATÊ FERHENGK Û FERHENGAN

Derheqê ferhengê Kirdkî-Tirkî di, reya verîni, yew xebati kovara Tîrêj di biya. Na xebati pê dim a heme çar hûmaranê Tîrêj di çap biya. No ferhengek hina vêşî kelîmanê dormarê Pîranî, Sêwreg nawnenno. (28)

Tira pey kovara Hêvî di zî yewna xebata anasarên ebi name bê "Ferhengok Dimilkî-Kurmanckî-Tirkî" çap biya. Seki name ra zî fahm beno, no ferhengek, yê Kirdkî-Kurmanckî-Tirkî yo. Kelîmey Kirdkî vêşane Kelîmey dormarê Dêrsimî yî. (29)

Ferheng verin o Kirdkî-Tirkî ebi name bê "Ferhengê Dimilkî-Tirkî/Zazaca Türkçe Sözlük" Uppsala di serra 1987 di çapi ro ginayo. Weşanên Dengî no ferheng reya diyini 1992 di, Estembul di, dayo çapi ro. No ferhengok ki Malmîsanîjî hadire kerdo 431 ripperî yo. Seki Malmîsanîjî vatişê vernî yê nê ferhengî di nûsto, no ferheng, cayanê binan hetî hina vêşî kelîmanê dormarê Pîran, Sêwreg û Çewligî (Bingöl) nawnenno. (30)

1994 di, ferhengê diyin ê Kirdkî-Tirkî, reyna Swêd di ebi name bê "Ferheng Kurdî-Tirkî (Zazakî)" şaristanê Stokholm di çap bi. No ferheng Mûnzûr Çemî hadire kerdo û 589 ripperî yo. Xususiyetê nê ferhengî no yo ki no ferheng,

hina vêşî kelîmanê dormarê Dêrsimî nawnenno. Mûnzûr Çemî qando ki gurênayoxê ferhengî, ebi yew hewawo asan, nê ferhengî ra îstifade bikî, Vatena Verî ya ferhengî di tanî me'lumat dayo. (31)

No yew demewo ki Malmîsanîjî, waredê xebata ferhengî di dest bi yew xebata xami kerdo. Yû, 1994 ra ineta, yew hewawo periyodîk hergû hûmara Armanc di ferhengokê "Kirdkî-Pehlewî-Kurmanckî" hadire keno. No ferhengok hetey etîmolojîyê kelîmanê Kirdkî ra yew fikirdo baş dano ma. (32)

XEBATÊ FOLKLORÎ

Tirkiya di tekstê folklorîk ê verîni 1963 di "Roja Newe" di çap biy. Roja Newe, Tirkiya di rojnameyo verîni o ki ca dawo nûştanê Kirdkî. (33) Nê tekstan ra yew, surguneyda "Silêmonî Gince" ser o yo û ebi şîweyê Dêrsimî nûsiyayo. Teksto diyin, yew deyîra zerri ya (lawîka) dormarê Çewligî ya û ebi nê şîwîy nusiyya. (34)

Semedo ki heta nika ebi Kirdkiya dormarê Modkî tena yew teksto folklorîk nûsiyayo, ez wazena wendoxî nê tekstê zî nas bikî. No tekst, yew estaniki ya û 1979 di fekdê yew dewijê Modkî ra nûsiyaya. Arêkerdixî, peyniya nê tekstî di, yew ferhengokê Kirdkiya Modkî zî hadire kerdo. (35)

23. Biewnî Lerzan Jandîl, "Zîwanê Kurdî Diyalakta Kirmanckî de Pronom", Rewşen, (Kovara Navenda Çanda Mezopotamya) Hejmar 12, (Istanbul, Sibat 1994), r. 7-12.

24. Biewnî Lerzan Jandîl, "Zaravên Kurdî", Lêkolîn, (Kovara İnstituya Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanistiyê) Hejmar 1, (Berlîn, Adar 1995), r. 126-175.

25. Biewnî Haydar Dişen, "Dimilkî di Nerî û Makî" Çira, (Kovara Komelaya Nivîskarên Kurd Li Swêdê) Hejmar 1, (Stokholm, Adar 1995) r. 95-106.

26. Biewnî Mûnzûr Çem, "Kirmanckî (Zazakî) di Nêr û Mayîk" Çira (Kovara Komelaya Nivîskarên Kurd Li Swêdê), Hejmar 2, (Stokholm, Hezîran 1995), r. 105-112.

27. Biewnî Haydar Dişen, "Kirdkî (Dimilkî) di jewamorey û bolamorey" Çira, (Kovara Komelaya Nivîskarên Kurd Li Swêdê) Hejmar 2, (Stokholm, Hezîran 1995), r. 96-100.

28. Namey xadirekerdixê nê ferhengokî nê nusiyyayo. Labelê hewawo ki ez perseyaya hadirekerdixê nê ferhengokî Malmîsanîjî o. Biewnî "Ferhengok Zazakî û Tirkî" Tîrêj no: 1 (Izmir, Çileyê pêşîn 1979), no: 2 (Izmir, 23.5. 1980), no: 3 (Izmir, 7.8.1980), no: 4 /Stokholm, Çileyê pêşîn 1981)

29. Biewnî Zîlfî, Ferhengok Dimilkî-Kurmanckî-Tirkî, Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî) Hejmar 1, (Parîs, îlon 1982) r. 107-123.

30. Biewnî Malmîsanîj, Zazaca-Türkçe Sözlük/Ferhengê Dimilkî-Tirkî, Jîna Nû Yayınları, (Uppsala, 1987)

Derheqê nê ferhengî di qandê hina vêşî me'lumatî nê nûştîyî ra biewnî: J. Espar, "Ferhengê Dimilkî-Tirkî" Welat, (Rojnameya hefteyî) Hejmar 14, (Istanbul, 23-29 Gulan 1992) r. 12.

31. Biewnî Mûnzûr Çem, Ferheng Kurdî-Tirkî (Zazakî), (Stokholm, 1994)

32. Biewnî Malmîsanîj, "Ferhengokê Kirdkî-Pehlewî-Kurmanckî", Armanc No: 153, (Stokholm, Çiriya pêşîn 1994), r. 10

No ferhengok hûmara 4(162) ra teber pê dim a nê hûmaranê Armanc di zî çap biyo: 154,155,156,157,158 1(159), 2(160), 3(161), 5(163), 6(164).

33. Biewnî, Malmîsanîj&Mahmûd Lewendî, Li Kurdistana Bakur û li Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1981), Weşanên Jîna Nû, (Uppsala, Adar 1989), r. 159.

34. Nê tekstî reya diyinî kovara Hêvî di çap biy. Biewnî, "Macera î Silêmonî Gince", "Xona Hecî", Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî) Hejmar 3, (Parîs, Sebat 1985), r. 107,108,113.

35. Biewnî Arêkerdix Malmîsanîj, "Estaniki (Vistoneki)", Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî) Hejmar 3, (Parîs, Sebat 1985) r. 103-104.



Zilfi, dormarê Dêrsimî ra çend berhemê folklorîkî arê day. Derheqê tanî xususiyetanê folklorî Kirdkî di Zilfi wina nûseno: "Pêrodayisê ke verva zulim û zorkariya xayinan û dismênan bena, folklorê Kurdî ebe zarava Dimilkî zaf estê. (...) Miletê Kurdi tarixê xo de çituri seweta azadiya xo dismênê zalim û zorkari de do pêro, folklor û edebiyatê Kurdî de beno arêze. Her çiqas ke folklorê Kurdî ebe zarava (lehça) Dimilkî (Zazakî) xêlê zengîn o, hata nika keşî bine ra arê nêkerdo, pêser nêardo..."

Zilfi, nê çend bebetanê folklorê ma ra numûney day: estanikî (sanikî), deyîrî (lawikî), meseley, mertalî, vatenê virênan, vatey kay. Yê tanî xususiyetanê nê berheman ser o fikrê xwi nûştî. (36)

Edetan û toreyanê Dêrsimê ser o yew xebata folklorîki ya M. Dûzginî çend hûmaranê kovara Berhem di çap biya. "Dixaskaniye (Zacilaney)", "Daniyê didan vetene", "Kostek remnene", "Terbiye kerdna domano de cayê camêrd û cîwanike", "Dersim de kewrayên", "Gaxand", "Misayvênî", "Zewez" babetê na xebata M. Dûzginî yî. (37)

Heme kovar û rojnameyanê Kurdkîyê ki 1975 ra pey veciyay, zaf-tayn ca dawo tekstanê folklorîkan ê Kirdkîyan. Bêguman tiya îmkân çiniyo ki ma ca bîdi hemînî. Xwira nê tekstê ki nê kovar û rojnameyan di nûsiyay, dima tanî heze kitab çap biy. Cûka ez wazena ma hina

vêşî nê kitabên folklorî ra çend hebar ser o vinderî.

"Na xumxum a..." namey yew kitabê folklorîk ê Kirdkî yo. Nê kitabî di, gore bê edatanê dormarê Sêwreg veyve, yew şîiri, hîrê hebî deyîrî, vîst û di hebî fiqrey, meseley, hikayey û heşt hebî estanikî estî. No materyola otantik heme dormarê Sêwreg ra arê biyo. Kitab 213 ripperî yo. (38)

"Folklorê Ma Ra Çend Numûney" namey yewna kitabê folklorîki yo. Nê kitabî di şîwayenê Çermûg, Çewlûg, Dêrsim, Gêl, Hêni, Licê, Ma'den, Modkî, Pîran, Palu û Sêwregi ra tekstî estî. Ebi nê şîwayenê ciyaran çewres û heşt hebî deyîrî (Nê deyîran ra notay vîst heban nusiyay.) pancsey û şeşt û panc hebî vatey verînan, sew û heştay hebî mertalî, çarsey û çewres û di hebî zewtî, disey û çar hebî de'ey, panc hebî estanikî, vîst û panc hebî meseley û fiqrey, di hebî hikayey heskerdişî û çarsey hebî qiseyê diletî nusiyay. Peyniya kitabî di arêkerdoxê namey cayenê ki tekstan di vêreno nûştî. No kitabo ki 319 ripperî yo reya verîni Stokholm di çapi ro ginayo. "Embaz Yayınları" 1993 di Ankara di reya diyini çap kerdo. (39)

Fekdê dewijanê Qelbînî (Qelbîn, yew dewa qezay Pîranî ya.) ra Wedat Kaymakî pencês estanikê dormarê Pîranî nûştî. No kitabo ki 109 ripperi yo ebi name bê "Istanikî Zazakî-Zazaca Hikayeler" çapi ro ginayo. Wedat vatîşê verîni yê nê kitabî di nûseno ki yû reya verîni ya ki Kirdkî nûseno aw semed ra beno ki gelekî çiyê şaşî kitabî di bî û wazeno ki wendoxî qusirdê yê nêewnî. (40)

Seîd Verrojî ebi name bê Folklorê

Kurdî, Kurmancî û Dimilî yew kitab nûsto. No kitab kes şeno vajo hîrê qismî yo. Kitabî di, tanî tekstanê folklorîkan ê Kurmancîyan û Kirdkîyan ra teber fotografê kilim û xaliyanê çend şaristananê Kurdistanî estî. Tekstê Kirdkî yê ki dormarê Pîranî ra arê bîy şiyês hebî deyîrî, panc hebî estanikî, çar hebî fablî, çend hebî zewtî û vatey verînan î. (41)

Yew kitabê folklorîki ki ganî tiya di qalê yê bibo, kitabo ki ebi name bê "Tayê Kilamê Dêrsimî" ameyo çapkerdiş. No kitab him hetey muhtewa ra him zî hetey metodê hadirekerdişî ra, kitabodo xam o. Seki namey yê ra fahm beno tena deyîrê dormarê Dêrsimî te de estî. Labelê arêkerdoxî tena tekstê deyîran nê nûştî, yê meseley nê deyîran zî nûştî. Mesela ma vajî, na deyîri çîrê vajiyaya? Kamî ser o vajiyaya? Kamca di vajiyaya? Kamî vata? Wendox derheqê persanê anaserênan di me'lumatê do derg û dila kitabî di veyneno. Mî gore, no me'lumat hinda deyîran muhîm o. Arêkerdoxî deyîrê hetey muhtewa ra zî ciya kerdî. Çar tewirî deyîrê nê kitabî di estî: deyîrê ki lejê'eşîran ser o vajiyay, deyîrê ki mesela Dêrsimî ser o vajiyay, deyîrê ki heskerdişê ser o vajiyay û deyîrê ki sewbî meselan ser o vajiyay. Kitab ebi ferhengê Kirdkî-Kirdkîyo ki arêkerdoxê peyniya kitabî di hadire kerdo, 318 ripperî yo. (42)

Folklorê Kirdkî ser o yew kitabê mi zi veciya. Nê kitabî di tekstê folklorîkê ki ebi şîwayenê Pîranî, Gimgimî (Vartoy), Bîngolanî (Solhanî) û Gêlî nusiyay, estî, "Ebi gore bê'edatanê ma zewacî, Deyîrî", "Meseley" "Vatey kay" û "Estanikî" babetê nê kitabî yî. Kitab 196 rippe-

36. Biewnî Zilfi, "Folklorê Kurdî ebe Zarava Dimilkî". Hêvî, (Kovara Çandîya Giştî) Hejmar 1, (Parîs, Îlon 1983) r. 83-106. Hejmar 2, (Parîs, Gulan 1984) r. 109-124.

37. Biewnî M. Dûzginî, "Torey û Adetê Dersimî", Berhem (Kovara Lêkolînên Civakî û Çandî) Hejmar: 1, (Stokholm, Sibat 1988) r. 34-40. Hejmar 2, (Stokholm, Gulan 1988) r. 18-27. Hejmar 3, (Stokholm, Îlon 1988) r. 48-50. Hejmar 4, (Stokholm, Sibat 1989) r. 18-19. Hejmar 6, (Stokholm, Cotmeh 1989) r. 32-35. Hejmar 8, (Stokholm Gulan 1990) r. 34-39.

38. Biewnî Arêkerdox Koyo Berz, Na xumxum a..., Weşanên Jîna Nû, (Uppsala, Tîrmeh 1988)

Derheqê nê kitabî di qandê hina vêşî me'lumatî nê nûştî ra biewnî: J. Espar, "Na xumxum a..." Welat, (Rojnameya hefteyî) Hejmar 10, (Istanbul, 25 Nisan-1 Gulan 1993) r. 12


39. Biewnî Arêkerdox Malmîsanîj, "Folklorê Ma Ra Çend Numûney" Weşanên Jîna Nû, (Îlon 1991, Ballinge/Sweden)

40. Biewnî Wedat Kaymak, Istanikî Zazakî/Zazaca Hikayeler, Hiddekel Förlag, (Stokholm, 1994)

41. Biewnî Seîd Verroj, "Folklorê Kurdî Kurmancî û Dîmilî". (Çi heyf ki nê kitabî ser o ne tarîx ne cay çapbiyayîşî û ne zî namey weşanxanîyê nusiyayo)

42. Biewnî Mûnzûr Çem, "Tayê Kilamê Dêrsimî", (Stokholm, 1993)

Nê kitabî ser o Malmîsanîjî yew rexne nûsto. Biewnî Malmîsanîj, Kitabêdo Newe: "Tayê Kilamê Dersimî" Armanc, No, 141 (Stokholm, Tebax-1993) r.10



rî yo. (43)

FEKDÊ KIRDAN RA CENGÊ ŞÊX SE'İD EFENDÎ Û YÊ DÊRSİMÎ

Mûnzûr Çemî heyatê Usifê Qurzkizî fekdê yê ra nušto û ebi name bê "Hotay Serra Usifê Qurzkizî" heze kitab çap kerdo. (44) Hetanî nika Kirdan miyan di kesî heyatê xwi nênušto yan zî nêdayo nûştîş. Inay ser o zî no kitab, no ware di kitabodo verîn o. Kitab, ebi ferhengekê Kirdkî-Tirkî 343 ripperî yo û yewndes qismî yo. 270 ripperanê verînan di yan zî new qismanê verînan di Usif heyatê xwi vano. Qismê desîmî di yû qalê'edet û toranê Dêrsimî keno, yê yewndesinî di Usif qeseyanê xwi yê peyanan vano. Kitab ebi şîweyê Dêrsimî nusiyayo.

Usif wina dest bi qeseyanê xwi keno: "Ez Qurze ra wûne, mezra dewa Hop a. Naya (nahiya) ma Xorxol o. Namê Xorxol o bîn Conega wa. Conega giredayiya Xêxî (Cêxî, Gêxî) ya". Dima ma nê kitabî di qewm û mêrdimanê Usifî, dewanê nîzdîyan, mintîqa, lej û pêrodaiyîşê dewijan wananî. Ma namey çend Kirdan musenî ki şonî ver a eskeranê Şêx Se'îdî herb kenî. Qismê diyinê kitabî, cengê Dêrsimî ser o yo. Usif bi xwi nê cengî miyan dir o. Çend rey merg ra xelasîyêno. Ebi çîman bê nê jenosidî weyneno. Mesela Key Bertal Efendî ser o wina vano: "Çê Bertal Efendî ra xo ra hîrê çênêkî xelaşay. Ê kî mêrde de bî coka xeleşay. Ci ra jûye maya Dr. Şivanî yanê Sait Kırmızıtoprak biye" (r.79) Yû no qismî di derg û dila behsê wehşet û bêbaveya dewleti, behzê têkiliyan û psikolojiyê Kurdan keno.

Bi kilmey yew hewawo kronolojik heyatê Usifê Qurzkizî wina yo: Cengê

Dêrsimê ra pey Usif reya verîn Dêrsim ra vejîyêno, şono Zibildax (Zonguldak). Ayca di komir di guriyêno. Dima şono Estambul. Cengê Dîna yê Diyin di Usif eskerey keno. Eskerey ra pey Estambul di yew fabrika di keweno gurîy ver. Tira pey gelekî cayenê ciyayan di guriyêno. 1962 di key xwi ano Estambul. 1964 di şono Almanya. 1983 di Almanya di teqawit beno.

Helbet nê serran ser o Usiv gelekî me'lumat dano. No kitab derheqê ceng, cografya û edatanê Dêrsimî di, derheqê sutrukturel sosyal û cematkiyê Tirkîya di, derheqê xebata Kurdan ê Almanya di, derheqê psikolojiyê xeribey di yew dokumento gelekî muhîm o.

Qapaxê nê kitabî ser o nusiyayo ki no roman o. Labelê kes demewo ki wane-no, zaf weş fahm keno ki vîrameyenê (xatirayê) Usifê Qurzkizî yî. Bêguman roman bibo zî nêbo zî no kitab, yew berhemo erjiyaye yo. Heta nika nê kitabî ser o çend kesan rexne (kritik) nušto. (45) Bawereya nûstoxan pêrûni yew a ki no roman niyo. Tena Ferqîn Melikî rojnemey Özgür Politika di nê kitabî ser o yew nûsteyo Tirkî nušto. Serê nûstedê yê wina yo: Lehçeyê ma yê Kirdkî di romano verîn: "Hotay Serra Usifê Qurzkizî" (46) Nûşte di zî gelekî cayan di qandê nê kitabî kelîma "roman" î gurêno. No me'lumato ki Ferqîn Melik dano wendoxan bincara şaş o. Gelo Ferqîn Melik çirê wina nûseno? Tiya di di çiy yenî kesî vîrî. Ya Ferqîn Melikî no kitab nêwendo ya zî eke wendo, caran roman nêwendo, nêzano roman çî yo.

Malmîsanijî fekdê yew eskerê Şêx Se'îdî ra, cengê Şêx Se'îdî nušto. (47) No Eskerê Şêx Se'îdî ay wext vîst û şeş serre biyo. Demewo ki yû qalê na mese-la keno neway û hîrê serre yo. Ma nê nûştîy musenî ki Şêx Se'îd Efendî verî

ki ceng dest pê biko senê ameyo Pîran û nê eskerê yê, yû kamca di diyo. Dima behs keno ki cengî senê dest pey kerdo, rolê birayê Şêx Se'îdî, Şêx Evdîrehîmî destpêkerdişê cengî di çî biyo. Yû bi xwi ay eskeranê Şêxî ra yew biyo ki vîsto Me'denî û Erqenî ser û nê cay girofî. Demewo ki eşto Diyarbekirî ser çî qew-miyayo? Eskerê Şêx Se'îdî Diyarbekir ra senê û çirê remayo? Qumandarê Tirkan Delu Fikrîy xeneqayîşê (daderdene) Şêx Se'îdî ra pey ay cayan di se kerd se nêkerdo? Dormarê Pîran ra çend kesî kişay yan çî amey Xeneqayîş? Kirdan ra kam destey Şêx Se'îdî biyo kam destey hukmatî biyo? Nê nûştîy di ma fekdê nê eskerê Şêx Se'îdî ra cewabê nê persan hemînî gênî.

Mi zî fekdê yew cenîya Pîranîy ra derheqê cengê Şêx Se'îdî di tanî çiy nuştî. (48) Na cenikê wextê cengê Şêxî di newe zeweceya û veyeka duyes roja ya. Demewo ki ya qalê cengî kena neway serra ya.

Ya zî behsê destpeykerdişê cengî kena. Eskero hukmatîyo ki destpeykerdişê lejî di birîndar beno, yê ay eskerî benî keydê xwi. Namey nê eskerî Sidiq o û Çêrmûgîj o. Verî ki eskerê hukmatî bêrî Pîran, yê Sidiqê keye di ca verdanî û remenî. Ya behs kena ki eskeranê dewleti senê Pîran talan kerdo. Ma vatîşanê yay ra mûseni ki Pîranîjîyan ra kam destey hukmatî biyo û kam destey Şêxî biyo û namey çend Pîranjan dana ki hukmatî yê Xarpêti di xeneqay.

Tani berhemê edebî tadiyah Kirdkî. Mesela kes şeno. Sebahattin Ali ra "Estanika Mêşna" (49), Samed Behrengî ra "Sanika Hezi", (50) Elî Eşref Derwîşyan ra "Beyî", (51) Demîr Özlüy ra "Mergê Xalit Begê Cibrî", (52) û Migirdîç Margosyan ra "Dîkran, Nazar, Xaço û Yê Bînî" (53) ebi Kirdkî biwano.

43. Biewnî Arêkerdax. J. Espar, Tanî Estanikî û Deyîrê Ma, Weşanên Rewşen, (Berlîn, Adar 1995)

Nê kitabî ser o Memo Darrêzî yew rexne nušto. Biewnî Memo Darrêz, "Kîştêkê Lîteraturî Ma" Welatê Me, Hejmar (Na nusha ya rojnamî ser o hûmarê rojnamîy nênuşiyayo) (Istanbul-7 Gulan 1995) r. 13.

44. Biewnî Mûnzûr Çem, Hotay Serra Usivê Qurzkizî, Weşanên Roja Nû, (Stokholm, Gulan 1992)

45. Biewnî Malmîsanij, Övgüye Değer Bir Kitap: Hotay Serra Usifê Qurzkizî, Azadî (rojnameya hefteyî ya nûçeyî û şiroveyî) no: 21, (Istanbul, 1992) r. 6. No: 22 (Istanbul, 1992), r. 6

● Cemil Gondoğan, "Hotay Serra Usifê Qurzkizî", Rewşen (Kovara Navenda Çanda Mezopotamya), Hejmar 9 (Istanbul, Kanunûna paşîn-Sibat 1993) r. 55-57.

(Namey nuştoxî çîno) Pirtûkede Newe: "Hotey Serê Usifê Qurzkizî'î Ser o", Wan (Kovara Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Swêd), No: 1 (Stokholm 1992) r. 47-48.

46. Biewnî Ferqîn Melik, Kirdkî lehçemizde ilk roman: "Hotay Serra Usifê Qurzkizî", Özgür Politika (Günlük Gazete), Nummer: 117 (Neu-Isenburg, 21 Dezember 1995) r.9

47. Biewnî Malmîsanij, "Mi Şêx Se'îd Dî", Wan (Kovara Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Swêd) No: 3 (Stokholm 1992) r. 32-38.

48. Biewnî J. Espar, "Hukmatî Pîron vit ward çiyekî nêverda", Welat (Rojnameya hefteyî) Hejmar 2, (Istanbul, 26 Sibat-5 Adar 1992) r.10.

49. Biewnî Sebahattin Ali, "Estanika Mêşna", Tîrêj, no: 1 (Izmir, Çileyê pêşîn 1979) r. 39-42. Tadayox: M. Dewij.

50. Biewnî Samed Behrengî, "Sanika Hezi", Berhem (Kovara Lêkolînên Givakî û Çandî), Hejmar 1, (Stokholm, Sibat 1988) r. 50-58. Tadayox: M. Dersimî.

51. Biewnî 'Elî Eşref Derwîşyan, "Bey", Hêvî (Kovara Çandîya Giştî), Hejmar 6, (Parîs, Tebax 1987) r. 95-103. Fariskî ra tadayox: Malmîsanij

52. Biewnî Demîr Özlü, "Mergê Xalit Begê Cibrî", Hêvî (Kovara Çandîya Giştî), Hejmar 4, (Parîs, îlon 1995) r. 115-120. Tirkî ra tadayox: Malmîsanij.

53. Biewnî Migirdîç Margosyan, "Dîkran, Nazar Xaço û Yê Bînî", Çira (Kovara Komelaya Nivîskarên Kurd li Swêdê) Hejmar 4, (Stokholm, Kanûna pêşîn 1995) r. 73-78. Tirkî ra tadayox: J.Espar

BINGEHA

ÇÎROKA KURDÎ

ZEYNELABÎDÎN ZINAR



Cîrok di her çandeke cuda de, li ser bingehêke taybetî hatiye rûniştandin. Îcar ew çand çî tewr bin, çîroka xwe jî li wê gorê afirandine û dewlemendiya xwe nîşan dane, yan lewaz û qels hiştine.

Çîrok, di çanda hemû neteweyan de cihêkî pir giring girtiye û neşeya jiyana wê xweş kiriye. Çandeke bê çîrok, yan çandeke çîrokqels rewatiya xwe napejirîne. Mîna xwarineke rijî ya bê xwê û bê meze çewa ku bê biha ye û çu nirxî bo xwe naderîne, çanda bê çîrok jî wisan e.

Çîrok, adana giyana çandê ye; xweşî û şênîtiya çandê di radeya pêşîn de vedigire û mezetiyeke zêde bi mirovan dide tamijandin.

Xwendina çîrokeke xweş, têbini û tîjîfemtiya mirovan bê sînor dike û zanîna mirovan derdixe sewiyeke bilindtirîn ku tîrêjên hicirkên mixê mirovan ber bi asonine bê dawî ve difîştîqin, rewantir dibin û taristanan ruhni dikin. Ew cûre çîrokên wisa hîç nahêlin ku xwendevan dev ji wan berbidin û her tim xwe di nava dilê mirovatîyê de dihêwirînin.

Di çanda kurdî de, çîrok û çîrvanok hene. Ev herdu babet jî, hevpişkên hevûdu ne û jî êk cuda nabin. Lê di navbera wan de cihêtiyeke hindik heye:

Çîrok: Hin rastiyên xwe yê pêgir hene ku ew tişt mîna bûyeran rûdane û bi serê hin kesan ve siqûmatine mezin hatine. Lê di çîrokê de ne navên wan kesan diyar bûye, ne cih û ne jî çaxê bûyerê ka kengê çêbûye diyar bûye. Ha ew serpehatiyên

wisa, piştê pîrî ku li nava xelkê geryane,

îcar di nava demê de bûne malê gel û cihê xwe di gulistana folklorê kurdî de wek çîrok vegirtine. Çîrokên gelêrî bi rewşa hebûna xwe, kurt û dirêj hene. Hin ji wan pîr dirêj in, heta hin ji wan 20-50 rûpelî jî dadigirin. Hinek jî kurt bi qederê çend rûpelan in, heta hin ji wan çend rêz in û dibê ku çend hevok bin jî.

Di çîrokên kurdî de, tiştine pîr hêja hene ku mirov dikare ji wan dersine nirxdar ji xwe re bigire û pê demepêşa xwe sererast bike, li ser wan birame û bi wan çêyî, xirabî û mirovatîyê derxine aziyê. Herweha şîret, xweşbêj û qewîfîne dilovan jî didine mirovan.


Çîrvanok: Ev babet naverok, pîr dirêj in û bi gotina di çend şevan de jî naqedin. Bi nivîs jî gelek rûpelan dadigirin û dikarin weke pirtûkên romanên jî dirêj bibin.

Di çîrvanokan de hin tişt hene ku ne aqil wan dipejirîne û ne jî mimkûn e ku mirov karibin bi biriya xwe wan tiştan bikin. Herweha sînor jî çîrvanokan re tune, serbest in û çewan lê xweş bê wisan jî digrin.

Bi gotineke din, mirov dikare bêje ku çîrvanok ji derewan pêk hatine, derewine wisa mezin û xweş in ku mirov naxwaze dev ji xwendina wan berbide. Çîroka bi sernavê **Caw cawê te ye mînaka vê yekê xweş diyar dike ku lemeke kurdiran tûrên xwe avêtine ser gundekî û her dirêj kirine heta çiya, newal, gelî û destên herêmê tevek di binê xwe de wendakirine.**

Bingeha Çîroka Kurdî li ser gelek bingehên babetcihê hatiye avakirin. Ev yeka han jî, dewlemendtiya çanda kurdî rûqalê mirovatîyê dike. Lewra çandeke ku çîrokên wê ne wisan dewlemend bin, giranbhatiya wê jî tune.

Li gorî lêkolîna min a li ser folklorê Kurdî ku ev duwazdeh sal in, herweha li gorî belge û materyalên ku bi destên min jî ketine, hemû eşkere dikin ku di Çîroka Kurdî de, tiştên ku min peyitandine 33 tiştên bingehîn ên girîng hene û ku ew xwe bi tewrekî pîr xweşik di piraniya çîrokên kurdî de nîşanî me didin. Ew tiştên me gotin di hin çîrokan de li hevûdu di-





kin
û xwe
bi êk ve girê didin û
di hin çîrokan de bi
hevûdu ve girê nadin.
Îcar em ê wan bi
rêzê şîrove bi-
kin û dilqa
(rol) wan pêşkêşî xwendevanên Kurd bi-
kin, ka çi ne û çi tişt in:

1- Leheng: Di her çîrokekê de, lehen-
gek heye. Ew leheng, divê bila mêr be
yan jin be, yan jî mezin be yan zarûk be.
Lê bi piranî lehengê Çîroka Kurdî mêr
e û navê wî Mîrze ye. Lê piştî ku bisil-
mantî daketiye Kurdistanê, navê Mihem-
med jî lê hatiye zêdekirin û bûye Mîrze
Mihemed.

2- Sê bira: Di Çîroka Kurdî de, timî
çend bira dilqên xwe pêkanine û jî dest-
pêkê heta dawiyê bûne avakiroxê wê. Di
hin çîrokan de du bira ne, di hinan de sê
bira ne û di hinekan de yazdeh bira ne
û di hinekan de jî zêdetir dibin. Lê bi
piranî sê bira xwe di çîrokan de diyar
dikin.

Di çîrokê de timî birayê piçûk zîrek e,
pir zana ye û tîjfehm e. Herweha le-
hengtiya çîrokê jî timî birayê piçûk digi-
re ser xwe û jî birayên din re dibe alîkar.
Birayê mezin jî, hertim di çîrokê de
dilqê yekî nezan, bêmirazî û belengaziye
digire. Birayê navîn jî, kê-m-zêde jî bi-
rayê mezin ne zêdetir e.

3- Xwişkên hevûdu: Di Çîroka Kurdî
de hertim du xwişk, yan sê xwişkên he-
vûdu hene ku jî nepeniyê derdikevin û
tên xwe nîşanê lehengê çîrokê didin. Ew
xwişk pir delal in, lê ya piçûk hin delal-
tir û spehîtir e.


Jimara xwişkan di hin çîrokan de
zêdetir dibe, heta ku digîje yazdehan jî.
Gava lehengê çîrokê dixweste û dixwaze
ku bêhna xwe berde, xasma çaxê ku li
nava baxçeyekî li ser birkekê rûdine, ew
xwişk xwe pê nîşanê didin, yan jî xwe di-
xin şiltê kevokan û tene ser birkê, şilt jî
xwe dikin û bi laşê tazî dikevin avê. Le-
hengê çîrokê û ew xwişk dipeyivin, li
hevûdu dikin û leheng wan bi xwe re di-
be malê. Xwişka piçûk hertim jî lehengê
çîrokê re ye, xwişka navîn jî birayê le-
hengê navîn re ye û xwişka mezin jî, jî
birayê lehengê mezin re ye.

4- Çavreşî: Di çîrokan de hertim çav-
reşî û çavnebarî xwe nîşanê didin û xira-
biyê dixin navbera birayan. Çavreşî li ser
gelek tiştan çêdibe. Mesela: Gava dê û

bav û kurekî xwe zêdetir hî sdikin, yan
birayek zêdetir hisdikin, yan birayek
zêdetir jî aliyê
xelkê ve tê hiski-
rin, birayên din
çavreşî davêjin wî
birayê hisjêkiri û
sergêjiyan jê re
çêdikin, heta
hin caran wî
dikuji an
didine wen-
dakirin. Lê jî ber
ku ew ser ve tèn jî
pêşiya xwe dadimalî-

ne û dikare zû xwe jî dek û dolaban difi-
litîne. Ew bira kesekî dilpak e û jî bo
tolstandina jî birayên xwe jî kînedozî na-
ke.

Çavreşiya zêdetir ku di nava birayan
de çêdibe, xasma li ser keçan e. Lehengê
çîrokê gava du xwişkan an sê xwişkan bi
xwe re tîne malê, hertim keça delal ku
xwişka piçûk e jî xwe re
dihêle. bi-
rayên din î-
car çavre-



şî davêjinê û dixwazin
ku wê keçê jê bistînin.

5- Keça Hêwiyê: Di
çîroka kurdî de. Keça hêwiyê (jinbav-
damarrî) pir delal, bedew e, spehî ye û
bê hempa ye. Lê jî ber ku diya wê miri
ye, niheqiyêke pir mezin jî aliyê jin-
bava wê ve lê tê kirin û hertim bir-
çî, belengaz û şerpeze dimîne.

Keçeke jinbava keça hêwiyê jî
heye ku ew herdu di ciyê hevûdu
de ne. Lê ev keçik ne delal e, bê
mirêz e û reş e. Hin caran jî
tê gotin ku ew keçik
“mina erebeke reş a
lêvdeqandi ye. Îcar çaxê
ku xwezgînî jî keça hêwiyê
re derdikevin, timî jinbav
keça xwe ya ne delal li
şûna wê dike bûk û dide
mêr. Lê berî siwarkirina
bûkê, teyrek an dikek
bi zimanekî mexlûte
dixwîne û bi dawet-

vaniyan dide zanîn ku ew keça dê bibin,
ne eva ku tê siwarkirin e û ya ku esas
bûk e jî aliyê jinbava wê ve hatiye veşar-
tin.

6- Keçeke delal: Di çîrokan de çewa
ku lehengê çîrokê heye, hin caran keçe-
ke tenê ya pir delal jî heye ku xwe bi le-
hengî dide xuyakirin û jê re dibe alîkar,
piştê jî pê re dizewice, hin caran jî pê re
nazewice. Îcar delaliya wê keçe bi ziman
nayê salixdan û her kes jê re hişmethey-
ran dimîne, deng û behsa delaliya wê li
dinyayê belav dibe û jî bo dîtina wê pir
kes dikevin tavila jî û mirinê.


**7- Keça zengin û xortê feqîr-yan ke-
ça feqîr û xortê zengin:** Di hin çîrokan
de keçeke zengin heye ku bi xortekî fe-
qîr re dizewice, yan keçeke feqîr heye ku
bi xortekî zengin re dizewice. Wek me-
sela ku dibêjin: Dil fermanê nasnake,
hin caran ev tişt pê li toreya kurdî jî dike
û keça qiralekî yan ya paşayekî bi kurê
xulamekî bavê xwe re dizewice yan pê re
direve. Yan kurê qiralekî/paşayekî bi ke-
ça xulamekî bavê xwe re dizewice. Ji vê
yekê zêdetir, yan keça zenginekî bi kurê
feqîrekî re direve û hin caran kurê zengî-
nekî keça feqîrekî jî xwe re tîne.

8- Zewac: Zewaca di çîrokan de,
hin caran toreya kurdî serobin dike û
dijberiya xwe pê re didomîne. Ji ber
ku di çîrokan de kê-m caran dê û
bavên xortan diçin keçan jî kurên
xwe re dixwazin, piranî xort bi tena
serê xwe diçin cem bavên keçan û
keçên wan jî xwe re dixwazin. Yan jî ke-
çik diçin xortan dibînin û pêşniyara ze-
waca xwe bi wan re dikin.

Hin caran jî xortekî bê kes û kilûs he-
ye ku bi tena serê xwe radibe diçe li din-
yayê digere û li deverekê, xasma li ba
padîşe, qiran û maqûleki dibe suxrevan.
Îcar jî ber kur ew xort timî dilqê lehneg-
tiyê nîşanê dide, ew paşe keça xwe didê û
wî dike zavê xwe.

9- Dawet: Di çîroka kurdî de, dawet bi
hawayekî wisan xweş
çêdibe ku her kes lê
şaş dimîne. Da-
wetên di çîrokan
de, jî aliyê zeman
ve yan heft roj û
heft şev didomînin,
yan jî çil roj û çil şev
in.

10- Fincana Jehrê:
Hin caran di çî-
roka kurdî de
zewa-



ca bêdil jî, bi zorê çêdibe. Gava keç dil dikeve xortekî lê berî zewicandinê siqûmatek tê serê xort û bi hev re nazewicin, îcar birayê xort an yekî din ku dixwaze bi keçikê re bizewice û dest bi kirina dawetê dikin, keçik jî fincanek jehrî dide destên xwe û naxwaze kes nêzî wê bibe, li pawuka dilketiyê xwe dimîne. Çi kesê /kesa ku nêzî keçikê dibe jî, keçik hema fincana jehriyê dibe ber devê xwe û dibêje: Eger tu nêzî min bibî, ez ê vexwim û xwe bikujim.

11- Hesp: Çawa ku di çirokan de ji mirovan leheng heye, herweha ji heywanan jî leheng heye, ku ew bi piranî jî hespek e, hin caran teyrek e, hin caran jî mişkek e.

Di çiroka kurdî de hesp devereke pir girîng distîne û ji siwarê xwe re pir alîkarî dike; riyên nenas dinase, psikolojiya mirovên biyanî û ya herêmên nenas dizane, bi îşaretan bi swarê xwe dide zanîn û wî bi sqûmatên ku dê bibin dide hisandin. Ew hesp hin caran dilqê xwe di-

Simirr” tê binavkirin. Lê ew teyr pirê caran kal e û nikare bifirre, demeke dirêj xwedikirineke taybetî lê tê kirin heta ku tê ser kewna xwe ya berê û hêj difirre. Carina jî teyr lehengê çirokê ji dinyakê dibe dinyayeke din.

13- Beran: Herwekî teyr, beran jî di çirokan de dilqekî mezin dide leyztandin. Devera ku ew beran lê ne, binê erdê ye.

Du tîp beran hene: Yek reş e û xirabiyê dike, yek jî sipî (mîna berrfê) ye û jî lehngê çirokê re dibe alîkar.

Beranê reş û beranê sipî hertim şer dikin û bi hirran li hevûdu dixin. Gava lehngê çirokê dikeve binê erdê û bixwaze ku ji wir derbikeve, xwe davêje ser piştaberanê sipî û beran wî derdixe ser ruyê dinyayê. Lê eger lehngê bi şaşî xwe bavêje ser piştê beranê reş, beran wî dibe binê her heft tebeqên erdê.

14- Ziya: Di çirokan de pirê caran ziyayek (marê pir mezin-ewdiya-ejderha) dilqê xwe nişan dide. Îcar ew ziyaya bi gerdê xwe pîrî ku mezin e, salixên wî nayêne dayîn. Hin cara ziyaya xwe li hawirdorê bajarê geredor dike, hin caran xwe li hawirdorê baxçeyan geredor dike û gava hîlma xwe jî dikeşîne pê re mirov, heywan û dar û ber tev dikevin devê wî.

Lê ziyayê çirokê, tebayekî dilpak e û kêman xirabî bi xelkê dike, hin caran jî dixwaze ku xwe bi destên lehngê çirokê bide kuştin. Ji ber ku ew ziyaya berê hin neheqî li mirovan kirine û xwe gunehkar dihesibîne û tawanê xwe bi kuştinê rewadibîne.

Ev ziyayê ku di çiroka kurdî de cih girîng, di mitolojiya Grekî û Farisan de jî, di şûfê ya kurdî de xwe nişan dide.

15- Paşayê Maran: Hin caran cin li maran tene zezebê û wan dixine şkefteke di binê erdê de û destûra derketina wan jî nadin. Di şkeftê

de, karbidestiya maran weke ya mirovan tê damezirandin; paşayekî maran heye, wezîrên wî hene, lê jina paşê dikare her tiştî bike û çu mar jî nikarin têkilî wê bibin. Gava lehngê çirokê şasiyekê dike, mar wî dibin cem paşê da wî tawan bike. Lê lehngê û paşê zû li hevûdu tîn û paşê jî alîkarî dixwaze. Lehngê jî disersebibe û destûra derketina wan jî şkeftê distîne.

16- Cin: Di çirokê de, cin tebayên xirabiyên in û her tim teşqeke ji mirovan re derdixin, lê hin caran alîkarî jî dikin. Hin caran jî keçeke cinî dibe evîndarê lehngê çirokê û pê re dizewice.

Çaxê kurê paşayê cinan an keça wî nexweş dikeve, timî mirov (lehngê çirokê) ji wan re dibin alîkar û wek biziş-

kekî diçin tedawiya wan dikin.

Cin, jî mirovan zêdetir dijminatîya maran dikin û wan dixin hesarê, çewa ku li pêş hatiye gotin wan dixin şikefteke di binê erdê de û nahêlin ku derkevin derwa.

17- Dêw: Di çiroka kurdî de gelek dêw hene û hertim bi lehngê çirokê re şer dikin. Dêwên jin hene û dêwên mêr hene. Pirê dêwan duserî ne, lê dêwa mê hertim heft serî ye, û her tim heft kurên wê yên yekserî hene. Mala dêwamê şikefteke e û li navsera çiyayekî ye. Herweha herêmeke çiyayî tev arinzi malê dêwekî ye.

Di şkeftê de yan dêweke heftserî digel heft lawên xwe hene, yan heft birayên dêw bi hevûdu re di şkeftê de dijîn, yan jî tenê dêwek di şkeftê de dijî. Eger dêwekî mêr tenê be, tu kes pê nikare û lehngê çirokê digere ku rihê wî bikuje. Lê rihê wî dêwî jî, sê kurmik in û li piştê çiyayê Qaf di qutikekê de ne, qutik jî jî di zikê heywaneke kovî de ye.


Gava lehngê çirokê çend seriyên dêwa heftserî bi şûrê jê dike jî, ew dêwa mê namire, divê ku her heft serî bêne jêkirin hêj bimire.

18- Rihê Dêw: Rihê dêwê bi tenê ku di şkeftê de dijî, sê kurmik in. Ew kurmik di qutikekê de ne, qutik di zikê çivîkekê de ye, çivîk di zikê kîvroşkekê de ye, kîvroşk di zikê xezalekê de ye û xezal jî li piştê Çiyayê Qaf e.

19- Çiyayê Qaf: Di çiroka kurdî de welê tê xuyakirin ku ev dinyaya em lê dijîn li rastekê ava bûye û li hawirdorê wê çiyarêzek heye ku navê wan bi giştî “Çiyayê Qaf” e. Piştê çiyayê qaf, jî dinyayê der e û jê nayete hesibandin. Ew dever mîna ku dinyayeke din be û jiyaneke ji vir xwestirî lê hebe tê zanîn.

20- Pîrelk: Ji dêwan û cinan zêdetir, di çirokan de pîrelk hene. Ev pîrelk zêdetir xwe di çirokên tirsê de nişan didin û xasma jî bo tirsandina zarûkan tene gotin ku (zarûk) bi tenê negerrin û bi riyan ve neçin.


21- Dunya: Di hin çirokên kurdî de,



guhêre û tiştine dervedemî dike. Di çirokan de, sê tîp hesp hene: a) Hespê Bayê, b) Hespê Agir (Hespê Brûskê), c) Hespê Avê (Hespê Behrê). Lê ev hersê tîp hesp, kêman di çirokekê de cih digirin, tenê di çiroka “Gul û Sînem” de hene.

Dilqê mişk jî di çiroka kurdî de, pir girîng e û mîna mirovan dipeyive, tiştên nihênî bi lehngê çirokê dide zanîn û riyên nenas jê re eşkere dibêje û wî ji mirinê difilitîne.

12- Teyr: Di çirokan de hertim teyrek heye ku alîkariya lehngê çirokê dike û hin caran wî li piştê xwe siwar dike. Ji devereke pir dûr dibe devera ku dixwaze herê, yan wî jî devera dûr tîne mala wî. Ew teyrê efsûnî hin caran bi navê “Teyrê



du heb dinyaya hene. Lehengê çirokê yek caran ji vê dinyaya me derdikeve û diçe wê dinyaya din, li wir dibe mêvanê paşayê yan qiralê wê dinyayê. Ew dinyaya din jî, mîna dinyaya me lê pir xirabî û nepakî çêdibin, lê ne hewqasî pir hindik in. Îcar lehengê çirokê gelek tiştên ku li vê dinyayê hene û li wê dinyayê nînin, bi xelkê wir dide zanin û wan fêr dike.

Di hin çirokan de, sê dinyaya jî hene. Li wê dinyaya sêyemîn xirabî tune, nepakî nînin û xelkê wir nizanin ku tiştin xirab çine; xisarê nadin heywanan jî, mirov û heywan di nava hevûdu de dijîn. Lê gûnê (reng) wê dinyayê şîn e (yan jî kesk e) Gûnê axa wir, yê kevir, dar û beran tev şîn e û yê mirovan jî her wisan e. Îcar gava lehengê çiroka kurdî jî wê dinyaya me diçe dinyaya diduyan û ji wir jî diçe dinyaya sisiyan, pêşî xelkê wir fêri kuştina kew û kevokan dike, ji wan re şûr, tîr û kevan çêdike û hin bi hin wan fêrî nêçîrê dike. Piştî wan fêrî diziyê dike û her ku diçe wan fêrî kuştina mirovan û xirabiya bi hevûdu re dike.

22- Mefhûma Dewletê: Di piraniya çirokên kurdî de sazûmanek heye ku serokê wê qiralek e yan paşayek e. Civateke wî serokî heye ku ji wezîr û kizîran pêk hatiye. Wezîr jî du cûre hene: Wezîrê milê rastê û wezîrê milê çepê. Ew herdu wezîr hertim li cem serok in û serok gava bixwaze ku tiştêkî bike, pêşî bi wezîrê xwe yê milê rastê pişt re bi yê milê çepê dişewire. Serok hin caran jî civata xwe komdike û raya hemûyan distîne.

Serok hin caran radibe wezîrêkî yan du wezîran bi xwe re hildide, xwe kincguhêr dikin û diçin li nava xelkê digerin, rewşa jiyana xelkê bi çavan dibînin û şûnde vedigerin tê, li wê gorê tevdir û ray distînin.

23- Bajarê Şerqê û Bajarê Xerbê: Di çirokan de pir caran behsa bajarê şerqê û bajarê xerbê tê kirin. Kîjan çirokbêjê ku dibêje jî, di behsa bajarê şerqê de navê Diyarbekir hildide û di behsa bajarê xerbê de jî navê Stenbolê hildide. Qiralê yan paşayê herdu bajarên bi hevûdu re kirrin û firotin dikin, keçên xwe didin lawên hevûdu û ji hev re diyarî dişînin. Çirokbêj hertim bedenêk jî li dora herdu bajaran didine çêkirin û li ber dêrî leşker û qulixdar hene ku destûra ketin û derketinê didin û bac ji rêwiyan distînin.

24- Xizani (Feqîrtî, belengazî û tuneşî): Xizaniya di çirokan de tîneke xirab li lehengê çirokê dike. Timî xortek an du bira li ber xizantiyê mala xwe dîterîkînin û diçin devereke dûr li bajarekî nanzozîko dişixulin. Ew xortê xizan di demekurt de zengîn dibe û dibe kesekî xuyani, piştî jî dibe paşe yan qiralê wî bajarî.

25- Xizne û Qencîne: Çewa ku me li

gorê got ku xizaniya di çirokan de tîneke xirab li lehengê çirokê dike, lê hin caran jî lehengê xizan li xizne û gencîneyên zêran rast tê û zû dewlemend dibe, bi haweyekî wisan dewlemend dibe heta ku paşe û qiral jî xweziya xwe pê tînin. Kesê ku xizne bi yê xizan nîşan dide, navê wî Mêrê Şevê ye.

26- Mêrê Şevê: Di çiroka kurdî de, Mêrê Şevê hertim xwe tîne xewna lehengê çirokê û pê riya rast, eger leheng xizan be pê xizne û gencîneyên zêran nîşan dide. Lê gava leheng ji xewna xwe bawer nake, hîcar Mêrê Şevê xwe lê eşkere dike û her tiştî jê re dibêje.

Ev Mêrê Şevê, piştî bisilmantiyê navê xwe di çiroka kurdî de guhartiye û kiriyê Xocê Xizir.

(Xizir û Îlyan, herdu “nebî” (nîvpêxember) ne û li gor baweriya Ola Bisilmantiyê ji wan re mirin jî tune, ew her dibin alîkarê bisilmanan û nexweşan derman dikin)

27- Teyrê Dewletê: Serokê dewletê hertim ji aliyê Teyrê Dewletê ve tê hilbijartin. Gava qiral an paşe dimire, ne kurê wî û ne jî merivekî wî dikeve şûnê, lê di rojêke kifşkirî de xelkê bajêr tev li rastekê dicive û Teyrê Dewletê berdidin. Îcar teyr li ser serê kî deyne, ew dibe serokê dewletê.

Ev yeka han jî, di çanda kurdî de be-yana demokratî û pirdengiyê ye ku çêbûye.

28- Pîrejîn: Karê pîrejînê di çiroka kurdî de, birin û anîna peyaman e. Ew deverên ku mêr nikarin xwe bigehîninê, pîrejînekê, dişînin. Xasma di gihandina keç û xortan de, pîrejîn dilqekî mezin dike.

Lê hin caran pîrejîn ji bo fesadî û xirabiyan jî tê bikaranîn, hin caran jî bo jîrêderxistina jin û qizan tê bikaranîn û hin caran jî, ji bo kuştina hin kesên xuyani tê bikara-

nîn.

29- Şikeft: Wargeha girîng a çiroka kurdî, şikeft e. Hertim lehengê çirokê li şkeftê rast tê û li wir pêrgî dêwan, cinan, maran û pîrelkan dibe. Yan jî leheng di şikeftê de gelsên xwe yên zehmet çareser dike û riya felatê dibîne.

30- Qesr-koşk: Devera ku qesr an koşk lê ye, navsera çiyayekî ye û bi tenê ye, zêdetir avayî li wir nînin. Di wê qesrê de yan dêwek dijî, yan dêweke jin tevî keçek xwe yan tevî heft kurên xwe dijî. Lehengê çirokê gava li wê qesrê rast tê, dibe mêvanê malê û hin caran pê xirabî dikin hin caran jî, jê re dibine alîkar.

31- Baxçe: Navê baxçeyê di çiroka kurdî de “xazbaxçe” ye; tê de her cûre darên fêki hene, kaniyek an zêdetir kanîsark hene, li ber wan birkek (hewz) heye û ji guliyên daran tav nade serê.

32- Kalê rihsipî: Di çirokê de kalê rihsipî, nîşana xirabiyan e û timî derdikeve pêşiya lehengê çirokê, jê re sergêjî çêdike.

Bejna kalê rihsipî, pir qut e, hin caran bihostek e û rihê wî du caran ji bejna wî dirêjtir e. Kalo gava bi rê ve diçe, rihê xwe li nava xwe dipêçe û pir xwarin jî dixwe.

Kalê rihsipî timî keçan dirêvîne û wan dibe dixê sikefta xwe ya di binê erdê de, lê têkilî wan nabe tenê wan bêhn dike yan rojê du-sê caran li wan dinêre û bi wî hawayî kêmûşa xwe sawî dike, kewja xwe dadi-xîne. Lê ew kalê rihsipî hertim ji aliyê lehengê çirokê ve tê kuştin û leheng wan keçan xilas dike.

33- Ava Şifayê: Di piraniya çirokan de kaniyek heye ku ava wê şifa ye û kesên ku jê vedixwin, jiyana wan dirêj dibe.

Ev av, rengê Ava Heyatê dide û dibe ku ji çanda bisilmantiyê dekatibe nêv çiroka kurdî.



HUNERÊ KIRMANCA DE CAYÊ KILAMAN¹

Kultur / çînit-çand (fr. ing. culture, alm. Kultur, tir. kûltûr / ekin) çik o? Ebi kilmîye mordem şikîno vaco, ke kultur pêrotîya⁽²⁾ qîmetanê jûtiya hiskerden û fikirîyena jû şarî yo. Yanî pêrotîya qîmetanê, ke jû şarî ebi ked û emegê xo, ebi hunere xo, ebi stîlê jîyana xo, ebi eleqa xo; ebi tabiatî viraystê, ava kerdê û nê qedrî jûbiyena yan jî jûkerdena fikirîyen û hiskerdena nê şarî de rolode bingeyîn kay kenê, na jûtiye kenê mumkun, ê. Bê nê qedra qe jû şar neşikîno wayirê jûtiya xo ya fikrî û ruhî bo. Kulturo fikrî yan jî ruhî, kulturê materyalistî/maddî ser ro xo ava kenê. Serê hardan ra teyna insan şikîno hacêta virazo. Wuncîya no insan nêşkîno bê hacêta jîyana xo bido devamnayene. Yanê mordem/insan tabiat ra zêdêrî ebi kulturî / çînitî eleqa de ro. Mordem ke berhema dano / veceno yanê kulturê xo, ke ano meydan teba nê kulturê xo ye maddî, xo jî ano meydan. Nê kulturê maddî ser ro jî kulturê fikrî û ruhî êno avakerdene.

Ebi pêrotîya fikrî û ruhî mordeman / insanan dinyayêde newîya mordematîye vecênê hemverê tabiatê kuvî û primîtvî. Çimke teyna mordem ebi na qewete, ebi nê aksiyonanê xo şikîno dinya bivurno.

Angorê nayê mordem ebi kar û barê xo şikîno nê kulturî bivurno û gor armancanê xo reyna virazo. Bê guman ebi jû nivîsî, yan jî zerrê jû nivîsî de kultur ser ro nivisnayene xêlê zamet a. Eke no kultur ke kulturê Kirmancan bo, na zametîye tayîna bena giran. Se ke êno zanayene. Mezopotamya de gelê şarî, gelê şarîstanî û girêdayê nînan jî gelê kulturî ava biyê. Nê kulturan ra tayê biyê vîndî, tayê tepîya mendê û tayê jî avê şîye, biyê hîra, biyêy malê şaran. Nînan ra jû jî Kulturê Kirmancan o.

Be guman wertê pêrotîya nê qîmetanê jûtiya hiskerden û fikirîyena jû şarî de, yanê wertê kultirî de xêlê çî, beşî estê. Kayê folklorîkî, şanîkî, destanî, edebîyat, werdene, xoradayene,

LERZAN JANDIL

ronîstene, roşan/cejnê dînî, huner, hacête ke amê viraştene û gelê çîyê bî-nî beşê kultirî ye, zerrê kultirî de ca cênê/gênê. Se ke êno zanayene nê beşî jî wertê xo de benê lete, yan jî vatene-de bîne "bineşbeşe" nê beşan jî estê.

Nê nivîsî de ma, beşêde kultirî, yanê hunerî de, hunerê Kirmanciye de cayê lawikanê / deyiranê / kilamanê Kirmancan ser ro vinderîme.

Lawike çik a? Senê kilamî estê? Sebebo ke mordem lawike vano çik o? Şarê ma ebi lawikanê xo, kancî hetanê xo ano re zon? Nê deyirî se hetanî ewro amê? Lawikê ke nêrestê roja ma cinay ra wo?

Ne persane corênan mordem şikîno derg kero, zaf kero. La belê mesela zedekerdene (zedekerdene) nê persa nîya. Mesela zelalnayena (zelalkerdene) nê persa wa. Nê nivîsî de ma wazenîme serba wendekarê / wendoxê xo tenê na mesela ser ro vinderîme, qasê zanayena xo na mesela bikinîme we.

Kilame/lawike çik a? Vatena ke mordem tede der û kulanê xo, kef û eşqê xo, hes û qarê xo, dîroka xo, şiklê jîyana xo, kar û gurê xo, çîyê ke serê mordemî ser ra derbaz biyê, yanê her hete xo, ebi ritim û muzik ano re zon kilam/lawik a.

Lawikê ma zaten ebi fek hetanî ewro amê. Tenê kesan nê lawikan ra tayê dê arê, nivîsne. Nê Lawikî Hevî, Berhem, Warê, Rewşen, Pîya û ê kovaranê bînan û tenê pirtûkan de, ze Tanî Estanîkî û Deyirê ma, Folklorê Ma ra Çend Numûney, amê arêdayen û nivisnayene. Xêlê hunermendan jî kasetanê xo ye muzik de nê kilamî vatê.⁽³⁾

Serbeta ke zarava ma de nivisnayene zaf herê dest kerdo ci, xêlê kilam jî biyê vîndî, amê xo vîrra kerdene.

Karê manê ewroyîni o wo, ke ma ganî kal û kokimanê xo resîme, çîyo ke ê zanê perîne binivisnîme. Serbeta ke welatê ma hetê dişmenî ra êno talkerdene, nê kal û kokimê ma zafêrî şîye sukanê girsanê Tirkîye, tayê şenik jî dewan de mendê. Ganî ma nînan doz

kerîme. Çimke ebi merdena dînan zafêriya nê kultirî, orîjînalîya nê kultirî, yanê çîyê otantikî jî şonê binê, hardî. Ganî no kar karê manê yewîne bo.

Se ke cor jî nivîsîyo, kilaman de mordem gelê çîya ano re zon. Gor nê çîyan jî beşê kilaman estê. Nê beşî ebi rêze nê wê:

- kilam / lawikê govende (veyvan û kayan)

- kilamê eşq û heskerdene (kilamê çenan û xortan)

- kilamê xerîbîye û welatî

- kilamê camêrdîye: kultê kesan

- kilamê lorîke (lorikî)

- kilamê şîwanî (şîwarî)

- kilamê edetan

- deysê/beytê dînî

- kilomêyeke wertê destanan de ênê vatene

- kilamê kesan

- kilamê anonîmî

KILAMÊ GOVENDE

Demo ke qesa govende êna vatene, ganî veyve mero famkerdene. Bê guman veyvan de govende kay bena. Bê govende, veyve nêno fikrê mordemê Kirmanci. Govende û veyve jûbînî ra zaf girêdayî ye. Jû bê ê bînî nêbeno. Mordem vano qey hurdmîna jû bingeqese wo. Cêrabîyena veyve û govende a wa, ke zafêriya veyveyan de dawulzurna jî esta, hama her govende de dawulzurna nêbena. Bê veyveyî jî mordem govende cêno, govende girê dano. Kirmanciye de "Kalo - Gaxan⁽⁴⁾ her kesî rê nas o. Zav-zêç, qij-pîl, cênî-camêrd her kes "Kalê Gaxanî" nas kenê. Kal serre de rêy amo çê dîna. Ê nê pêro jî zanê, ke Kal bê govende, bê kilamanê govende nêbeno. Yan jî "Beran/wosn civerdayene bê govende û bê kilamanê govende nêbena.

Naca tenê kilamanê govende ra, di hîrê çekû nîyarê:

Kido⁵

Kido kido kid vano:

"Merge weş a, amnan o"

Kido kido kid vano:

"Merge weş a, amnan o"

1 Na ware de karê mi çîno. Yanê ez karê folklorîkî ser ro nêxebetîna. La belê çîyanê folklorîkî dana arê. Serba kêmasî û şaşîyan mi ra, keremê xo mi ravêr. 2 pêrotênîya jî êna vatene

3 Na ware de gelê hunermendan emeg do. La belê zaf heba

kasetanê xo da ebi tirkîjî vato. Na, ya kêmasîya dînan a, yan jî xo huna kultirê Tirkan ra, tirkîtiyê ra nêxelesno ra. Na jî problema mawade bîn a.

4 Kalo Gaxan

5 Kilama govenda hetê Gimgimî. Arêker: Bira Hesên

Bîyo honikê şanî

.....
Bîya adîr pê şanî
Bîyo honikê şanî
Bîya adîr pê şanî

Kido kido kid vano:
"Merge weş a, amnan o"
Kido kido kid vano:
"Merge weş a, amnan o"

Zozan weş o, amnan o
Cênî ênê tek teke
Zerrya mi kewta rindeke

Kido kido kid vano:
"Merge weş a, amnan o"
Kido kido kid vano:
"Merge weş a, amnan o"

Şîme derê Çorsane
Xilor tedê vay dame

Kido kido kid vano:
"Merge weş a, amnan o"
Kido kido kid vano:
"Merge weş a, amnan o"

Lê derdî 6

Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Herçî rindî berdî lê(7)
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Kelo korî ma rê verdî
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Nê derdî laca werdî
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Nê derdî kamî werdî
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Layikî çêneka hes kenê
Lê derdî, derdî, derdî

Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Axir yenan, nê derdî
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Pîyê çêna keçil o
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Qalindê çêna giran o
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Sed hezara wazenê
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Qalindo zaf kî nêdano
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Xortê ma ze fidan ê
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Qayt kenê, nîya nêbeno
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Layikî çêneka remnenê
Lê derdî, derdî, derdî
Nê derdî kamî werdî
Heqo yeman ê, derdî

Bizine 8

Hey, hey, hey, hey bizinê
Tîşt, tîşt, yah, yah dayika min ê

Na bizina qoç mezinê
Na bizina qoç mezinê

Hey, hey, hey, hey, bizinê
Tîşt, tîşt, yah, yah dayika min ê

Bizin kewta merga minê
Bizin kewta merga minê
Hey, hey, hey, hey bizinê
Tîşt, tîşt, yah, yah dayika min ê

Kim Ximê 9

Kim Ximê to rê vana
Rindekê to rê vana
Çîmanê to kil kena
Biskanê to ver dana
Kim Ximê xo rê ana

Kim Xima tullemanrî
Çîçega diyarê banî(10)
Nata bê lewê panî
Biskanê to ver dana
To xo rê ana

Huzna 11

Wî day, wî day, wî dayê
May to bimro Huznayê
Wî day, wî day, wî dayê
May to bimro Huznayê

Huzna bîya veyvike
Wî day, wî day, wî dayê
Huzna bîya veyvike
May to bimro Huznayê

Huzna 12

Wî day, wî day, wî dayê,
wî dayê, wî dayê
Wî day, wî day, wî dayê, bay(13)
to bimro huznayê

Ez ha şîna eskero, wî dayê, wî dayê
Ez ha şîna eskero, wî leyro, Huznayê

Kom(14) ku Huznay mi bero,
wî dayê, wî dayê
Kom bero ez kişeno, wî leyro
Huznayê

Husna 15

Wî day, wî day, wî dayê, wî leyro,
Husnay mi
Wî day, wî day, wî dayê, wî leyro,
Husnay mi

Şaro vano "Husna vîya ya(16)", wî
leyro, Husnay mi
Şaro vano "Husna vîya ya", wî leyro,
Husnay mi

Şar ar "ma zî pîya ya" wî leyro,
Husnay mi
Şar vono "ma zî pîya ya" wî leyro,
Husnay mi

6 Kilama govenda hetê Gimgimî. Arêker: Bira Hesên

7 Verziyonêde na kilame de çekuya verêne nîya (yanê dawîye de lê êsto) êna vatene.

8 Kilama govenda hetê Gimgimî. Na kilame de hurdmîn zaravay jî estê û verziyonê xo yê cêrakerdî zaf ê. Mi naca na kilame kilm gurete. Arêker: Bira Hesên

9 Dewa Gimgimî Dirba ra Elîcan. Çîme: Arşîvê mi.

10 bonî

11 Hetê Gimgimî de êna vatene.

12 Malmîsanîj; Folklorê ma ra çend numûney, rûpl. 29, Weşanên jîna Nû, çapa yekemî, Îlon 1991, Sweden

13 pîyê to, bawoyê to

14 kam ke

15 Espar, J.; Tanî estanîkî û deyîrê ma, rûpl. 45, Weşanên Rewşen, çapa yekemîn, Adar 1995 Stockholm

16 vîya wo

Cîrane¹⁷

Cîranê, cîranê, cîrana mi
Hevalê, hogirê, derman yarê
Cîranê, cîranê, cîrana mi
Hevalê, hogirê, dermal yarê

Cîrana mi honî⁽¹⁸⁾ ya cêro yena
Cîranê, cîranê, cîrana mi
Cîrana mi honî ya cêro yena
Cîranê, cîranê, cîrana mi

Xumxumê¹⁹

Xum Xumê to rî vana
Ti nêba⁽²⁰⁾ ez nêvan
Ti nêba ez nêvana

Darê mezlandê ma kewrî⁽²¹⁾
Xumî yenî hewadê hewrî
Çimsîfyay î, sênegewr î

Nînna²²

Nînna, nînna, nînnayey, nînnayey
Nînna, nînna, nînnayey, nînnayey

Hêga sur o, filhon⁽²³⁾ o, nînnayey
Hêga sur o, filhon o, nînnayey

Yew⁽²⁴⁾ ha mîyon di aw⁽²⁵⁾ donû,
nînnayey
Yew ha mîyon di aw donû, nînnayey

Teres bawkê keynon⁽²⁶⁾ o, nînnayey
Teres bawkê keynon o, nînnayey

Xezal²⁷

Xezale, hêlî mêlî, delaley hêlî can
Xezale, hêlî mêlî, delaley ez im can

Ez Heleb, Dîyarbekir, Xezaley hêlî
can
Ez Heleb, Dîyarbekir, delaley ez im
can

KILAMÊ ÊŞO Û
HESKERDENE

Serbeta ke nê kilaman çênê û xortî
vanê, mordem şikîno vacê kilamê
"çênan û xortan" jî. Çênê û xortî hes-
kerdena xo, eşqê xo, jûbînî nêresîyena
xo, bi kilmîye waştênanê xo bi nê kila-
man anê re zon. Nê kilamî zafêrî lokal

ê. Yanê her dewa Kirmancîye de, her
mezra Kirmancîye de çênê û xortî kî-
laman erzenê waştîyê xo/waştîya xo
ser, herserdê xo ser. Motîvê nê kila-
man tim rindekîya bejna waştî(ye),
biskê waştîye, rindekîya waştî(ye),
çêkerîya waştîye, xebatkarî û hewlîya
waştî yê. Nê motîvan ra çend mîsalî nî-
ya rê: 1- Yê çênan. Çen û biska xo ta-
dayene; Sêno sîs, sîsik; Silota surê;
Gerdano sipê; Bejna qawaxa, bejna ze
qawaxa; Mîyano barî; Por çima / mi-
yanê barî ser de verdayene; Puluk ver-
dayene; Destê îpegî; Çim şîya, bûrî
qeytan/qelem bîyene ûêb. 2- Yê Xor-
tan. Dest de qutîye, şane bîyene; Puluk
dêmdayene; Bejna rindeke; Aksesu-
varê bînî, ze îştanî; Hunermendiya
xortan ûeb. Serbeta ke ne niyame kom-
kerdene, nivîsnayene, zaferîya nînan
ver va vîndbîyene şonê. Naca ez nînan
ra, tenê nûminê ke mi hetê ma ra dê
arê, dana.

Canî²⁸

Mi va: "canî canî canî mela mi
canî⁽²⁹⁾"

Çimê to ke şîya yê bûrîyê to qeytan î
Silotê to ke surê ze saya Gûmûşxanî
Bêçikê to ke bariyê ze qelema destê
walyê Erzînganî"

Bêçikê to ke bariyê ze qelema destê
walyê Erzînganî

Mi va: "Silotê to ke surê ze saya
Gûmûşxanî"

Mi va: "Nata şîya ke lewê panî"
O lewê ma bî qir û qotik kewt wertê
der û cîranî ax cana mi canî

Mi va: "canê waxto ke cêro amêne
kardî mi dest de bîye

Mi xo re dare ke taystê

To dî, to verê çêverî de nîştîbî ro, to
xo rê pûçik viraystê"

Mi va "aqilê mi ke no aqilê bîyene
canê canê mi to xo rê waystê"

De canî canî melema mi canî

Mi va: "bejna cana mi ke rindek a,
qawaxa serê tûmî ya

Erê canê qe kî şar alem vaco,
rîndênîya to bi xo çimî dîya"

Mi va: "nêzo piyê to, to dano nêdano,
teselîya ma bifiyo,

Hundê ke nê raya ra ama şîya, qor û
qenesta ra bîya"

De canî canî melema canî, de canî
canî dîlbera mi canî

Mi va: "germê perojî yo, ez ama, ke
melema mi nîsta ro de sacî ver de
Nêzo xedarî se vato, hêstra varnena
silotanê zêda ser de"

Mi va: "lawo waxto ke bêzar a destê
daye bice.

Şewa ênî ze şamya merda mi re teber
de"

De canî canî melema mi canî

Va ke: "wa bo, wa bo, mîrê mi wa bo
Wa mîrê mi bêro verê çêverê ma de
pêya bo

Ronênî koreke⁽³⁰⁾ mîrê xo rê pocî, wa
îsta mîrê mi yabo

Ronênî koreke mîrê xo rê pocî, îsta
mîrê mi yabo"

Va: "di zerrê ke jûbîn ra hayşt bê,
emşo nêbo, wa şewêna bo"

Mi va: "canê aşme vecîye, bîye cila
Ez verê çêverê çê piyê to de bîyane
qila

Mi rê çêver yake, hebê mend bî, ke
kutkanê çê piyê to ez kerdê vila"

De canî canî melema mi canî

Mi va: "verê çêverê çê piyê mî, bi
çifte kemerî

Çêver yake, huna ke aşme kewta binê
hewrî"

Va ke: "çê ma seba to ra kerdê pê
çêverî dar û kemerî

Çê ma seba to ra kerdê pê çêverî dar
û kemerî"

De mi va: "ti zerre de bifeteliye
tebera ez çi wele xo ro kerî"

Mi va: "germê perojî yo, ez şîya, ke
melema mi çê de nîya

Ondêr kozmagê bonî mi ser ro
feteliya

Haşê mi amê şî, ez gina waro, sarê mi
gina kuçika pê adir ro, didanê mi
şikîya"

Ez şîya lewê mele û şêxa, mi va:
"gonya didanê mi çik a?"

Va: "gonya didanê to, cana to bi xu
ya"

Corde ênê teke tûke⁽³¹⁾

Zerrya mi kewta çêneke

17 Espar, J.; Tanî estanikî û deyîrê ma, rûpl. 58, Weşanên
Rewşen, çapa yekemîn, Adar 1995 Stockholm

18 ha wa cêr ro êna

19 Malmîsanîj; Folklorê ma ra çend numûney, rûpl. 17,
Weşanên jîna Nû, çapa yekemîn, Îlon 1991, Swedan

20 Ti nêbê

21 Darê Mezalanê ma kewrî ê.

22 Espar, J.; Tanî estanikî û deyîrê ma, rûpl. 42, Weşanên
Rewşen, çapa yekemîn, Adar 1995 Stockholm

23 şuve

24 iû. zû. vo

25 awe, awike, axwe

26 piyê çênan

27 Espar, J.; Tanî estanikî û deyîrê ma, rûpl. 60, Weşanên
Rewşen çapa yekemîn, Adar 1995 Stockholm

28 Na kilame D. Baba vano. Çime: Arşivê mi.

29 Hetê ezafeya zonê ma ra ganî "Canî" mero vatene.
hurêndîya "Canî" de "Canê" bêro vatene. Hama ez naca bawar
kena, serba kafîye ra, "nîya ama vatene.

30 ronênîya korekî

31 Dewa Gimgimî Dirba ra Elîcan. Çime: Arşivê mi.

Meyman amê vêšanê
Adir çîno pê şanê

Çênê ênê teke tuke
Zerrya mi kewta kilmeke
Bîyo honîkê şandî
Nata bê lewê panî

.....
Rayê dûrî, rayê dûrî⁽³²⁾
Sayî dara ra bîyê sûrî
Ewro çîqa kewto mi vîrî
Zê bijika binê adirî, dendikê sîrî
Xo rê ewro di roj yo
Xazgînîyê ne zemanî bîyê zûrî

.....
Va êno vayê koyî⁽³³⁾
şaneno pelê soyî
mi va rinda mi
kata nîya oxir kena
ez bê to nibena gorî

.....
Vare şan o, vare şan o
Îştanê destî şewle dano
Hecî muxtar qerar dano
Nişaniya ma ewro wuncî pêde dano.

.....
Hemêde mi ti şîya welatêde durî⁽³⁴⁾
Sayî dar o de kaleke ra biye sûrî
Mevinde bê ti zaf kota mi vîrî
Ti van ke jê dendikê şîrî

Wî çêne³⁵

Wî çênê, wî çênê derdê to
Zerrya mi kewta bejna to
Derdê dela maya maya to
Derdê kopekê piyê to

Zerda mi³⁶

Berde, berde, girda pîlê berde
Qije verdê,
Zerda mi sacî verde,
Mîzzî kerde,
Mi va: "Zerda mi,
bê ez to berî"
Mi kerd nêkerd, xebera mi nikerde

Çêna Xalî³⁷

Dewa ma birr û kare
Der û cîran sono ware
Ez malê dîna se kerî
Esqê to ma rê beso, çêna xalî

Çêna xalî, çêna xalî, çêna xalî

Bisike poze şîme malî, çêna xalî

Dewa ma birr û sêjî
Bê izlemê to vejî
Na ussarî veyvê ma bo
Pîl û qiz têde sa bo

Çêna xalî, çêna xalî, çêna xalî
Bisike poze⁽³⁸⁾ şîme malî, çêna xalî

Dewa ma birr û kare
Der û cîran şîyo ware
Ez malê dîna se kerî
To ra piya kume têvirare

Çêna xalî, çêna xalî, çêna xalî
Bisike poze şîme malî, çêna xalî

I

Çê çênê melema mi⁽³⁹⁾
Ez ke cêro amunê çê şîma,
Sosina mi to dî, mi to ra xatir wayşt
ra,
Ti di gamî, mi dima bîya hîra,
Ez pêser cêronê ra,
Ti wertê çîmanê mi de ana diqetlî
nîya da,

Amuno ke lew to ra ni,
Zalimê to çî ra nêverda,
A sate bîye a sate derde to mi ra bî
giran,
Ti bîya kardîya alafiranga,
Cîgerê mi zerede birana,
Ez bi to ra piya şome diwanê Ana
Fadîma,

Melema mi, na dîna nîya, a dîna,
Ana Fatma persena qenter başîya
şîma cênîya na,
Çopal dana rûyê to ro, rûyê to kena
siya,
Vana: "çênê çêvêşayî, ... xo dime
vêşna",

To cêna erzena lê qetranî
Mi kena bekçiyê verê to
To verde kolîyo name pira,
Kelî yê nê kelî ser de
Gûneka ma to re yêna
Şome ginema Ana Fatma ro,
Ti ef kena,
Kena heqa canê ma,

II

Hetê oda de nişena ro, kinca
derzena⁽⁴⁰⁾
Çên û biskê xo ta dê
Ardê resnê binê gula xo de girê dê
Amê destê ma toqa kerd
Mi destê sosina xo kerd zerê destê xo

Ti vana îpego zerê destê ma de
Vana: "lawo destê mi ra verde"
Sosina mi xatirê to neşikneno,
Şarê dewa şîma dedî qodî kenê heqa
ma de

Vana: "lawo owo ke kuno wertê di
gonulo..

Alancixe pirano Şa îmam Wusenêno
ke Kerbela de"

Çala Erzîngan o, peyde şono dere,
Ama ke sosina mi niştâ ro,
Non pocena socî ver de
Des û di cayde poro filik munito,
Leto jû pêde esto,

Leto jû verde ardo sênê sîsî ser de
Binê çimû ra ma de nîya da,
Cîgerî qir kerdî ma zere de
Ez wuştno ra şîyono teber,

Gula xo avaro kerde

Mi va: "heqo ti ke heqênî kena,
Mîno na melema mi rojê verde
meverde

O ke wertê ma de xayênênî keno,
Awxa siyayê biyarê hurdmîn cimo
serde"

.....(41)

Dîrê tercumanî ma arêc ra veciyê,
Pêro kî dişmenê Xizirî,
Pêro dişmenê Xizirî,
Pêro îne gon û qêrête xo eyşt,
Xo ozno re hetê Tirkanê Qirşehîrî,
Xo ozno re hetê tirkanê Qirşehîrî

Mi va: "birayênî hênî,
Heq kenê nîya mekerê
Şîma wayîrê rayber û pîrî,
Şîma wayîrê rayber û pîrî
Êlgêna şîma mi rê lazim nîya,
Miradê min o yara mi bikero
Xizirê pê pirdê sûrî,
Xizirê pê pirdê sûrî"
Sosina mi cîgerê ma perenê, göyül
göyül⁽⁴²⁾,
Aseno serê nê adirî,
Hey gonul gonul serêde adirî

Heserê Welatî⁴³

Mi va: "Nalefî şoro topraxa hunanî
Ne te de estê gerçeğî ne estê zîyarî
Kewto re mi vîrî wetenê bav û kalî"
Mi va: "nasîb bo ez şopê welatî ser de
Ez bêrî bêrî, bêrî, bêrî, bêrî, bêrî,
qewme bêrî"
Mi va: "ez şopê welatî ser de ez bêrî
bêrî, bêrî, bêrî, dost de bêrî"

Mi va: "Welato durîyo pê xêlê koya

32 Na kilama waya mi Gulizar a. Çîme: Arşivê mi.

33 Hetê Gimgim de êna vatene.

34 Berhem Nisan 1992, Hejmarel - jû cênîkêde Dêrsimî mêrdê xo rê
kasete kena pir, tede vana. Arekêr Birawo Derg. Motivêke na kilame de
der dorê Gimgim, Kela û Karliova de jî estê.

35 Heciyê D. Çîme: Arşivê.

36 Heciyê D. Çîme: Arşivê mi.

37 Berhem, hejmar 8, rûpl. 39, Gulan 1990, nivisna. Areker: Hawar
Tornêcengî

38 Bijike poje

39 Kilama Qemê Arevîî. Çîme: Arşivê mi.

40 Kilama Qemê Areyîjî. Nê kilaman de tenê cayî rind nîyamê
famkerdene, nayê rê jî tenê kê m amê nivîsnayene. Çîme: Arşivê mi.

41 Hurdmîna kilamê Qemerê Areyîjî zaf derg ê. Serbeta ke xêlê ca cênê
û serba famkerdene jî ganî bêro eşkera kerdene mi nê kilmî kilm
nivîsnayî. Verziyonê binî yê nê kilaman jî estê.

42 Qesê Tirkîyê ke kilame de estê, mi nivurnê.

43 D. Baba xerîbîye de ro. Hem derdê xerîbîye zaf ê, hem jî welat kewto
vîrî. Her çîqa ke naca "welat" teyna, "dewa" yan jî "der û dorê" dewa
şayr a jî, na kilame de Dewrêş Babayî hesreta welatî, derdê xo zaf rind
ardo re zon. Her çîqa ke na kilame zaf derg a jî, serbeta ke na kilame de
xêlê çî amê re zon, mi nêwaşt ez na kilame kilm bidêrê. Çîme: Arşivê mi.

no
Kes bi derdê zerê kesî nêzano
Merdene pê goşê ma de ra se beno
heq bizano”
Mi va: “Nasîb bo ez şopê
welatî ser de
Ez bêri bêri, bêri bêri, bêri bêri,
qewme bêri”
Mi va: “Ez şopê welatî ser de ez bêri
bêri, bêri bêri, dost bi bêri”

Mi va: “Bêri şorê meskanê bimbarekî
Şorê Keça diyarê hewşa verê
dara ê gerçegî
Şorê Goşgar verê kêleka ê kalekî”
Mi va: “Nasîb bo ez şopê
welatî ser de
Ez bêri bêri, bêri bêri, bêri bêri,
qewme bêri”
Mi va: “Ez şopê wetenî ser de ez bêri
bêri, bêri bêri, dost bi bêri”

Mi va: “Bêri şorê dîya rê mexbera
Hazir Bavayî
Ser ro ena na sûra vayî
Defêna nasîb bê qurbanê Goşgar
Bavayî
Mi va nasîb bo ez şopê welatî ser de
Ez bêri bêri, bêri bêri, bêri bêri, dost
bi bêri

Mi va: “Ez şopê welatî ser de ez bêri
bêri, bêri bêri, qewm bi bêri”

Mi va: “Bêri şorê waranê diyarî
Cîranî seba qurbanê benê top şonê
ware wertê malê şanî
Kewtê ra mi vîrî cîranê bav û kalî”
Mi va: “Nasîb bo ez şopê welatî ser
de
Ez bêri bêri, bêri bêri, bêri bêri,
qewm bi bêri”
Mi va: “Ez şopê welatî ser de ez bêri
bêri, bêri bêri, dost bi bêri”

Rojê nê rojê çeverê ma qebriştana
Meyîtê ma nanêro serê çar dara
Vanê: “Dewrêş Baba emşo biyo
meymanê Mem û Zera”
Mi va: “Nasîb bo ez şopê welatî ser
de
Ez bêri bêri, bêri bêri, bêri bêri,
qewm bi bêri”
Mi va: “Ez şopê welatî ser de ez bêri
bêri, bêri bêri, dost bi bêri”

KILAMÊ XERÎBÎYE

Şarê ma ke dest kerd ci, şî xerîbîye
nê kilamî amê vatene. Verde kilamê nî-
yanênî eştene kesanê ke şîye eskerîya
Osmanîye yan ji Tirkîye. Bê guman
mordem nêşikîno sindor bonco wertê
kilaman û vaco: “Na kilama eşqîya, na
ê xerîbîy a.” Nê çî zaf tê werte de rê.
Ez naca teyna çekûyade jû kilama xer-
îbîye nivîsena.

Yazî amo, yazîyo kan o⁽⁴⁴⁾
Perrî çînê, ez xo ra nî
Şorî Wanê kambaxî
Serê Kekilê xo ser ro biwanî

KILAMÊ CAMERDÎYE

Kilamê nîyanênî verde serba kesane
ke şerê eşîrîye de mêrdetênî kerda, fi-
rarîye kerda, vatene. Pêco nê kilamî
serba kesanê ke hemverê koledera,
yanê Osmanîya, Tirka yan jî Wurizi şer
kerdo amê vatene. Ez na derheq de wa-
zena naca ca bidêri vatena W. Shakes-
paire “Kesên ke kilamanê jû şarî vira-
zenê, kesanêke kanûnanê ê şarî vira-
zenê ra tayina qewetlî yê” Se ke êno
zanayene jî her şar qehremananê xo e-
bi xo çînenno we yan jî hozanê şarî qeh-
remananê şarê xo gor waystena şarê xo
çînenno we. Şarê ma jî nîya kerdo. Nê
kilamê camerdîye hetê Dêrsim de zaf
e. Ez naca nînan ra hîrê kilamê ke
Dêrsim de zaf amê şinasnayene nivîs-
nena.

Xelil Beg⁴⁵

Mîre Mîre bêbext o Mîro
Ax Mîro Mîro bêbexto Mîro
Bêbextênî meke dismenê to Xizir o
Kam ke be kîn o, xayîn gineno pîro
Ax kam ke be kîn o xayîn gineno pîro
Ala ûrze Memê Îlasî çekê guretê
kistena Xelil Begê mi rê fint cêrîno

Fêma Fêma Xelil Begê mi hênî yo
Va ke çê Mîrî de meser biyo
De Mîre Mîre adir de çê to kuyo
Qêmişîye ro Xelil Begê mi meke,
misayîvê tu yo
Axirê wertê sima de îqrarê Elî yo
Adirê Olî de çê Mîrî kuyo

Xeznê çê Sawşên Begî zaf ê wayê
Heq zalimî vîra şîyo

Fêma Fêma Xelil Begê mi weke
Emîna Xanima waye xevere rûsnena
mamurê sola Koreke
Mamur Heqî nas kena Xelil Beg amo,
egle meke
Mamur ti ke Heqî nas kena Xelil
Bego birayê mi amo egle meke
Jê çêvêsayî ro Helil Begê mi kerda,
esmo dubare û deke
De Mîre Mîre bêbextê meke.

Fêma vêsayîya Xelil Begê mi cado
Fêma vêsayîya Xelil Begê mi cado
Ostorê Xelil Begê boncê tever, cinîso
rado
Rêya bezna rindeke va xo pašta
ostorê kimefî sero helmê tado
Mîro Heqî roza ke da to, ci ra helmê

ma do
Xelil Begê mi do kîstene, ci ra ne
domano ne ewlado
Xelil Begê mi do kîstene, çêverê odî
û qonaxa Fêma de cado

Fêma mêres e Xelil Begê mi, kemer û
rîs o
Fêma mêres e Xelil Begê mi, kemer û
rîs o
Ostorê kimefî jên kerê mereqlî yo,
helmê cinîso
Jênê ostorê kimefî altun o gimis o
Xelil Begê mi ve xo, zerno xalis o
Kila comerd de çê Mîrî ra nîso
Mordem çitur kîseno mordemê
nîyanênê kom û meclis o
Mordem çitur qest keno dano kîstene,
begê nîyanênê kom û meclis o

Derd o derd o Xelil Begê mi derd o
Ax derd o wax derd o Xelil Begê mi
derd o
Xelil Begê mi şîyo Mamexatûne, rîyê
xo terdo
Mîrî xapito, Xelil Begê mi qan kerdo
Berdo Baxire têt sond werdo
Na Mîre way Mîre Heq to rê nêverdo
To Xelil Begê mi do kîstene, çêverê
odî û qonaxo Fêma de zerze kerdo

Fêma Fêma Xelil Begê mi kaşî
Way berverna mi hêfê birayê xo
gurtene nêno
Ax waxê min o bîno wayrê merex û
taşî
Wayê merex meke kafirê dîn tersî
Na dîna de neçeler qer kerdê axay
mêrxasî
Na dîna de çêvêsayê bêbextî day
kîstene, xotê bornebaşî
Xelil Begê to do kîstene, kerdo ve
qolindê Memê Îlaşî

Sahan⁴⁶

Hozatî persena cadê tomoflî
Heq adir be Avdîla pasay verdo
Koto qeracê mordemê pîlî
Sahan vano “Qedrê canê xo bizanê
Masero cêrenê qanunê kafirî”

Ax de biye, na be ma biye
Sahîne mi qolêde xo gureto
Şîyo basqînê alayîye
Vano “Tersa mi sarê mi ke tal de kuyo
Kownê Dêrsimî de nêmano çêna û
cênîyê”

Ax ko romerdiyo bi nêni yo
Esker nawo amo koyê Dêrsimî
munîyo
Sahan wano “Di sareyî vîyarnay mi ra
Jû yê Xanime wo, jû yê Alîşêr Efendî
yo”

44 Birayê T. şono Wan de waneno. T. na kilame erzana birayê
xo ser. La belê xêlê kilma.

45 Berhem hejmar 2, rûpl. 2, Gulane 1988

46 Berhem hejmar 11,12, rûpl. 70-71, Gulan, îlon 1991,

Sahanê mi qolêde xo gureto
Şîyo geçê Koyê Muziri
Vano "Lawo bêbextênî mekerê
Ma piya werdo qirbanê Xiziri"

Aşîrî merdena mi rê qayil nêbenê
Tornê Babayî kerdê îmamê serî
Xozatî persena Qerexlan ra nato
Qanunê Mistefa Kemalî (Mistê Kori)
persena
Çi çiyode bervat o

Sahan vano "Lazê Pirçoyî de misewre
meso
Min û to cizikê zû maye lîto"
Heqo ti keşî ser de naye mîyarê
Birayî sarê birayî berdo çadire de roto

Sahanê mi rê efkar nêbo
Hesenî hêfê to gureto
Ax de biye biye, Sahanê mi biye
Sahanê mi ke merdo nêmerdo
Şikiyo tilsimê Kirmançiyê

Pane pane (pirane) Sahanê mi pane
Eskerê Mistê Kori amo ma qir keno
Cigera mi pane
Eskerê Mistê Kori amo ma qir keno
Mecal ci mede pane

Lawika Xidirê Alîyê İsmî⁴⁷

De wayî wayî keko bira wayî
Xidir vano, bira kora ke marê amê
Ma çekê xo kerdî top berdî
Nazmîya de teslîm kerdî dayî
Vano, û sire de tede jîyar û dîyarî
ma ra heredîyay
Wexto ke jîyar û dîyarê Dêrsimî
Hona ma ra hast bî
Ci ra amênê ma rê destmal û sayî
Vano, mîlîs qeyd biyo
Hedeke ma nêdano
Ax çêvêsayê Tornê Mamed Axayî
Sanay xo ver berdî tede (têde) qir
kerdî
Mamed Alîyê Qolî
Mursayê Belkijî
Welê Bolebanijî
Hesenê Seydijî
Mezra şestmale de
Çê Alê Areyijî
Jîyara Paçikêne de
Çewres xortê Kurêsijî
Çuxura şestmale de
Çê Hesen Axayî
Alîyê Gaxî
Usivonê şewfîmale de
Çê Murtê Ojî
Vano, bira nê zalimo ma qir kerdîme
Cendegê ma tede kerdî verva tîjî
Bira Xidir vano, na kelepûre ma
Wertê aşîro de çîqa hondê dîyo ucijî

De wayî wayî keko bira wayî
Sarê Koyê Jêle binê lingonê dismen
de
Kerdê duz û rasteyî
Pilê Dêrsimîz û ke qir kerdê nêkerdê
Peyde qisle û qereqolî virastê.

KILAMÊ LORIKE (lorîkî)

Nê kilamî, yan jî lorikî serba pîtan /
dergûşan ênê vatene, ke wa ê rakuye.
Bê guman Kirmançiyê de her dayike,
her waye lorika zana û vana. Nê lorika
her kes xo rê vano. Arêkerdena nînan
jî zaf bi qedr a. Ganî her kes hetê xo ra
nînan arê do.

Dûrî ra dûrî vengê girango yeno⁽⁴⁸⁾
Pitê mi nêwes o cizik nêceno
Meberve pitê mi meberve
Dismen bervîsê to hesneno
Dar û kemer dezîya mi ver vêseno
Qulva tarîye de qe sodir nêbeno
Meberve pitê mi meberve
Dismen bervîsê to hesneno

Ax lemîne biye biye
Pitê minê çewreşî rê biye
Zalimî şîlê ma qir kerdê
Qizê ma fişt lona tarî ye

Vajî vajî eve hêşîrîyê vajî
Na tarî de çîna şîleka qajî
Veng ro pitê mi birîyo
Olî înerê kî meverdo jûyê ajî
.....
Derd o, derd o⁽⁴⁹⁾
Memikê mi
Beng werdo
pê merdo

De lorî, lorî, lorî⁽⁵⁰⁾
berxa mi lorî
Derdê dayika to zar ê
Ez bi gori

Lorî kena lorî nêbena
Berxa mi nêweş a
Ez nêzana çî wazena
Çimê dayika to kor bê
To hênî giran nalena

KILAMÊ ŞÎWARÎ (şîwanî)

Nê kilaman de mordem şîn-şîwar
keno. Zafêrî jî ya erzînê kesanê ke
xort/azeb merdê yan jî şer de merde,
ser. Nê kilaman ra hetê Dêrsim de gelê
estê. Zafêrîyê xo şerê Wurizî, şerê
Dêrsim ra dime amê vatene. Bê guman
ze kilamanê binan, şîwarî jî ma de zaf
ê. La belê pêro niyamê arêdayene. Ez
naca teyna jû şîware nivisnena. Seke
balê wendevanî jî anceno, a şîware de
mordem motivanê kilamanê camerdî-

ye jî şikîno bivîno.

Şerê Dêrsimî⁵¹

Mi va: "yeman o, heqo yeman o"
Mi va: "yeman o, heqo yeman o"
Şerê Dêrsimî şerêde giran o
Hênî biyo, bira birayî ser ro îfade
dano

Mi va: "hewrî vecîyay hewrê şîyayî"
Mi va: "hewrî vecîyay hewrê şîyayî"
Dîyarê Dêrsimî ser ra biyê vilayî
Vanê: "aşîra wusenaw demena kerda
bi çar cayî"

Mi va: "hewrî vecîyay hewrê surî"
Mi va: "hewrî vecîyay hewrê surî"
Dîyarê Dêrsimî ra nêkunê durî
Vanê: "çewres çêna bakire destê
jûbînî gureto
Xo eyşto çemê nê Mûzirî"
De wayî wayî way li minê

Mi va: "yeman o heqo yeman o
Ordî gureto ma ser ra dormê ma
qapan o
Caye ra odaxe ma nêdano
Ê ma na nafa qirkerdena dayê, hetê ra
kok û ferman o"

Ê ma nafa qirkerdena, hetê ra kok û
ferman o
Hela şorê hetê Erzê Alî, şîn û şîwan o
Qemerê Cibrayîlî verê mixara de gino
waro
Ximalê şerê min o, beran o
Va: "hala goş re ser nê vengê Wusê
Seykalfî êno; mîrê mi se vano"

Va: "hala goş re sernê vengê Wusê
Seykalfî êno, mîrê mi se vano"
Îbîşê Seykalfî xo şanito dîyarê
Pîrxatûne
Hem dano piro, hem qeyda vano
.....
De wayî wayî roca şîyaye

Îbîş Axa amo, ordî zor kerdo, xo
biçaye pê kemere
Ewro hucum kerdo qolê hetê Petere
Qûrşîna polate gina Îbîş Axayê mi ro,
ordî koto dere
Nêzo kamî ma kor re arda na xebere

Îbîş Axayê mi laçî vera sûya hîre
Îbîş Axayê mi laçî vera sûya hîre
Lacê mi herm û bozî şemernê we,
kewto pê tabûre
Mi va: "buko lerze meke, ravêr meşo,
rew memire"
"Buko lerze meke, ravêr meşo, rew
memire,
Ordîyê hukmatî zaf o, dînya ma ser ro

47 Berhem hejmar 8, rûpl. 65, Gulan 1990, Arêker: H. Tornêcengî, (Dêrsim ra lawikêde anonîm a)

48 Berhem 7, rûpl. 49-Çileyê Paşin 1990, Arekerdox Hawar Tornêcengî

49 Dewa ma de xalika Şuşe na vatene.

50 Dewa ma de amêne vatene.

51 Na şîware D. Baba vano. Çime: Arşivê mi.

kerda sacya sure”

KILAMÉ EDJIAN

Kirmancîye de tenê rojan, deman û karanê muhîman de kilamî ênê vatene, yan jî kilamî erzînê nê çîyan ser. Demê waran, demê baranverdan/vosn/vonsverdan de, demê non û çûnan de, Hawte Mart de nê kilamî vacînê. Naca ez teyan jûkeke nivisnena.

Payîz o, wextê waran o⁽⁵²⁾
Gewr û rindê, Eminayê
Payîz o, wextê waran o
Gewr û rindê, Eminayê

Ma bar kerdo vareno
Gewr û rindê, Eminayê
Ma bar kerdo vareno
Gewr û rindê, Eminayê

Bawkê mi tucarê tuşkan o,
Gewr û rindê, Eminayê
Bawkê mi tucarê tuşkan o,
Gewr û rindê, Eminayê

Payîz o, waxtê rezan o
Gewr û rindê, Eminayê
Payîz o, waxtê rezan o
Gewr û rindê, Eminayê

Koy Laloy ver ra şono,
Gewr û rindê, Eminayê
Gulzan cay Qizilbaşan o
Gewr û rindê, Eminayê

DEYSÎ

Deysî-Beytî lewê Kirmancan de cayode giran cênê. Verde Cem-cemat ebi deysanê ma, ebi ziwane ma amêne kerdene. Gulban ebi ziwane ma amêne dayene. Sama ebi ziwane ma amêne şiyene. Hemverê Osmanîye de serba jûtîya şarê ma nê deysa rolode zaf giran kay kerdo. Hetanî nê demanê nêzdîyan jî pîranê ma her çî ziwane ma vatêne. Nînan ra, Baba Zeynel zaf meşur bî. Şarê ma çîqa ke nêzdîyê rê Tirkan û Tirkî bî, nê deysî jî amê xo vîrra kerdene. Rolê deysan ze rolê “Qewlê Ezdîyan o”

Xo vîra meke⁵³

Qaşqar Qaşqar, Duzgin Duzgin ez to ra vano
Her têla to ser hazar namê asan o
Qaşqar Qaşqar, Duzgin Duzgin ez to ra vano
Se beno bawo xo vîra meke
Duzgin, Duzgin, Duzgin, Duzgin xo

vîra meke
Hasa çîna ma de dubara û deke
Dal û budaxê mi tî ya adirê mi we ke
Sata tenge de bawo xo vîra meke
Pîre xanekano bawo Şahqulî Baba
O zaman, o zaman de to ra se va?
Ti bena derdê mi rê hem yîlac û hem derma
Yîlac bide yara mi ser, xo vîra meke

Duzgin, Duzgin, Duzgin, Duzgin xo vîra meke
Hasa çîna ma de dubare û deke
Dal û budaxê ma ti ya adirê ma we ke
Sata tenge de bawo xo vîra meke

Kokim Budela⁵⁴

Dilê, dilê mi sewda
Dilê, dilê mi sewda,
Minê budelay xo rê veng da,
Minê budelay xo rê veng da,
Vengê mi şî ulu dîwan
Vengê mi şî ulu dîwan,
Xizir mi de, di laj û zû zama
Xizir mi de, di laj û zû zama,

Sewtmala danga de qedîya
Kinkorê mal û gawa,
Domanu tawigî guret
Bira dero ro bî hîra,
Xevera şay⁽⁵⁵⁾ amê mi rê,
Va ke: “Çix amo, çixê hetê ma”,
Sewo⁽⁵⁶⁾ budela to ra berdî
Di laj û zû zama

Mî tomir⁽⁵⁷⁾ kerd ve xo dest
Çix ser ro koto sama,
Sewda mi şîye ulu dîwan
Tîjî sêlam da gilê kowa,
Ezo dirê gam bîne hîra
Va ke: “Çik o? kokim budela”,
Mi va “Mî ra berdî
Di laj û zû zama”

Ostoro qir dota vejîya
Ezo ver va ci bîne hîra,
Va ke: “Çik o? kokim budela
To çî berdî goş-kerrîkê ma”,
Kalo Xizir dizgîn çara
Tozike kerde çimê ma,
Lodosê ko cê birryara
Va ke: “Çik o? bawo budele”

Dilê, dilê mi sewda
Dilê, dilê mi sewda,
Minê kokim xo rê wes veng da
Minê kōkim xo rê wes veng da,
Vengê mi şî ulu dîwan
Vengê mi şî ulu dîwan,
Xizir day mi, di laj û zû zama

Xizir day mi, di laj û zû zama
Xizir day mi, di laj û zû zama
Xizir day mi, di laj û zû zama,

Silo Feqîr⁵⁸

Wurze wurze wurze Silo şodir o
Wurze wurze wurze Silo şodir o
Şairo qir rameno verver û kenarê mi ro
Va “To kata benê damawo Silo feqîro”
Mi va: “mi benê vilê mi bawo danê piro”
Mi hermê xo ser de qayt kerd nur û cernalê xo bozat Xiziro
Mi va: “mixenetêni meke veng de, tenge de daîm lewê her kes de hazir o”

Ezo feqîr şîyane dîyarê na Mose
Ezo budela şûne dîyarê na Mose
Hewşê pîrê mi aseno bawo ze ayne û tase
Mi va: “ya budelayê Kurêşî, cayê halê ma de rew birese”

Ezu feqîr şûne pirdê Mama Xatune
Ezu budela şûne pirdê Mama Xatune
Alaya nê kafîrî emşo fişta ro mi dime
Va: “To kata benê?” mi va: “kindiro ke erzenê gula mi, ron kerdo bi ronê na zeytune”
Hermê mi ser de amê bawo sizina serdine
Mi va: “to kotî menda da ucax şên, dara qazax şanenê sala furine?”

Mosa kambaxe bivêşo cêrde
Mosa kambaxe bivêşo cêrde
Alaya nê kafîrî arda mi ser de
Va: “To kata benê?”
Mi va: “mi benê pirdê Mutî de mi kenê dardê”
Damawo Kurêşo kokimo zerre xo vêşa, xebera xêre mi rê arde
M va: “ucax şên ti kotî menda, daîm çele qazê to, sala furine hîre şewî hîre rojî furine kerde serde.”

De wayî wayî wayî Silo feqîr wayî
De wayî wayî wayî budelawo feqîr wayî
Zalimê bōllebaşî herm û boziyê mi, bi şilmanê şimondî girê dayî
Domanê mi hurdî yê bawo, dormê mi de berbayî
Herm û boziyê mi budelay mosayî
Ustina raye berda zalimê çê vêşayî
Mi cûyab da Duzginê zerre vêşayî
Ezo qurbanê mewzu zatanê Kurêşê cerebîyayî
Dar û budaxê mi birîya bawo, mi

52 Malmîsanîj; Folklorê ma ra çend numûney, rûpl. 51-54, Weşanên Jîna Nû, çapa yekemîn, Îlon 1991, Sweden
53 Berhem Hej. 11-12, rûpl. 93, Gulan / Îlon 1991, îmîsker:
Davud Sularî; Vatox: Bira Alî, Arêker Munzir Comerd. Zaf înterensat o. Çi hêt ke Davud Sularî deysê xo zafêrî ebi Tirkî vatê.

54 Na deysê Rençber vano. Na deysê de motîvê şîware jî estê.
55 sūyaye
56 Sêwo budela
57 tamur
58 D. Baba. Çime: Arşîvê mi...

ziyar û dîyarî xelesnayî
 Ustina raye berda, zalimê çê vêşayî
 Kilincê mewrana mi ser ro şikiyayî
 Xiziro can selem rayş qapax da we,
 va û aslata ver vindarnayî
 Mî va: "ewro hîrê şew û hîrê roj yo
 kerda binê linganê mi, woş
 qerevenanê gayî
 Huna xeta û gunê mi çînê, cara
 nêverdîya re têla jüyê teynayî

Welat Welat⁵⁹

Welat, welat, welatê cêrî
 Welat, welat, welatê cêrî
 Qanun rind o, qanunê corî
 Qanun rind o, qanunê corî
 Celbe amê mi dime, celbê Qereçoli
 Ezo kokim ho rê ra wurzêrî, şerî
 Îfada ho bidê, belka rew berî
 Nina kaxita ho da Omer, Osmanî
 Minê ho da Duzginê Kemerî

Welat, Welat, Welatê nişo
 Welat, Welat, Welatê nişo
 Bekî zeba Qizil Kîlîs o
 Qanun rind o, çetin hepis o
 No senê hepis o, çira hondê pis o
 Kila Sey Sobinî sala piranişo
 Kam gerrê mi kerdo, vato:
 "Bêkar û bê îş o"
 Hepsê Mazgêrdî de bêro,
 di serrî ronîşo
 Kokim o Seyîd Qazî yo, eve
 herdîş o
 Mî rêy Çesikê ho de niya da ke
 Ho ra tede zû quruş o

Wayî, wayî, way limin wayî
 Wayî, wayî, way limin wayî
 Şuwareyê Tirko dîyar de vejîyayî
 Mi vozda ke vozde, zalim
 verda vi mi dime
 Dest o payê minê kokimî pê de girê
 dayî
 Ez kerdune saye, çar qurîşî mi ser ro
 vejîyayî
 Perê mi gureti, mi nêdayî
 Berdî Mazger de fetelnayî
 Perê minê kokimî fiştere raye
 Şî ginay re xezna padîşayî
 Welat, welat, welato tat o
 Welat, welat, welato tat o
 Qanun rind o, çetin hokmat o
 Na terş ma ser ro qeşo giran vato
 Mî îmat ve pîrê ho ardo ke
 Îmatê to bê bînat o

Koyê na gerike, bira na gavan o
 Koyê na gerike, bira na gavan o
 Çêyê Meme Alê Bese, dostê mawo
 kano
 Çêyê Meme Alê Bese, dostê mawo
 kano
 Mî va: "Şerî lewe, mi ra qesa xêrê
 vano"

Va ke: "To şo Mazgêrd, ezo to dimê
 ra yêno"
 Şiyo Mazgêrd ke pirê baxçe û tuyan o
 Şiyo zuqqimê hepişî,pirê aspizan o
 Şiyo Kalferat, wayrê Şêx
 Memedan o
 Şiyo Jêla Zinga Zerde, wayrê
 Heyderan o
 Şiyo Hopa Şênay, wayrê Şêx
 Amudan o
 Baxira Sipîyê horîya des û dî koyan a
 Çemê Munzir Babay vana wayrê
 Abasan o
 Koyê Sipê van, rind o, wayrê
 Çarekan o
 Kal Mamik, Kalferat, wayirê
 Arêzan o?
 Çewres osporê Xelxel, serê
 Kelçikan o
 Çimê Emir babay, wayirê
 Pawikzan o
 Gonya Xizir vana, çêber mirodan o
 Xizirê serê deryay, serê kelek
 vapuran o
 Ewliyayê tosnîye, wayirê
 Bamasuran o
 Şiyo Hewşê Dewe, wayirê
 Kurêşan o
 Şiyo Kemerê Duzginî, pîlê
 jîyaran o
 Şiyo ke, kokim hawo koşe de
 nişto ro
 Dot ra binê çima ra, mi de
 nîya dano
 Çimê fek ra perrayî, tawa
 mi nê dano
 Ez vanune "Bimbareko oyo ho wo
 Yoxro ke misayê şêne û postan o."

Binê darikan o, binê birrikan o
 Wusar nawo amo, çêfê çênekan o
 Serê na bonan o, çêfê na Xortan o
 Binê şîvingan o, çêfê pîrikan o
 Peyê kila dawan o, çêfê veyvikan o
 Dawa Heq bo, kes koçikê do mi rê
 nêano (Heqo dawa to bo kes koçikê
 do mi rê nêano)
 Minê kokim vana hepsê des û ponc
 rozan o
 Kam gerrê mi kerdo, vato:
 "Pîlê jewegan o"
 Kokimo Seyîd Qazî yo,
 kilamû vano
 Hîrê sew şêş û şêş kilamî vatî,
 qeydê xo tamam o
 Memê Alê Bese vana, mizawiro
 kano
 Hala şêrê, rey ci ra vacê
 Na qeydê mi rê se vano?

KILAMÊNKE WERTÊ DESTANAN DE ÊNÊ VATENE

Hetê ma de waxto ke destanî ênê
 qesekerdene, kilamê nê destana
 orijînal û Kirdaskî ênê vatene. Nînan

ra Bedrane. Siyaben û Hece, Dewrêşê
 Evdê, Mem û Zîn zaf amê
 şinasayene. Bê guman no çî zaf lokal
 bî. Naca çiyêde bin gelê interensant o.
 Xêlê Kirmanca kirdaskî fam
 nêkerdene hama wuncîya jî goş nêne
 Radonê Erîwanî ser. No dem de şarê
 ma gor kilame hem berbênê û hem jî
 kêf kerdêne. Xêcâ naye tenê kesanê
 Kirmancan kirdaskî jî kilamî vatene.
 Nînan ra hetê ma de Q. Zere zaf bî
 name û veng bî.

KILAMÎ KESAN

Kilamê ke niviskarê xo êno
 zanitene, yan jî niviskarî eştâ xo nê
 kilaman ra mordem şikîno vaco,
 kilamê kesan. Serbeta ke Sey Qazî
 kilama xo ya corêne eştâ xo ser, na
 kilame nê kilaman ra wa. Nê kilaman
 de namê wayirê kilame tim derbaz
 beno. Çiyo ke naca bêro dîyene o wo,
 ke nê kilaman ra qe jûye profesyonel
 niyama vatene. Yanê qe kes nifikirîyo,
 nêvat, "ez nika jû kilame vecena yan jî
 nivisnema." Motifê nê kilaman, wayirê
 kilaman bi xo yo.

KILAMÊ ANONİM

Kilamê ke nivîskar yan jî wayirê xo
 nêşinasîno, kilamê anonîm ê. Gelê
 kilamê govende, lorikî, şîwarî anonîm
 ê.

Ebi kilmîye: Dinya kilamanê
 kirmancan de motîvê derd, kêdere,
 ezîyet, teberdayêna kinê hemverê
 zilum û neheqîyan, redkerdana çîyanê
 pîsan, exparcîyênî; hetkarî û
 nêmiyatîye; eşqe heywanî; naturî,
 daran; kowan; ziyaran; çeman; waran;
 hegayan; merga; sewdaya dizdênîya û
 eşkeraye; qehremanîye; asparîye;
 nişancîyîye; mêrdêtiye; namêrdênî zaf
 ê. La belê derd û kulî kilamanê
 Kirmancîye de tim estê. Zerre kilame
 gor kesîtiya keso ke ser ro kilame ama
 vatene yan jî gor kesîtiya wayirê
 kilame, wo. Gor kilaman mordem
 şikîno dîroka xo jî tenê bişinasno.

Her çîqa ke hozan û şayiranê mayê
 pîlî ze, Sey Qazî, Sa Heyder, Welê Usê
 İmamî, Silo Qij, Qemo Areyij, Baba
 Kudiz, Wusênê Tikmeyî, Dewrêş Baba
 qedr û qîmetê xo ra çiyê vîndî nekerdo
 jî ewro kilamanê ma de demo klasik
 vêdro ra, demo newe, modern amo.
 Xêlê hozan ebî zarava ma
 kilaman/lawikan/deyîran vanê. Se ke
 êno zanitene, kilamî ke amê
 nivisnayene ebi melodî, ebi qesê xo,
 benê bêmerdene, benê mende.
 İsnstumentê ma tamur/tomur,
 bulure, kemane saz na derheq de
 rolêde girs kay kenê. Ebi na hêvîye.

11.02.1996

ZIMAN Û RÊBAZÊN ZIMANZANÎNÊ

ÇETİN ÖZEL

Gelek guftûgo û têz li ser serukanîya (orjînitî) zimanan hatine gotin. Antropolojîst dibêjen hebûna dîroka mirovan nêzîkî 5- 6000.000 salan e. Lê belê nivîsîna herî kevn ya Sumera ya ku tê xwendin-dekodekirin heta B.Z 4000 salan diçe. Ew tomarene yê derbarê dîroka pêşweçûna zimanê gelek direngîne û çî serîştan li ser serukanîya zimanê nadete me.

Ji ber wê hindê pir gotinên olî û zanistî, di derbarê orjînitîya zimanê de hatine gotin. Bi bawerîya gotinên olî xweda ziman ji mirovan ra bexş kiriyê. Gelek xebatên zanistî yê dijî gotinên olî dibêjen afrandêrê zimanê mirov bi xwe ne. Feylezofofan, zimanzanan û newrolîngûîstan xebatên berkefî li ser orjînitîya zimanê kirine lê belê hêjta, orjînitîya zimanê nehatîye peyda kirin. Ew mijar zor kûr û dirêj e. Bi rastî armanca me jî, orjînitîya zimanê nîne. Lê belê ziman çî ye? Zanîna zimanê û rêbazên zimanê çî ne? Em dê li ser wan ravestî.

Her cihê mirov lê hebin, bêguman li wêrê ziman jî heye. Xwedîbûna zimanê, li hemû tiştên dike pirtir mirovan mexlûqên dîtir cûda diket. Ziman ji bo mirovatiyê binetareke girîng e. Ji bo hindek gelên Afrikayî zarokeke nû peyde bî **kuntuî** ye yanê ew tenê tişteke e, hêj nebûye **muntuî** yanê mirov. Kengî ew zarok ziman fêr bit hingî ew dibite mirov. Ji wê kevnepê wê ra, em hemû mirov in, ji ber ku em hemû bi kêmtîwe zimanekî dizanin. Belam, ya em dizanin çî ye? Wata ziman zanîne çî ye?

Lêre em dikarin ku bêjin agahîya zimanzanîne (lînguîstîk) pir girîng e. Ew gava mirov zimanekî bizanît ew dikarît wî zimanî biaxifit û mirovên dike yê ku wî zimanî diaxifin têtîgehê. Mana wê ew e ku, mirov dikarît dengên bi watên aşîkar bide û dengên ku mirovên dike didin jî têtîgehê.

Hingî, zanîna zimanê, zanîna sazûmana deng û wate ya wê ya pev girêdayî ye. Gava yek zimanekî nezant, dengên wî zimanê bîyanî yê ku tene gotin ji bo wî çî wate nîne. Ji ber ku pevgirêdanîya dengên û wate ya wan pevgirêdanîyêke serbixwe ye.

Agahîya zimanzanîne, hêza pêkanîna bêjan ji bo çekirina hevokan dide miro-

van. Ziman zanîn ew e ku mirov hevokên berê nehatine bihisten û gotin çêbikît û bibêjît. Herwiha hevokên berê nehatine gotin û çekirin têtîgehê. Zimanzanekî berkefî Noam Chomsky dibêjite wê berjewendîyê rexê afirandêrîya zimên xebitandine.

Çi kes nikarît lîsta hevokên zimanekî çêbikît, Lê belê, em dikarin lîsta qeyîdan, yê ku peyvdarek ji bo axaftin û têtîgîştina hevokên bê sinor kartinît çêbikin.

Ew qeidenê hevok sazîya (syntax) zimanê dihilgirite hundirê xwe. Ew gava kesek zimanê fêr dibit, ew wan qedana sazûmana deng (fonolojî) û riya deng, têtîgî û wata (semantik) wê fêr dibit. Hingî, em dikarin bêjin ziman sazûmana deng û watê ye, yê ku serbixwe pevgirêdayî. Ew gava mirov zimanê dizanît mirov wê sazûmanê dizanît.

Ji kevin da heta niha gelek rêbaz li ser fêrbûna wê sazûmanê hatine dameziran-din. Ji wan ya jî hemîyan kevintir rêbaza wergera rêzimanî ye. Ew rêbazê berê pêşîn bi gelemperî ji bo fêrbûn û xwendina Grekî û Latînî hatîye xebitandinê. Bi kar anîna wê metodê em nêzîkî dawîya sedsala nozdehan da pirtir dibînîn. Binetare wê jiberkirina qeidenê rêzimanî, li ser textên helbijartîye. Axaftina zimanê çî cih di wê rêbazê da negirtîye. Ji xwe ji wan ra axaftin ji bo zimanzanîne ne pêwîst bû. Lê belê, piştî ku zimanê bîyanî ji bo komînikasyonê pêwîst bû dawîya wê metodê jî hat û wê cihê xwe ji metodên din ra hişt.

Herwekî reaksiyoneke li dijî metoda jorîn metodeke nû ya dibêjnê rêbaza direkt derket. Pêşdarîya wê metodê profesor E.W Gatenby û Dr. Robert Lado kiriyê. Di wê rêbazê da ziman bi terzeke din tete fêr kirinê. Zimanê dayîkê bi çî terzeke nahête axaftin ango çî wergerîya zimanê nîne. Tenê zimanê bîyanî yê ku xwendekar fêr dibin tete axaftin. Ders bi dîyalogekê an jî bi anekdotekê dest pê diket û hîndarî jî bi pirsîyarên di derbarê dîyalogê-anekdote de cihê xwe digirt. Rêziman û çanda xwedîyê wî zimanî bi îndaktîvî tete fêr kirin. Lêker pêşîyê tene bi karanîn û gelek dawî da tene aşîkarkirin.

Hindek xebatên li ser psîkolojîyê û zanîne bi xasmetî zanîna zimanan rêba-

zeke nû dibejînê rêbaza audîolingual derxiste meydanê. Pêşdarîya wê rêbazê Skinner kiriyê. Skinner di wê xebatê da li ser şîyarker, bersiv û destekdan an jî xurtkirinê (stimulus-response-reinforcement) rawestîye. Ew metodê dawîya teorîya behavîourîsmî ê ye, û pir tişt jî, ji metoda direkt vergirtîye. Mamosta û zimanzanan ew teorî ji bo zimanzanîne bi kar anîne. Ew dibêjin zanîna zimanê tişteki hûtbûyîn e, ji ber wê çendê ziman bi riya dîyalogan û ducarkirinê tete fêr kirin. Rêziman jî di nav dîyalogan da bi harîkariya ducarkirinê tete dan. Her çar berjewendîyên zimanê guhdarî kirin, axaftin, xwendin û nivîsandin tene bi kar anîn. Lê belê, guhdarîkirin û axaftin her du berjewendîyên dîtir xwendin û nivîsandinê girîngtir in, di wê metodê da. Ew rêbazê nû jî, li gelek cihên dinyayê tete bi kar anîn.

Sala 1959 an Noam Chomsky êrîşeke dijwar bire ser teorîya Skinner ya Behavîourism û ew teorî serûbin kir. Ewî binetare rêbaza cognîtivîsm ê danî. Chomsky di pirtûka xwe ya **Aspects of The Theory of Syntax** dibêjît ziman fêr bûn tişteki hûtbûyînî nîne, ziman fêr bûn tişteki afrandêrî ye. Heke ne wisa ba, ew dibêjît çawan zarûk dikarin ku tiştên wan berê negotî niha bibêjin. Chomsky dibêjît mirovan berjewendî û performansa zimannasîyê heye di ber wê hindê ew dikarin hevokên berê nehatine gotin biafirînin. Li wê rêbazîyê da ziman bi terzekê komînikasyonî tete fêr kirin. Rêziman her çar berjewendîyên zimanê guhdarî kirin, axaftin, xwendin û nivîsandin wekhevî bi gelemperî di nav konteksekê da tete dan. Di wê rêbazê da ji para hemîyan pirtir rexê komînikasyonê zimanê cih digirt. Di rêbaza cognîtivîsm da jiber kirin, an jî ducarkirina zimanê gelek nîne. Li cihê wê divê xwendekar bi henîjin û afirandêr bin.

Niha li hemû dinyayê, ew rêbaz pir bi rûmet e. Mamosta û zimanzan jî, wê rêbazê jî hemîyan pirtir serfiraz dibînîn. Hêjta gelek rêbazên hürde hürde ser ziman fêr bûnê hene, belam yê ji hemûyan girîngtir her çarên jorîn in.

Em hemû dizanîn ku çî rêbaz tenê bi serê xwe bes nîne. Xasma di wê dema komînikasyonê da hindek rêbaz wekî wergera rêzimanê jî binî ve kêmtir in û tîr nîn in. Ji bo fêr bûna zimanê jî hemû rêbazan çî kêmtir çî zor divê mirov feyde bike.

ÇAVKANI

1- Chomsky, Noam. Language and Mind, enlarged ed. New York Harcourt Brace Jovanovich, 1972.

2- Cutisse, S. Genie: A Psycholinguistic Study of a Modern-Day Wild Child. New York, Academic Press 1977

Dahûrîna le ser parkîtên di kurmancî de

ZANA FARQÎNÎ

Zimanê me zimanekî wisan e ku hem ji pêş ve, hem ji paş ve û hem jî, ji nav ve qertaf (pirtik, ek) distîne. Celadet Bedirxan ji bo qertafên ku tîna pêş û paşiya peyvvan, tîgînên "pêrkî" û "parkît" bi kar tîne; ezê jî, wan tîgînan (terman) bi kar bînim.

Ji bo ravekirina vê rewşê, me divê em nimûneyan bidin:

Xwez+gîn: Di vir de "gîn" parkît e.

Kele+şêr: Di vê nimûneyê de "kele" pêrkît e.

Kurt+e+bir: Di vê nimûneyê de ji "e" navkît e.

Tê zanîn ku bi alîkariya pêrkît û parkîtan rengdêr, navdêr û îsmî fail tîne çêkirin. Piştî van agahiyên, îcar min divê ku ez sînorê vê xebata xwe daxuyînim. Di vê vekolîna xwe de, ezê bi tenê li ser parkîten di zaravayê kurmancî (kurmanciya jorîn) de rawestim û li gorî peyvirên (wezîfeyên) wan, ez dê wan ji hev veneqetînim. Bi gotineke din, ez li ser peyviran parkîtan rawestim û wan nasenîfînim. Ji hêla din ve, qertafên ku tîna paşiya peyvê, lê erkên wan cuda ne, wekî parkît nehata peyvirandin. Nimûne: Qertafên tewangên navdêran, veqetandek çî yê binavkirî û çî yê nebinavkirî, tewangên veqetandekan, qertafên jimarîn û rêzin, raderên lêkeran û qertafên ku bi alîkariya wan ji navdêr û rengdêran lêker tîne çêkirin...

Divê ez vê yekê jî bibêjim ku, ji raweya fermanî ya lêkerê jî, parkît bi dest tîne xistin. Nimûne: Ji raweya fermanî; "bigire" an jî "bigir". Di vê mînakê de "bi" ya fermanê ye û "gire" an jî "gir" kok e. Bi gotina Celadet Bedirxan rayek e. Bi "gir"ê ku em peyvinên nû çêkin: *Govendgir, keşgir, masîgir...*

Wekî ku min di destpêkê jî de got, ezê li ser parkîten ku ji rayeka lêkeran tîne bidestxistin, rawestim. Di gel vê yekê, ez dixwazim ku xaleke girîng rave bikim. Di zimanê me de parkîtin hene ku ji koka lêkerê tîna, lê êdî, ji rastîniya xwe bi dûr ketine. Ji bo nimûne: *kar, ber, ker, mal, best...*

Piştî van agahiyên, îcar ez dixwazim dest bi mijara xwe bikim. Ji bo vê xebatê, min heft pirtûkên gramera zimanê kurdî bi dest xistin û der barê parkîtan de min ew vekolandin. Serê pêşîn ezê van vako-

lanên xwe pêşkêş bikim:

1. Kitêba gramera kurdî ya Emîr Celadet Bedirxan û Roger Lescot:

Di vê xebatê de, 71 qertaf mîna parkît hatine nîşandan. Di dawiya vekolînê de ez gihyam vê baweriyê ku, 20 heb jê ne parkît in. Li hêla din, ji wan dîsan 2 heb jê bi tirkî, 2 jî bi kurmanciya jêrin in (sorani ne). Li vir 46 heb dimînin ku wekî parkît ji aliyê me ve hatine pejirandin. Ku em wan li gorî rêza alfabetîk bidin:

a, ahî, ak, al, ane, anî, ar, asa, asî, a-wer, ban, bar, baz, bend, ber, dank, dar, dêr, e, ek, êr, gaz, geh, gîn, ik, istan, î, îna, kar, ker, mal, mend, nak, ok, ole, o-nek, or, oyi, ox, tî, ûr, van, war, wer, xa-ne, yar

Didoyên bi tirkî: **çi û daş**

Didoyhen bi kurmanciya jêrin: **ger û avend**

Li gorî rêza alfabetîk 21 parkîten ku bi ya min şaş in jî ev in:

an, bare, de, dok, eke, fam, gon, ifk (ivk,îşk), înok, îni, îtik, o, olek, olik, reng, sar, vanî, vank, ver

an: aliyan, heyran

Di peyva "aliyan" de "an" tewanga navdêran a gelemariyê ye, tîkiliya wê bi parkîtiyê re nîn e. Di peyva "heyran" ê de jî "an" êdî hêmana lêkerê ye. Wekî tî zanîn, dema lêker negerguhêz (nederbasî) be, tevî radêra (mesdara) xwe wiha ye: *Heyrînan - heyirîn*.

Lê gava ku lêker di rewşa gerguhêz de be jî wiha ye: *Heyrandin an heyirandin*.

Bi vî awayî, "î" ya di peyva "heyirîn"ê de, li "a"yê dadigere û dibe "heyran". Ji bo vê yekê me divê em çend nimûneyên din jî bidin: Ji "weşîn" ê weşan, ji "ramîn" ê raman, ji "razîn" ê razan, ji "kuttîn" ê jî kutan.

bare: dubare, rencbare

Dema ku "bare" tîna paşiya peyvê, maneya tîkare û çend cariyê dideyê. Heke em li ser "bare"yê jî rawestim, em dikarin bi hêsanî wê ji hev derxin û rave bikin. Carek peyv hevedudanî ye û jî "bar" û "e"yê pêk hatiye. her du jî, bi serê xwe parkît in.

de: şermende

Di vê mînakê de parkît ne "de" ye, lê "ende" ye: Jihevderxistina peyvê wiha ye: "şerm+ende"

dok: birandok, xeberdok

Li gorî mînaka "xeberdok" ê mirov dikare bifikirê ku parkîteke wê heye, lê di ya "birandok" ê de, na. Ev parkît "ok" bi xwe ye.

eke: bendeke

Rastiya peyvê "berdenke" ye û bi pêrkîta "ber" û ji peyva "denk" û ji parkîta "e" yê pêk hatiye. Qertafeke bi navê "eke" nîn e. Gava ku heywanên mîna ker, hêstir, hesp tîne barkirin, ji wan re berdenkeyek tî çêkirin û pişt re serbar li wan tî kirin. Ev peyva "berdenke" her herêm li gorî devokên xwe bi lîv dîke û jî aliyê teşeyê (şeklê) ve xera bûye. Wekî "bendeke"...

fam: gulfam

Bi tenê mînakek hatiye nîşandan û mirov bi hebekê jî, zû bi zû qanî nabe. Her wiha, me jî nimûneyan bi dest nexistin. Di gel vê yekê jî baweriyaya ku "fam" ne qertaf e, ji me re çêbû.

gon: Ev ne qertaf e, peyveke bi serê xwe ye û tîna maneya reng û rengdêr e. Jixwe mirov dema bala xwe bide nimûneyên ku hatine pêşkêşkirin, bi hêsanî ji wan tî derxistin ku peyv hevedudanî ne; mîna *ar+gon, av+gon...* Em bi vê şeweyê şiroveya peyvvan dikin:

Argon, ango rengê agir; avgon, ango rengê avê. Ji milê din ve, em dixwazim mînakeke din bidin ku gelek di nav gel de tî bikaranîn: Genimgiwînî; ango rengê genim. Heye bî gotin ku "gon" û "giwîn" ji aliyê teşe ve nadirûvin hev. Rast e, heman mirov pê dernaxe ku peyv ji ber devokên herêmî guheriyê û ev yek hatiye serê wê. Nimûne; kesin hene ku ji "kor" re "kiwir", ji "gûz" an jî "goz" re jî "giwîz" dibêjin.

ifk, ivf, îşk: gulîşk, germîşk

Ji bo ku her sê bi hev re wekî qertaf hatine nîşandin, em dê wan hebo hebo hildin destê xwe û wan rave bikin. Ji bo "îşk" ê jî bi tenê peyva li jorê hatiye dayîn. Lê, dîsa em bi hêsanî dikarin bibêjin ku peyv ji "gul+if+k" ê, bi gotineke din jî sê hêmana pêk hatiye. Ji bo ku ez vê nimûneyê baş zelal bikim, ez dê nimûneyên "palîf" (balîf) û "nazbalîf" ê bidim. Di vir de xuya dibe ku, bi ihtimaleke mezîn qertaf "îf" be.

ivk: Ji bo wê, nimûne nehataye dayîn. Di gel vê yekê tîkiliya wê bi "îşk" ê heye. Ji lew re dengên ku jêderka wan yek be, ihtimala wan a bihevguherîna zehf e. Jixwe qertaf, ne "ivk" e, lê "iv" an "îf" e.

îşk: germîşk

Heke em li ser "germîşk"ê rawestim: Germ, bi serê xwe rengdêr e, dema ku jê lêker were çêkirin, an wê serî li radêra "andin" an jî li radêra "jandin" ê bî xistin. Nimûne: *germandin, nermandin*

an jî *germijandin*, *nermijandin*.

Nexwe em dikarin bibêjin ku kok ango rayek "germij" e û bi alikariya parkîta "k" yê peyv hatiye afirandin. Ji lew re "germişk" şaş e û divê "germijk" be.

înok: *xapînok*

Peyv ji "xapîn" û "ok" ê hatiye holê. Eşkere dibe ku qertaf ne "înok", lê "ok" e. Ji raweya lêkera fermanî ya "bixapîn" an jî "bixapîne" rayeka "xapîn" hatiye bidestxistin û bi alikariya parkîta "ok" rengdêr hatiye çêkirin.

înî: *bavîni, pirîni*

Qertaf "în"e, ne "înî" ye. Wekî "rast+în, derew+în, dil+în... Parkîta "î" yê careke din li peyvê zêde bûye û "î" manaya peywendiyê pêk tîne.

îtik: *bangerîtik*

Ji bo vê yekê, bi tenê nimûneya li jorê hatiye dayîn. Ev rewş jî dibe sebeb jî ku mirov tengezar bibe. Ji neçarî vekolîna me bi tenê li ser nimûneyekê ye. Bi ya me peyv ji sê hêmanan pêk hatiye: *ban+gerît+ik*

"Ban", ango xanî, "gerît" jî rayeka lêkerê ya gerîtinê (gerîne) ye û "ik" jî parkît e. Heye bê gotin ku gerîtin ji ku derket. Ji vê re jî em dê çend nimûneyan bidin: *nivîstin* (nivîsîn), *kirîtin* (kirîn), *meşîtin* (meşîn)

Ji van mînakên jî xuya dibe ku bi domana demê re ji aliyê teşeyê ve guherîna di peyvên de çêbûye û hawayên di nav kevanê de cih ji yê din standine.

o: *zero, xapo*

Baş diyar e ku ev "o" ji bo zayenda nêr e û di dema bangkirinê de tê bikaranîn. Ji milê din ve, dikare were paşîya çî navê mîran û çî jî, yê jinan, Mînak:

Kendal; Kend+o, Rindê; Rind+o

olek: *çinçolek*

Bi serê xwe, parkîteke me ya "olek" nin e. Peyv ji sê parçeyan pêk hatiye: *çin+çol+ek*

Lê parkîteke me ya bi navê "ol" heye. Mînak: *spîç+ol+kî*

Diyar e ku "olek" bi serê xwe ne parkît e.

olîk: *gulolîk*

Em peyvê dikarin wiha ji hêmanên wê ji hev bikin: *Gul+ol+ik*

Tê de "ik" jî bi serê xwe parkît e; wekî *kêr+ik, dar+ik...* Li jorê jî me parkîta "ol" rave kiribû.

reng: *sorereng*

Bi alikariya "e" yê ya "navkît" peyveke ku ji sê hêmanan pêk hatiye, çêbûye. Reng, bi serê xwe ne parkîteke e.

sar: *şermesar*

Qertaf bi xwe ne "sar" lê "ezar" e. Di vir de "sar" rengdêr e. Bi alikariya wê jî peyv tîr çêkirin; mîna *xemsar, dilsar* û hwd.

Şanek, ji bo "ezar" ê: *şerm+ezar, teng+ezar, xerab+ezar.*

vanî: *şerevanî*; jixwe bi qertafa "van" ê peyv hatiye çêkirin, bi "î" yê careke din hatiye çêkirin. Di vir de jî parkîta sade "van" e, her wiha "î" jî parkît e.

vank: *destvank*. Ev peyv jî, ji sê hêmanan çêbûye: *Dest+van+k*. Li gorî vê yekê dixuye ku "vank" bi serê xwe tenê, ne qertaf e û parkît bi tenê "van" e.

ver: *gilo+ver*

Heye ku qertaf "over" be; kok "gil" e û ji bo ku peyveke me ya bi navê "gil+ok" ê jî heye. Heta em dikarin du mînakên din jî rapêş bikin: *gil+or, gil+êr*

Du qertaf jê bi tirkî ne; "daş" û "çî": *sînor+daş, xêr+daş, def+çî, qehwe+çî*

Qertafên ku ji kurmanciya jêrê ketine ya jorê: "ger" û "avend" in. Nimûneyên wan jî ev in: *Hesîn+ger, beş+avend*

Piştî ku parkîtên di xebata Celadet Bedirxan û Rager Lescot de hatin daxuyandin, îcar min divê ku ez werime ser Ferhenga D. Îzolî. Di ferhengê de Îzolî beşek ji rêzimana kurdî re veqetandiyê û li ser vê mijarê nêrîn û ramanên xwe pêşkêş kirine.

2. Di Ferhenga D.Îzolî de parkît:

Îzolî di vê berhêmê de, 79 qertaf wekî parkît nîşan dane. Lê ji wan 32 lib ne parkît in. Yek jê jî, bi kurmanciya jêrîn e. Li gorî rêza alfabe yê 46 parkîtên ku ji layê me ve hatine pejirandin ev in:

a, ahî, ak, al, ane, anî, ar, atî, awer, ban, bar, baz, bend, ber, dank, dar, dêr, e, ende, gar, gaz, geh, gîn, ik, istan, î, îî, îng, îfî, kar, ker, mal, mend, nak, ok, ole, onek, oyl, tî, ûr, van, war, wer, wî, xane, yar

Ën ku ne wekî parkît (32) hatine pejirandin jî ev in:

an, asî, bare, dox, fam, ger, gir, gîr, gon, hî, îni, înok, îr, îtik, îyan, kok, lan, lîn, mende, niwaz, oke, ol, olek, olik, perwer, reng, sar, tir, vanî, ver, yî, za

Yek jê jî bi kurmanciya jêrîn e: **ayetî** Di nîrxandina li ser berhema C. Bedirxan û R. Lescot de, me ji bo "an", "bare" (?), "fam", "gon", "îni", "înok" "îtik", "olek", "olîk", "reng", "sar", "vanî" û "ver" ê, îzehet hatin dan.

Di gel vê yekê me dîsa li dawîya "bare" yê nîşaneka pîrsê danî; sedem jî ev e: Jê re nimûneyên şaş hatine rapêşkirin; *der+bare, yek+pare...* Zehf êşkere ye ku ev her du nimûne jî ne parkît in. Carek di nimûneya "yekpare" de her tişt xuya dibê; ku "pare" ango parçe ye. Di kurmancî de ji bo ku bihevêbûn û tek-kerîtiyekê tiştêk bê şayesandin (teswîrkirin) wiha jî tê gotin: *yek+ker*

Ji bo mînaka "der+bare" de jî em vê bibêjin ku di vir de "bare" tê maneye "heq" a di vê hevokê de: *Der heqê me de hûn çî diramin* an jî *der barê me de hûn çî diramin...*

Heta daçeka "di" yê jî datînin pêşiyê; nola *di der barê me de...*

Niha jî, li gorî rêza alfabe yê em dê wan qertafên ku wekî parkît hatine nîşandan, rave bikin:

asî, ger, gir, gîr, hî, îr, îyan, kok,

lan(an), lîn, mende, niwaz, ol, perwer, tir, yî, za

asî: Min divê ku ez li ser parkîta "asî" yê jî rawestim; ji ber ku Îzolî jê re peyvya "mêrxasî" yê wekî nimûne daye nîşan. Peyv ji "mêr", "xas" û "î" yê pek hatiye; *mêr+xas+î*. Herê, di kurmacî de parkîteke me ya bi navê "asî" heye, lê peyvya ku Îzolî nolî nimûne pêşkêş kiriyê, ne rast e. Ji bo parkîta "asî" yê mînak: *Teng+asî, kurt+asî, kêma+asî...*

ger, gir û gîr: Me di destpêka nivîsa xwe de gotibû ku, em dê li ser parkîtên ku ji raweya fermanî ya lêkeran tîr peydekirin, ranewestim. Ev her sê jî, ji raweya fermanî ya lêkerê hatine bidestxistin. Nimûneyên ku ji aliyê D. Îzolî ve hatine pêşkêşkirin: Ji bo "ger" ê şev+er, ji bo "gir" ê agir+gir, ji bo "gîr" ê jî mînakên *av+gîr* û *kele+gîr* hatine daxuyandin.

Baş xuya dibe ku di mînaka "avgîr" ê de parkît "gîr" e û ji teşeya "gîr" ê dageriyaye "gîr" e. Heta Îzolî di ferhenga xwe de peyvê bi vî awayî bi mane dike: Gola ku ji ava baranê tije dibe û havînan jî ziwa nabe. Ji bo "kelegîr" ê jî ramana me ew e ku peyv ji pêrkîta "kele" û ji raweya fermanî ya lêkera girîne, pêk hatiye. Heta wî di ferhenga xwe de cih nedaye vê peyvê. Rastîniya peyvê jî ev e: *Kele+gîrî an kele+girîn.*

hî: Di kurmanciya jorîn de qertafeke me ya wisa nîn e. D. Îzolî jê re hin nimûneyan dane, em li ser wan bisekinin: *ava-hî, agahî*. Di her du mînakên de jî bi hêsanî dixuye ku qertaf "î" ye. Di mînaka "avahî" yê de rayek "ava" ye, "h" jî herfa kelijandinê û "î" jî qertaf e.

îr: Bi tenê nimûneya "dil+îr" jê re hatiye nîşandan. Lê di vê nimûneyê de parkît "êr" e. D. Îzolî gelek ji xebata C. Bedirxan û R. Lescot feyde dîtîye û zehf di bin bandora wan de maye. Her wiha çaxa ku nimûneyê jî wan standiyê - çî jî aliyê wî û çî jî ji aliyê kesên tîprêz- şaş veguhastin. Ji lew re di xebata Bedirxan û Lescot de nimûne bi xwe wiha ye: *dil+êr.*

Ji milê din ve, ne bi tenê jî bo vê nimûneyê, gelek nimûneyên ku ji hêla Îzolî ve hatine nîşandan hema bibêje tev eynî wekî yê Bedirxan û Lescot in.

îyan: Ji bo vê, nimûneyên "germîyan" û "sermîyan" hatine pêşkêşkirin. Carek "îyan", "an" bi xwe ye û qertafa pîranîyê ye. Ji ber ku du dengdêr nayêne ba hev, herfeke dengdar -bêdeng - (y,h,w) dikeve navbera wan. Ji wan re herfên pêwendiyê, kelijandinê tê gotin. Îcar em bîne ser wan peyvyan: "germîyan" hem navê êlekê û hem jî ya heremêkê ye. Di vê peyvê de "germ" kok e, "î" qertafa mensûbiyetê û "an" jî tewanga navdêran ya gelemariyê ye. Peyv ji van hêmanan hatiye pê: *germ+î+y+an*

Li dû jîhevderxistina peyvya "germîyan" îcar em bîne ser peyvya "sermîyan" û wê jî hev derxin; "ser+mi+ty+an" dertê rastê û peyveke

hevedudanî ye. Qenc zelal dibe ku qertafeke me ya bi navê "iyan" ê nîn e.

lan (an): Birêz Îzolî ev minak dane: *erde+lan, meze+lan*

Di van nimûneyan de rayek "erdêl" û "mezel" e; "an" ên ku bi paşîya wan ve zeliqîne jî tewanga navdêran a gelemjariyê ye.

lîn: Îzolî jî vê re jî peyva "hêlîn" nîşan daye. Heke peyvînen din jî rayî me bikira, belkî ramanêke din jî me re çêbibûya, lê belê jî vê minakê pir xweş diyar dibe ku "hêlîn" navêkî xwerû ye. Dîsan jî mirov zorê bide xwe dikare vî navî wiha jî hev derxe: "hêl+în". Wê gavê dikare bê gotin ku qertafeke bi navê "în" ê heye; ku heye jî.

kok: Jê re vê peyva "çilo+kok" wekî nimûne nîşan daye. Xweş diyar e ku peyv jî "çil", "ok" û dîsan jî "ok" ê pêk hatiye.; *çil+ok+ok*

bnimûneya ku jî bo ravekirina wê hatiyê dayîn "şer+mende" ye. Lê parkît di vê nimûneyê de "ende" ye û peyv wiha jî hev dikare bê derxistin: *şerm+ende*

Niwaz: *dilniwaz*; ev jî du peyvyan, jî "dil+niwaz" çêbûye û terkîb e.

oke: Îzolî jî bo "oke" yê peyva "banoke" yê daxuyandiye. Jixwe peyv carekê bi parkîta "ok" û pişt re jî bi "e" yê pêk hatiye; parkît "ok" û "e" ye.

ol: Peyva ku hatiya rapêşkirin "gul+or" e. Bêdijwarî tê dîtin ku qertaf "or" e, ne "ol" e. Lê parkîteke me ya wisa heye.

perwer: *welat+perwer*. Ew bi serê xwe ne parkît e.

tir: Mezintir, biçûktir. Rind diyar dibe ku ev "tir" rewşê derdibe û kemperiyê (qiyastiyê) dide xuyan.

yî: Em bêne ser peyva ku nolî nimûne hatiyê nîşandan "bêpareyî". Di vê de jî "î" qertaf e û herfa "y" yê jî peywira ke lijanîne tîne cih.

za: *mîr+za, bira+za*. Ji van minakan jî eşkere dibe ku "za" rayeka lêkera fermanî ya "zan" an jî "zayîn" ê ye û ne parkît e, jî lêkerê hatiyê idestxistin.

ayefî: Ev parkît jî kurmanciya jêrê derbasî nava kurmanciya jorê bûye.

3. Di Gramera zimanê Kurdî ya Prof. Qanatê Kurdo de parkît:

Prof. Qanatê Kurdo, di vê kitêba xwe de 39 qertaf wekî parkît radixe ber çavan. Ji wan sê heb ne parkît in, yek jê jî bi tirkî ye. Ji çar parkîtan re jî nimûne nedane, jî lew re der barê wan de min ramanek danexuyand.

Li gorî rêza alfabeyê 30 parkîten ku rast hatine dîtin:

ahî, anî, ane, ar, ayî, baz, bend, dar, ek, gar, ge(h), ik, (î)stan, î, in, k, kar, kî, lan, mend, ng(?), ok, saz, tî, war, wer, wî, van, yar, xane

Ûn di kevanê de jî aliyê min ve hatin danîn, jî ber ku kêmbûn; lê dîsa min ew rast pejirandin. Li dawîya "ng" ê min nîşaneka pirsê(?) danî, jî ber ku kêmbû.

Ew qertaf, tim dengdêrek distîne pêşîya xwe û bi serê xwe nabe parkît. Nimûne: *dar+ing, pêş+eng, çol+ang...*

Qertafên ku jî aliyê min ve wekî parkît (4) nehatine pejirandin ev in:

dan, deng em û kîng
dan: Nimûneyên *kevçî+dan, ka+dan, kil+dan* nîşan dane. Ji şrovekirina vê yekê re ne hewce ye ku gotin bê dirêjkirin. Diyar e ku pakît di rastiya xwe de "dank" e. Heta ez gihame wê baweriyê ku parkît jî du hêmanan çêbûye; jî lêkera "dan" û jî parkîta "k" yê. Dîsa jî ez "dank" ê wekî parkîteke serbixwe dipejirînim.

dang: Parkît "dank" e
em: Ev rêza tiştêkî û kemperiyê dide xuyan û bi kurmanciya jêrê ye. Ji bo nimûne: *Kesê duyem, sêyem...*

kîng: Jê re nimûneyên "bira+kîng" û "zava+kîng" hatine dayîn. Parkîteke me ya ku ravyek "ng" ye heye û dengdêrek dikare were pêşiyê. Me li jorê jî bo wê daxuyaniyê dabûn.

Ku em li ser nimûneyên dayî rawestin û wan jî hev bibişkêvin: "birakîng", peyv jî "bira+k+î+ng" yê hatiyê pê. Di şûna ku "birayê min" bê gotin "birakê min" jî tê gotin. Di vir de "k" parkît e. Ji bo nimûneya din jî ev ravek dikare bê dayîn.

Ji "in", "la", "um" û "tank" ê re qet minak nedane. Em jî bi şeweyeke zanistî nikarin li ser wan gotin bibêjin.

çî: *xebatçî, zirneçî...* Ev parkîteke bi tirkî ye.

4. Di pirtûka Rêzimana Kurdî ya A. Balî de parkît:

A. Balî di vê berhema xwe de 31 parkît tespît kirine. Di dawîya vekoîna xwe de ez gihyam vê encamê ku dido jê ne parkît in û yek jî bi tirkî ye. Ji sê heban re jî nimûne nedaye û li hêla dinê jî parkîteke hatiyê dubarekirin.

Li gorî rêza alfabeyê 24 parkîten ku jî aliyê me ve hatine pejirandin:

ane, anî, ar, baz, bend, dank, dar, gar, geh, ik, (î)stan, î, in, k, kî, mend, ng, ok, saz, tî, war, wî, xane, yar

Min jî "stan" ê re herfa "î" yê di nav kevanê de, danî paşîya wê, jî ber ku awayê rast welê ye.

Parkîten ku rast ne hatine pejirandin:
dan, dang, kîng

dan: A. Balî vê wekî parkîteke daye nîşan û jî bo nimûneyê jî peyva "gadan" daye. Qenc diyar e ku "ga" nav e û "dan" jî lêker e, ne parkît e.

Li ser "dang" ê jî ku me fikra xwe derpêş kiribû, ku ev qertaf "dank" bi xwe ye. Ji ber tевелиya devokên herêmî, di bilêvkirina eynî peyvê de cudahîtiyê diqewime; îcar ku tip jêderka wan yek be ev rewş hîn bi hêsanî rûdide. Ji bo "kîng" ê jî me li jorê îzehet dabû.

Dîsa me der barê qertafa "çî" yê de ramanên xwe daxuyandibû ku ew bi tirkî ye.

Ji "din", "la" û "um" ê re tu peyv nedane nîşan.

Welê xuya dibe ku A. Balî pir di bin bandora Qanatê Kurdo de maye, heta nimûneyên wan jî mîna hev in û qertafên ku wekî parkît hatine nîşandan û nimûne eynî ne.

5. Di Hêmana Rêzimana Kurdî ya Feqe Huseyn de parkît:

Feqe Huseyn di vê xebata xwe de, 28 parkîtan pêşkêş dîke. Ji bilî du heban tev rast in.

Li gorî rêza alfabeyê parkîten ku rast hatine pejirandin:

ane, anî, ahî, ar, asî, ayî, baz, dar, ek, ende, er, geh, ik, (î)stan, î, in, kar, ker, kî, mend, ok, ox, tî, van, xane, yar

Herfên nava kevanê jî hêla min ve hatin danîn. Bi ya min qertafa "stan" ne bêtî herfa "î" yê ye û "g" ya di qertafa "dang" ê de jî "k" ye.

Parkîten ku min ev nepejirandine "kok" û "dang" in.

kok: Ji vê re minakên "sevi+kok", "deri+kok" û "jini+kok" hatine nîşandan. Ji wan minakan jî bi awayekî zehf zelal dixuye ku, qertaf "ok" e. Ji ber ku peyv bi parkîtan, du car hatine çêkirin. Nimûne: *jîn+ik+ok, der+ik+ok, jîn+ik+ok*. Me li ser "dang" ê berê ramana xwe daxuyandibû.

6. Di xebata Kemal Badîllî de parkît:

Rehmetiyê Kemal Badîllî, di berhema xwe de -her çiqas di bin sernavekê de parkîtan bi nav nekiribe jî -22 parkît destnîşan dîke. Ji wan du heb jê, ne parkît in û yek jî kêmbû. Ew jî "min" e. 19 parkîten ku jî aliyê min ve rast hatine pejirandin ev in:

a, anî, al(î), ar(î), ax, e, ek, ng, ik, î, in, kar, kî, ok, onek, or, tî, van, war(?)

Herfên nava kevanan Badîllî bi xwe ew dane, nîşana pirsê jî, jî aliyê min ve hate danîn. Di rastiya de ew "î" jî bi serê xwe parkît in, ku jî wan re nimûneyên "zen-garî" û "hevalî" dane.

Ji aliyê din ve K. Badîllî dema minakan dide, "war" ê nolî parkît nîşan nade. Lê dîsa min ew, mîna parkît qebûl kir.

Qertafên ku jî aliyê min ve nolî parkît nehatine pejirandin:

dan gûn û min

dan: "xoy+dan", diyar e ku peyv jî du hêmanan pêk hatiye; jî "xwê" û "dan" di vir de lêker e, ne parkît e.

gûn: Parkîta "gûn" û "gon" yek tişt e. Ji ber ku, herfên "o" û "û" bi hêsanî dikarin bi hev biguherin. Mînak; *honandin-hûnandin*, serok-serûk. Em li ser "gon" ê rawestiyabûn ku ew rengdêr e.

min: Divê bê daxuyandin ku "min" jî "man" ê tê. Jixwe, jî bo wê nimûneyê "dij+min" hatiyê dayîn; her çiqas peyv îro wisa tê bikaranîn jî, di rastiya xwe de "min" jî "man" ê dageriyaye. Mînak: *şa-*

dîman, encûman, poşman, şîşman...

7. Parkîten di kitêba

Mûrad Ciwan de

Mûrad Ciwan di vê berhema xwe de 42 parkîten ku, tèn paşiya peyvyan pêşkêş dîke. Ji wan me 15 liban wekî parkîten nepejirandin.

Li gorî rêza alfabayê 27 parkîten ku rast hatine pejirandin:

ane, ahî, anî, ar, ayî, baz, bend, dank, dar, ek, geh, gîn, ik, istan, î, in, k, kî, mend, ok, saz, tî, van, war, wer, wî, yar
Ën ku wekî parkîten (15) nehatine pejirandin:

an, andin, çolkî, dan, em, emîn, ê, hî, in, fyan, fyar, okî, olekî, otankî, tirîn
Ji bo "an", "dan", "em", "hî" û "fyan" ê daxuyanî hatin kirin.

andin: radera lêkerê ya dema wê ya gerguhêz e. Her wiha mirov dikare bi alîkariya wê ji navdêr û rengdêran jî lêkeran çêke: germ, germ+andin; kel, kel+andin...

emîn: yekemîn... Ev jî nolî "em" ê rêzê dide nişan û ji kurmançiya jêrê derbasî ya jorê bûye.

ê: paşiyê, dawiyê... Ev "ê", qertafa tewangê ya zayenda mêtîyê ye ku hatiye dawîya peyvê.

çolkî: spî+çolkî. Nimûneyek bi tenê hatiye nişandan û peyv ji sê hêmanan pêk hatiye; spîç+ol+ki. Di wir de "îç", "ol" û "ki" bi tenê parkîten in.

in: Jê re ev nimûneyên "şûştin" û "darin" hatine dayîn

Heke em li ser her duyan rawestin, dê bê dîtîna ku "şûştin" lêker e û di rewşa raderê (mesdarê) de ye û ji aliyê din ve jî, di halê kişandî de ye. Kin were gotin, ji aliyê kî ve "in" qertafa raderê ye û ji aliyê din ve jî ya kişanê ya gelemariyê ye, li gorî dema borî; "in" a di peyva "darin" de jî qertafa tewanga gelehejmariyê ya nebinavkirî ye ku bireserek (nesneyek) nedaye pey navdêr. Ji bo nimûne: *Mirovin hatin, agir kete dehlê darin şewitîn...*

fyar: bext+î+yar... Parkîten di rastiya xwe de "yar" e û li gorî peyvê herfeke dengdêr dikare were pêşiya wê. Mînak: cot+yar, pirs+yar...

okî: Qirêj+okî... Peyveke hevedudaniye û wiha dikare ji hev bê derxistin: qirêj+okî+î... "okî" bi serê xwe ne parkîten e.

olekî: Reş+olekî... Ev jî, ji "reş", "ole" û "ki" yê çêbûye. Di wir de tî xuyan ku "ole" û "ki" her yek bi serê xwe parkîten in.

otankî: Reş+otankî... Peyv ji du rengdêr û parkîtek û ji gihanekekê hatiye holê: reş+û+ tanî+ki. Ji bo ku em baş zelal bikin, ji taniyê "i" ketiye û ji milê din ve "û" li "o" yê dageriyaye.

tîrîn: Mezintîrîn... Ji bo kemperiyê tê bikaranîn û ji kurmançiya jêrê ketiye nava ya jorê. Di kurmançî de ji dêla wê ve "herî" û "tewrî" tê xebitandin. Ji bo mînak: herî mezin, tewrî mezin...

Pîştî van nîrxandinan îcar min divê ez yekûna hejmara parkîten ku di her heft xebatan de cih standine, pêşkêş bikim; ku 59 lib in. Ev jî heye ez dê ji bo "ng" ê nimûneya "ing" ê bidim. Li ser wê teherê xwe daxuyanî hatin kirin.:

a: beza, zana
ahî: dûrahî, dirêjahî
ak: civak, ronak
al: heval, delal
ane: mêrane, dostane
anî: pîrani, mehanî
ar: mirar, guhar
asa: hûtasa, dêwasa
asî: tengasî, kêmasî
atî: mirovatî, kirîvatî
awer: cengawer, dilawer
ayî: reşayî, kîrayî
ax: antax, qûndax
ban: pusban, kezîban
bar: xembar, guhêrbar
baz: şûrbaz, rimbaz
bend: nalbend, sazband
ber: rêber, rencber
dank: derzîdank, kildank
dar: maldar, deyndar
dêr: çavdêr, avdêr
e: xwende, nerme
ek: serek, pişteker
ende: dirende, firende
er: koçer, pêjer
êr: dilêr, gelêr
gar: şûngar, yadigar
gaz: belengaz, gerdengaz
geh: pêgeh, bergeh
gîn: mizgîn, xwazgîn
ik: hîvik, kêrik
istan: kurdistan, şaristan
î: kurdî, botî
in: zêrin, darîn
îng: soring, çolang
îfî: nezaniîfî, meziniîfî
k: binkirask, berdilk
kar: cotkar, goşkar
ker: zîvker, karker
kî: devkî, nivîskî
lan: mozelan, kuçelan
mal: destmal, pêşmal
mend: aqilmend, hunermend
nak: derdnak, endîşenak
ok: kenok, şermok
ole: hişkole, tirole
onek: tîrsonek, bizdonek
or: gulor, gilor
ox: gotox, dayox
oyî: şeroyî, germoyî
saz: çeksaz, diransaz
tî: pismamîfî, xinamîfî
ûr: rencûr, destûr
van: aşvan, dergevan
war: berwar, şarwar
wer: serwer, bextewer
wî: rewî, bawî
xane: aşxane, dermanxane
yar: bextyar, pirsyar

Ez dixwazim li ser hin parkîtan ramanêke xwe daxuyînim. Bi ya min, qertafin hene ku bi qonaxa demê re li hev dageri-

yane û li gorî baweriyaya min ji hev tèn. Heke ez wan di komekê de bi rêz bikim:

"ak", "ax", "ok" û "ox"
"ar", "er" û "or"
"ahî" û "ayî"
"or" û "ol"
"ûr" û "or"
"ban" û "van"
"bend" û "mend"

Îcar ez dixwazim parkîten ku min ew di van heft xebatan de nedîtine û yên ku ji aliyê min ve hatine tespîtîkirin ku 23 heb in, pêşkêş bikim. Bi rêza alfabayê:

aş: qeraş, gulaş
at: civat, gulat
av: palav, delav
ava: malava, zarava
az: tolaz, firaz
bat: malbat, sazbat
co: nivco, manco
çe: nalçe, xaliçe
çink: mûçink, dewçink
de: pêşinde, talde
ele: rewtele, sengele
ezar: şermezar, tengezar
gan: bazirgan, çogan
heng: serheng, leheng
ij: lavij, paqij
îç: spîç, ziriç
îne: çavîne, yekîne
nc: sarinc, qolinc
ol: gilol, çinçol
ûn: kaşûn, derûn
ûd: şerûd, sirûd
waz: şaşwaz, cihêwaz
wir: canewir, mizawir

Li ser "nc"ê pêwîst e ku ez hin daxuyanîyan bidim. Herfînen dengdêr dikarin bêne pêşiya "nc"ê. Nimûne:

sar+i+nc, ar+ê+nc, ser+e+nc...

Bi van 23 paşgiran ve, di zaravayê kurmançî de yekûna paşgîrên tespîtîbûyî digihîje 82'yan. Hêviya min ew e ku ev xebat ji aliyê kesên zimanzan ve bê vekolîn û nîrxandin, pişt re jî ez bêm agahdarkirin da ku ez karibim careke din lê vegêrim.

ÇAVKANÎ:

1- Emîr Celadet Bedirxan, Rager Lescot; Kûrtçe Gramerî, Doz yayinlari, Stenbol
2- D. Îzolfî; Ferhenga Kurdî -Tirkî, Tirkî -Kurdî, Weşanên Deng, çapa pêşîn, Stenbol 1992

3- Prof. Qanatê Kurdo; Gramera Zmanê Kurdî, Koral Yayinlari, çapa duduyan, Stenbol 1991

4- A. Bali; Rêzimana Kurdî, Alan yayincîlik, çapa pêşîn, Stenbol 1992

5- Feqe Huseyn Sağniç; Hêmana Rêzimana Kurdî, Melsa yayinlari, çapa pêşîn, Stenbol 1991

6- Kemal Badîllî; Türkçe İzahlı kûrtçe Gramerî, Med Yayinlari, çapa duduyan, Stenbol 1992

7- Mûrad Ciwan; Kûrtçe Dilbigisi (Kûrtmança lehçesi), Weşanên jîna nû, çapa pêşîn 1992.

Çend nîşe li ser pêşveçûnên fonolojîk ên di kurdî de

Li ser wergerê çend gotinên pêwîst

Di destpêka wergerê de diwariya ku derket pêşberî me ji ber wergerandina tîpên îngilîzî (yên di mînakên de) li tîpên kurdî bû. Ji bo ku xwendekarên kurd ji mînakên fêhm bikin, guhertina hin tîpan bi yê kurdî pêwîst bû. Lê ji ber ku di zimanê îngilîzî de hintîp bi gelek awayan tîpên lêv kirin, di ravekirina hin peyvên de arîşe derket. Wekî tîpa I li ku Ay, li ku wekî I hatiye bikaranîn; an tîpa A li ku E, li A ye. Dîsa tîpa E li ku E ye, li ku i ye û hwd. Her wiha hin deng hene ku ji aliyê nivîskar ve bi awayekî baş nehatina ravekirin, ji ber vê yekê ji bo insanên ku bi zimanên ku jê mînak hatine wergirtin nizanin, naskirina wan dengan zehmet e. Hin tîpên transkripsiyonê li kurdî hatin wergerandin, wekî J bû C, C bû S û 'C, û 'Z bûn Ç û 'J'ya kurdî, hin îşaretên ku di komputerê de bi dest neketin ji nehatin nivîsandin an ji bi nîşeyên din hate guhertin. Tevî kêmasiyên ku me li jor dabas kirin ji ez bawer im, nivîsê ji hêjabûn û zanistiya xwe zêde tişt wîna nekir. Heke ji ber sedemên ku min anî zimên, hin kêmasî derkevin, ez ji niha ve lêborîna xwe ji nivîskar û xwendevanan dixwazim.

HAMID MAHEMADI

Ji Îngilîzî: Sami Berbang

Tevî pîrbûna zaravayên wî û birek peyvên ku wî ji zimanê din ên îranî û ne-îranî wergirtine, zimanê kurdî tekanebûna xwe di warê cudabûna karekterî û dirûvîne de diparêze. Kurdî, tevî zimanê ku farisî, ji ber vê yekê zimanê rojavayê Îranê yê herî girîng û zimanê pê herî zehf tê axaftin e. Di van rûpelên xwarê de wê çav bê gerandin li hinek taybetmendiyên dengsaziya (fonolojî) kurdî û pêşveçûnên wê, tevî danberheva (qiyaskirin) bi zimanên kevnare û nûjên yê îranî re; wekî Avestan (Av)⁽¹⁾, Parthî (parth)⁽²⁾, farisiya kevin (FK)⁽³⁾, farisiya navîn (FN)⁽⁴⁾, farisiya nû (FNû)⁽⁵⁾, pehlewîya pirtûkan (PP)⁽⁶⁾, îraniya naverasta rojava (ÎNR)⁽⁷⁾ û du zimanên din: Sanskritî (Skr)⁽⁸⁾ û zimanê giştî yê hînd-ewrûpayê (HE)⁽⁹⁾. Kurmancîya Başûr ku zêdetir bi navê soranî⁽¹⁰⁾ tê nasîn, li wir wê wekî nûnerê zimanê kurdî (Krd.)⁽¹¹⁾ bê bikaranîn. Her wekî wê bê dîtin, Parthî (pehlewî) û kurdî

ku her du ji zimanên bakurê rojavayê Îranê ne, di rîya pêşveçûna dengsaziyê de ji xwediyê gelek hevparîyan in.

A. Hinek hevpariyên kurdî û Parthî di pêşveçûna (perisîn, kamilîn) dengsaziyê de.

I. *G^W û *G^{WH}'ya hînd-ewrûpî ku dengdêrekê an niv-dengdêrekê bi dû xwe dixê, di sanskritiyê de dibe C û H. Her du deng ji di îraniya kevin de dibin C

| | |
|-------------------------|---------------------|
| HE *G ^W İwo | *G ^{WH} en |
| Skr Çiva(jiyan, jîndar) | ḥan- (lêxistin) |
| Av Çva | Can |
| FK Çîwa | Can |

Ç'ya îraniya kevin di farisiya navîn de dibe Z, lê di parthî de dibe J. Farisiya nû forma farisiya navîn diparêze, kurdî forma parthî digire.

| | |
|-----------------|----------|
| Krd. Jîn, Jiyan | jî |
| Parth Jîw | Jîwahr |
| Jîwahrên | Jîwandag |

PERAWÊZ:

¹ Zimanê pirtûka pîroza a zerdeştîyan, Avesteyê. Zimaneke Îrana rojhilat e û pir kevin e. Ev ziman belkî ji sedsala VI. (BZ) bi vir ve wekî hacetê ragihandinê nayê bikaranîn.

² Parthî an jî pehlewî zimanê dewleta Parthîyan e (247 BZ-226 PZ). Niha di hinek belgeyên de ku ji wê rojê gihîştine îro, ev ziman derketiya pêşberî mirovan. Ev jî wekî kurdî zimanê bakurê rojhilata Îranê ye.

³ Farisiya kevin an jî parsîk zimanê farisên Acheamenian (559-330 BZ) bû. Hinek belgeyên bi vî zimanî bi dest ketin. Ev ziman dikeve nav şaxa zimanên başûrê rojava yê Îranê.

⁴ Farisiya navîn an jî parsîk zimanê farisên dema Sasaniyan (224-637 PZ) bû. Bi şeweyê paşîn di nava belgeyên Manichae-anê ji Turfana Asya Navîn a Çînê de, hatiye parastin.

⁵ Farisiya nû an jî farisî, zimanê pê axaftin û nivîsînê yê farisan ji dema fetha îslamê ya sedsala 7'an (PZ) ve.

⁶ Ev şeweyekî çêtîr û kevintir e farisiya navîn e. Bi piranî di pirtûkên olî yê dema Sasaniyan de tê dîtin. Alfabe ya dihat bi ka-

ranîn, jê re digotin pehlevî (mînak pathî) ji ber vê yekê Pehlewîya pirtûkan jê re bûye nav.

⁷ Navekî giştî ku li Parthî û farisiya navîn tê kirin e. Ev tîgîn, dema peyvên ku di her du zimanan de hevpar bûn rojevê, tê bikaranîn.

⁸ Zimanê pirtûkên pîroz ên Rig Vedaya Hindûîzmê ye. Sanskritî inêzîkî avestayî ye.

⁹ Wekî "Ursprache" jî tê binavkirin, navê giştî yê hemû zimanên hînd-ewrûpî ye. Ji ber ku niha zimaneke bi vî navî tune, hebûna vî zimanî tişteki teorîk e angû çêkirî ye.

¹⁰ Soranî yek ji car zaravayên kurdî yê mezîne e. Bi texmînî zimanê axaftinê yê 6 milyon kesî ye. Li Kurdistanê sînorê herêma ku bi piranî bi vî zaravayî tê lê peyivîn, mirov kare wiha rave bike: Li bakur, xeta ji başûrê gola Wirniyê ta xala ku çemê Zapa Mezîn û Dicle digihîje hev û başûrê Musilê; li başûr jî, rîya ku çemên Sîrwan û Diyala dişopîne ye; ji nêzîkî Hamadanê heta Kîrîyê mirov kare pir hindîk wekî sînor bigire. Soranî zaravayê piraniya kurdên Îran û Iraqê ye.

¹¹ Ev nav, hemû zimanên îranî bi şeweya wan a herî kevin nîşan dide.

| | | |
|------|--------------------------------|--------|
| F.nû | Zistan | Zinda |
| | Zindigani, zindigî | |
| F.N | Ziwist- ziw | Zihr |
| | Zihrên | Zindag |
| Av | Çivya, çvaya, çuya, çuva, çvan | |
| | Çitay (f.), çyatav, çyotû | |

| | | |
|--------|--------------|-------|
| Krd. | jan | jîr |
| Parthî | jan | jîr |
| Farisî | zan | zîrek |
| F.N | zan | zîr |
| Av | Canay, Cenay | Cîra |
| Skr. | Canay | Cîra |

II. K'ya hînd-ewrûpî ku ji koka zimên dertê, di sanskrîtî de dibe S, di avestayî de vediguhere dibe S û di farisiya kevin de dibe Ø (nêzî zata e-rebî)

| | | |
|------|---------------------|-------|
| HE | -k ₁ mtō | (sed) |
| Skr. | Sata- | |
| Av. | Sata- | |
| FK. | Øata- | |

S'ya avestayî û ø'ya farisiya kevin, di zimanê rojavayê navîn ê îranî de dema li seriyê peyvê dibe S, mirov wê di nava navîna peyvên farisiya navîn de wekî H dibîne.

| | | |
|-----|-------------|--------------|
| Av. | Sata- (sed) | Sareda (sal) |
| FK. | Sata- | øarda |
| ÎRN | Sad- | Sal, sar |

| | | |
|--------|-------|-------|
| Krd. | Mezin | Deh |
| Parthî | Mas | Das |
| FK. | *Maø | *Daøa |
| FN. | Mah | Dah |
| Av. | Mas | Dasa- |

Di kurdî de hindik peyvên ku S'ya parthî ya hemberê H'ya farisiya navîn diparêzin hene.

| | |
|--------|---------|
| Krd. | Masî |
| Parthî | Masayeg |
| FN. | Mahîg |
| Av. | Maya |
| Skr. | Matsya |

| | |
|--------|-----------------------|
| Krd. | Asin, hesin |
| Parthî | Asanag (hesinî) |
| F.Nû | Ahen |
| PP. | Asén |
| | Asénîn |
| Av. | Asmana (kevir) |
| | ayarehaéna (ji hêsîn) |

| | |
|-----------------|------|
| û mînaekeke din | |
| Krd. | Ask |
| Baluçi | Ask |
| Parthî | Asûg |

| | |
|------|------------|
| FN. | Ahûg |
| PP. | Ahûk, ahug |
| F.Nû | Ahû |

III. Taybetiyeke kurdî jî parastina Z'ya parthî û avestayî ye ku di farisî û farisiya navîn dibe D. Her wiha ew deng di hinek peyvên hevpar ên piraniya zimanên îranî de jî tê dîtîn. Z'ya avestayî (di farisiya kevin de D) jî *Ĝ'ya û ĜH'ya hînd-ewrûpî ku di sanskrîtî de dibe C û H, tê.

| | |
|------------|---------------------|
| HE | Ĝreyos (zerya, gol) |
| Krd. | Zerya, zirê |
| Parthî | Ziréh |
| FK. | Drayah- |
| FN. | Drayâb |
| PP. | Drayab û zreh |
| FNû | Darya |
| Av. | Zrayah |
| Skr. | Crayah |
| û her wiha | |
| HE | *eĜHom |
| Krd. | Ez ⁽¹²⁾ |
| Parthî | Az |
| FK. | Adam |
| Av. | Azem |
| Skr. | Ahem |
| wekî | |

| | |
|--------|--------------|
| Krd. | Zawa |
| Parthî | Zamad |
| FN. | Damad |
| PP. | Damat, damad |
| Av. | Zamatar- |
| Skr. | Camatar |

| | |
|---------------|--------------------|
| Mînaekeke din | |
| Krd. | Zistan |
| FNû. | Zimistan |
| PP. | Zamistan, damistan |
| Av. | Zyam, zayana |
| Skr. | Him |

| | |
|----------|---------------------|
| Her wiha | |
| Krd. | Zanîn |
| Parthî | Zan-, Zanad |
| FK. | Dan-, adana |
| FN. | Danist, Dan- |
| PP. | Danistan |
| F.Nû | Danistan |
| Av. | Zan-, paîfî. zanata |
| Skr. | Can-, canatî |

| | |
|--------|---------------------------------|
| Krd. | Zird, zir (dil) ⁽¹³⁾ |
| Parthî | Zird |
| Av. | Zered zaresaya- |
| FK. | *Dird |
| PP. | Dil |
| FNû | Dil |

| | |
|------|-------------|
| Skr. | Hrd, hrdaya |
|------|-------------|

IV. *KW'ya hînd-ewrûpî ku bi zava lêvan û zimên dertê û berî dergdêr an nîvdengdêrekê tê, di sanskrîtî de dibe S, di avestayî û farisiya kevin de dibe Ç. Mînaekeke baş ku diyar dike ku kurdî li ser rêça parthî ye, pevyâ roj e.

| | |
|--------|-----------|
| Krd. | Roj, roje |
| Parthî | Rôj |
| FK. | Rauçah- |
| FN. | Rôz |
| PP. | Rôz |
| Av. | Raoça |
| Skr. | Rôças- |

V. TW*ya hînd-ewrûpî TV'ya sanskrîtî dide, lê di avestayî û farisiya kevin de dibe ØW.

| | |
|------|--------------|
| HE | Twém (a te) |
| Skr. | Tvam |
| Av. | Øwam |
| FK. | Øwam |

ØW'ya îraniya kevin a şeweya navîn e, ew di parthî de F, lê di farisiya navîn de dibe H.

| | |
|--------|----------|
| Krd. | Çuwar |
| Parthî | Çafar |
| FN. | Çahar |
| FNû | Cahar |
| Av. | Çawwâre |
| Skr. | Çatvâras |

Ji bilî çuwar, tu mînaekeke din tu-nin di kurdî da ku em bibêjin kurdî ew rê şopandiyê. Lê ev peyv tenê jî nîşan dide ku kurdî bi parthî re riyê-ke hevpar a perisandinê kudandiyê. Ji bér ku dengê F dikare veguhere bi-be W, lê dengê H nabe W.

VI. Taybetiyeke kurdî ya herî girîng pêşveçûna M'ya ku piştî dengdêrekê tê ye. Ew deng vediguhere dibe W/V (binêre li paragrafa XI'an). Ev pêşveçûn dikare di gelek peyvên parthî de jî bê destnîşankirin. Îraniya kevin *Hama- sarda (wek hev)

| | |
|--------|--------|
| Parthî | Hawsar |
| FN. | Hamsar |
| FNû | Hamsar |

û

Parthî Angaw-, angawad (kuta kirin)

| | |
|-----|--------|
| FN. | Hamgam |
|-----|--------|

Bi wan peyvên kurdî de re dibe ber hev:

| | |
|------|--------|
| Krd. | Hawsar |
| | Hawbaş |

B. Hin pêşveçûnên dengsaziyê

¹²Zarayê kurmançî yê kurdî

¹³Her çiqas di zimanê kurdî de peyva ji bo dil "zird" an "zir" be jî, di hin zaravayên kurdî yê wêkî guranî de, ew dibe ili.

yên hevpar di kurdî û farisiya navîn de.

VII. Y'ya îraniya kevin ku hemberê *Y'ya hind-ewrûpî ye, parthî di serê peyvêde wekî xwe diparêze, lê di farisiya navîn de dibe C. Hem kurdî, hem jî farisiya nû vê rê dişopînin.

| | |
|---------------------|-------------------------------|
| Krd. | Car |
| | Ca |
| FN. | Car |
| | Carcar (carcaran) |
| Parthî | Yawar (dem) |
| | Yawaryawar (tim, carcaran) |
| Av. | Yar (sal) |
| | Yare-drayah (dirêjîya salekê) |
| û | |
| Krd. | Cadû |
| PP. | Yatûk, cadûk |
| | Yatûkîh, cadûkîh |
| FNû | Cadû |
| Av. | Yatav, cayw |
| Skr. | Yatav |
| û dîsa | |
| Krd. | Cerg |
| FNû | Cegar |
| Av. | Yakar |
| û | |
| Krd. | Cuwan |
| Parthî | Yuwanagîft |
| PP. | Yuwan, cuwan |
| Av. | Yuvan-, yvan, yavan, yûn |
| Skr. | Yûvan, yûn |
| Wekî mînaekeke din, | |
| Krd. | Cawîd (nemir, timzindî) |
| FN. | Cayedan, cayedanag |
| PP. | Cawitan, cawidan |
| FNû | Yawedan |
| Av. | Yav- (heta hetayê) |
| Krd. | Cô (ceh) |
| FNû | Cô |
| PP. | Cô |
| Av. | Yawa- |

VIII. DW'ya farisiya kevin û DW(B)'ya zimanê avestayî, bi awayekî gelemperî di parthî de dibe B, lê di kurdî, farisiya navîn û nû ew dibe D.

| | |
|--------|------|
| Krd. | Dar |
| PP. | Dar |
| FN. | Dar |
| FNû | Dar |
| Parthî | Bar |
| Av. | Dvar |

| | |
|--------|----------------------|
| Skr. | Dvarau, durah |
| û | |
| Krd. | Duwa |
| FK. | Duvitiya (duyemîn) |
| FN | Dôdig (duyemîn) |
| Parthî | Bid, bidîg |
| Av. | Dva (duyemîn) |
| | Bitya |
| | Bityai |
| | (di cara duyemîn de) |

C. Hin pêşveçûnên dengsaziyê yên parthî û farisiya navîn ku di kurdî de cih digirin.

IX. *RD an jî *LD'ya hînd-ewrûpî di îraniya kevin de bi taybetî di avestayî û farisiya kevin de dibe RD. Lê *RG an LG'ya hînd-ewrûpî di van zimanên ku me bi nav kir de, dibe RZ. RD'ya îraniya kevin, di parthî de wekî xwe dimîne, di farisiya navîn de diguhere, dibe L(R). Dîsa RZ'ya îraniya kevin di parthî de wekî xwe dimîne, di farisiya navîn de dibe L. Her çiqas kurdî bi gelemperî li ser şopa parthî bimeşe jî, çend mînakên ku her du awayan tevî hev diparêzin jî hene.

| | |
|--------|-------------------------|
| Krd. | Heştin, hel- |
| Parthî | Hişt, hirz |
| FN | Heşt |
| Av. | √hrz |
| û | |
| Krd. | Malîn |
| FNû | Malîdan |
| Av. | √mrz |
| dîsa | |
| Krd. | Mel |
| Av. | Merezav (hestiyê piştê) |

Mînakên li xwarê awayê din destnîşan dikin:

| | |
|------|---|
| Krd. | Mare (di kurdî de Z'ya dawîya peyvê ketiye) |
| Av. | √mrz |

| | |
|--------|-----------------------|
| Krd. | Berz |
| Parthî | Burz, burzênd |
| FN. | Buland |
| FNû | Buland |
| Av. | Berzant- Barez, berez |

X. ND'ya îraniya kevin a dawîya peyvê di parthî de wekî ND dimîne, lê di farisiya navîn dibe NN. Bi hejmareke hindik mînakên awarte hene di farisiya dema navîn de ku ji vê qeyîdeya giştî avarê dibin. Mînak peyva bann, bi şeweyê zimanê parthî an

go wekî band jî tê dîtin. Farisiya nû li ser şopa parthî dimîne di vê mijarê de. Lê di pehlewiya pirtûkan de mirov rastî her du şeweyan jî tê. Her wiha kurdî jî her du şeweyan tevî hev diparêze.

| | |
|--------|---------------------|
| Krd. | Benn, bend |
| Parthî | Band |
| FN. | Bann, band |
| PP. | Band |
| FNû | Band |
| û | |
| Krd. | Bendixane |
| Parthî | Bandistan |
| FN. | Bannistan |
| dîsa | |
| Krd. | Ganim |
| | Genîn |
| | Gend |
| Parthî | Gandag (bêhna genî) |
| FN. | Gannag |
| PP. | Gannak, gannag |
| FNû | Gand |
| Av. | Gainti |

D. Hin taybetiyên din ên dengsaziyê di kurdî de.

XI. Her wekî di paragrafa VI'an de hate gotin taybetiyeke dengsaziya kurdî ya herî girîng guherîna M'ya piştî dengdêre bi V/W'yê ye.

| | |
|------------------|-------------------------|
| Krd. | Naw |
| Parthî | Nam |
| FN. | Nam |
| PP. | Nam |
| Av. | Naman-, Naman |
| Skr. | Naman |
| û mînaekeke din, | |
| Krd. | Haw |
| Parthî | Ham |
| FK | Ham- |
| FN. | Ham |
| PP. | Ham |
| FNû | Ham |
| Av. | Ham-, Ham-, Hêm- û hwd. |
| Av. | Sam |

| | |
|-----------|--------|
| Her wiha, | |
| Krd. | Hawîn |
| Av. | Hamîna |

| | |
|--------|------------------|
| û | |
| Krd. | Zewî |
| Parthî | Zamîg |
| FN. | Zamîg |
| PP | Zam zamîg, zamîk |
| FNû | Zamîn |

Tiştêkî balkêş e ku ev qeyde li ser peyvên ku ji farisî û erebî derbasî zimanê kurdî bûne jî pêk tê.

Temama erebî di kurdî de bûye te-

waw û cema'ata erebî di kurdî de bû-ye civat.

Hin caran, wekî mînaka ziman, be-revajiyê vê qeydeyê jî pêk tê. W'ya piştî dengdêrê ya farisiya dema navîn di kurdî de dibe M.

| | |
|--------|--------------|
| Krd. | Ziman |
| Parthî | Îzban |
| FN. | Îzwan |
| PP. | Uzwan |
| FNû | Zeban |
| Av. | Hizu-, hizva |

XII. Taybetiyeke xweser a kurdî jî guherîna **-sm** û **xm'**ê bi W/V'ê ye.

| | |
|--------|--------|
| Krd. | Çaw |
| Belûcî | Çam |
| Parthî | Çaşm |
| FN. | Çaşm |
| Av. | Çaşman |

| | |
|--------|------|
| Krd. | Şow |
| Belûcî | Şom |
| FNû | Şoxm |

Her wiha ,

| | |
|---------|----------------|
| Krd. | Tow |
| Belûcî | Tom |
| Paştûyî | Toma |
| Parthî | Toxm |
| FK. | Tauma |
| FN. | Toxm |
| PP. | Tohmak, toxmag |

| | |
|-----|---------|
| FNû | Toxm |
| Av. | Taoxman |

XIII. Taybetiyeke zimanê kurdî ya xweser ku wî jî hemû zimanên rojavayê îranê yên dema navîn û dema nû vediqetîne, parastina riha kevnare çyu- (çûn)

| | |
|---------|--------------------|
| Krd. | Çy, çûn |
| Paştûyî | C- |
| Waxî | Çaw |
| Osetî | Çaeu |
| Parthî | Şud, şuw- |
| FN. | Şud, şuw- |
| Av. | Şyav, şav |
| Skr. | Çyavata, syavayafî |

XIV. Kurdî du şeweyan: paitî'ya a-vestayî û be' ya farisî bi hev re diparêze.

| | |
|------|-------------|
| Krd. | Be (ber bi) |
| | Pe |

| | |
|--------|----------|
| Parthî | Pad |
| FK. | Patiy |
| FN. | Pad |
| PP. | Pad, pat |
| FNû | Be |
| Av. | Paiti |

XV. Di kurdî de W'ya serê peyvê ya zimanên Naverasta Îranê hin caran wekî parthî dimîne, hin carên din wekî farisiya nû dibe B.

| | |
|------|-------------------------------|
| Krd. | Werz, wezrîn (ber rakirin) |
| PP. | Warz |
| FNû | Barzigar (kesê ku ber radike) |
| Av. | Varezâ- |

| | |
|------|---|
| û | |
| Krd. | Wafr, Befr (bi zaravayê guranî warwa ye.) |

| | |
|--------|------|
| Parthî | Wafr |
| FN. | Bafr |
| FNû | Barf |

| | |
|------|--|
| lê, | |
| Krd. | Baran (di zaravayê guranî de waran e.) |

| | |
|--------|-------|
| Barîn | |
| Parthî | Waran |
| FNû | Baran |
| PP. | Vara |
| Skr. | Var |

| | |
|------|--|
| û | |
| Krd. | Bad (bad) (di zaravayê guranî de wa ye.) |

| | |
|--------|----------|
| Parthî | Wad |
| FNû | Bad |
| PP. | Wat, wad |
| Av. | Vata |

Her wekî di mînakên de tê dîtin zaravayê soranî meyldarê guhertina W'yê bi B'yê ye, lê zaravayê guranî W'yê wekî xwe diparêze.

XVI. Dema mirov farisî û kurdî di-de ber hev, taybetiyeke kurdî ku wê jî farisî vediqetîne, ev e: B'ya navîna û dawîya peyvê ya farisî di kurdî de wekî W derdikeve pêşberî mirov.

| | | |
|------|----|--------|
| Krd. | Aw | awdan |
| FNû | Ab | abadan |

| | | |
|------|-----------|------|
| û | | |
| Krd. | Meyanduaw | sawz |
| FNû | Miyanduab | sabz |

| | | |
|------|----------|---------|
| dîsa | | |
| Krd. | Çêw (ço) | wrişom |
| FNû | Cûb | abrîşam |

| | |
|------|-----|
| Krd. | Sêw |
| FNû | Sîb |

Paşgotin: Di nivîsê de 35 mînakên ku em karin pê kurdî, farisî û parthî bidin ber hev derketin

holê. Di 20 mînakên de parthî û kurdî dişibin hev, lê di 11 mînakên de jî kurdî û farisî didirûvin hev û din. Di 4 mînakên de jî kurdî hem şeweya farisî û hem jî şeweya parthî diparêze. Ji ber ku kurdî û parthî, her du jî zimanên bakurê rojavayê Îranê ne, tiştên di dengsaziya kurdî û parthî (Pehlewani) de wekî hev, du qatî hev-park iyên kurdî û farisî ne.

Çend mînakên balkêş ên ku ji zaravayê guranî hatin girtin, nîşan didin ku têkiliya di navbera dengsaziya vî zaravayî û parthî de hêjayî lêkolîneke berfirehtir e.

Bibliografiya bijartî

- Blau, Joyce, Dictionnaire Kurde. Brussel, 1995.
- Henning, Walter B. û F.G. Andreas, Mittleiranische Manichaica aus Chinesisch-Turkestan. 3 Vols. Berlin, 1932-34
- Horn Paul, Grundriss der Neupersischen Etymologie, Strassburg, 1893.
- Mc Carus, Ernest N., A Kurdish Grammar. New York, 1958.
- Kurdish-English Dictionary (Sorani) Dialect of Sulaymania, larq. Ann Arbor: University of Michigan Press, 1967.
- McKenzie, D.N., Kurdish Dialect Studies, Vol. 1. London, 1961.
- "The Origins of Kurdish," Transactions of the Philological society (1961)
- Meillet, M., Introduction a l'Etude Comparative des Langues Indo-Euopean. Mobile, 1966.
- Nyberg, H.S., Hilfsbuch des Pehlevi, vols 1-2. Uppsala, 1928-31.
- Reicheht, Hans, Avesta Reader. Strassburg, 1911.
- Rizgar, Baran, Kurdish-English Dictionary. London, 1993.
- Tedesco, Paul, "Dialectologie der westiranischen Turfantexte," Le monde orientale, xv (Uppsala, 1921).
- Wahby, Taufiq, û C.J. Edmonds, A Kurdish-English Dictionary. Oxford, 1966.
- Waqayi'-nigar, 'Alî-Abbar, Badayi' al-lugha an Farhang-i Kurdî-Farsî. Teheran, 1990.

K Li Ser Alfaba Kurdî

RAIF YAMAN

Heta niha li ser alfaba kurdî ya bi tîpên latîni gelek guftûgo hatin kirin. Min jî di nivîsên xwe yê li ser vê mijarê da gelek caran rexne li vê alfabe girtiye û pêşniyar dane. Di van pêşniyaran da xala hempar li ser bikaranîna 26 tîpên standard ên alfaba latîni ye. Dema ku ez li dû xwe vedigerim û dinihêrim, dibînim ku kêmasiyek min a mezin heye. Min ji pevdengên di qada navnetewî da baş tîn zanîn û li gor dengzanîna kurdî jî dema ku bîn bikaranîna nabin asteng zêdetir, li gor nîsbeta bikaranîna dengên kurdî pevdeng hilbijartine û pêşniyar kirine. Di vê nivîsê da, ez naxwazim wekî nivîsên xwe yê berê, dîtî, raman û pêşniyarên lêger, zimanzan û rewşenbîrên kurdî û biyanî bînim zimên li gor dereca zanîna xwe kêmasî û tîkûsiyên wan binivîsim.

Bi çar awayî em kanin alfaba kurdî bi hêsani di nav gelê xwe da bi cih bikin. 1- Bikaranîna alfabeke netewî ya kurdan. Alfaba Mishafa Reş û Kitêbê Cilwê an jî Alfaba Masî Soratî ji van du mînak in. 2- Bikaranîna alfabeke netewî ya netewek din. Em kanin alfabeke weha adapteyî kurdî bikin. Alfaba erebî û krîlî ji van du mînak in. 3- Em kanin alfaba latîniya kurdî bi temamî nêzîkî tirkî bikin. 4- Em kanin alfaba kurdî ya latîni bi temamî jî, ya tirkî dîr bixin. Ji ber sebebên cûr bi cûr, ez awayê çaran jî bo kurdî ji gelek aliyî ve çêtir dibînim. Lê, divê em di pêşniyarên xwe da zaf îsrar nekin. Bi gotinek din gerek em tim nebêjin hessinê min. Heta ku pêşniyar bi awakî giştî ji alî saziyên me yê akademîk ve neyên pejiwandin, divê bi tuawayî em di pratîkê da bi kar neyînin.

Ji bo ku xwendin û nivîsandina kurdî di nav gel da zû bi cih bibe, neguherbariya pevdengan zaf girîng e. Yanê dengên ku bi pevdengan tîn nivîsandin, li ku derê dibin bila bin, dema ku bi pevdengên xwe yê standard werin nivîsandin, dê hînbûna xwendin û nivîsandina kurdî hêsantir bibe.

Ji bo ku peyvên kurdî di nivîsên bi zimanên cûr bi cûr ên bi alfaba latîni tîn nivîsandin da jî rast bîn nivîsandin û ji aliyê mirovên ku di zimanên wan da, an jî di zimanên ku bilêvkirina dengên wan baş zanin da, dengên kurdî yê ku hene rast werin bilêvkirin, bikaranîna alfabe-yek ji 26 tîpên standard û pevdengên ku di qada navnetewî da tîn naskirin girîng e.

Ji aliyê teknîkî û nivîsandina pratîk ve jî, alfabeke weha nabe asteng. Bi bernamêke hêsan mirov kane van pevdengan jî, mîna tîpên bi serê xwe bi tûşek klavyê binivîse.

Hinek tîp hene di piraniya zimanên ku bi eynî alfabe tîn nivîsandin da mîna hev tîn bi bilêvkirin. Tîpa X di hemî zimanên ku bi tîpên alfaba latîni tîn nivîsandin da, dema li serê peyvê be mîna S ya bi stûr, dema ku di nav peyvê da be KS an jî QS tîn xwendin. Tenê di alfaba grekî û alfaba transkripsiyonê ya navnetewî da dengê ku em îro di kurdî da pê didin dayîn derdixe. Dinya alfaba latîni bi kar tîne, vî dengî bi giranî, bi pevdenga KH nas dike. Rewşa tîpa C jî weha ye. Dengê ku em di kurdî da bi vê tîpê didin dayîn jî, tenê di tirkî da heye. Gerek em tîpa X mîna gelên din ên ku alfaba latîni bi kar tînin, di şûna KS û QS yê da bi kar bînin. Ji xwe ev deng jî di kurdî da ewqas zêde nînin. Ji ber vê yekê jî, dê ev tîp zêdetir ji bo peyvên ji zimanên biyanî were bikaranîna. Divê em C yê jî, ji bo dengê kurdî yê ku di navber K û G yê da ye, bi kar bînin.

Di kurdî da hemî R yê serê peyvê bi stûr in. Tenê R yê di nav peyvê û dawî ya peyvê da yek caran bi stûr, yek caran bê stûr in. Ji bo L ya bi stûr jî ev rastiyek e. Dema ku em R û L yê bi stûr ên di nav peyvên û dawî ya peyvên da bi du RR û du LL yan binivîsin, gelemşa jî, dê ji holê rabe.

Alfaba ku ez bi vê nivîsê pêşniyar dikim ji 26 tîp û 13 pevdengan pêk tî. Du tîpên ku me li jor qala wan kir, ne tî da, tîpên din mîna niha tîn xwendin û nivîsandin. Ji ber vê yekê, ez pêwîst nabînim tîpên alfabe carek din binivîsim.

PEVDENG

- AE Mîna e a erebî tîn xwendin.
 CH Mîna CH ya îngilîzî tîn xwendin.
 DJ Mîna C ya tirkî, DJ ya fransîzî tîn xwendin.
 GH Mîna x ya axayê gund tîn xwendin.
 IE Mîna î ya kurdî ya niha tîn xwendin.
 KH Mîna X ya kurdî ya niha tîn xwendin.
 KHW Mîna XW ya kurdî ya niha tîn xwendin.
 OU Mîna U ya tirkî OU ya fransîzî û îngilîzî tîn xwendin.
 PB Dengêkî di navbera B û P yê da dide.
 SH Mîna ş ya tirkî, SH ya îngilîzî tîn xwendin.
 TH Dengêkî di navbera T û D yê da dide.
 TS Dengêkî di navbera C û Ç ya tirkî da dide.
 UE Mîna ê ya kurdî ya niha tîn xwendin.
 XH Mîna h ya heram tîn xwendin.

MÎNAK

Belekiyên berfê li quntara çiyê spî dikirin. Çemê Mûradê, lemî-lem bû, di geliyê xwe da diherikî. Bayê biharê dihat û piçekî ricif dikir nava mirovan. Gundî, bi qasî du saetan bû, li derê mizgeftê li ser piya bûn. Şewqe egal û telikên xwe kiribûn destê xwe û bê deng li qumandarê qereqola nehiyê guhdarî dikirin. Gundî tev cixarekêş in. Ji wan hinek, carna cixarê bi cixarê vêdixin.

.....
 - Tu çi dibêjî Babo? Ma heke Heso birayê te ye, ew apê min e, Lê belê, Hesoyê apê min neheq bû.


(Tevfik Jêhat, Rewşen, hejmar 22-23, rûpel: 15)

Bi alfaba ku di vê nivîsê da tîn pêşniyarkirin:

Beleciyên berfue li qunthara tsiyue spie dicirin. Tsemue Mouradue, lemiele bou, di geliyue khwe da dihericie. Bayue biharue dihat ou pbitsecie ridjif dicir nava mirovan. Gundie bi qasie du saetan bou, li derue mizgeftue li ser pbia boun. Shewqê, aegal ou telicuen khwe ciriboun destue khwe ou bue deng li qumandarue qereqola nehiyue guhdarie dicirin. Gundie tev djigharekuesh in. Ji wan hinc djigharue bi djigharue vuedikihin.

.....
 - Thu chi dibuejie Babo? Ma hece Xhaso birayue the ye, ew abpue min e. Lue belue, Xhasoyê apbue min neheq bou.

(Tevfiec Juehath, Rewshen, hejmar: 22-23, roupel:15)



Rojname
Özgür Ülke hat
bombekirin

ROBİN REWŞEN

DI HIQÛQA KOMARA TIRKIYÊ DE DIJ KURDÎTÎ

Di destpêka sedsala 15 an de împaratoriya Osmanî cesaret nedikir ku bi ser Kurdan de here. Wê demê Kurd bi sistema mîrîtî û nîvserbixwe dijiyan. Împaratoriya Osmanî, di cihê şer de bi riya siyasî û peymanê Kurd kişandin aliyê xwe. Vê rewşa han demeke dirêj berdewam kir. Padişahên Osmanî di ferman û belgeyên xwe de, xwe padişahê Kurdistanê jî didan nasîn û bi vê yekê jî şanaz dibûn. Ango Kurd û Kurdistan ne-dihat înkâr kirin. Kurd wek hêzeke mûtefik dihat qebûl kirin. Mîrên Kurd xwediyê hêzên leşkerî bûn û di demên şer de li kêleka artêşa Osmanî diketin şer.

Piştî şoreşa Fransayê bîr û hizrên neteweyî li Ewrûpayê belav bûn. Neteweyên Balkanî li hemberî împaratoriya Osmanî ya kevnepêrest serî hildan, nîrê bindestiyê şikandin û bûn xwediyên welatên xwe.

Împaratoriya Osmanî ketibû tengasiyeke mezin, welatên ku dagir kiribû yek bi yek ji dest diçûn. Edî wek berê talan û xenîmet tune bû. Nemaze sadsala 18-an gelek girîng bû. Ji aliyekî ve neteweyên Balkanî yek bi yek serî hildidan û artêşa Osamanî ji welatê xwe diqewirand, ji milê din ve li Misrê Mehmed Alî Paşa bûbû hêzeke mezin û li hemberî Împaratoriya Osmanî serî hildabû. Hêzên Mehmed Alî Paşa ji Sûriyeyê û Edeneyê dest pê kiribûn û hew mabû ku Stanbolê ji werbigirin. Ji bakûr ve jî Rusyayê rihetî nedida Împaratoriya Osmanî. Dîsa, ji destpêka wê sedsalê û pê ve serhildanên Kurdan ên neteweyî dest pê kiribûn.

Vê rewşa siyasi û leşkerî tirs û xofeke mezin xistibû dilê birêvebirên împaratoriye jî, berê xwe dida Kurdistanê û hîn bêtir leşker û bac dixwest. Ev jî dibû sebaba şer. Mîrîtiyên Kurd û împaratoriya Osmanî êdî du hêzên dijberî hev bûn.

Peywendî û dan û standinên mîrîtiyên Kurd û Împaratoriya Osmanî reng guhartibûn. Serhildanên Kurdan yek li pey yekê bû. Lê, ji ber faktorên derve û hundir encam nedihat girtin. Di têkçûna serhildanên Kurdan de dewlet û împaratoriye biyanî, nemaze Prûsyayê roleke mezin list. Lê, li vir tişteki balkêş hebû ku piştî têkçûna serhildanan împaratoriya Osmanî serokên serhildanan ji welat bi dûr dixist (surgun dikir). Ango mîna Komara Tirkiyeyê serokên serhildanan bi dar de nedikir, gel qê nedikir û bajar û gund wêran nedikir. Bo nimûne; Mîr Bedirxan surgunî girava Gîrîtê û şêx Ubeydullah surgunê Mekeyê kirin. Ber bi dawiya sedsala 18 an ve gelên Balkanî ji Împaratoriya Osmanî veqetiyabûn. Tixûbên împaratoriye teng û biçûk bûbûn û gelek ax wenda kiribû. Birêvebirên împaratoriye pir ditirsyan ku dê Kurd û Ereb ji bo azadiyê di xebateke çalak de bin.

Desthilatdarên împaratoriye li çareyan digeriyan da ku tişteki peyda bikin û van gelên ku doza azadiyê dikirin bi hêsaniyê bi rê ve bibin. Osmanîti peyda kirin, çare nekir. Islamîti heta derekî bi kar anîn lê encam neda. Di dawiyê de li ser tûranîzmî yê biryar dan. Nemaze di dema Îttîhat û Terakkî de nijadperestî pir pêşve çû. Ermenî hatin qir kirin. Dest bi qirkirina Kurdan jî kirin lê, neçûn serî. Îttîhat û Terakkî û Împaratoriya Osmanî têkçûn. M. Kemal siyaseta nijadperest a Îttîhat û Terakkî berdewam kir. Herçendî M. Kemal di destpêka avakirina Komarê de bi Kurdan re peywendî danî û alîkarî ji wan xwest û gelek soz jî dabe, piştî ku bi ser ket ev hemû mîna wî nekiribin ji bir kir. Li hemberî Kurdan siyaseta qirkirinê bi rê ve bir. Ew siyaseta ku Îttîhat û Terakkî dabû ber xwe û nivçe mabû, angost qirkirin, pişaftin û Tirkkirina Kur-

dan bi awayekî tundtir ji aliyê M. Kemal ve hate bi rê ve birin.

Ji bo vê hemû rê û metod bi kar anî. Li gel hêz û şideta leşkerî, sirgûn (Qanûna Îskanê), sistema perwerdekirin û hiqûqê û hwd. ji bo qirkirin û pişaftina Kurdan bi kar anîn.

Valahî û kêmasiyên ku ji ber artêşê di-man ango bi artêşê ev nedibûn, Komara Tirkiyeyê bi hiqûqê dadigirt, ev kêmasî tamam dikir.

Em dikarin bibêjin ku Komara Tirkiyeyê sistema hiqûqê jî mîna hêza leşkerî bi hişkî û dijwarî li hemberî Kurdan bi kar anî. Ango artêş û hiqûqa Komara Tirkiyeyê hev û din tamam dikir. Her du mînakên li jêr vê rewşa Komara Tirkiyeyê hîn baştir radixin ber çavên me.

1- Qanûna Îskanê ya Mecbûrî. (Hejmara qanûnê 2510,52 xal in. Di 14 ê pûşpera 1934-an de hatiye qebûl kirin. Binihêrin: Î. Beşikçi; Kürtlerin Mecburi İskanı, Yurt-Kitap Yayın, Ankara 1991)

2- Qanûna Tunceliyê. (Binihêrin: Î. Beşikçi; Tunceli Kanunu (1935) Ve Der-sim Jenosidi. Belge Yayınları İstanbul 1990)

Ev herdu mînak pêşanî me didin ku Komara Tirkiyeyê çawan sistema hiqûqê li hemberî Kurdan bi kar tîne. Herçendî ev her du qanûn ji navê rabûne jî lê, ew fonksiyona ku van qanûnan didit îro jî, bi nav û hejmarên guhertî berdewam e.

Divê em vê bibêjin ku di sistema hiqûqa Komara Tirkiyeyê de hebûna Kurdan nehatiye qebûl kirin. Di sistema Komara Tirkiyeyê de neteweyek bi navê Kurd, welatek bi navê Kurdistanê tune ne. Ango Kurdistan, Tirkiye û Kurd jî, Tirk tene hesab kirin. Lê, dema ku mirov li hiqûqa Komara Tirkiyeyê mêze dike, li çarçove, naverok û armanca wê dinihêre û dikole, dibîne ku komara Tirkiyeyê bêyî ku navê Kurdan û Kurdistanê bi lêv bike bi awayekî veşartî hebûna Kurdan û Kurdistanê qebûl dike. Yanî di resmîyetê de înkâr dike û di pratîkê de ji bo qedandina Kurdan çî ji dest wê tê texsîr nake. Di raporên nehênî de bi dorfirehî qala Kurdan û pişaftina (asîmîlekirina) wan dikin.

Piştî vê destpêkê em niha dikarin ji mevzûata ango ji hiqûqa nivîskî ya Komara Tirkiyeyê çend mînakên li pey hev rêz bikin.

QANÛNA BINGEHÎN KOMARA TIRKIYÊYA 1982 an

III. Temamiyeta dewletê, zimanê fermî, sirûda milî û paytextî

Xala 3-an: Dewleta Tirkiyeyê bi welat û mîletê xwe ve temamiyetek e ku nayê parve kirin... *(Türkiye Devleti, ülkesi ve milletiyle bölünmez bir bütündür.)*

II. Sînor kirina maf û azadiyên bingehîn

Xala 13-an: Maf û azadiyên bingehîn, temamiyeta dewletê bi welat û mîletê xwe ve ya ku nayê parve kirin... dikare bi qanûnê were sînor kirin.

(Temel hak ve hürriyetler, Devletin ülkesi ve milletiyle bölünmez bütünlüğünün... kanunla sınırlanabilir.)

III. Maf û azadiyên bingehîn nayên istîsmar kirin

Xala 14-an: Maf û azadiyên ku di Qanûna Bingehîn de ne ji bo xirabkirina temamiyeta dewletê bi welat-mîletê xwe ve ya ku nayê par ve kirin... nayên bi kar anîn...

(Anayasada yer alan hak ve hürriyetlerden hiçbirisi, Devletin ülkesi ve milletiyle bölünmez bütünlüğünü bozmak... kullanılamazlar.)

A. Azadiya çapemeniyê
Xala 28-an: Çapemenî azad e. Nayê sansur kirin... Bi zimanê ku qanûnê qedexe kiriye weşan nabe...

(Basın, hürdür, sansür edilemez. Kanunla yasaklanmış olan herhangi bir dilde yayım yapılamaz...)

II. Maf û erka perwerde û hîndekariyê
Xala 42-an: ... Ji bilî zimanê Tirkî tu zimanekî din di dam û dezgehên perwerde û hîndekariyê de ji bo hemwelatiyên Tirk wek zimanê zikmakî nayê xwendin û fêr kirin...

(... Türkçeden başka hiçbir dil, eğitim ve öğretim kurumlarında Türk vatandaşlarına ana dilleri olarak okutulamaz ve öğretilmez...)

A. Partî damezrahdin, endambûn û jî endametiye derketin

Xala 68-an: ... Hebûn û serxwebûna dewletê, temamiyeta welat û mîletê ya ku nayê parve kirin... bi namûs û şerefa xwe sond dixwim.

(... Devletin varlığını ve bağımsızlığını, vatanın ve milletin bölünmez bütünlüğünü, ... namusum ve şerefim üzerine andiçerim.)

Dewleta Tirkiyeyê, bi welat û mîletê xwe temamiyetek e ku nayê par ve kirin (dabeş kirin, perçe kirin)

(Türkiye Devleti, ülkesi ve milletiyle bölünmez bir bütündür.)

Temamiyeta welat û mîletê ya ku nayê parve kirin (dabeş kirin, perçe kirin)

(Vatanın ve milletin bölünmez bütünlüğü)

Ev formulasiyona han gelek girîng e û di gelek xalên (madeyên) Qanûna Bingehîn a Komara Tirkiyeyê de dubare dibê. Me pêwîst nedît ku hemûyan li vir binivîsin. Dîsan ev formulasiyon bi deh hezaran qanûn û destûr (tuzuk) û yên din de tê dubare kirin. Di vê formulasiyonê de dij kurdîti, tirs û fobiya kurd veşartiyê. Ango Komara Tirkiyeyê û birêvebirên wê bi vê formulasiyonê dibêjin ku Kurd hene, Kurdistan heye û dê roj hebe ku Kurd rabin doza mafên xwe û welatê

xwe bikin. Ev formulasiyona rê li pêşiya Kurdan girtiye, bend û dîwarekî mezin e. Ev formulasiyon tirs û xofa dewletê nîşan dide.

Vê formulasiyonê em di Qanûnên Bingehîn ên dewletên demokratîk de nabînin. Yanê kîjan dewlet dikare bifikire ku dê beşek ji miletê wê rabe beşek, perçeyek ji welatê wê veqetîne û welat û milet ku beş û çend beş bibin. Ev sendroma parvebûnê wek me li jor gotî, ji dîroka wan tê. Ji ber vê tirsê bû ku Ermenî qedandin, Rûm qedandin û ji bo qedandina Kurdan jî çî ji dest hat, kirin û dikin. Sîstema hiqûqê ji bo piştaftin û qirkirina neteweyekê bi kar anîn, îstismarkirina hiqûqê ye.

Çapemenî azad e. Nayê sansur kirin. Bi zimanê ku qanûnê qedexe kiriye weşan nabe. Xala 28-an.

Ji bilî zimanê tirkî tu zimanekî din di dam û dezgehên perwerde û hîndekariyê de ji bo hemwelatîyên tirk wek zimanê zikmakî nayê xwendin û fêr kirin. Xala 42-an.

Em pêşî li ser zimanê ku qanûnê qedexe, bend kiriye rawestin. Herçiqas bêyî ku nav hatibe dayîn, zimanê ku qanûnê qedexe kiriye, zimanê kurdî ye. Gelo zimanek çawan bi qanûnê tê qedexe kirin? Ev hiqûqî ye an ne? Mîna ku tê zanîn ji destpêka Komarê û heta niha zimanê kurdî hatiye qedexe kirin. Di vî warê de gelek qanûn derketine û rabûne. Hinde caran Kurdan kovar û rojname -ku piraniya wan bi tirkî bûn- derxistibin jî, lê temenê weşanan kin û domdar nebû. Çewsandinên li ser zimanê kurdî çî bi qanûnan û çî ji de facto (fîlî) her berde-wam bûye.

Li welatên ku hinek bêhna demokrasiyê ji wan tê zimanekî bi qanûnê nayê qedexe kirin. Ji lewre ziman tiştê tabîî (xwezayî) ye. Bi qanûnên çêkirî, pêşî li qanûnên xwezayî nayê girtin. Ev sosret û rûreşiyên han bi tenê di dewletên faşîst û dîktatoriye de dibin. Ku tu tîkiliya wan bi hiqûq û mafê mirovan û mirovahiyê re tune ye. Li vir cudahiya "dewleta hiqûqê" û "dewleta qanûnê" tê pêşberî me. Hinek tişt hene ku dikarin qanûnî bin. Lê, nayê wê wateyê ku hertistê qanûnî, hiqûqî ye. Ji bo baş were têgihîştin em mînakê ji Almaniyaya dema Hitler bidin. Bingê Hitler qanûnek derxistibû û zewaca Alman û Cihûyan qedexe kiribû. Dema mirov ji awira formel (şiklî) ve li pirsê binihêre, organa ku qanûnê derdixe, qanûnekê derbixe û pêvajoya qanûnbûnê temam bibe edî ew tiştê ku qanûn dixwaze, qanûnî ye. Lê, heke em ji awira hiqûqê li pirsê hûr bibin ew mînak me li jor gotî, ji derî mirovahiyê ye û ne hiqûqî ye.

Komara Tirkiyeyê jî bi hezaran qanûn derxistiye, çêkiriye û nemaze yên li dij

Kurdan in, gelo çiqas hiqûqî ne? Ji bo dewletê ya girîng hiqûq e an siyaseta wê ya ku qirkirina Kurdan ji xwe re kiriye armanc? Gelo dewleta Tirk, "dewleta hiqûqê" an "dewleta qanûnê" ye? Bersiva wan pirsan em ji xwendevanên xwe yên heja re dihêlin.

Ji naveroka van herdu xalan baş tê fêmkirin ku dewleta Komara Tirkiyeyê, zimanê kurdî, weşana kurdî, hînbûn û hînkirina zimanê kurdî qedexe kiriye. Dewleta Tirk ji tecrûbe û kiryarên xwe baş têgihîştîye ku bi leşkerî qedandina Kurdan ne gengaz e. Li ber vê yekê jî dest avêtiye hemû waran û hemû rê û dirb li Kurdan girtiye. Bê guman jî bo neteweyekê ziman, çand gelek girîng e. Eger neteweyek ji ziman û çanda xwe bêpar bimîne, edî endamên wê neteweyê herçendî biyolojîk ji wî neteweyê hesab bibin jî lê, şexsiyet (kesîtî) birîndar û qels dibe. Ji rastî û orijînalîta xwe bi dûr dikeve. Heke îro tevgera rizgariya neteweyî pir li ser pîrsa şexsiyetê disekine, ev jî ber ku dewleta Tirk birîndar kirîye ye.

Li ser pîrsa ziman qedexekirinê, em behsa qanûna ku bi hejmara 2932-an tê nasîn, bikin. Ev qanûna han piştî cûntaya leşkerî ya 12-ê îlona 1980-î dema pênc general li ser hukûm bûn, hate çêkirin. (Tarîxa qebûlkirina wê qanûnê 19-ê kewçêra 1983-an e)

Di dema serokkomar T. Özal de bi Qanûna "bi terore mucadele" (hejmara qanûnê 3713, mêjûya pejirandinê 12.4.1991) xala 23/e hate rakirin. Armanca rakirina wê qanûnê jî, ji bo ku li hemberî Ewropayê xwe wek welatek demokrat nîşan bîdin. Ev qanûna jî aliye generalan we hatibû çêkirin û bi awayekî pir dijwar zimanê kurdî qedexe kiribû. Ji xwe di raya giştî de wek qanûna ku zimanê kurdî qedexe kiriye, dihate nasîn.

Xala 3-an ya wê qanûnê welê bû: "Zimanê zikmakî yê hemwelatîyên Tirk tirkî ye"

(Türk vatandaşlarının ana dili Türkçedir.)

Dewletê bi vê formulasiyonê zimanê zikmakî yê Kurdan, zimanê kurdî dikir tirkî. Wê demê gelek kesan ji bo kasetên kurdî di mala wan de hatibûn dîtin, bi mehan û salan di zindanê de man. Cûntaya leşkerî pir bi xwe bawer bû û hevî dikir ku dê zimanê kurdî bide ji bîr kirin û pîrsa kurdî bi vî awayî jî holê rabike, biqedîne. (Ji bo agahdariyên dorfireh binihêrin: E. Xemgin, Kürdistan'da İnsan Hakları, Agri Verlag 1989)

Bi kurtebirî, Qanûna Bingehîn a Komara Tirkiyeyê ji Kurdan re dibêje: Hûn nikarin bi zimanê xwe bipeyivin, bi zimanê xwe weşanê bikin, zimanê xwe hînbibin û hînbikin, partiyên siyasî damezrînin, doza mafên neteweyî bikin. Heke

hûn bikin ev dibe sedema perçebûn û parvebûna dewlet, welat û miletê me. Ev jî tawanbariyeke (sûcdariyeke) pir û pir mezin e. Yanê Komara Tirkiyeyê du rîyan dide pêşiya Kurdan. Yek jê mirin e û ya din jî aşmîlebûn, tirkbûn û xwe înkarkirin e.

Li hemberî wê, helwesta Kurdan çî bûye û çî kirine? Ji bo ku mijar zêde belav nebe, em dê bi tenê li ser çend diyardeyên (fenomenên) piştî salên 1990-î rawestin. Qanûna Bingehîn a Komara Tirkiyeyê herçendî hemû rê û derfet li Kurdan girtibe jî, Kurdan bi heza xwe de facto (fîlî) hinek mewzî bi dest xistine. Bêguman bi berdêleke giran. Kurdan di sala 1990-î de dest bi weşandina rojnameyên hefteyî kirin. Dîsan di vê salê de cara yekemîn Kurdan partiyeke siyasî ya legal ava kirin. Dewlet bi tundi û dijwarî bi ser wan de hat. Lê, Kurdan paş ve gav neavêtin û bêtir berê xwe dan pêş. Di sala 1992-an de rojnameyêke rojane bi tirkî û rojnameyêke hefteyî bi kurdî li Kürdistanê, Tirkiye û Ewropayê belav kirin. Dewletê gelek rojnamevan kuştin, rojname girtin û navenda wan bombe kir, cezayên zindanê û diravî da. Partiyên siyasî hatin girtin, endam û birêvebirên wan bombe kir, cezayên zindanê û diravî da. Partiyên siyasî hatin girtin, endam û birêvebirên wan hatin îşkence kirin, hefs kirin û kuştin. Parlamenterên kurd bi hefsê hatin ceza kirin û yek ji wan hat şehîd kirin.

Van kiryarên dewletê, wek ku wê dixwest encam nedan, Kurdan gavên mezintir avêtin û dest bi weşana televîzyonê kirin, partiya siyasî ya legal a çaran ava kirin. Herweha rojname û kovar bi kurdî û tirkî berde-wam in. Vê xebata Kurdan a neteweyî sîstema hiqûq a Komara Tirkiyeyê bê fonksiyon kiriye.

Li gorî hiyerarşiya norman piştî Qanûna Bingehîn peymanên navneteweyî (hundir) temam kiribin, tîm, Komara Tirkiyeyê jî piraniya wan peymanan îmze kiriye û parlamentoya wê (T.B.M.M) tesdîq kiriye. Bi vî awayî jî, ev peyman bûne hiqûqa navxweyî û jî mevzûatê, hiqûqa nivîskî tîm hesab kirin. Di van peymanan de mafên jîyanê, xebatê, ziman, îşkence nedîtin, birêxistinbûn, azadiya raman û nivîsînê, zarokan û gelekên din hatine garantî kirin. Mafên mirovan, mafên millî, olî û grûbî tîm parastin. Zilm, îşkence û jenosîd (genocide) tîm xedexe kirin.

Dewletên îmze avêtine bin wan peymanan heke rîyatê wan nekin bi riya hinek mekanîzmeyên navneteweyî tîm rexne kirin, îkaz kirin û heta muhekeme kirin. Dema em li rewşa Komara Tirkiyeyê dinihêrin, hîç nirx û girîngî van peymanan û hertim wek xwe kiriye û pîrî caran jî, jê re kar maye. Dîsan beriya ku

van peymanan înze bike, ew xalên ku Kurd nikaribin jê istîfade bikin. Mixabin carinan jî bi ser dikeve. Bo nimûne: Komara Tirkîyeyê di sala 1987-an de serlêdana ferdî ji bo Komîsyona mafê mirovan a Ewropayê qebûl kir. Bi mercekî ku Kurdistan li derveyî vê çarçoveyê bimîne. Bi kurtî naveroka vê serlêdanê ev e: Ji bo problemekê li Tirkîyeyê hemû riyên hiqûqî biqedin û encam neyê girtin mafê kesî/kesan heye ku serî li Komîsyona mafê mirovan bixin. Organên Komîsyonê serlêdanê kontrol dike heke pêwîstiya muhakemekirinê bibin, muhekeme dest pê dike. Lê, ji bo ku Ewropa Tirkîyeyê baş nasdike, Komîsyonê jî bo Kurdan bêyî ku riyên hiqûqî biqedînin, mafê serlêdanê qebûl kir. Di rêbendana 1989-an de leşkerên artêşa Tirk li Cinîbira (Yeşilyurt) Cizîrê gû bi gundiyan da xwarin. Gundiyan Cinîbirê

(fîl) bi armanca beşek ji axa ku di bin hakîmiyeta dewletê de ye ji birêvebiriya dewletê veqetîne, bi cezayê mirinê tê ceza kirin.

(... Devletın hakimiyeti altında bulunan topraklardan bir kısmını devlet idaresinden ayırmaya matuf bir fiil işleyen kimse ölüm cezası ile cezalandırılır.)

Xalên 168, 171, 312, û 314-an dîsan li dij kar û xebatên Kurdan yê siyasî ne. Nemaze ev xala 125-an gelek girîng e. Heke Kurd doza welatê xwe bikin û ji bo vê bixebitin li gorî dewletê ev sîceke mezin e, û cezayê wê jî mirin e. Şoresger û welatparêzên kurd jî vê xalê tên muhakeme kirin û ceza kirin. Mîna ku tê zanîn Komara Tirkîyeyê vê qanûnê jî qanûna cezayê ya Mûssofinî wergirtibû û gelek xalên wê jî, ji berê girantir kiribû.

Li vir jî dewlet kar û xebata Kurdan a ji bo azadiyê wek terorê bi nav dike û cezayên giran dide.

QANÛNA ÇAPEMENİYÊ

Hejmara qanûnê: 5680; Tarîxa qebûl-kirinê: 15.7.1950

Xala 16/4-an: ... Di rewşa ku bi zimanê ku qanûnê qedexa kiriye, weşan hatibe kirin...

(... Kanunla yasaklanmış herhangi bir dille yayın yapılması halinde...)

QANÛNA DI DERBAR AVAKIRINA ÜSÛLÛN MÛHAKEMEKIRINA DADGEHÛN EWLEKARIYÊ YÛN DEWLETÊ DE

Hejmara qanûnê: 2845; Tarîxa qebûl-kirinê: 16.6.1983

Xala 1-e: Temamiyeta dewletê bi welat û miletê xwe ve ya ku nayê parve kirin...

(Devletin ülkesi ve milletıyla bölünmez bütünlüğü...)

QANÛNA PARTİYÛN SİYASÎ

Hejmara qanûnê: 2820; Tarîxa qebûl-kirinê: 22.4.1983

Partiyên siyasî
Xala 78-an:a) ... Temamiyeta dewleta Tirk bi welat û miletê xwe ve ya ku nayê parve kirin...

(... Türk Devletinin ülkesi ve milletiyle bölünmez bütünlüğüne...)

Xala 81-ê: partiyên siyasî
a) Nikarin bibêjin ku li welatê (axa) Komara Tirkîyeyê kêmahiyên neteweyî, dinî çandî, mezhebî, nijadî û zimanê wan cuda hene.

(Türkiye Cumhuriyeti ülkesi üzerinde millî veya dinî kültür veya mezheb veya ırk veya dil farklılığını dayanan azınlıklar bulunduğunu ileri süremezler.)

b) Ji derî ziman û çanda tirkî nikarin ziman û çandeke din biparêzin, pêşve bibin û belav bikin...

(Türk dilinden veya kültüründen başka dil ve kültürleri korumak, geliştirmek veya yaymak...)

c) Li nivîsandin û belavkirina bername û destûrên xwe de, di kongre, civîn, xwepêşandan û propagandayên xwe de jî derî zimanê tirkî zimanekî din nikarin bi kar bînin... Bername û destûrên xwe jî bilî zimanê ku bi qanûnê hatiye qedexa kirin dikarin bi zimanekî biyanî wergerînin.

(Tüzük ve programlarının yazımı ve yayınlanmasında, kongrelerinde, açık veya kapalı salon toplantılarında, mitinglerinde, propagandalarında Türkçe'den başka dil kullanamazlar... Ancak tüzük ve programlarını kanunla yasaklanmış diller dışındaki yabancı bir dille çevrilmesi mümkündür.)

Ev xal qet şîove naxwazin.

Rojnaxekê bi zimanê tirkî

ԱԿՕՍ

Քրդերէն Էջերուն մէջ պիտի գտնուի

Հայաստանի կորդերական Փոխ Աստիարակ Արա Մանուկեան և Ազգ. Փորձի պատուիրակները Խաղաղարկի մէջ 1 Խաղաղարկեան գծակարներ, ապա թ. ոչ 2 Քրդի Գործարկի Խումբը Թ. Քրդ. կր պատրաստող 3 Կարէր Աստիարակ Էջերուն մէջ Դրաստիկ 4 Հայ պարիթի մը Դարար Աստիարակեան 5 Փորքանմանիտեան խմբակներ 6 Հայաստանի մէջ սերտակամարտորեսան մրցանքը 7 Պարտի մը դիպի Գաղտնի Պարտիարակներու թող Մանուկեան 8

Իրենց սանջ տարիները Խաղաղարկեանցին մէջ «Կարպիկորիւն չեմ կրնար ընել» ըստ Պարտիկեան «Եւ պիտի մնամ Հայաստանի երկրի»

Komara Tirkîyeyê gilî kirin. Dadgeha Komîsyonê piştî muhakemekirinê Komara Tirkîyeyê tawanbar dît û biryar da ku Komara Tirkîyeyê tazminatê bide gundiyan.

Niha jî li qanûnên Komara Tirkîyeyê binihêrin, gelo rewş çawan e, û bi çend mînanan raxin ber çavan. Li gorî Qanûna Bingehîn-divê qanûn dernekevin derveyî çarçoveya ku Qanûna Bingehîn diyar kiriye. Eger derbikeve kes û organên xwedî maf dikarin serî li Dadgeha Qanûn a Bingehîn bixin û qanûnê bidin îp-tal kirin. Rewşa ku di Qanûna Bingehîn de ye bi kurtî be jî hat dîtin. Rewşa qanûnan jî nê ji ya wê kêmtir e.

QANÛNA CEZAYA TIRK

Hejmara qanûnê: 765; Tarîxa qebûl-kirinê: 1.3.1926
Sûcên li hemberî şexsiyeta dewletê
Xala 125-an: ... Ew kesê ku çalakîyek

QANÛNA BI TERORÊ RÊ TÊKOŞIN

Hejmara qanûnê: 3713; Tarîxa qebûl-kirinê: 12.4.1991

Xala 1-ê: ...Xirakirina temamiyeta dewletê bi welat û miletê xwe ve ya ku nayê perçe kirin...

(... Devletın ülkesi ve milletiyle bölünmez bütünlüğünü bozmak.)

Li dû neperçebûyîna dewletê propaganda

Xala 8-an: ... Bi armanca xirakirina dewleta Komar a Tirkîyeyê bi welat û miletê xwe ve ya ku nayê perçe kirin, bi nivîskî û devkî propaganda, civîn û xwepêşandan nayên kirin...

(...Türkiye Cumhuriyeti Devletinin ülkesi ve milletiyle bölünmez bütünlüğünü bozmayı hedef alan yazılı ve sözlü propaganda ile toplantı, gösteri ve yürüyüş yapılamaz...)

DI HUNERÊ DE TEŞE Û NAVEROK


SÜLEYMAN DANIŞMAN

Ji tirkî: M. Ali

Mijar: Wisa bawer dikim ku heta li ser hunerê nese kinim, nikanim derbas bim; lewra di hunerê de, naverok û teşe heye.

Her komên t êkildarî hunerê, li gor xwe (= serwextiyên xwe) ihunerê dinasin û şirove dikin. Ev yek jî dibe sebeb ku, em her demê nasîn û şirovekê tenê na, gelek nasîn û şirovên cihêreng dibînin. Yek tenê ne mimkûn e. Raweya ku em pêşkêş bikin, wê li gor pîvanên zanistî ên Estetîkê be. Li gor vê huner: iJi nû ve bi alîkariya sembolan afirandina (çêkirin) rastiye ye. Li gor vê rawekirinê sembol, "Di hunerê de xwerûtiya xwiyaniya rastiye ye." (A.Ziss-Estefîk, S.71-72). Lê hema, sembol di zimanê røjane û yê felsefê de wek hev nînin, divê ev baş bê zanîn ku ferq bê raçavkirin.

Pirî caran; em xebitandina sembolê li gor teoriya xwiyaniyê (görünüm) kifş dikin. Li gor vê teoriyê zanedariya (bilinc) mirov nîşaneke rastiya dorhêli ye. Lê hema sembolên hunerî, danasîneke pêşniyarên subjektîf, yê dinya heyî xwiyayî dikin. Ev pêşniyar û nihêrîn, bi deh hezaran sal berê, gava ku mirov cara pêşîn dest daye made çêbûye û dest pê kiriye. Gava pêşîn; piştî sekinandina şerê ku bi milyonan salî dikirin, tê



avêtin. Ev jî bi temambûna pêvajoya dema "psîşik" dibe. Ev gav, ji bo mirovbûnê gaveke ji dil û a pêşin e. Mirovan ji ber ku dest û hişên xwe tev xebitandine made guhertine û şelek (teşeyek) danê; xistine teşeyek din. Paşê (dema şikeftan), ji xwezayê famkirin û şirovekirin dikeve teşekê. Bi awakî sinkretîk (awayê xebateke xeyalî) be jî, em dibînin ku di vê demê de, xebatek hunerî kirine. Em îro (niha) dibînin ku, li dîwarên şikeftan gelek resim çêkirine, li ber van resman listine û kilam gotine (muzîk çêkirine).

Ev tev didin nîşanî me ku mirov ji heyn û tiştên dordora xwe gelek tişt û herketên mirovî digire. Yanî, ji jiyane gelek tiştî hîn dibe. Heynê jiyane teqlît (bizar) dike. Her wiha, têkiliyên civakî bi cih dibin, kirin û miratên wan ji nîşan derbasî nîşan dibe ku îro gihîştîye me. Ev yek serfirazî û jêhatîbûna wan e. Mirovbûna mirovan, anegorî qewimîna nihêrînê objektîf ên dinya heytî bûye. Qewimîn çiqas zû bûbe, mirovbûn jî hewqas zû bûye. Lê hingî hatiye zûtir bûye. Mirov kare van tiştên bûyî tevan weke berhemek xebatên sinkretîk binirxîne.

Gava ku ev xebat, di diyalektîka kar û hunerê de, êdî ku dixwiyê, berî ku bigihîjin civakên çînî, em dibînin ku, totemîzm, animîzm û fetîşîzm dîtine û jiyane. Wekî din jî, mîtosên ku wan afirandine, ji dinê serwextbûna nîşanî û hunerî bûn. Bi wan mîtosan ji dinyayê serwext dibûn, teşa serwextbûna wan wisa bû.

Ji wir hingî hatiye, bi vî alî ve her ku hatine û ketine demên li pey hatî, nihêrînê nîşanî û hunerî, xeysetî, olî, felsefî û estetîkî derxistine û bi cih kirine. Marx Grundrisse (S.369) wiha dibêje: Ji ber vê yekê, berî her tiştî; rastiya zanîne hebûnek rast nîne, di hişê mirov de hêj ku zelal nebûye, rasterast (direct) lihevtesîrkirina hevru ya yekitiya "heyinê û kirî", "xweza û civakê", "mîrov û dinê" ye. Hingî çûye subjektîfîya ramanê û xwe ji tesîr û bandora dinê dîrxistina mirov, hema bibêje deh hezar sal piştî gava pêşin pêk hatiye. Ji ber vê yekê, ramana nîşan û hunerî gelekî pêşiya çêbûna ramanê mantiqa subjektîf çêbûye.

Lenin weha dibêje: "Li ser rûyê dinê; zanebûn bi raçaviyên zexm mirov digihîje ramanê teorîk, ji vir jî diçe pratîkê." A. Ziss jî weha sêrî temam dike: "Ev nihêrîn, weke ku bo zanîne zanistî-teorîk diçe, ji bo pejirandina rastiyan hunerî jî diçe." (Estetîk, S. 73).

Li vir weke ku em li ser nîşanê hunerî sekinîn, hinek be jî, ji pîrsa "hunermendê anegorî çî qewlan huneran biafirîne" behs kir. dixwiyê ku mirov nikare bê rastiyan xwe yê civakî hunerê biafirîne. Gotî hunermend anegorî rastiyan civaka ku tê de dijî huneremendiyê bike. Wekî din ne rast e û ne jî dibe. Him ber-

pişiyariya civakî û him jî hunermendî ve yekê wekî hoyekî dibîne. Wekî din jî, orjînalîta xwe jî, tenê bi vî awayî û anegorî demê bi xebatan kare pêk bîne. Dîroka hunerê diyarî me dike ku xebatên hunerî bandorên erênî li pêşveçûna civakan kiriyê û dike. Weke ku li jor jî hat gotin, yekitiya ked û hunerê bingeha dînamîka hebûna mirov e. Aliyekî vê yekitiya diyalektîkê serfkirina kedê be, aliye din jî xebatên hunerî ne û wiha jî bûye. Huner, weke berê îro jî, bingeha heyinê darîngî û giyanî ye, vê qudreta xwe dipaêze. Huner di Dema Navîn de, di xizmeta xebatên olî de bû. Îro jî di bin destên hêzên serdest de ye. Ev rastiye berçav e û pir jî dîlşewat e. Ew, anegorî qirêjîyên xwe-rastiyan xwe- hunerê pêk tînin û wisa jî rayê lê dikin (qontrol dikin). Ji wan hunereke berebaş/pêşverû şoreşger hêvîkirin sefitî ye.

Îro weke ku şaxên kar zêde bûne huner jî pê re geş bûye; şax daye û piralî bûye. Berê gava ku huner dihate gotin; wêne, peyker, mîmarî, edebiyat, şanogerî, helbest û hwd. bûn. Lê îro pir fireh bûye, şaxên nû çêbûne; sînema, fotograf, televîzyon, rojname, kovar û hwd. Bi van huner ketiye her rehên jiyane. Lê çî heyf nivîskar û hunermendên saziyê anegorî kara xwe hunerê çêdikin û berhemên didin. Ji berê zêdetir û zûtir digihîjin mirovan. Her wiha şansê wan zêdetir e. Ew, bandora hunerê bi awayekî pir zexm dixebitînin û bi vî awayî mirov dixin halet. Her wiha hînbûna li dibistanan jî bi xê metodê jî bo armancên wan e. Li hember wan nebaşyan jî alternatîfên ku tên xebitandin jî, çî heyf awayên wisa dixebitînin ku heta niha wisa jî hatiye. Hêj carna jî, ji hunerê gelekî dûr in, bê kêr in. Rastiyan naxwiyînin. Bi tu awayî naşibin hunerê. Belê tiştên wiha têne kirin. Niha, rastir e ku bibêjin: "Xweber çêkirina hunereke zexm, ne li gor xebatên (şores) pêşveçûna civakî ye." Marx; "Ji bo ku huner dîrokê bineqîşînin, divê hûn dîrokê bijîn" dibêje. Ez jî, vê li ser hunerê weha dibînim: "Heger hûn hunerê nejin, dîrokê jî najîn." Ji bo dîrokneqîşandinê, dixwaze li her derê xebatên alternatîf werin kirin. Naveroka hunera ku vê demê geş dibe, bi rengên wan xebatên şoreşger dineqîşin û dertên. Her wiha bi hêjanên mirovî dagirtî û xweş ava dibe.

Teşe û naverok berhemên hunerî dineqîşînin. Li ser vê yekê, bi awayekî gelemperî, danekek (mijarek) berhemên hunerî heye. Ev, bûyereke wisa ye ku, bi awayekî berçav diyarî me dibe û em jî dibînin. Bi awayekî din jî, neqîşandina naverokê di vê çarçovê de ye. Ev neqîşandin ramanê hêwa (tema) û hunerî ne. Hêwa, di berhemê de, guftûgoya ramanê ramyarî, xeysetî (etîkî), hunerî û hwd. ye. Yan jî, li ser van danekan, pîrs û bersivên ku lê hatine danîn. Di berhemek hunerî de danekek û hêwa çawa bi hev

re dineqîşin, yekitiya (hevkerin) herduyan jî naverokê îfade dike. Yekbûna şel (teşe) û naverokê berhema hunerî derdixe. Kêmasiya yekî, -carna- dibe sebaba mirina yê din. Ev ji bo hunerê tişteki dibe (muhtemel) bû. Qelsiya -kêmasiya-yekî, tesîra yê din dixê. Niha, heger ku mînakek bixwaze, em li koma peykerên F. Fievskî "Jî Mirinê jî Zexmtir" binihêrin. Em bawer dikin ku ev berhemên, di derbarê "şel û naverokê" de zelaliyan çê dike. Koma peykerên "Jî Mirinê jî Zexmtir", di îşkencê de rewşa sê mirovan dide nîşan. Pîrsiyariya van mirovan çawa bi îşkencê hatiye kirin dide nîşan. Di neqîşandinê (kompozîsyon) de yek ketiye û xeriqîye (= dibe ku miribe jî). Yê ciwan hêj jî tê îşkencekirin. Mirovê ku zana ye, yê sîsiyan; bi awakî rikdar berxwedana xwe dide nîşan. Koma peykeran, bi polayên zengnegir hatiye çêkirin; ev pêşveçûna hêwa û ramanê nîşanî me dide. Şela figuran bi pola zexmtir dibe, çêtir dibe. Gava ku mirov lê dinihêre, hêwa û biryarên berxwedanî dikevin dilê mirov.

Em bi vê mînaka jorîn, têkiliya hostatiya hunermend û berhema wî dibînin. Bi hostatiya hunermend berhem bi ser ketiye. Ev yek, tenê bi yekbûna diyalektîka aliyên hunerê pêk tînin. Hunermend an jî binêr (temaşevan) ku têkiliya şel û naverokê rind raçav nekiribe, tu gavê baş jê serwext nabe. Tişteki baş jê naqefilîne.

Weke ku bi vê mînakê jî dixwiyê, naverok û şel bê hev nabin. Di berhemek baş de, tev li tişteki wiha digerin. Yekitiya (Yekbûn-hevkerin) şel û naverokê qewlekî hunerê ye. Yanî, bi naverokê şel; bi şelê jî naverok dineqîşe. Weke ku çawa jî polayê zengnegir berxwedan çêbûye, ji berxwedanê jî polayê bê zeng çêbûye.

Di berhemek hunerî de naverok ji gelek nîşanan çêdibe. Nîşan, haletên hêwayê derdixin (çêdikin). Ev halet çiqas baş û di şûna xwe de xebitîbin, hêwa jî wisa zexm dibe. Di vî warî de hevalên Tolstoy kêm hene. Heta gotineke dereke jî, pir baş dixebitîne, em dikarin bi saetan li ser bisekinin û bipeyivin. Di romana xwe **Ceng û Aştî** de, fermandarekî Rûs birîndar û xeriqî gava ku hişyar dibe, li ewrên asîman dinihêre û weha dibêje: **Asîman çiqas jî kûr bûye.** Ev gotin, gelek tiştan dixê bîra me. Bi vê gotinê, li hember sîstema ku bi tenê ew xistine nav plan û haletên şer û her wiha tişteki din nedîtine, derdikeve. Piştî ku li kûrahiya asîman dinihêre û jê serwext dibe, digihîje fikreke wiha. Kûrahiya nexweşiya şer û zêdetir jî ramanê wiha nîşan dide. Ev tev; ji hêwa serwextiya jiyaneke xweş pêştir tişteki din nîne. Wekî din jî, di vir de, hêwa; tiştî manedar û qenc a jiyane ye, ya bê mane û ne qenc jî, ya şerê di nav mirovan de ye. Ji vê, em

dikarin gelek fikrên din jî derxin. Yekbûna berhemên hunerî çiqas girîng be, ji bo temaşevanekî yan jî lêgereki jî, derên hunerî û derxistin jî hewqas girîng e. Em çawa dixwazin hunermend hunera xwe zanedar, serwext û alîgirî çêbike, gotî rexnegir/lêger jî wisa zelal binihêre. Ji ber ku huner pir nazik e, pîrî caran dixarînin, rastiye vekişînin. Di rastiye civakî de dualîti heye. Hema weke dubendîtiya diyalektîkê. Yek pêşveçûna rastiye ye, ya din jî rastiya ketina (rizîna) aliye din e. Polîtîka û îdeolojiya hunermend li kîjan alî be, hunermend li wî alî serdest dibe. Ev jî, anegorî hunermend mane û serwextîyek mezin e ku rastiya hebûna wî ya civakî ye. Xwe wek mirovekî kîjan alî bibîne, rastiye wî aliye diparêze. Ji ber ku pîrî caran vê riya xwe rast dernaxe, serwext nabe ka li kîjan alî ye. Pêşdaçûna vê rewşa hunermend, yanî dayîna berhemên wiha, nezalaliya kesaniya hunermend dide nîşan. Li ser vê yekê Çer-nîşevskî wiha dibêje: **“Mana hunerê, li hember rastiye, tiştên ku li mirov xweş tînin jî nû ve afirandina wan e”** Li ser vê yekê civakên kapîtalîst, li ser navê hunerê tiştên beredayî, neberçav û vala çêdikin ku ev jî rastiya xitimîna wan dide nîşan. Ev asêbûn hem piçûkiya hunermend û hem jî xerabûna sîstemê diyar dike. Dixwaze ku em vê rastiye bibêjin; cihê ku mirov dikare lê pêsta here û berhemên nemir bide, tercihên zanedarî ne. Lewra sîstema serdest, naxwaze mirov pêstahere, van dixê hedef ji xwe re. Tebitandin û tirsandina mirovan temenê wan dirêj dike, lewma wisa dikin. Pirsgrêk her çî dibe bila bibe, gotî şixwîl rast û bi zanedarî bê kirin. Sîstema kapîtalîstên kedxwar dikarin li her derê li jiyane serdestiye bikin û jiyane wisa bidomînin. Lê, tenê karin wiha bikin. Ji ber vê yekê, her tiştê ku derdikeve dixwazin bixin kontrola xwe. Her tişt anegorî berjewendiyên xwe çêkirine, ev yek hewcedariyek wan e. Ev; ji bo aborî, ol, ramiyarî û zanînen çî be, ji bo hunerê jî ew e. Dagîrker, cerdevan û qatîl dizanin çî ji bo çî dikin. Ewên ku tevî van nabin gotî peywîr û cihên xwe zanibin. Mejbûr in li gor van qeydan bixebitin. Ev yek, bi hînbûna hêjayên mirovî, -netewî, çînî- pêk tînin. Bi vê riyê tenê gerdûnîtiye dikanin pêk bînin. Anegorî hêjanên xwe yê civakî ku hereket bikin, ancax dikarin serfiraz bibin. Divê mirov tesîra rastiye xwe yê civakî di hunera xwe de diyar bike. Ev peywîra bingehîna ji bo hunermend. Ev kar jî, bi zanetî bê kirin ancax pêk tînin. Heke ku hunermend, guherînen civakî û dîrokî serwext nebe û nepejirîne, ketin-rabûna civakê pê re ne jî, nikare bibe hunermendê civakê. Xwe-navî (orijinalite) û hunermendiya xwe tenê wiha dikane bijî. Ancax wiha dikare berhemên bide. Her wiha hunermend; hest û ramanên xwe bi riya nîşanan û bi

awakî helbestî qefilandibe, riya hunermendîtiyê jî qefilandibe. Yan na, xebatên wî jî xebatên belgeyî pêştir nînin. Yan jî, ji şêlperestekî (hewqasî bi şêla hunerê de dikeve, li naverokê nanihêre) zêdetir tiştêk nîne.

Tiştêkî sivik be jî, di destê hostan de mimkûn e ku bibe berhemek mezin. Hunermend, ku manekê bidê û bi neqîşîne dikare bîneran (temaşevan) yan jî xwendevanan hejmetkar bihêle. Heta, hunermendekî hosta, bûyere dîrokî jî, weke tiştêkî nû û xweş dikare bide temaşekirin û xwendin. Em ji bo mînakekî li serhildanên kolan li Spartakûs binihêrin. Hem dibe tiyatroyê û hem jî dibe opera, em dikanin wisa bifikirin. Heta weke resim peykerekî jî dikanin biramin:

Piştî serhildanên salan, roja paşîn hatiye lê qelibiyê. Berêvara wê rojê, Spartakûs û hevalên wî tîk diçin. Serhildana wan dişikê. Li sahnê:

Serokartêşê Romayê li berpala girekî û di dest de şûr, li dorê leşkerên wî û li ser kendalekî mezin diqire. Bi şûrê xwe dîlekî îsyankar dide nîşan û weha dibêje: **“Heger hûn bidin naskirin ka Spartakûs kîjan e, ezê we bibexşînim. Yan na, ezê we tevan weke vî şûr bikimî, dîl bi lêdana şûr dikeve erdê. Hûn dizanin, hûn êdî şikestin. Dî, piştî vê yekê, hebûna Spartakûs jî mirinê pêştir tiştêkî jî we re nayne. We li ku veşartibe derxin. Yan jî bi xwe dertê û we jî, ji vê yekê xelas dike.”** Her weha ji nav brîndaran yek der tî, **“Spartakûs ez im”**, dibêje. Paşê yekî din der tî **“Spartakûs ez im”** dibêje, Piştî re yekî din jî dertê Spartakûs ez imî dibêje û her weha îsyankar li pey hev **“Spartakûs ez im”** dibêjin. Tev, bi hev re diqîrin: **“Spartakûs ez im”, “Spartakûs ez im”, “Spartakûs ez im”** dibêjin û deng dikeve hundir. Meydana cengê dikeve destê dengê **“Spartakûs ez im”, “Spartakûs ez im”** Lê dîsa jî, heke ku baweriya we bi serfiraziya îsyankaran hebe.

Tam wê demê eşqa ku dikeve dilê we, hestiyên we jî dihejîne. Di hişê we de, bi sedan fikir û hêwa çêdibin. Ji serî de li jiyane dinihêrin û dixwazin jê serwext bibin. Di domana dîrokê de, mirovan ji bo bawerî dostanî û serxwebûna xwe gelek fedakarî kirine. A ev e ku em dibêjin, hêjanên ku mirovahî çêkirine ev in. Ev lehengiyên rast û mezin in. Ew mirina ku ji bo serxwebûnê bedela paşîn e ji serxwebûnê pêştir tiştêk nîne, serxwebûn bi xwe ye. Gava şerhildar weke ji bo serxwebûnê be, radibin mirinê, vê demê hûn jî dibin xwediye gelek raman û hestên nû.

Me li vir dît ku yekbûna raman û hêwayê çawa naverok çêkiriye. Wekî din jî, em baş fam dikin ku figur û şêl jî naverokê zexm dikin. Wekî din jî, jidiliya wan birîndar û westiyayên kompozîsyonê bi ser mirinê de diçin û jê naîrsin jî, pir baş dixwiye. Em vê yekê jî weke

şêla hundirîn ya hunerê dikarin bibînin. Şêla hundirîn hem naverokê zexm dike hem jî, yekbûna naverok û şêlê dineqîşîne. Bi awayekî din jî, şêla hundirîn, li ser berhemên hunerî gelek tiştan nîşanî me dike. Em, pê di berhemê de endamên jiyana rast dibînin. Kompozîsyona berhema hunerî, tenê bi şêla hundirîn diqede. Ev ji bo peykerê çiqas pêwîst be û hostatiyek hewqas zexm bixwaze; ji bo muzik û tiştên din jî wisa dixwaze. Her çiqas şaxên hunerê cûrecûre be û ji wan re materyalên wisa ne ji hev hewce be jî, ji alî şêl û naverokê ve şibîna hev û başbûna wan, li ser hişyariya hunermend e.

Di serî de jî, gava ku me ji danekê bi道府ehî behs kir, ji hinek berhemên hêja jî behs kiribû. Divê em hinekî jî, ji rewşa welatê me behs bikin. Van 15 salên dawîn tiştên wisa qewimîn, weke ku piraniya wan karibin dinyayê bihejînin, giran bûn. Lê çî heyf, qet yek jî neket berhemên hunerî. Rastiyeke nayê veşartin e jî ku hinek ji wan, ji bo bibin berhemên hunerî ceribîne. Lê hema weke ku em dixwazin, tu nebûne berhemên hunerî. Mînakek girîng ev e: Dema ku berxwedana Zîdana Amedê zexm bibû gelek tişt qewimîn. Gotina **“Agir netemirînin, geş bikinî”** dikare bi dehan berhemên nemir derxe. Zêdetir jî, di tiyatroyê de berhemên hunerî jê dertên. Ji bo ku bûyer bibe berhemek hunerî, bibe-nebe jê re hostatiyên mezin dixwaze. Berhemek hewqasî baş amade bûbe jî, ne bes e. Divê pê re, ji alî hostayekî mezin ve li sahnê were temsîlkin. Berhem, li ser hev, belkî wisa bibe berhemek hunerî. Em qewimîna (çêbûna) bûyerê êdî nabînin, ne mimkûn e. Ji ber vê yekê, gotî hunermend bûyerê rind bihûne û li dar bixe. Yanî bûyerê bi zimanekî hunerî jî nû ve bineqîşîne. Tenê wiha em dikarin bigihîjin raman û hêwa wê. Ev jî bi awayekî diyalektîk li ser tevxebitandina naverok û şêla berhemê ye, şêl û naverok gava ku hêzê didin hev, ev pêk tînin.

Bûyerê mirov dikare di gelek şaxên hunerê de bixebitîne. Ev yek bûyerê (mîjar) piçûk naxe/naxe, mezintir dike. Yanî ew berhema ku li ser hev tî neqîşandin, dibe malê xelkê. Ji yê din jî, ders dertên. Tiştên nehewce jî, dafînin aliye-kî. Lê hema fonksiyona berhemek hunerî jî, li ser pêvajoya xwe ye. Yanî gotî anegorî demê bê xebitandin, dixwaze ku wê demê ji bîneran re veke. Gava ku em weke şaxeke civakî li hunerê dinihêrin, dibînin ku pêwîst e şaxên hunerî tev bîn xebitandin/gerandin. Weke NÇM ê (Navenda Çanda Mezopotamya) ku muzik û folklorê dixebitîne, şaxên din jî naxebitîne. Li bal wan gelek resim hene; lê pir kêr di pêşangehan de derdixînin. Ji aliye din ve jî, tiştên navnetewî jê çênan. Heke Ku xebat û hêjanên wan hebin; gotî derxin ku kêrî me werin. Niha jî dixwazim tabloyek NÇMê pêşkeş bi-

kim. Bi vê tabloyê em li yekbûna şêl û naverokê binihêrin. Gotî em li ser vê yekê jî bisekinin. Berhema çê, bi bînerên xwe tê tégihîştin. Ew berhema ku xwe bi bînerên xwe dide pejirandin baş e, rind e. Yanî berhema hunerê ew e ku, xwe bi rastiyên xwe ifade dike. Heke ku xwe baş nikaribe ifade bike, tu kes nikare jê ra tercumantiyê bike.

Ku xwiyani têr bike, ji wata çapa wê ya reşespî (reşebelek) tiştêk dernaçe. Hewqasî, dibe ku anegorî ya rengîn xweşxwiyaniya wê hinekî dereng bê hîskirin.

Em baş dizanin ku hunermendiya hunermend ne ji bo xwetêkirina wî ye. Ji ber vê yekê, divê em hunerek wisa derxin ku bigihîje gel û fonksiyona xwe pêk bîne. Pêkhatina vê yekê- yanî serfirazîjî, li ser sazûn û rêxistina vê xebatê ye. Gava ku em wiha lê dinihêrin hunermend û rêxistin, rêxistin û civak, civak û rêxistina ramyarî hev destek dikin û hebûnek tevahî nişanî me didin. Jiyan pirali ye, rengîn e û yekbûyî ye. Tu aliyek tenê yan jî, jiyan bê aliyekî nabe. Tiştêkî weha nemimkûne. Ji bo guhertina jiyanî tenê li ser aliyekî yan jî li ser çend aliyan serketinê nayne; dixwaze li ser alî û şaxên jiyanê xebatên ji dil çêbin. Tenê wiha mirov dikare jiyanê biguhere. Tenê mirovek, heta gelek jî naqedîne. Ev hêjanên mirovî ne. Heta ku van gerdûnî yan jî navnetewî nekin; heta nexin hêjanên mirovî serfirazî çênabe. Ji ber ku huner, hêjanên mirovî û gerdûnî derdixe, em pir qîmetê didinê. Ev jî ancax bi derketina berhemen hunerî û mezîna dibe. Huner, faktoreke wisa zexm e, tesî-

reke gelek mezin li rabûna neyartî û nebaşiyên dike. Tiştê girîng, bi tevxebitandina hostatî û faktorên, wê têkiliyê li dar bixe û berhemek wisa mezin jê çêke. Bi vê re, girîng e ku ev berhemen pêşkeşî civakê bibin. Heke ku yek ji van kêmbê, li ser her duyan jî kêmasiya me dide nişan. Heta ev kêmasî diyar dike ku em li ser tiştên mezintir -politikayên şaxan- jî kêmbê in. Di derbarê vê yekê de Kagan zexmiya hunerê wiha ifade dike:


“Di hunerê de gotinek e ku li ser xebat hatibe kirin, neqîşibe û karibe şêlek hunerî bide, herweha dikare gelek nişan û haletan derxe. Ji ber ku, mirovan dinya bi awayekî helbestî û ramanî pejirandine, ev jî zanînen entellektuel çêtir, zexmtir û xweşiktir e temendirêjtir e, nemir e. Gava ku em şaxên hunerî tevan (ji resmê heta sînemê) yekoyek yan jî li ser hev analîz bikin, wê bixwiyê ku emê nikaribin baş ifade bikin. Ji ber ku, hêzên serdest ji bo kara xwe van waran jî kontrol dikin. Weke ku me li jor jî gotibû, karê me yê hunerî jî zor e. Gava ku em baş lê binihêrin, peywirek giran li vir jî, dertê pêşiya hunermend. Dijwariya vê yekê jî, pêştê şaşdagirtina piraniya gel e. Gel jî berê ve tiştên nebaş-nerast hîn bûye û jiyaye. Ev jî, giranî û girîngiya kar qat bi qat girantir dike. Ji nû ve, modelkirina şaxên hêjanên mirovî sivik nîne. Xebatên ji dil çênebin, pêk nayê. Heger ku jiyan civakî saz bibe û pêş ve here, şaxên hunerî jî wê bersiva pirsgirêkan bidin. Kagan li ser vê rewşê jî weha dinivîse:


“Di hunerê de serfiraziya hunermend li derî civakê ye, di kûraya jiyanê civakê

de ye.” Bi Belînskî wiha didomîne: “Hozanek-helbestvanek çiqas mezin be -yê civaka ku lê bûye dijî, pêşveçûna wî, heta kesaniya wî- hewqas jî li ser dîroka pêşveçûna civaka wî ye.” (*Estetik û Huner*, r: 345).

Ji serî de, ji bo mirovbûna mirov civak faktoreke çiqas mezin be, ji bo çêbûn û pêşveçûna kesaniyên hunermend û serok jî faktorek wisa mezin e. Lê hema li vir, têkiliya kes û civakê bi awakî wisa ye; him hevru ye, him beranberî ye û him jî hevkarî ye. Sebebên hebûna vê yekê derdixe. Pêşveçûneke wiha, di çarçova tevahî de, xebata dijberan jî digêrine. Madem ku em li vir, ji huner û civakê nû behs dikin, gotî şikênandina şasiyan û tiştên paşverû bi berhemen berçav îspat bibin. Herwiha ji bo rastbûna kesaniya civakî, dixwaze tiştên mirovî bikevin warê gerdûnî. Heger ku ji civakê agirekî mirov tune be, tiştêkî ku mirov wêna jî çênabe. Her wiha ku mirov tevî ramana “Agir netemirîne, geş bikin” nebe, tu mafekî mirovî jî bo mirov namîne. Gava ku li jiyanê civaka xwe dinihêrin, ne tenê hunermend li bal her kesî tişt hene ku karibin agir geş bikin. Wisa be, ewên ku em jî wan re hunermend dibêjin, gotî tiştên êdî berçav derxin. Ev berpisiyariyek hunermendîtiyê ye.

Weke ku di rûpelê pêşin de jî hat gotin, gelek çiqas berhemek hunerî hene. Lê disa jî, xwîna xwe ji rastiyan civakî hildide. Berhema hunerî weke şixwîlekî rojane yan jî lêgerîneke zanistî nîne. Li ser jiyanê civakî ava dibe û wê jiyane li gor xwe jî nû ve dineqîşîne. Piştî ku tiştên xas ên xwe tev kir, ji bo ku tiştêkî rind derxe, rind-xebitandina destxistinê dixwaze. Divê hunermend jiyanê weke kefa destê xwe baş bizanibe. Heta ev jî têrê nake. Dinya her roj diguhere, gotî anegorî van hişyar be. Wekî din jî, li ser şaxa xwe, ji bo saziya xwe, dixwaze xebat û lêgerînan jî bike. Helbet hewqasî berhendan ne bes e. Dixwaze baş raçav û analîz bike, ka ev berhemen û xebat tesîreke çawa li civakê û mirovan dike. Tiştê girîng jî ew e ku, tev li pey tiştên nû be. Tiştên nû jî ne ku hewqasî tiştên nû bin (û bêkêr bin), ji bo pêşveçûna hunerê bin. Yan jî, êrişkirina ser hêjanên heyî karê nayne, tiştên nû dernaxe. Bi êrişên li ser naverok û şêlê ku prensîbên hunerê yê bingehin in, tiştên nû çênabin. Li vir, em nakevin minaqeşa vê. Lê hema, divê em bi çend hevokan jî hinek tiştan bibêjin. Ji xwe ji serî de, nivîsandinên me ji bo parastinê ne. Lê hema; niha jî weke ku mirov li mirov û hunerê dinihêre, dixwiyê em hêj li destpêkê ne. Gava ku em li gelê û rewşê dinihêrin -anegorî min- wekî ku hêj karikatûrekî tiştên mirovî derkeve. Peywira me jî, hêj jî xerabkirina vî karikatûrî nîne, zenginkirin û mezinkirina wê ye. Yanî heta jî me tê, em wan bineqîşînin.





Ev wênayê peya pey ku di encama îddî'ayekê de ji layê Edward Muybridge've hatiya pêkanîn, ji mînakên pêşî ku Higel tesbîtîkirina bizavê yê bengîniya çavdêriyêye.

Bi Nihêrînek Gelemperî Sînema

YILMAZ KELEŞ

Zayîna nîgar û heykelan digel Mimesis-bi teqlidê dest pê dike. Tiştên-suruştî, portre û yêd -ku ji nuh de derbasi tual, yan ji heykelan bûne û/yan ji/afiranderên ku bi têngêhiştineke wênekari (fotoxrafîk) xîçik (eskiz) ên xwe pêk anîne, ji sedsaliya 15 an û pêve (demaronîdayî) ya nîgarkariyê, (welatên) rojava dev ji karên fotoxrafîk û teqlidkirina tiştan berdane û li şûna vê yekê, digel cîhana derveyî xwe dest bi daxuyakirina cîhana xwe ji kirine.

Digel perspektîfê, bi destxistina qonaxa sêyemîn nîgar(karî) êdî dixwaze bikeve bizavê û pêşdeçûnê berdest bike, yan jî, yên ku arîşeya ser û berê nîgarê çareser kirine, xwestine wê (nîgarê) bizavê bidinê. Hetta, wan kesên ku nîgar û heykelên Îsa û yên Meryemê çêkirine, li pêşberî wan (nîgar û heykelan) xwe çemandine û "çi dibe, digel min bipeyive" gotine û girîyane. Di bîngeha xwe de li Asyayê dixebitin ku dîmenên bi bizav, bi leyistikên sîtavî bidin xuyakirin.

Di sedsala 17'an de li Ewropayê, bi peyda bûna film, kamîra û yêd. Magic latem (fanosa bi sêhr) Traumatrape (1824) phênakistis cape (1832) wênekêş (kodak 1839) kinescope, zootrape

(1859) bizav dâne nîgarê û her wusa nîgar kirine dimenên bi bizav.

Tomarkirina dîmenên bêyî ku ji hev bêne parçekirin, Edward Muybridge bi wênekêşa xwe pêkaniye. Edison jî bi kinetographe yê ezmuniya film û filmên dengdar kir û her wusa, di 28'ê befranbara sala 1895'an de, cara yekemîn ji layê Lumiere'an ku birayên hev bûne, li qatê binî yê Grand cafe ya bo temaşekaran sinema hate pêşkêş kirin.

Her wisa digel pişeyê wênayî, pişeyekî nûjen yê mekanîk hate danandin. Ev pişeyê ku dipeyive, bizavê dike û bi zeman û mekan re dileyize û "bi kiryarên xwe yên optîk û mekanîk, afirandina rastiye ya ji nuh de" pişeya heftemîn sînema bû. ...dî, zayîna dimenên bi bizav jî dest pê kir. Lê yê ku kînestoop afirand Edison û yên ku danîşana filman cara yekemîn pêkanîn, Lumiere'an jî sînema wekî huner dîtin.

Yên ku sînema arasteyî çirok û celebên ji hev cuda kirin, Georges Melies'ê Frensî û Edwins-Porter'ê Amerîkî bûn. Van kesan, dimenên bi bizav, mina navgîneke hevpeyvînê bi kar anîn. Yê ku ji dimenên bi bizav re zîmanek peyda kir û wekî pişe bi kar anî, Dawîd Work Griffith'ê Amerîka Başûr bû.

Her wisa sînemayê rastiya xwe ya gerdûnî wergirt û li ser gelek celebên ji hev cuda tê dabêşkirin. Ev celeb:

- 1- Filmên hunerî
- 2- Filmên zincîrî
- 3- Filmên pêkanî
- 4- Filmên mējûyî
- 5- Filmên cengê
- 6- Filmên kowboyan
- 7- Filmên gangsteran
- 8- Filmên Tîrsê û yên fiksiyon-zanistî
- 9- Filmên trajedî, dram, melodram
- 10- Filmên Muzîkal
- 11- Filmên Belgeyî
- 12- Filmên Anîmasyon (filmên kartonî û pêlîskan)

Di sînemayê de Livînen ku digel pêşdeçûna teknîkê tene dîtin û digel guherînên têkçûn û aloziyên siyasî û civakî, felsefeya dîmenan jî bi pêş de çû û bi şeweyeke nûjen hate zimên. Dîmenên bi bizav, bermayiyên eş û azarên herî kûr dan ber çavên cîhanê û her wisa zawayên nêrînen ji hev cuda afirandîn.

Rêkêşên sînemayî ku di demên xwe de her yek ji wan bînerên dengdar û yên bêdeng bûn, digel hunermendên xwe yên herî xurt û kêrhatî û avakerê corên dabêşbûyî, kostuman, dekoran û ronahiyan ku xwe nîşan didin, Almanya derket holê.

Piştî Cenga Yekemîn a Cîhanê ku li pêş ronahiya "kesên ku derdidin rastiye





nabînin, lê di derbarî rastiye de nerîna wan heyê” dest pê kiribû û digel hebûna meyla Almaniya ji bo tirsê, toristanîyê û tiştên nehênî, Afiranderên Almanyayê filmên mîna “Dr. Mabusse”, “Metropolis”, “Wesiyetnameya Dr. Mabusse”, “M” pêkanîn. Filmên Robert Wiene “Pisporxaneya Dr. Coligor” nîşana wê demêye, wate, pêkanîna wî ya sereke ye. Şanogehên mîna kaxalan ku kesên mirovkuj, zanyarên çavsor yê nêşwinda û nexweşên giyanî lê piyase dikirin, Li nav labiretên ku ji layê sitov û ronahiyê ve hatibûn afirandin, tirs û teror û dudilî, bi şeweke har û bêperwa diçûn û di hatin.

Gava ku nîgarkêş Harman Wormin: “Divêt film, rewşa nîgarên candar werbigre” digot, ev gotina wî ji layê sînema-geran ve hate pêkanîn. Êdî, reng û dekarên varî ku bi şeweyekî dîrî rastîyê dihatin zimên, bi pêş de hatin.

Her wisa rêkêşiya derdayî, afiranderê “Hemwelat” “Kane” yê filmê sê qonaxî Orsen Wetles û afiranderê swêdî xudanê filmên “Bêdeng”, “Çîçekên Çolê” û “Mohia Heftemîn” Bergmen ji xistibûn bin bandora xwe û her wisa ev rêkêşî bi-bû serekanîya filmên tirsê jî.

Bi vê rêkêşiya ku jêre – coligorizm- jî tê gotin. Bi filmê “Metropolis” pêjna lingên Hitler ragihandibû. Senaristê berbiçav yê rêkêşiya derdayî Carl Mayer, digel Kammerspiel ya ku rêkêşiya Bi Geşedaneke Komelayetî Rastiya Nûjenî berê xwe dane kesên li kolanan, li şûna dekoratên bi Studyo yê nêşwinda û gelekî dewlemend, bi berhemên xwe yê nêşwinda, wekî, “Kolana Bêdeng” (G.W. Pabest). “Wargete” (E.A. Dupant) “Peyê Dawî” (F.W.Marnau) berê xwe dane kolana û hejaran bêkariyê û buhatiyê, evîni, têkiliyên nêşwinda û mê û rewşên trajedîk anîn ser zimên, û derbasî çihana kesên ku ji ber van egeran hatine veder/kirin bûn.

Çavdêriya (temaşekariya) Frensiyan

Ji zimanê Sînemayî wê vetir, rêkêşiya Frensî, digel hebûna cudayîyan di nav xwe de jî, danandina peyvan li şûna dîmenan, ji layê rexnegîr, rewşenbîr û nîgasperestan ve -yên ku hêmanên sinemayî di bunya xwe de radikin- Rêkêşiyê ku nîgaş û biranîn û nerînen rewşenbiran dide xuyakirin e.

Derhêner û filmên wan ên giring, Germaine du Lac, Mariel l’Herbier û Jean Epskin, bi filmên xwe yê nêşwinda, wekî, “Devera Mirinê”, “Ez-Te,Wî-gunehbar Dikim”, û “Tekerlek” (Abel Gance) di dema zêrîn ya Sînemaya bêdeng de, li Fransê sînemaya serkêşî (Avant-garde) bi pêş de hat.

“Baleya Mekanîkî/Parisa Nivîstî” (René Clair) “Nardî, Kumbetê li Rastê” (Je-

an Renair). Lê, "Pêla" a durust, wê di sala 1960'an de derketana holê.

Ji bo geşedaneka mezin ev rêçek bû da sînemaya serkêş xwe berhev dike. Sînemaya serkêş berhemên xwe yên durust, piştî Charlie Chaplin'ê îngilîz wê li Sowyetê bidana. Dixwestin têkoşîna çanda sosyalîst ya mirovanî bidin û komeleke nû bi afirînin

Piştî şoreşa 1917'an derhênerên wekî, Azîla Wertov, Elsençteîn, Kulesov, Dovgenko, Padovkin, ji bo afirandina komeleke nûjen û çanda sosyalîst ya mirovane dixebitîn da rastiya sowyetê, yan jî, jiyana komelayetî binin ziman.

Rastteqîneya helbestî (Realisme Poetique)

"Her wekû dixwestin ku pirozîyên beredayî yê" derdorên hişk bawerên civakê binin ziman bi ahengeke ku piraniya tiştan pembe xuyadikir "Li derdorê Lêmânê" (Benderên) bi mij, "Cadeyên ku bi baranê şil bûne", "Çayxaneyên tenha yên çolterê" û yêd "Revokên ji leşkeriyê", "Mirovên ku li bexteweriyê digerin" li sînemê hatin listin. naveroka van filman, bi gelemperî evîndariyên zor dijwar yên mirovên nadiyar ku hatine vederkirin, vala, evîndar û li hemberî kavdanên asê û aloz rû bi rû mane berdest kirin. Aliyê rastteqîneya vê rêkêşiyê jî, di deliveyê herî xemgîn de bi destên polîs û gangsteran kuştina mirovên wînda ku di cîhana xewna de ne.

Nûnerên vê rêkêşiyê Jean Vigo, Marcel Cher bier, Julien Duvivier û Marcel Carne'ne yekemîn car yê ku di hûnermendiyê de têgehîştinên xwe yên nediyar derbasî sînemayê

kir û li hemberî gerdiş û kevneşopîya civakî, sazûmanan, zagonan û makîneyên ku rêhberîya mirovatîyê dikin yê ku serî hilda, daxuyakirina kesatîyan ku li berxwe dide, ramanên ku di mêjî de bi cî bûne, daxwazên wan, bêfikirînen wan anî zimên, rastteqînegêr -surrealist- Luis Bunuel, piştî her du filmên xwe yên bi navnîşanên "Seyê Endulus" (un chien Andalou 1928) û "çerxa zêrîn" (Age d'or 1930) digel xwedan bawerê rastteqî-negerîya helbestî Jean Vigo, filmê Anarşîst yê bi navnîşana (Rewş û bûcûn ne tiştêk) pêkanîn.

Bi filmê xwe yê binavnîşana "400 Darbe" de, François Truffaut û Vittorio De Sica ji filmê xwe yê binavnîşana "Mûcizeya Milano" her çende li pirozî û perwerdekirina sincî û bajarvanîya Jean Vigo rexne dikirin jî, lê di filmên xwe de didin xuyakirin ku di bin tesira wî de ne.

Vigo, di filmê xwe yê bi navê "l'Atlantide" de keyneperestî û paşverûtiya bajarvanîyê dîsa rexne dike. Kargêrê herî giring yê Sînemaya Frensî û filmên bi vî rengî Marcel Carne, di filmê xwe yê bi navê "Peravên bi mij" (1938) de, di encama danîna têkiliyên ne durust kuştina revokekî ji leşkeriyê ji layê gangsteran ve li ser cadeyên ku ronahiyên wan bi baranê şil bûne dide xuyakirin. Her bi vî rengî yan jî pêk anîna vî filmî li Tirkiyê, di sala 1959'an de ji nivisina Atilla İlhan û ji çekirina Lütüfî Ömer Akad filmê "Peravê kesên bi tenê".

Ji bo filmê "Peravê mijê" (La quai des Brumes) Andre Bazin' trajediya dilpakîyê û tenê bûnê" dibêje.

Rastteqîneya Komela Sovyetê

Piştî Şoreşa Sowyetê, Sînemagêran jî şerê damezrandina komela nûjen li welêt da. Sînemaya Sowyetê karê Sîrîmeyerê îdeolojîk û polîtîk'e. Gava ku ev kar dikirin, ne bes film pêkanîn, la-yenên ji derveyî zanîne û ramanê ji vala nehiştin. Wate, dîtîna û kirîna pêkve ketin bizavê.

Hoştiviya min Hiroşîma (Hiroshima mon amour, Alain resneis, 1959)

Di demek herî kurt de "Pisporxaneyê ezmûnî" ya lev kuleşov "Kino-qlaz" a Dzigo Vertov "Fêrgeha leyistikên Eksantrîk" (Ji derveyî navendê) ya yutkeviç, Trauberg, Kosint Zev û yên sînemagerên Eisenstein, Doğa ozan Dovçenko û her wisa şoreşgerê romantîk Pudovkin ku sînema derbasî rewşeke nûjen kirin gihîştin.

Kino-qlaz, tiştê ku dihat dîtîna li şûna çav danî û her wusa wekû dihat xuya kirin jîyanê kêşa paşê jî ber bi kurguyekê diyar ve çû. Bê dekor, bê senaryo û bêyî Leyistikvanan... bêyî amedekirina tiştêkî, filmê jîyanê wekû xuya dibû hate pêk anîn.

"Sînemagêrê tundîya Şoreşgerî" S.M. Eisenstein, di filmê xwe yê bi navê û nîşana "Zirxiya potênkin" de, rêveberîya Çar Nikolay û yên li hemberî vê rêveberîyê, wate gel û gemîvanên di zirxliya potênkin de bi şeweyekî dastanî anîye zimên. Rîtm û tevgêrên di film de, di mējûya sînemayî de cihêkî taybet digire. Sahneya pêlikê di gelek filman de hat bikar anîn. Evî filmî Cemawer kiribû Şanoger. Bi filmên xwe yên wekû "Grev", "Octobir", "Kevn û nû", Her bî-jî Meksîko "-nivco hiştin- Alexander Mevskî" û "Îvan ê bi heybet" ku bûcûna sîyasî ya Stalin rexne dikir, muhara xwe ne tenha li demeke diyar, li mējûyê sînemayî xist.

Rastteqîneya nûjen -neo- realisme

Piştî duwemin cenga cihanî piştî zordestiya faşîzmê ya bîst salan -rêkêşîya rastteqîneya nû ji naturalîzma Frensî, ji sînemaya civakî ya Sow-yetî, ji Fêrgeha dibin mersa rêkêşîyên filmê belge-yê İngilîzî û





“verismo”ya di toreya itali de. Serpêhatiya dramatik ya di dema rejima faşist de û arîşeyên rûdana yên piştî vê rejîme (Ceng, bizava berxwedanê, bêkarî, bazara reş, bêmalî Şevnîşînî û yêd.) babetên wusa bi kar anîn. Her wusa demekê demokratên fille, bi Hollywood re, her wekû bûne yek û her çende xwestin ku rêkêşîya rastteqineya nû ji holê rakîn, lê nekarîn bi ser kevin.

Rêkêşîya rastteqineya nû, digel ku ji layê rejîma faşist ve ji hemî layan hate dorpêç kirin ji, lê bi giyanekî raperfinkar, rewşa Îtalyana 1944-45'an di filmê “Roma bajarê vekirî” de didin xuyakirin. Di rojên dahatû de Roberto Rossellini, bi filmê xwe yê bi navnîşana “Almanya, salên sifir” û bi filmên xwe yên ditir wê dadgêrîya rejîma faşist kiribûna.

Her wusa Vittorio de Sica digel Zavattini bi filmên xwe yên wekû û zarok li me dinerin “û” “Zarokên kolanan” wê berê xwe dabûna jiyana zarokan. Di filmê “Zarokên kolanan” de bazara reş û du zarokên ku jiyana xwe bi boyaxkirina pêlavên leşkerên Amerîkî derbas dikin, didin xuyakirin.

Filmê wanî “Dizên baysiklan” jî, ji filmên herî baş yên hemî demên mêjûya sinamayî ne.

Di filmên ku li ser bêkarîyê hatin e pêkanî jî, piştî cengê rewşa rûxiyayî ya Îtalyayê tê ditin. Bê ser û beriya civakê bi dimenên ji bajarê mezin li ber çavan tene raxistin.

Filmên mina “Mucizeya Milano”, “Zarokên pirêkan”, “Umberto D.” pêk anîn.

Luchino Visconti, wekû Einsenstein'ekî ji nêrîna Marx ya mêjûyî jî sîd wergirtiye û şaxekî nû li mêjûyê zêdeki-

riye. Filmên wî “Namegêr du cara li derî dixê”, “Bengînî”, “Dinya diheje”, “Sensa” û filmê wi yê herî grîng “Leopar” pêkaniye. Di filmê xwe yê “Leopar” de, bi zimanekî dramatik rûxandina feodalîtê, ango, li hemberî kiliseya paşverû û Aristokrasîyê, desthilatdarîya burjuwazî û bajarîyan ya bi piştewaniya gel dide xuyakirin. Filmekî wusa, yan jî em dikarin bibêjin bi rengê xwe yê li Tirkîyê, ji pêkanîna Nesli Çölgeçen filmê “Zügürt Ağa” ye. Berî têgehiştina fantastik û ji rastîyê wêye Federico Fel-

lini jî di nav vê rêkêşîyê de cih digirt. Filmên “Ciwangayên Kevnepir”, “Reyên bêdawî” pêkanî. Lê dawîyê jî filmên wek “Kolanên bê dawî”, “Ronahiyên vergete”, “Jiyana bextewer”, “Heşt û nîv”, pêkanî.

Antorioni jî, kargêrê herî giring yê sinemaya Îtalî ye. Li berahîkê di nav Rastteqineya nû de cih girt. Belê paşê jî “Taya çerxê”, psîkolojiya mirovî bi şeweyekî mirovane anî zimên. Di pey re filmên wek “Li bajêr evînî”, “Afreta bê sosin”, “qêjîn”, “Heyv hatiye girtin”, “Gula



Di çardemîna mehrîcana filmên nêvnetewî, di beşê sêdsaliya sinemayî de li stenbolê, dimenek ji filmê (Lourance Oliver, 1948) Hamlet

sor", Pêk ani. Wek gelek sinemagêran Y. Güney jî maye di bin mersa rêkêşîya rastteqîneya nû de. Filmê Y. Güney "Hêvî" ne tenha versiyoneke rêkêşîya rastteqîneya nû ye, baştirin nimûneya vê rêkêşîyê ye.

Pêla nû (Nouvelle Vague)

Di sala 1924'an de li Fransayê, Jean Renoir, Louis Delluc, Bernard Leger, Mekanik Bale, Rene Clair, Jacques Becker, Julien Duvivier, Marcel Corneni, ku li ser şopa rastteqîneya helbestî û sinemaya serperîst bûn, şûnmayiya sinemayê her çende bi alikariya Rene Clement, Andre Cayatte, Robert Bresson'an ber bi dawîya salên 1940'an hat jî, lê li dawîya salên 1950'yan rêkêşîya "pêla nû" ber bi pêş ve hat. Bi kombûna nerînên ji hev cûda li derdora kovara "Cahiers du cinema" yê, evan sinemagêran "Sinemaya havînî" afirandin.

Bi vê pêşniyara Alexandre Astruc "divêt yê sinemagêr wek her hunermendekî bibe yekane çêkerê tevaya hêmanên filmekî û wek roman nivisekî bi sanahî (qelemê balkêş) divêt bixe bite." Sinemagerên ku hatine xudankirin, wekû nîşekî nûjen bi filmên "Orfeu Negro" (Marcel Camus) beşdarî mîhrîcana Cannes'ê bûn.


Kargerên girîng yê nê rêkêşîyê; François Truffaut, Alain Resnais, Claude Chabral, Louis Maller û paşê jî Jean Rouch, Jean-lue Fodoral, Marcel Camus, Jacques Daniel û Valeroz'in.

Ji vî nîşê nûhatî Truffaut yê ku di bin mersa kargêrên wek Alfred Hitchcock û Franz Langde maye, wê filmên wek "400 Darbe", "Laşê nerm", "Jules et Jim" pêk anibûna.

Alain Renais, lê rast hatin, kes û tişt, her yek û razek bi xwe re hildigrin, dibêje. Nivîskarê jî nîşê nûhatî yê romana Fransî Marguerite Durusla, di filmê "Xoştiviya min Hiroşîma" de.

Li ser wek hevîya di navbera drama kesane ya miroveki Japonî de ku kambaxîya atomî ê jîyayê û li navçeyêke Fransayê ku di bin dagirkirina Nazîyan de li ser têkilîya jineke Frensî digel yekî Elmanî ku her dû rûdan jî gunehkarîne, rawestiyaye.

Neguherîn û wekhevîya zeman û mekan ya rêkêşî ya "Romana nû", pêkaniya filmekî bi tevgera navxoyî, têkilîyên di navbera zeman û insan de, bi şeweyekî Saykolojîk destnîşan dike. Bi filmên "Li Marhinbad'ê sala par -L'annee derniere a Marienbad, 1961-" Ceng dawî hat", "Apê minî li Amerika", "Di mirinê de evînî" -l'amour a mort- Li İspanyayê şerê di nav bera komarparêz û faşîstan, digel bêxemîya rojava ya li hem-



berî vî şerî dide xuyakirin. Her wusa di cihekî de jî dagêriya ji bir kîrin û bîranînê, faşîst û Şoresgerîyê dike.

Filmên Louis Malle "Yên evîndar", "Sêdare", yê Claude Chabral, "Keşxe", "Dêhlekan", "Parisa me", yê Jean Rouch, "Ez zencîyek'im", "Pramid'a mirovan", "Serpêhatiya havînekê" û Jean Lue Godaral ku yek ji kargêrê pêla nû û hosteyê sinemaya Anarşîst politik bû, filmê, wî "Henase li duv henase -A Bant de Souffle-", "leşkerê biçûk", ji ber peyama wî ya siyasî ku bi cenga Vietnamê ve pêwend bû hatin qedexekirin. "Jinek jinek e (une femme est une femme)" "Jiyana xwe meriv bijî", -vivre sa vie.

Sinemaya Azad (Free Cinema) Kargêrên wek Lindsay Anderson, Karel Reisz, Tony Richardson, li dijî nerîna akademîzma ku sinemaya Îngilîz bê mane dike derdikevin û vê dijîyatîyê şeweyekî berteng li dijî sistemê bikar tînin.

Filmê Lindsay "O.Dramland -Ey welatê nîgaşan-", yê Karel Reisz û Tony Richardson "Momma Don't Allow" Diya min destûrê nade-" Filmên Karel Reisz "Em zorekên taxa lambeth'ê", û "Rojên Heviniyê", Filmê Tony Richardson "Girmijina sexte" filmê Linda Anderson "Jiyana werzişvanekî" û filmê

John Osborne "Kerb" ev film yê nê, herî girîng in. Filmê "Kerb" wêneyê zivêriya navxoyî yê Îngilîstanê ye.

Sinemaya nû (Cinema Novo)

Ji navenda Brezilyayê derçûye. Nûnerên rêkêşîya ku jêre rêçîka sinemaya şoresger jî tê gotin û her wusa yê nê ku arîşeyên welatên Latîn Amerika ewên ku ji layê Aborî ve bi paş de mane didan xuyakirin, Glauber Rocha, Ruy Guerro, Nelson Ferreira das sentos bûn.

Glauber Rocha "li ser axên têr hetav yezdan û şeytan" "Li hemberî dirindeyê nebaşîyê şervanê pîroz."

Ruy Guerra "Plaja Arezûyê", "Çek", "xweda û mirî", û "Neçirvanên berketî"

Nelson Pereira dos santos, "Rio, 40 pile", "Rio, Herêma bakur", "Jiyane Zuwa"

Kargêrên wek Leon Hirszman, Arnaldo Jabar, Walter Lima, Joachim Pedro de Androda jî, paşê di nav vê rêkêşîyê de cihên xwe girtin.

Têbini: Di vê nivîsinê de tenha li ser rêkêşên di mêjûya Sinemayî de hatiye rawestandin. Li ser kargêr û filmên ji derveyî van rêkêşan nehatiye rawestandin.

Di derbarê gelên Mezopotamyayî de bîbliyografya gernamên Ewrûpiyan

MEHMET BAYRAK

Serok û navdarê Kurd Selahedinê Eyûbî, li ser Seferên Xaçperestan bi rojavayîyan re dikeve têkiliyên zexm. Ev têkilî jî li ser şerên ku bi wan re kirine ye. Piştî van seferan Ewrûpayîyan; zêdetir jî piştî ronensans û reforma ss. a 16 an, bi hinek metodên cihêreng berê xwe dane Rojhilatê. Bêşik arasteyek weha jî, ji bo wan pir girîng bû. Lewra li vir, yanî li Rojhilatê dergûşa şaristaniyê Mezopotamya û dewama wê Kurdistan heye. Li ser vê yekê hatine Kurdistanê.

Ji vê yekê ye ku, ji sedsala 16'an heta niha di derbarê Pêşasya û Kurdistanê de, em rastî gelek seyahatnamên seyahên Ewrûpayî tîn. Mezopotamya, Kurdistan û Enedol di literatûra Ewrûpayê de zêdetir jî bi navê Pêşasya tîn naskirin. Ev seyahatname hingî diçe pirtir dibin, di sedsalên piştra jî zêdetir dibin. Lê di sedsala 19'an de digihîje tangeke mezin, pir zêde dibin. Ev seyahatname nêzikî dawîya sedsala 19'an digihîje tanga bilindtirin. Piştî vî heyamî, êdî lêgerîn û lêkolîn dikevin şûna seyahatnaman.

Ev lêgerîn; "Di Derbarê Mezopotamya û Kurdistanê de Bîbliyografya Seyahatnamên Ewrûpayîyan", weke ku dizanim, li ser vê yekê xebata pêşin e. Di vê xebatê de; seyahatnamên îngilîzî, fransîzî, almanî û îtalyanî hene.

Ev berhemên ku ketine vê bîbliyografyayê tev jî; ji ger û dîtin, bîranîn û raçavîyan (qerewilî) pêk hatine. Ji van, di çend pirtûk/seyahatnaman de her çîqas zêdetir li ser Îran û Ermenîstanê sekin hebe jî, ev jî bo kurdan jî girîng in, lewma navên wan jî ketiyê. Hindik bin jî, pirtûkên weke "Kurds, Turks and Arabs" a Edmonds jî ketine vê xebatê û ew jî xebatên di derbarê raçavî û lêkolînê de ne. Seyahatnamên din tev jî, yan rasterast li ser Kurdistan û Mezopotamyayê ne, yan jî him ev û him jî wekî din tevhev in.

Pir zelal dixwiyê ku; ev seyahatname ji bo dirok, erdnîgarî, diroka hunerê, civakzanî, etnolojî û çanda kurd pir girîng in. Ji bo kurdzanîyê ev berhem jî yê Osmanîyan û Safaviyan girîngtir in. Yê wan aligir in. Vaqaunusan (bûyernivîs) dirokên wan nivîsîne, ku ew jî wekî karmendên wan bûne. Ji ber vê yekê ye ku ji bo lêgerîn û lêkolînan ev seyahatnamên Ewrûpayîyan girîng in û çêtir in jî. Lê hema pirî van jî; ku xebatên mîs- yonerî ne; bi zanîn, raçavî û derxistinên

(veri) zanistî re, divê mirov wan bi awayê zanistî analîz jî bike. Ev yek bêgavî ye.

Piştî rojavayîyan "kurdzanî" dikeve destê zanyarên kurd û êdî bi destê wan rexistinî dibe. Di heyameke wiha de, ji ber ku ev bîbliyografya digihîje lêger û lêkolîn kurd, bawer dikim wê bibe alîkarê wan.

PIRTÛK

1. **Beauchamp, William F.:** Travels and Resarches in Asie Minor, Mesopotamia, Chaldea and Armenia (Li Asya Piçûk, Mezopotamya, Kalde û "Ermenîstanê Seyahat û Lêgerîn), 2 cîld, Londra-1842

2. **Beauchamp, William F.:** A Personal Narrative of the Euphrates Expedition (Li ser Gera Firatê, Çirokke Xweser), 2 cîld, Londra-1888

3. **Beauchamp, William F.:** Du Khorasan au pays der Bakhtiaris (Ji Xorasanê Heta Welatê Bextiyariyan), 4 cîld, Paris-1911

4. **Beauchamp, William F.:** Kirchen und Mocheen in Armenien und Kurdistan (Li "Ermenîstan û Kurdistanê Dêr û Mizgeft), Leipzig-1913

5. **Beauchamp, William F.:** The Nestorians and Their Rituals, With the Narrative of a Mission to Mesopotamia and Koordistan in 1842-1844, and of a Late Visit to those Contreis in 1850 (Di navbera Salên 1842-1844'an de Li Mezopotamya û Kurdistanê Tesira Gotinê Dînî; Nasturî û Edetên Wan, Di Sala 1850'an de Li Van Welatan Gereke Derengmayî), 2 cîld, Londra-1852

6. **Beauchamp, William F.:** Les surprises du Kurdistan (Surprîzên Kurdistanê), çapa 2., Paris-1945

7. **Beauchamp, William F.:** Auf den Spuren der Bagdadbahn (Li Ser Tesira Riya Tirêne ya Bexdayê), Weimer-1913

8. **Beauchamp, William F.:** Rerum secula quinta decima in Mesopotamia gestarum bibum (Li Ser Mezopotamyayê di s.s.'a 15'an de Pirtuka Tiştên Bûyî-Cûyî), Bratislava-1838

9. **Beauchamp, William F.:** Reconnaissances in Mesopotamia, Armenia, Kurdistan and Azerbaijan in 1885-1886 (Di

Salên 1885-1886'an de Li Mezopotamya, Kurdistan û Azerbeycanê Lêgerînên Stratejîk), Simla-1889

10. **Beauchamp, William F.:** Anatolien, Ceorien, Armenien, Kurdistan, Irak und Al-Dschesira (Anadol, Gurcistan, "Ermenîstan, Kurdistan û Cizîr/El-Cizîr)

11. **Beauchamp, William F.:** Viaggi in Armenia, Kurdistan e Lazistan (Li "Ermenîstan, Kurdistan û Lazistanê Ger), Milano-1863

12. **Beauchamp, William F.:** Au Kurdistan en Mesopotamie et en Perse (Li Kurdistan, Mezopotamya û Îranê), Paris-1887

13. **Beauchamp, William F.:** Journeys in Persia and Kurdistan (Li Îran û Kurdistanê Ger), 2 cîld, Londra-1891

14. **Beauchamp, William F.:** Die Stamme (Stemme) des nordlichen Kurdistan (Qebilên Rojhilatbakura Kurdistanê), Leipzig-1858/1862

15. **Beauchamp, William F.:** Travels in Luristan and Arabistan (Li Luristan û Erebitanê Ger), 2 cîld, Londra-1845

16. **Beauchamp, William F.:** Correspondance et Mémoires d'un voyagur en Orient (Li Ser Gera Xwe ya Rojhilatê, Bîranîn û Nêrinên Seyahêkê), Paris-1840

17. **Beauchamp, William F.:** Notes of a Jouney though a part of Kurdistan in the Summer of 1838 (Sala 1838'an, Encamên Gera Li Perçeke Kurdistanê), Londra.

18. **Beauchamp, William F.:** Transkaukasien und Ararat (transkafkasya û Ararat), Londra-1877

19. **Beauchamp, William F.:** The Tragediya of Mesopotamia (Trajedya Mezopotamya) Londra-1938

20. **Beauchamp, William F.:** Travels in Mesopotamia (Li Mezopotamyayê Ger), cilt 2, Londra-1827

21. **Beauchamp, William F.:** Das ehemalige Wilayet Dersim (Wilayeta Dêrsima Kevn), Viyana

22. **Beauchamp, William F.:** Les kurdes de l'ouest et leur pays dans les contrées au nord ouest de la Turquie asiatique (Welatên ku li Bakurrojavyê Turki-

- ya Asyayê Avabûne û Kurdên Rojava), Budapeste-1892
23. **Barnaby, Fred.** On Horseback through Asia Minor (Bi Hespê Seranser Gera Anadolê), cilt 2, Londra-1877
24. **Bushnell, A.S.** Travels into Turkey (Li Tirkîyê Ger), Londra-1744
25. **Carver, V.** Our Future highway/Travels in Syria and the Euphrate (Riya me ya Paşê/Li Geliyê Suriye û Firatê Ger), 2 cild, Londra-1880
26. **Carré, Abbé.** The Travels of Abbé Carré in India and the Near East 1672 to 1674 (Gerên Ku Abbé Carré di navbera salên 1672-1674'an de Li Pêş-Rojhilat û Hindistanê Kiriyê), 2 cild, Londra-1947
27. **Chambers, Francis Rawdon.** The Expedition for the Survey of the Rivers Euphrates and Tigris, Carried on by Order of the British Government, in the Years 1835, 1836 and 1837 (Di Salên 1835, 36, 37'an de Ser Xwestina Hukumeta Bîranyayê, Di Derheq Çemê Firat û Dicle de Rapora Gerê), 2 cild, Londra-1850
28. **Chastel, Ernest.** Exploration dans le Kurdistan et l'Arménie (Li Kurdistan û Ermenîstanê Lêkolîn)
29. **Chardin, Jean.** Sir John Chardin's Travels in Persia (Gera Îranê ya Sir John Chardin), Londra-1927
30. **Chardin, Jean.** Voyages du chev. Chardin en Perse et autres lieux de l'Orient (Li Îran û Welatên Rohhilat yê din Seyahatên Chardin), Amsterdam-1711
31. **Chézy, Armand-Pierre.** Arménie, Kurdistan et Mésopotamie (Ermenîstan, Kurdistan û Mezopotamya), Paris-1892
32. **Clayton, L.** The Mountains of Kurdistan (Çiyayên Kurdistanê), 1886-1888
33. **Clément, A.** Excursion dans le Kurdistan Ottoman, de Kerkuk'a Revanduzê (Ji Kerkukê heta Rewanduzê, Li Kurdistanê Erişên Osmanîyê), Paris-1866
34. **Clément, A.** Excursion dans le Kurdistan (Li Kurdistanê Ger), Cenevre-1860
35. **Cook, Frederick.** Yesterdays in Persia and Kurdistan (Li Îran û Kurdistanê Heyamê Çuyî), Claremont/Califfonia-1939
36. **Croft, James.** Armenia, Kurds and Turks (Ermenî, Kurd û Tirk), 2 cild, Londra-1880
37. **Croiset, Vital.** La Turquie d'Asie, géographie... (Asya Tirkîyê), 2 cild, Paris-1891
38. **Cross, H.** Journey in Kurdistan (Li Kurdistanê Ger), Londra-1910
39. **Cross, H.** Voyage en Perse Fait Dans les Années 1807, 1808 et 1809 en Traversant l'Anatolie et la Mésopotamie De Constantinople Jusqu'à l'extrémité du Golfe Persique et de l'Iran (Di Salên 1807, 1808 û 1809'an de Gera Ji Stenbolê heta Enebol, Mezopotamya û Dawiya Kerdava Besrayê; Ji Wir Ji ya Îranê), 2 cild, Paris-1819
40. **Edmonds, Cecil John.** Kurds, Turks, and Arabs (Kurd, Tirk û Ereb), Londra-1957
41. **Egiazaroff.** On a raft through the desert (Li Çoleke Şemirî), 2 cild, Londra-1881
42. **Foster, S.** Drei Jahre in Persien und Reisenabenteuer in Kurdistan (Li Îranê Sê Sal û Li Kurdistanê Gerê), 2 cild, Aachen-1842
43. **Fletcher, J.F.** Notes from Nineveh and Travels in Mesopotamia, Assyria and Syria (Ji Nînovayê Not, Li Mezopotamya û Suriyê Ger), Philadelphia-1850
44. **Fraser, J. Smith.** Travels in Kurdistan, Mesopotamia (Li Kurdistan û Mezopotamya Ger), Londra-1842
45. **Fraser, J. Smith.** A Winters Journey (Tatar) from Constantinople to Teher with Travels through Various Parts of Persia (Zivistanê Ji Stenbolê Rêktin û Di Hinek Ciyên Îranê ra Çûna Gera Teheranê), Londra-1838
46. **Gardane, F.A.** Journal d'un Voyage dans la Turquie d'Asie et le Perse fait en 1807 et 1808 (Di Salên 1807-1808'an de Rojana Gereke Li Îran û Enebolê), Paris-1809
47. **Garnier, Monte Singar.** Storia di un popolo ignoto (Çiyayê Sincarê / Dîroka Gelekî Nenas), Roma-1900
48. **Grant, Ashobah.** Life in Kurdistan (Li Kurdistanê Jiyân), 2 cild, Çap nebûye
49. **Grant, Ashobah.** The Nestorians / Travel in Ancient Assyria, Armenia, Media and Mesopotamia... (Nasturî/Li Asura Kevn, Ermenîstan, Med-
- ya û Mezopotamya Seyahat), Londra-1841
50. **Griffiths, R.P.** Travels in Europe, Asia Minor and Arabia 1785-1786 (Di Salên 1785-1786'an de Li Ewropa, Asya Piçûk û Erebistanê Ger), Londra-1805
51. **Haddad, Mir Asim.** The Insurrection in Mesopotamia-1920 (Di Sala 1920'an de Li Mezopotamya Jiyân), Londra-1922
52. **Hanilton, A.A.** Road through Kurdistan (Riya Li Ser Kurdistanê), Londra
53. **Hartman, Martin.** Botan (Botan), 1892
54. **Hay, W.R.** Two Years in Kurdistan, 1918-1920 (Li Kurdistanê Du Sal; 1918-1920), Londra-1921
55. **Heard, F.R. Mrs. Margaretha.** Kurds and Christians (Kurd û Xirîstiyân), Londra-1913
56. **Heintz, Hans.** Unter der Sonne des Orients/Durch Arabien Musten Zur Kalifenstadt am Tigris (Di Bin Tava Rohhilatê de/Ji Çolên Erebistanê Heta Bajarên Dora Dicle), Berlin
57. **de Hill, Hester.** Voyage en Turquie et en Perse (Li Îran û Tirkîyê Seyahat), Paris-1864
58. **Hildebrand, W.** Eine Karavanreise von Mosul nach Aleppo (Ji Mûsulê heta Helebê Rêwîtkê Karavanî), Gotha-1914
59. **Hildebrand, W.** From the Gulf to Ararat: An Expedition through Mesopotamia and Kurdistan (Ji Tengavê Heta Araratê: Di Mezopotamya û Kurdistanê re Derbasbûn), New York-1917
60. **Huntington, E.** The valley of the upper Euphrates river and its people (Geliyê Firata Jorîn û Gelê Vir), New York-1902
61. **Jacobert, P. Amédée.** Voyage en Arménie et en Perse (Li Ermenîstan û Îranê Ger), 2 cild, Paris-1805
62. **Jewel, W.** Twenty-five Years in Persia (Li Îranê Bîst û Pênc Sal), Chicago-1898
63. **Jules, Leclercq.** Voyage au Mont Ararat (Li Çiyayê Agiriyê Ger), Paris-1892
64. **Klunzsch, John Theodor.** Voyage dans l'Asie Mineure et le Kurdistan (Li Kurdistan û Asya Piçûk Ger), 2 cild, Paris-1813

- 66. Kinnear, John Macleod: Journey through Asia Minor, Armenia and Koordistan in the Years 1813-14 (Di Salên 1813-1814'an de Li Asya Piçûk, Ermenîstan û Kurdîstanê Ger), Londra-1818
- 66. Kippel, Ernst: Unter Druzen, Kurden und Teufels-ambetern (Li Nav Durzî, Kurd û Şeytanparêzan), Berlin-1926
- 67. Kutschy: Reisen in Anatolien, Cypren, Tauris, Syrien und Kurdistan 1840-1862 (Di Salên 1840-1862'an de Li Anadol, Qibris, Toros, Suriye û Kurdîstanê Ger), Viyana
- 68. Layard, Austin Henry: Discoveries in the Ruins of Nineveh and Babylon with Travels in Armenia, Kurdistan and Desert (Li Ermenîstan, Kurdistan û Berrîyê(Çol) Ger; Li Nînova û Babîlonyayê jî Lêgerîn û Lêkolîn), 2 cîld, New York-1856
- 69. Lenzenowski, George: Russia and the west in Iran 1918-1948 (Di Salên 1918-1948'an de , Li Ûris û rojavayê Îranê), Londra-1949
- 70. Lewis, Harry G.: Mosul and its Minorities (Musil û Gelên Hindik yên Wir), Londra-1925
- 71. Maclean, E.W.: Ancient Nestorian Church and its Present Influence in Kurdistan (Dêra Nasturiyan ya Kevn û Paşê Li Kurdîstanê Tesira Wê), 2 cîld, 1911
- 72. Marsh, Dwight Whitney: The Tennesseean in Persia and Kurdistan (Li Îran û Kurdîstanê Tennesseeyî /Emerikayî), Philadelphia-1869
- 73. Marshall, F.: Kurdistan, Londra-1804
- 74. Mathews, Henry: La Turquie et ses différents peuples (Tirkîye û Gelên Wê) 2 cîld, Paris-1857
- 75. Michaud, Francois: Correspondance d'Orient (Namên Rojhilatê 1830,1831), Paris-1833-1835
- 76. Mitchell, Frederick: Wild Life among the Koords (Li Nav Kurdan Jiyana Hovî), Londra-1870
- 77. Moberly, Frederick James: The Campaign in Mesopotamia (Li Mezopotamyayê Şer), 4 cîld, Londra-1927
- 78. Montagu, William: Kars and Erzeroum with the Campaigns of Prince Paski ewitch in 1828 and 1829 (Di Salên 1828-29'an de Bi Bajarên Qers û Erziromê re Şerê Prens Paskevîç), Londra-1856
- 79. Montgomery, J.S.: A Study of Military Operation in Eastern Anatolia (Xebateke Li Ser Operasiyona Eskerî ya ku li Rojhilatê Anadolê bûye), Princeton-1952
- 80. Montagu, William: Das Land und Volk der Kurden (Gelê Kurd û Welatê Wan) 2 cîld, Berlin-1892 (Bi Tirkî kurteçapa wê: Türkiye Mekturlari, İstanbul-1964)
- 81. Morgan, J.S.: Mission scientifique en Perse (Li Îranê Mîsyona Zanistî), Paris-1904
- 82. Morier, James: A Journey through Persia, Armenia and Asia Minor to Costantinople in the Years 1808-1809 (Di Salên 1808-1809'an de jî Îranê, di ser Ermenîstan û Enebolê re Hatina Stenbolê), Londra-1812(Çapa nû; Berlin-1985)
- 83. Morier, James: Second Voyage en Perse en Armenie et dans l'Asie Mineure fait de 1810 a 1816, Paris-1818
- 84. Morrison: A thousand miles on horse-back through the valley of the Euphrat (Bi Hespê Li Deştê Firatê Hezar Mîl), New York- 1897
- 85. Mowbray, W.: Pitiful Plight of the Assirian Christians in Persia and Kurdistan (Li Îran û Kurdîstanê Trajediya Asuriyên Xirîstîyan) New York-1916
- 86. Noel, Edward William: Diaries: Diary of Major E.W.Noel, CIE, DSO, on Special Duty in Kurdistan from June 14 th to September 21st, 1919 (Di Navbera 14 Heziran-21 Îlona 1919'an de Li Kurdîstanê Ger), Besra-1920
- 87. Noth: Reise nach Innerarabien, Kurdistan und Armenien (Li Erebiştan, Kurdistan û Ermenîstanê Rêwîti), Braunschweig-1895
- 88. Oppert, Jules: Expedition scientifique en Mesopotamie (Li Mezopotamyayê Gera Zanistî), 2 cîld, Paris-1859
- 89. Percy, H.A.S. Lord: Highlands of Asiatic Turkey (Ciyên Çiya yên Tirkîya Asyayê), Londra-1901
- 90. Perkins, Justin: A Residence of Eight Years in Persia, among the Nestorian Christians with Notices of the Muhemmedans (Li Îranê, nav Nasturiyên Fileh Heşt Sal û Li Ser Muslimanan jî Not), New York-1845
- 91. Petronian, M.: Reisen im Orient (Li Rojhilatê Ger), Leipzig-1865
- 92. Pericault, M. Sebastian: Voyage dans l'Asie Mineure en Mesopotamie, a Palmyre en Syrie et en Palestine et en Egypte 1836-1837 (Di Salên 1836-1837'an de Li Asya Piçûk Mezopotamiya, Palmîr, Suriye û Filistinê Ger), 2 cîld, Paris-1840/1841
- 93. Perrot, Louis: Reisen in Kurdistan (Li Kurdîstanê Rêwîti), Berlin-1883
- 94. Perrot, Louis: Itinerary into the Eastern Countrees, as Syria, Palestine, or the Holy Land, Armenia, Mesopotamia, Assyria, Chaldea (Li Welatên Rojhilatê; Weke Suriye, Welatê Pîroz Filistin, Ermenîstan, Mezopotamiya, Asur û Kalde Ger), Londra-1693
- 95. Rich, Charles J.: Narrative of a Residence in Koordistan and on the Site of Ancient Nineveh (Çiroka ku ez heta li Kurdistan û Kelefên(xirabe) Nînovaya Kevn mam), 2 cîld, Londra -1836
- 96. Rich, Charles J.: Notes on Kurdistan (Li Ser Kurdîstanê Not), Londra 1836
- 97. Riley: Christians and Kurds in eastern Turkey (Li Rojhilata Tirkîyê Xirîstîyan û Kurd), Londra-1889
- 98. Rieu, Charles: Hatt-i Saltanat (Rêhesina Bexdayê), İstanbul-1331(1915)
- 99. Rieu, Charles: Reise in Syrien und Mesopotamie (Li Mezopotamiya û Suriyê Ger), Leipzig-1883
- 100. Rieu, Charles: Am Euphrat und Tigris (Li Ser Firat û Dîclê), Leipzig 1900
- 101. Sandberg, G.: Über die Reise von Herrn Burchardt nach Kurdistan (Li Ser Gera Burchardt ya Kurdîstanê), Berlin-1896
- 102. Sandberg, G.: Reise nach Mosul und durch Kurdistan nach Urmi-a (Ji Musilê Ser Kurdîstanê re Rêwîtiya Urmiyê), Stuttgart
- 103. Stein, Mary: Glimpses of Life and Manners in Persia (Li Îranê Jiyana û di Derheq Edetan de Dîtin), Londra-1856
- 104. Simon (Simeon) Simeon S.A.S.: Polonyali Simeon'un Seyahatnamesi (XVII.yy), (Di ss'a 17'an de Seyahatnama Simonê Polonyayê), İstanbul-1964
- 105. Simon, Simeon: Armenie, Kur-

- distan, Mesopotamie (Ermenistan, Kurdistan û Mezopotamya), Paris-1882
- 108- *Siemens P. Müller-Hyvernat, H.*: Du Caucase au Golfe Persique a travers l'Armenie le Kurdistan et la Mésopotamie (Ji Ermenistan û Kendava İrânê Gera Kurdistan û Mezopotamyayê), Paris/Lyon-1892
- 109- *Seaton, E.S.*: Two Years in Kurdistan (Li Kurdistanê Du Sal), Boston-1908
- 110- *Seaton, E.S.*: To Mesopotamia and Kurdistan in Disguise (Bi Girêdana / Kincên Fermî Çûna Mezopotamya û Kurdistanê), Londra-1912
- 111- *Seatzger, Horatio*: Narrative of a Tour throgh Armenia, Kurdistan, Persia and Mesopotamia/with Observations on the Condition of Mohemedanism and Christianity in Thosa Contries (Çiroka Gereke Li Ermenistan, Kurdistan, İrân û Mezopotamyayê û Li Van Welatan Rewşa Xiristiyani û Muslîmantiyê), 2 cild, Londra-1840
- 112- *Seiderer, Gustav Theodor*: Narrative of the Revival of Religion among the Nestorians of Persia (Çiroka Ronesansa Dînî Li Nav Nasturiyên İrânê), Boston-1848
- 113- *Seykes, Mark*: Journeys in North Mesopotamia (Li Mezopotamya Bakur Ger), Londra-1907
- 114- *Sykes, Mark*: Daru'l-İslam/A Record trough of the Asiatic of Turkey (Welatê İslamê/Li Tirkîya Asyayê Lêgerînek), Çapa nû: Londra-1988
- 115- *Tavernier, J.B.*: Les six voyages de J.B. Tavernier (Şeş Gerên Tavernier), Lahey-1718
- 116- *Taylor, John*: Travels in Kurdistan (Li Kurdistanê Ger), Londra-1865
- 117- *Taylor, John*: Jourjnal of a tour in Armenia, Kurdistan..., (Çiroka Gera Li Ermenistan û Kurdistanê), Londra-1868
- 118- *Thévenot, Jean des Voyages de M. Thévanos* (Seyahatên Thévanos), Paris-1689
- 119- *Thomaschek*: Sasun und das Quellengebien des Tigris (Bingeha Sason û Diclê), Viyana-1895
- 120- *Turak, Henry F.*: Turkish Armenia and Eastern Asia Minor (Ermenistana Tirkîyê û Rojhilata Anadolê), Londra-1881
- 121- *Turkân, J.A.*: Letters on Turkey (Namên Tirkîyê), 2 cild, Londra-1857
- 122- *Wagner, Moritz*: Reise nach Persien und dem Lande der Kurden (Gera İrân û Welatê Kurdan), 2 cild, Leipzig-1852
- 123- *Wigram, W.A. Wigram, George F.A.*: The Cradle of Mankind, Life in Eastern Kurdistan (Li Rojhilata Kurdistanê Jiyan û Hebûna Mirvatîyê), Londra-1914
- 124- *Wigram, W.A.*: The Assiyrans and their Neighbourse (Asurî û Cinarên Wan) Londra-1929
- 125- *Wissouroudi*: Loyalties in Mesopotamia, 1914-1917 (Li Mezopotamyayê Sedeqet, 1914-1917), Oxford-1930
- 126- *Wissouroudi Y.*: Mesopotamia, 1917-1920 (Mezopotamya, 1917-1920), Londra- 1931
- 127- *Wussek*: Reise in Kurdistan (Rêwîtiya Kurdistanê), Viyana-1883
- 128- *Wussek*: Meine Reise in Armenien und Kurdistan (Gera min ya Kurdistan û Ermenistanê), Viyana-1884
- 129- *Yerkes*: A Journey in the valley of the Upper Euphrate (Gerek Li Gelîyê Jora Firatê), Londra-1896

NIVÎS

- 1- *Misrahi, William*: Notes Taken on a Journey from Constantinople to Mosul in 1839-1840 (Di Salên 1839-1840'an de Li Ser Seyahata Ji Stenbolê Heta Musilê, Notên Hatine Girtin), Journal of the Royal Geographical Society, X(1841), rp. 498-529
- 2- *Bausse, Ewald*: Durch Norden Mesopotamiens (Di Mezopotamya Bakur re Çûn), Petermanns Mitteilungen, LVII, B.I, Gotha, 1911, rp. 119-172
- 3- *Bausse, Ewald Am Empirat* (Li Ser Firatê), Deutsche Rundschau für Geographie, XXXV, Viyana, 1913, rp. 466-529
- 4- *Becker, L.*: Reise von Basra durch Mesopotamien nach Mosu (Ji Besrayê Heta Musilê Rêwîtiya Mezopotamyayê), Globus, XVII, Braunschweig, 1870, rp.121-126
- 5- *Becker, L.*: Einekaravanreise von Mosul nach Aleppo (Ji Musil Heta Helebê Rêwîtiya Kewranekî), Globus, LXIII û LXIV, Braunschweig, 1873, rp. 172-184

- 6- *Beck, W.*: Untersuchungen und Reisen in Transkaukasien, Hoch-Armenien und Kurdistan (Li Transkafkasya, Ermenistana Jorîn û Kurdistanê Ger û Lêkolîn), Globus, LXIII û LXIV, Braunschweig, 189
- 7- *Beck, W. Lehmann, G.F.*: Reise-reife von der Armenischen Expedition (Di Derheq Mefiya Ermenîyan de Namên Rêwîtiyê), Mitteilungen des Geographisches Gessellschaft, Hamburg, 1898-1899, cild-15/16
- 8- *Beck, W. Lehmann, G.F.*: Reisebericht Über eine Forschungsreise in Kleinasien (Notên Rêwîtiya Gera Lêgerîna Ser Asya Piçûk), Werh.d.Ber-Anthr.Ges.1901
- 9- *Becker, L.*: On Part of Mesopotamia contained between Sheriat el-Beyt on the Tigris and Tel-İbrahim (Perça Di Navbera Şeriat El-Beyta Dora Diclê Mezopotamyayê û Tel-İbrahim), Journal of Royal Geographical Society, XXXVII, Londra-1867, rp. 160-172
- 10- *Beck, G.*: Reisen im Orient (Li Rojhilatnavînê Ger), Zeitschrift für algemai Erdkunde, Berlin-1861, cild:10
- 11- *Beck, G.*: Von Urumia-See nach dem Wan-See (Ji Gola Urmiyê Heta Behra Wanê) Zeitschrift der Deutschen Morgenlandischen Gesellschaft, 1858, XII û 1862, XVII
- 12- *De Bode, G.A.*: Extarcts from a Journal Kept While Traveling in January 1842 through the Country of the Mamaseni and Kohgilu/Bakhtiyari (Di Zivistana Sala 1842'an de Notên Gera ku li Mamasenî û Kohgilu-bûye), Journal of the Royal Geographical Society, XIII(1843)
- 13- *Ernst, J.*: Notes of a Journy through a Part of Kurdistan, in the Summer of 1838 (Di Havîna 1838'an de Notên Gera li Perçeke Kurdistanê) Journal of the Royal Geographical Society, X(1841), rp. 341-434
- 14- *Carre de Vassilharov*: Notice sur les Kurdes (Di Derheq Kurdan de Kurtenot), Revue de l'Orient Chrétien, T.I (1896)
- 15- *Chavira, Ernest*: Exploration dans le Kurdistan et l'Armenie (Li Kurdistan û Ermenistanê Qerewilî), Congres des Soc. Francs. de Geolion- 1881, rp. 209-217
- 16- *Clissot, Bertram*: Journey in Kurdistan (Li Kurdistanê Ger), Journal of the Royal Geographical Society, Londra-1910

1. A Visit to the Sinjar hills in 1838 (Di Sala 1838'an de Li Çiyayên Sincarê Gerek), Journal of the Royal Geographical Society, 9, 1839, rp. 409-430
2. E.ine Topographische-Historische Studie (Botan: Lêgerîneke Dîrokî û Topografîk), Mitteilungen der Vorderasiatischen Gesellschaft, 1896
3. Bergnomaden und Yaylabauern im Mitleren Kurdischer Taurus (Li Torosên Kurdan Koçer û Zozanvani), Dissertation Marburger Geographische Schriften, Marburg, 1959 20-Lees, G.M.: Two Years in South Kurdistan (Li Kurdistanê Başur Du Sal), Journey of the Royal Central Asian Society, XV, BL, III, (1928) rp. 253-277
4. Central Kurdistan (Kurdistanê Navendî), Geographical Journal, LIV, No: 6 (1919), rp. 329-347
5. Central Kurdistan (Nava/Navenda Kurdistanê), The Geographical Journal, 18 (1901), rp. 121-144
6. A Journey in Dersim (Li Dêrsimê Gerek), Geographical Journal, XLIV, No:1 (Temuz-1914)
7. Journal of a Tour from Oromiah to Mosul through the Kudish Mountains, and a Vistin to the Ruins of Niniveh (Ji Urmîyê Heta Musilê; Notên Li Ser Gera Kelefên Nînova û Çiyayên Kurd û xerbên Nînoveyê), Journal of the American Oriental Society, I-1(1851), rp.69-119
8. Les Kurdes de Haimaneh (Kurdên Haymanayê-Enqere), Dans le Revue des Deux Mondes, Sibat-1865
9. Through Iraqi Kurdistan (Ji Kurdistanê Iraqê), The Manchester Guardian Weekly, LXI-II, No: 19 (1950)
10. Der Bin-Gol Dağ, der Tausundseenberg, das quellgebiet des Araz (Çiyayê Bîngolê, Ciyê Derketina Arasê), P.M. 1877
11. Reisen im armenischen Hochland, ausgef. im Sommer 1871. Die quellen des Aras, Firat und Tschorok (Di Sala 1871'an de Li Zozanên Ermenîstanê Ger. Derketinên Aras, Firat û Çoruxê), P.M. 1875
12. Notes on a Journey from Tabriz, through Persien Kurdistan to the Ruins of Takhti-Soleiman (Notên Gera ji Tewrêzê û ser Kurdistanê Îranê re, ku derbasî Textê Silêmaniyê dibe), Journal of the Geographical Society, X (1841, rp.1-158
13. Notes on a Journey from Tabriz through Kurdistan, via Van, Bitlis, Se'ert and Erbil to Suleymaniyeh, in July and August 1836 (Di Tebax û Temuza Sala 1836'an de; Notên Li Ser Gera Bajareh Kurdistanê Wan, Bilîs, Erbil û Silêmaniyê), The Journal of the Royal Geographical Society, 8(1839), rp. 54-101
14. A Visit to the Kurds (Li Kurdan Dîtinayik), New Times, No: 24/1949, rp. 23-28
15. A Visit to the Kurds (Li Kurdan Dîtinayek), New Times, No: 25/1949, rp. 23-26
16. Travels in Kurdistan, with Notices of the Sources of the Eastern and Western Tigris and Ancient Ruins in the Neigh borhood (Bi Notên Ser Kelefên Nêzikî Rohilat û Başûra Çemê Dicle, Gerên Kurdistanê), Journal of the Royal Geographic Society, XXXV (1865), rp. 21
17. Journal of ano yage in Armenia, Kurdistan und Upper Mesopotamia, with Notes of Resarches in the Deyrsim Dagħ in 1866 (Li Ser Gera Ermenîstan, Kurdistan û Mezopotamya Jorîn Not û Lêgerîn), Journal of the Royal Geographical Society, XXXVIII, Londra, 1868
18. Kurden und Armenien (Kurd û Ermenî), Deutsche Rundschau, 1, XXXVI, 1896
19. Northern Iraq and Its Peoples (Bakura Iraqê û Gelên Wê), Journal of the Royal Central Asian Society, XXIV, Bb. I-I, Nisan-1937, rp. 287-299
20. Meine Reise nach Armenien und Kurdistan (Li Ermenîstan û Kurdistanê Gera Min), Mitteilungen der Geographischen Gesellschaft, jimar: XXVI, Viyana-1883
21. Voyage dans le Mésopotamie...(Li Mezopotamyayê Ger), Bulletin de la Société de Géographie, Paris, 1827, VII, rp. 163
22. Reisen in Mesopotamien... (Li Mezopotamyayê Ger), Magazin der merkwürdigen Reisebeschreibungen, Berlin-1838
23. Essai sur les Kurdes et les Yézidis du Gouvernement d'Erivan Kasan, 1888
24. Meine Vorderasienexpedition 1906 und 1907 (Di Salên 1906 û 1907'an de, Di Derheq Pêşasyayê de Lêgerînên min), 2 cîld, Leipzig-1911
25. Des gleichen derjenigen Volker, welche unter dem osmanisch Schutze stehen, als Griechen, Armenier, Araber, Drusen, Kurden, Jezden, Tatar, Wallachen, Moldauer; Viyana, 1788
26. Voyage de la Côte de Malabar a Constanople par le Golfe Persique, l'Arabie, la Mésopotamie, le Kurdistan et la Turquie d'Asie fait en 1817, Paris, 1820
27. Voyage dans l'Empire Otthoman, l'Egypte et la Perse fait pa'ordre du Gouvernement, pendant les six premières années de la République, 6 cîld, Paris-1801/1807
28. Travels in Georgia, Persia, Armenia, Ancient Babylonie... during the years 1817,1818,1819 and 1820, 2 cîld, Londra-1827
29. Extrait d'un Itinéraire de Haleb a Moussoul par la voie du Dzéziré, Paris-1823
30. Derzeitige Derzeitige, Ingenieur Josef Cerniks technische Studien - Expedition durch die Gebiete des Euphrat und Tigris nebs den Ein- und Ausgangs-Routen durh Nord- Syrien, Gotha-1875
31. Voyage de Constantinopole a Bassora en 1781 par le Tigres et l'Euphrate, et retour a Constantinople en 1782 par le Désert et Alexandrie, Paris-1798
32. Description de l'Arménie, la Perse et la Mésopotamie, publiée sous les auspices des ministres de l'Interieur et da l'Instruction publique, 2 cîld, Paris-1842/1852
33. Joseph Platon Relation d'un voyage du Levant, contenant l'histoire ancienne et moderne... de l'Arménie, de la Gergie, des frontières de Perse et l'Asie Mineure, 2 cîld, Amsterdam-1718
34. Reise nach dem Ararat, Stuttgart-1848

NIVÎS/PIRTUKÊN DIN

Derheqê Rastnuştêna Kırdkî (Kirmanckî) de Kombiyayîşê Stockholmî

CEMİL GÜNDOĞAN

Roja diyina aşma tebaxe (menga agustose) de, Stockholm de, Kırdkî, kirmanckî, dimilkî, zazakî) ser o kombiyayîşê dest pêkerd û hîrê rojî (2-3-4 ê tebaxe) ramit. Komeleya Nuştexanê Kurdan-Swêd de (Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê) no kombiyayîş amade kerdbî. Kombiyayîşê Stockholmî de nê pancês kesî amade bîy:

Said Aydoğmuş (Pîran)
Osman Aytar (Sêwregî)
Mûnzûr Çem (Dêrsim)
Memo Darrêz (Bongilan)
Haydar Diljen (Sêwregî)
Nihat Elî (Sêwregî)
J. Espar (Pîran)
Cemil Gündoğan (Dêrsim)
Lerzan Jandîl (Gimgim)
Çeko Kocadağ (Gimgim)
M. Malmîsanîj (Pîran)
Selîm Mûrat (Palu)
Kamer Söylemez (Dêrsim)
Kazım Temürlekn (Dêrsim)
Harun Turgut (Palu)

Bêguman no kombiyayîş wareyê zıwanê kurdî de û hîna zaf zî wareyê lehçeya kurdî / kirmanckî de gamêda mûhîm a. Nê kesan no kombiyayîş de rastnuştêna kurdî ser o meylê xwî tesbît kerdî. Nê kombiyayîşê de meselanê cêrînan ser o yew bi yew û derg û dila manuşey bîy. Şima nê nuştî de netîceyanê nê munaqeseyan û meylan wanenê. Netîceyê ke ze meyl tesbît bîyê, fikrê vêşaneyê (zafaneyê) nê kesan ifade kenê. Nê, ze tewsiye û teklîfî yê. Keso ke biwazo şîno zey nê meylan binuso.

Tanî çeku (kelhîme) yan zî formê çekuyan ê ke ma no nuşte de ze nimûne nuştê, tanî mîntaqayan de ci-

ya yê.

1) Herfî

Herfê elfaba ewroyin a kurdî nê 31 herfî yê:

A B C D E Ê F G H I Î J K L M
N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z
a b c ç d e ê f g h i j k l m n o p
q r s ş t u û v w x y z

Tanî nuştexî nuştexanê xwî de herfanê zey “Û” û “Ğ” nusênê yan zî herinda herfa eyn a erebkî de îşaretê apostrofî (‘) ronanê. Madem ke elfaba kurdî de çinî yê, ganî nê herfî û îşaretî nêre nuştene. Ma vajî, ganî herinda “ğerîb” î de “xerîb”, herinda “Hezretê ‘Elî” de “Hezretê Elî” binusiyo (bêro nuştene).

2) -an

Kırdkî de, tanî cayan de, herinda “-an”î de “-ûn”, “on”, “-û” yan zî “-o” vajiyêno. Herinda “-am”î de zî tanî cayan de “-ûm” yan zî “-om” vajiyêno. Labelê nuştene de ganî e-be formanê “-an” û “am” î binusiyo. Çend nimûney:

Meylê kombiyayîşî: mangan, dewan, banan, zanayan

Formê bînî: mûngûn / mongon / mûngû / mongo, dewûn / dewon/dewû/dewo, bûnûn/bonon/bûnû/bono, zûnayûn/zonayon/zûnayû/zonayo

3) -am

Meylê kombiyayîşî: cam, dame, lamba, name, tam, tamam, zama

Formê bînî: cûm/com, dûme/dome, lûmba/ lomba, nûme/nome, tûm/tom, .temûm/temom, zûma/zoma

4) Tarixî

Tanî nuştexî nuştêna tarîxan de îşaretê - yan zî apostrof (‘) xebitenê (gurênenê). Meylê kombiyayîşî aw o ke tarixî bê nê îşaretan binusiye.

Meylê kombiyayîşî: 25ê aşma nî-

sane / 25ê aşma nîsani, lê gulane, 17ê temmuze

Formê bînî: 25-ê aşma nîsane, 1-ê gulane, 17-ê temmuze

25’ê aşma Nîsane, 1’ê Gulane, 17’ê Temmuze

5) Kilmnuştene (abbreviation)

Çekuyan yan zî nameyanê kilmkerdeyan dim a apostrof esto. Labelê herfane kilmerdeyan dim a nuqta nêronêna. Nimûne:

Meylê kombiyayîşî: Kesê welatperwerî lejê YNK’î û PDK’î nêwazenê.

Formê bînî: Kesê welatperwerî lejê Y.N.K-î û P.D.K-î nêwazenê.

Kesê welatperwerî lejê Y.N.K-î û P.D.K-î nêwazenê.

Kesê welatperwerî lejê Y.N.K’î û P.D.K’î nêwazenê.

1-NAME

Nuştoxê kirdan/kirmancan ewro tanî nameyan ebi forman û çekuyanê ciya-ciyayan nusênê. Cêr ra ma derheqê tani nameyan de meylê kombiyayîşî nusênê:

1) nameyê rojan

Nameyê rojan ebi herfa werdî (qîce) dest pêkenê û wina nusiyênê:

Kırdkî/kirmanckî: şeme, yewşeme, dişeme, sêşeme, çarşeme, panşeme, îne

Tirkî: cumartesi, pazar, pazartesi, salı, çarşamba, perşembe, cuma

2) nameyê mewsiman

Nameyê mewsiman wina nusiyênê:

Kırdkî/kirmanckî: wisar, hamnan, payız, zimistan

Tirkî: ilkbahar, yaz, sonbahar, kış

3) nameyê qıtayan (kontinentan)

Nameyê qıtayan ebi herfa girde dest pêkenê û wina nusiyênê: Asya,

Ewropa, Amerîka, Afrîka, Awustralya, Antarktika

4) Nameyê şaristananê (bacaranê) Kurdistanî

Ze prensîp, nameyê şaristananê Kurdistanî, zey vatişê şarê aw (ay) şaristanî nusiyênê. Nimûne: Dêrsim, Gimgim, Bongilan, Diyarbekir, Mêrdîn.

5) nameyê ziwanan û lehçeyan

Nameyê ziwanan û lehçeyan ebi herfa werdi dest pêkenê.

Nimûne: kirdkî/kirmanckî/dimilki/zazakî, kurdki, tirkî, fariskî, frenskî, îngilizkî

6) nameyê dînan û mezheban

Nameyê dînan û mezheban ebi herfa werdi dest pêkenê.

Nimûne: misilmanîye/misilmaney, xiristîyanîye/xiristîyaney, yahudênî/cihudey, elewîyênî/elewîyey, katolikênî/katolîkey

7) nameyê mensûbanê milletan

Nameyê mensûbanê milletan ebi herfa werdi dest pêkenê. Nimûne:

O kurd o

A tirk a.

No lajek alman o.

Nê keynekî ereb ê.

Sifet û zerrê ke nameyanê milletan û dewletan ra viraziyênê zî ebi herfa werdi dest pêkenê. Nimûne:

Keyneka kurde (kurdi) kirdkî wend keyneka tirke (tirkî) tirkî wend.

Tanî xortê kurdperwerî ewro zîndan de yê.

Gelek unîversîteyan de îronolojî esto labelê kurdolojî çinê yo.

8) nameyê mensûbane şaristanan

Nameyê kesane mensûbanê şaristanan, mensûbanê dewletan û milletan ebi herfa werdi dest pêkenê. Nimûne:

O pîranij o.

A dêrsimij a.

No lajek îranij o.

Nê keynekî gürcistanij ê.

Seyîd Riza dêrsimij (dêrsimiz) bî.

Ehmedê Xasî yo ke kitabo kirdkî-yo verên nuştê hezanij bî.

Not: Herinda “-ij” î de tanî cayan de “-ic” yan zî “-iz” zî vajiyêno. Nimûne: dêrsimiz, pîranic, çewlîgic/çolîgic.

Sifet û zerrê ke nameyanê şaristanan ra viraziyênê zî ebi herfa werdi dest pêkenê. Nimûne:

Gedeyîya mi de mûndîya lawure Pîran de biqîmet bî. (Çekuyê “lawure”, nameyê şaristanê, “Lahor” î ra yena.)

Ma hete camêrdan di tewir şalwarê siyay xwi pay kerdênê, tewiro yew qeremendû aw bîn zî awrûpa bi; labelê awrûpa hîna vay bi.

9) nameyê kesane xerîban

Nameyê kesane xerîban ke orjînalê xwi ebi elfabeya latînî nusiyênê -ma vajî nameyê ewropayijan û amerîkayijan-, zey orjînalê nê nameyan nusiyênê, teleffuzê yî-nî parantezan miyan de nusiyênê.

Nimûne: Rene Descartes (Rône Dekart), Shakespeare (Şekspîr), George Bush (Corc Bûş)

Nameyê kesane orisan, ereban, farisan... ke orjînalê xwi ebi elfabeya krîlkî, erebkî/fariskî... nusiyênê, zey teleffuzê nê nameyan nusiyênê.

Nimûne: Gorbaçov, İbnî Xeldûn, Sedîyê Şirazî

Nameyê kesane misilmanan û şarê Rojhelatê Miyanîni (Ortadoğu) zey teleffuzbiyayena nê naman nusiyênê. Hafiz Esed, Seddam Huseyn, Mehmed Derwîş, Xumeynî, Muhemmed İqbal.

Eger îmkanê nuştene orjînalê naman ê xerîban-hetê herfan ra çinê bo, aw wext herfê nîzdîyê nê herfanê xerîban tercîh benê. Ma vajî herinda “Kungstradgarden” î -ke nameyêdo îsveçkî (swêdkî) yo-de merdim şîno binuso “Kungstradgarden”. Çimkî herfê “a” û “a” Kurdkî de çinîyê û beno ki daktîloyê Kurdan de zî çinê bî.

10) nameyê kitabane nuşteyan

Her herfa verîn a her çekuyê kitabane yan zî nuşteyan (yazîyan) gird nusiyêna, labelê nê nameyan de herfa verîn a edatan û konjunksiyonan (conjonction, bağlaç) gird bunusiyo zî beno, werdi binusiyo zî beno. Ma vajî nameyê kitabane

Mûnzûr Çem, J. Espar û Qemerê Alî wina nusiyênê: Hotay Serra Usifê Qurzkizî, Tanî Estanikî û Deyîrê Ma, Adîr û Asme.

II-FİİL

Kirdkî de yew fîl esto ke tamam niyo, zek erebkî de vajiyêno “fîlo naqis” o yanî “fîlo nêmcet” o, tena demeyê nikayine (present) de anciyêno. Nameyan, zemîran yan zî sifetan dim a yeno, menayêda newa dano yîni. Muqabilê nê fîlî frenskî de “être”, İngilizkî de “to be” yo.

Ganî nuştux xwi vîrî nêko ke fîlo corîn zemîran, sifetan û nameyan ra ciya nusiyêno. Tiya de ma çend nimûneyan nusenê:

ez a

ti yî

ti ya

o yo

a ya

ma yê

şima yê

ê yê

Ez kurd a.

Ti kurd î.

Ti kurd a.

O/yû kurd o.

A/ya kurd a.

Ma kurd ê.

Şima kurd ê.

Ê/yê kurd ê.

Ez gird a.

Ti pîl î.

Aw / ay defter o.

A qelem a.

Ma zaf ê.

Şima tanî yê.

Ê zanaye yê.

Menfiyê (negation) nê fîlî

ez nîya, ez nêbiya, ez nêbibîya
ti nîyî, ti nêbî, ti nêbibî
ti nîya, ti nêbiya, ti nêbibîya
o nîya, o nêbî, o nêbibî
a nîya, a nêbî, a nêbibî

ma nîyê, ma nêbiyê, ma nêbibîyê
şima nîyê, şima nêbiyê, şima nêbibîyê
ê nîyê, ê nêbiyê, ê nêbibîyê

Ganî ma naye zî vajî ke him zemîrê şexsî him zî antişê (conjugai-

son) nê fiilî ca ra ca ferq kenê. Ma vajî şîweya Dêrsimî de wina yê:

ez ûne/ez o/ez û/ez a
ti ya
o wo
a wa
ma yîmê
sima yê/şima yê
ê/î yê

Ez kurd ûne.
Ti kurd a.
O kurd o.
A kurd a.

Ma kurd îme.
Sima/şima kurd ê.
Ê/yê kurd ê.

Ez gird ûne.
Ti pîl a.
O defter o.
A qelem a.

Ma zaf îme.
Sima/şima senik ê.
Ê zanaye yê.

Menşiyê (negation) nê fiilî
ez nîyûne, ez nêbîyûne, ez nêbî-
vîyûne
ti nîya, ti nêbîya, ti nêbîviya
o nîyo, o nêbî, o nêbîvî
a nîya, a nêbiye, a nêbîvî

ma nîme, ma nêbîme, ma nêbîvî-
me
sima/şima nîyê, sima/şima
nêbîyê, sima/şima nêbîvî
'he/yênîyê, ê/yê nêbîyê, ê/yênêbî-
vîyê

Herçiqas ke no fiilo corîn fiilê
"bîyene" / "bîyayene" maneno zî
no "bîyene" / "bîyayene" niyo,
yewna fiil o. Muqabilê fiilê "bîye-
ne" / "bîyayene" frenskî de "deve-
nir", îngilizkî de "to become" o û
wina ancîyêno:

bîyene/bîyayene/bîyayîş
ez bena / ez beno
ti benî
ti bena
o/yû beno
a/ya bena

ma benê
şima benê

ê/yê benê

Şîweya Dêrsimî de
ez benû/ez beno/ez bena/ez ben
ti bena
o beno
a bena
ma beme
sima/şima benê
ê/yê benê

Fîilo piyabeste

Fîilo piyabeste (verbe compose,
bileşik fiil) çend tewirî yo. Cêr ra
ma meylê kombiyayîşî gore nuşte-
na nê tewiran nusênê:

1- prefikso yewheceyin+fiil

Gege yew prefiks (önek) û yew
fiil piya yewna fiilê newî virazenê.
Yanî prefiks+fiil= fiilo piyabeste.

Cend prefiksê yewheceyinî: a-,
ci-, de-, ra-, ro-, we-, pa-, pê-, po-,
tê-, to-.

Fiilê ke hîna zaf nê prefiksan dim
a yenê û fiilêdo newe virazenê nê
fiilî yê:

ameyîne/ameyîş, dayene/dayîş,
guretene/girewtîş, kerdene/kerdiş,
kewtene/kewtiş, mendene/mendiş,
fistene/vistiş.

**Prefikso yewheceyin û fiil, mes-
der. (infinitif) de piya nusiyênê.**

Nimûne (hetê Pîranî de): **rabîya-
yene**, rakerdene, rasanayene, raver-
dene, wekerdene, wedardayene.

Nimûne (hetê Pîranî de): **aker-
diş**, dekerdiş, dekerwtîş, padayîş,
pakerdiş, pêşanayîş, pokerdiş, rada-
yîş, rodayîş, ronayîş, têşanayîş, to-
kerdiş, wekerdiş.

Ne fiilî cayan gore di tewirî an-
cîyênê. Tanhi cayan de fiil ke ancî-
no, prefiks fiilî ra ver yeno.

Nimûne: **akerd**, rakerd, dekerd,
pakerd, wekerd, rona

Tanî çayan de zî fiil ke ancîno,
prefiks fiilî ra pey yeno:

Nimûne: **kerd a**, kerd ra, kerd de,
kerd pa, kerd we, na ro.

*Zeke nimûneyanê corînan de zî a-
seno, eke antena fiilî de prefiks fiilî
dim a bêro, fiil û prefiks -antene de-
ciya nusiyênê. Labelê ake antene*

*de prefiks fiilî ra ver bêro, prefiks û
fiil piya nusiyênî.*

2- prefikso zafheceyin-fiil

Eke prefiks (önek) zafheceyin,
yanî yew hece ra zafêr bo, prefikso
zafheceyin û fiil ciya nusiyênê. Ya-
nî prefikso zaf heceyin ze yew çe-
ku, fiil zî ze yew çeku nusiyênê.
Bêguman nê her di kelîmey fiilêde
newî virazenê.

Cend prefiksê zafheceyinî: bider-
/bere-/bede-, cira-, tira-/dira-, pede-
, pêra-, pêro-, pira-, piro-/pero-, te-
de-/tedi-, têra-, têro-, tiro-.

Nimûne (hetê Dêrsimî de): **pêra
bîyayene**, pira guretene, piro daye-
ne, piro ginayene, piro kerdene,
têra çarnayene, têra kerdene, têro
cinitene

Nimûne (hetê Pîranî de): **pêro
dayîş**, bere şanayîş/bede şanayîş, ti-
ra kerdiş/dira kerdiş, pede kerdiş,
pêra nayîş, pira kerdiş, piro şanayîş,
tede mendîş, tiro kerdiş

Nê fiilî cayan gore di tewirî an-
cîyênê. Tanî cayan de fiil ke ancîno,
prefiks fiilî ra ver yeno.

Nimûne: **pêro da**, dira kerd, têra
kerd, tede mend.

Tanî cayan de zî fiil ke ancîno,
prefiks fiilî ra pey yeno:

Nimûne: **da pêro**, gina piro, na
pêra

Heş di tewiran de zî prefiks û fiil
ciya nusiyênê.

3) name/sifet + fiil

Gege name û yew fiil yan zî sifet
û yew fiil fiilêde newî (fiilê piya-
bestî) virazenê. Nê tewir fiilan de
name û fiil zî sifet û fiil zî ciya nu-
sîyênê.

name û fiilî ra

aw dayene/aw dayîş, bare bîyaye-
ne, bawer kerdene, ca ardene, da-
wet kerdene, pars kerdene, pers
kerdene.

sifet û fiilî ra

berz kerdene/berz kerdiş, derg bî-
yayene, gird (girs) kerdene, pak bî-
yayene, şîya kerdene, sûr kerdene,
weş kerdene.

4) **fîl + fîl**

amayîne kerdene, amayîne vate-
ne, dayene guretene, dayene kişte-
ne, dayene vatene, dayene wende-
ne, dayene zanayene.

Fîlan de menfiyey (negation)

Kirdkî/kirmanckî de fîlî ebe "nê-"
", "ni-" û "me-" menfi benê. Fîl û
"nê-" "ni-", "me-" piya nusiyênê.
Nimûne:

nê-: nêweno, nêzano, nêva,
nêkerdo, nêveşenê, nêwanena,
nêşimeno, nêantbî, nêşutbî,

nêdekerdbî/denêkerdbî, nêra-
kerd/ranêkerd, nêrakewto/ranêkwto
nêda pêro/pêro nêda, pira nêgu-
ret, piro nêgina

weş nêkerd, sûr nêkerd, bawer
nêkerd, nêard ca, nêramit ser, nêda
wendîş/wendîş nêda, veng a ci
nêda/veynda yê nêda.

ni-: nişno/nişkeno/nêşkeno, ni-
zono

me-: mebere, meke, mevaje, me-
wane, merake/rameke, me-
agêre/megêr a, meraşane/rameşane,
wa nêraşano, wa nêdeko/wa
denêko, wa nêagêro/wa nêgêro a,
meake, cira mevaje/tira mevaje, sûr
meke, bawer meke, meşo war, ven-
ga ci mede/veynda yê mede, mede
wendene, ramekewe/merakwi, wa
nêrakewo/wa ranêkwo, mewene,
ma nêwano.

III. EDATÎ (PREPOZÎSYON Û POSTPOZÎSYONÎ)

Kirdkî/kirmanckî de edatî hîrê te-
wirî yê û çekuyanê bînan ra ciya
nusiyênê. Cêr ra şima çend nimû-
neyan wanenê:

1- **Prepozisyonî**

be.../ve...

Ez şêna **be** Diyarbekir.

Xatir **be** to./Xatir **ve** to **bo**.

Êno **ve** dewe.

Mi îman **ve** pîrê **xo** ardo.

bi... / **ebi...** / **ebe...** / **eve...**

Bi peranê **xo** erînawo.

Ebi des camêrdan rayîr **kewt**.

Eve dest **werd**.

bê...

Bê to **ma** nêşinê.

Bê wendene **menusênê**.

pey...

Pey peran **gurey** **xo** **viraş**t.

ver bi...

Mêrdek **ver bi** hêgay **şi**.

Not: Eke "bê-" çekuyê ra **ver**
bêro û sifetê virazo, "bê-" û çekuyo
ke dim a yeno piya nusiyênê. Na
"bê-"ya ke sifetan virazena rolê
prefiksî vînena.

Nimûne: bêaqil, bêbext, bêçare,
bêhêş, bêhevî, bêkar, bêkes, bêna-
mûs, bêsol, bêşeref, bêveng.

2- **Postpozisyonî**

... **de**/...**di**/...**der**/...**dir**

Lajek **tenge de** wo. / Lajek **tenge**
der o. / Lajek **tengi di** wo. / Lajek
tengi dir o.

Çanteyê mi **di** qelemî çinî **yê**.

Dewe **de** çî esto çî çin o? / Dewi
di çî esto çî çinê **yo**?

...**ra**/...**a**/...**ya**

Mi **ra** **pey** ame.

To **ra** **girewt**.

Ma **ra** **va**.

Ez **semedê şima ra** ameya.

Lajekî **lewi keyneki ra** day. / La-
jekî **lew keynek a** day.

Ez **semedê şima ra** ameya. / Ez
semedê şima ya ameya.

... **ro**

Şiwani bizê **xwi ko ro** berdê, deş-
te **ro** nêberdê.

...**ya**

Mêrdek **di** xizmekaran **zî kênay**
xwi ya şaweno.

3- **Prepozisyonî û
postpozisyonî piya**

a ... ra

Lajek çinayanê **xo** **dano a xo ra**.

beynatey... di/beyntarê ... di

Beynatey min **û to di** çî çinê **bi**. /
Beyntarê min **û to di** çiyekî çinê **bi**.

bi ... a / bi ... ya

Mêrdek **bi** **yew cenî ya** amewo.

bi ... bê / ebi ... bê

Keyneki bi **fek bê** **xwi vato**. /
Keyneki ebi **fek bê** **xwi vato**.

ede ... de/di ... de

"Xidê Momid, **ede** **raya** **trêna** Er-
zingan **de** **tasaron bi**."

"Tayê **cênî**, **cûwamêrd**, **domon**,
eskeronê **şuwarû** **day arê**, **ede** **Kor-**
ta Hêmez de **bêrd**."

"Hen **eve** o **qêyde** **ede** **dustê** **bo-**
nonê Çê Ferê Bilêj de **bî vînd** **şi**."

"Çiqas **bon**, **ede** o **Estembol de**,
cawonê bînu **de**, **hemêgê** **ma** **ra** **amê**
virastene nîno **hesavkerdene**."

"Naye **ser** o **ez niştûne** **ro taxsî**,
tekit **û şûne Hêyder Pasa** (Haydar
Paşa), **mi ede** **trêne de** **pêguret**."
(Mûnzûr Çem, Hotay Serra Usifê
Qurzkizî, r. 83, 96, 104, 205, 209)

pey ... ra

Mêrdek **pey** **berî ra** **vejiya**.

ve... ra/bi ... ra

Ez **ve** **to ra** **pîya** **some**.

IV-**HÛMARÎ**

Kirdkî/kirmanckî de **vatişê** **tanî**
hûmaran **de** **ca** **ra** **ca** **ferq** **esto**. No
kombiyayîş **de** **ma hîna** **zaf vîst** **hû-**
maranê **verînan** **ser** **o** **vindertê**.

Hûmaranê "yew" **ra** **heta** "des" **î**
(1-10) **ser** **o** meylê kombiyayîşî:
yew, **di**, **hîrê**, **çar**, **panc**, **şeş**, **hewt**,
heşt, **new**, **des**.

Formê, bînî: **yo/jew/jû/zû**, **didi**,
hîrê, **çêher/çihar/çok**, **panj/**
ponc/ponz, **ses**, **hawt/hot**, **heşt**, **no**,
des.

Hûmaranê "yewendes"/"des **û jû**"
ra **heta vîstî** (1-20) **ser** **o** **di** **meylî**
bîy. **Meylê** **nêmeyê** **amadebiyayo-**
xan (**kesanê** **haziran**) **û** **nêmeyê** **bînî**
ciya **bi**.

Meylo yewin: **yewendes**,
diwês/duyes, **hîrês**, **çarês**, **pancês**,
şiyês, **hewtês**, **heştês**, **newês**, **vîst**.

Meylê diyinî **gore**, **merdim** **şîno**
ebi **nê** **her** **di** **formanê** **cêrînan** **binu-**
so:

a) **yewendes**, **diwês/duyes**, **hîrês**,
çarês, **pancês**, **şiyês**, **hewtês**, **heştês**,
newês, **vîst**.

b) **des** **û** **jû** / **des** **û** **jew**, **des** **û** **didi**,
des **û** **hîrê**, **des** **û** **çar**, **des** **û** **panc**, **des**
û **şeş**, **des** **û** **hewt**, **des** **û** **heşt**, **des** **û**
new, **vîst**.

RIPINÊ GELAN BI ZIMAN TÊ NASÎN

TORI

DESTPÊK

Di salan de peywistiyên mirovan an gelan têna guherîn. Hin mithel an tişt ji jiyana gelan dirabin, hine nûjen cehê wanan digirin. Ev nûjenbûn bi xwe ra mirina, guherîna wûşeyan bi xwe ra tînî. Lê ev mirina, guherîna wûşeyan di tevayiya gel de heye ko nebî. Ew wûşe heye ko di navçeyina welatê wî gelfî de jiyana xwe hêj mîdekî didomênin. Ev jî dibî mebestek derketina zarawayên wî zimanî. Hege îroj di Kurdî de gelek zarawa hebî, mebestek jê ev e.

Nexwe wûşe di ziman de, di heyamine dirêj de an jî ta talî jiyana xwe nadomênin. Lê di nav van wûşeyan de, wûşeyên ziman bixwe gelek kêmbûn dibin an tene jibîrkirin. Windabûyîn an jî jibîrbûyîna wûşeyan, di hazar salî de, nêzikî ser sadî bîst (%20) e. Tê vê yekê ko em nikarin ripinên gelan ji wekheviya wûşeya tê bigihin. Hege em rabin, wûşeyên hanûha ko ji aliyê gel bi wûşeyên êl û eşîrên ripinê wî gelfî, yê berî hazar salan bidine ber hev û yekîtîyekê di navbera wan wûşeyan de bigerin, emê nikaribin ripinê wî gelfî binasin. Herwekî, ripinên Kurdan Hurriyî û eşîrên Hurriyî ko di dîrokê de dewlet û împaratorî damezrandin, ji kêmayî, berî pênc hazar salî derketibûn qada dîrokê. Li gora wûşe di hazar salî de li ser sadî bîst tene guhertin, ji pênc hazar salî bi vir ve wûşeyên zimanê Hirriyan ser sadî sad hatine guhertin. Ev jî nîşeyî dikî ko wûşeyên berî pênc hazar salî êdî nînin. Zimanê berî wan hazar salan êdî nemaye. Hege lêkolîna ripinê gel jî wûşeyên berî van hazar salan ko di belgeyan de derketine holê bê kirin, emê di vê lêkolînê liqayî tiştêkî nebin. Emê hingî ripinê gel girêdî çend sad salên van taliyan. Ev jî wê me serrastî çewtiyan bikî. Divê em ji van çewtiyan xwe bi-

vedênin, lêkolîna xwe dirêjî ta berî dîrokê bikin û xwe bigihêjinine roja me. Ji dêla berhevanîna wûşeyan, divê damezrîna ziman bi awayekî farah ê lêkolîn. Bitenê bi terxîna damezrîna ziman emê karibin ripinê gel binasin. Ev jî lêkolîna ripinê kultur û damezrîna zimanê Kurdan û êl û eşîrên Kurdan dideynî ber me.

1- Di Welatê Kurdan de kultura Hurriyan serwer e

Di kolan û vedanên ko di welatê Kurdan de hatî kirin heyîna yekîtîyê ke kulturî derxistiye holê. Ev yekîtîyê gelek bihêz ji bakur dirêjî Qafqasya, ji rojava navçeyên Malatî - Elezîz, ji başur Surî û ji rojava dirêjî Gola Urmiye dibî. Ev yekîtî li van cihan de, di sala berî mîladê çar hazar salan de lidar bûyî bû. Navê vê kulturê di awayê kultura Hurrî, ya jimêj tî nasîn. Ev kultur, di sala berî mîladê hazar salan de, li zozanên bilindcihên Enedolê, Transqefqasya, rojava bakura Îran, li başur ta Urfa - Xelfetî dewleta Urartu damezrandiye. Dîsa ev kultur di van cihan de di warê çandiniyê û xwedîkirina sewalan de derketiye holê.

Kultura Hurrî ya jimêj, li bilindcihên rojhilata Enedolê, di cara yekemîn hatiye aferandin. Ji wir belayî cihên din ko li jor hatî derbirin bûyîye. Derî çandinî û xwedîkirina sewalan, daxwiyânên vî kulturî, awayê texlîtên kuzikan, avakirina avayîyan û ziman e. Kuzikên vî kulturî ji aliyê nîgar (reng), awa û xemlan layî hev in. Dîsa ev kuzik di tev navçeyên Hurrî, êl û eşîrên Hurriyê de hatine hilberîn. Di kolan û vedanan de ji van navçeyan derketine holê.

Daxwiyîna kultura Hurrî ya jimêj, ya duyemîn, awayê avakirina avayîyan e. Di vî heyamî de avayiyên gurover dihatine avakirin. Ev rûçika avayîyan di avayiyên Hurriyan de xwiya dibû. (1)

Daxwiyana kultura Hurrî ya jimêj,

awayê ceyirandina binê mezalan e. Hurriyî binê mezalên xwe bi casê (alçî) diceyirandin. Axa sipî tevlu casê dikirin, rûdikirin binê mezalên xwe. Casa rûkirî didelikandin. Dema ko cas di binê mezalan de hişk dibû, diçirîsî, şahîk dibû. Bi wê ceyirandinê binê mezal her tim paqij, havînan hînik dima. (2) Di roja me, di gelek navçeyên Kurdan de di wî awayî de binê mezalan bi casê tî ceyirandin û delikandin.

Navçeyên ko li jor hatî raberkirin bi çiyayîne gelek bilind ji hev tene veqetîn. Lê dîsa di navçeyan de kultura Hurrî bîkêmanî tî dîtin. Di ti heyamî de di kultura wan navçeyan de ti tîvelî nehatiye dîtin. Ev jî nîşe dikî ko nêzikî tevayîya gelhê wan navçeyan Hurriyî ne, û ji sala berî mîladê çar hazar salan ve li wan navçeyan dijîn. Hurriyî, li gora belgeyên heyama Aqqadiyan ko bi tîpên mîxî hatî nivîsandin, di vî hayamî de Hurriyî di sala berî mîladê sê hazar li navçeyên robara Xabur dijîn. Lê bi awayekî farah, Hurriyî ji bakur çiyayê Qefqas, ji başur Surî û rajora Mezopotamya, ji rojava çiyayê Toros û ji rojhilat ji çiyayê Zagros dibuhurî wî alî û digihaşte Gola Urmiye. (18-21)

El û eşîrên gelê Hurriyî di nav van navçeyên farah de, bi navine tîvel de, yekîtîya eşîran, dewlet û împaratorî damezrandin. Hin ji van dewletan di pay hev de, li ser rikinên dewleta berî xwe, hin jî ji wanan di heyamekî de dewletên xwe damezrandine. Herwekî, Mittaniyî, Nahriyî, Urartuyî di pay hev de, li ser rikinên dewletên berî xwe dewletên xwe lidar kirine. Eşîrên Gutiyî, Luluyî, Kassiyî dewletên xwe li bilindcihên çiyayê Zagros, li welatê Babil, bi Hurriyî û Mittaniyan ra û nêzikî salinan de damezrîn û ruxiyane. Lê ev dewlet heyinên xwe ta mîladê domandine. Piştî mîladê êdî em Kurdan di pergala mîritiyê de dibînin. Ev mîritî berî mîladê jî hebûn. Lê li hember wan mîritiya Aşşurî hebûn. Ev êl û eşîrên Kurdan, ta ruxîna dewleta Aşşuriyan, bi wanan ra di tîkoşînê de bûn. Dema ko Aşşurî setemkariya xwe li wanan dişidand, ew eşîr li hev dicivîn. Ya yekîtîya eşîran yan jî dewletên xwe lidar dikirin. Dema ko setemkariya Aşşuriyan ji ser wanan dirabû, ew eşîr yekîtîya ko lidar kiri bûn, difêşkilandin. Herwekî, dewleta Nahri, pişt ra ya U-

rartu bi vî awayî lidar bûyi bûn. Di vê taliyê de eşîrên Zagros jî li hember setemkariya Aşşuriyan de di yekîtîya dewleta Urartuyîyan de cih girti bûn. Tê vê yekê ko dewleta Urartu, bi yekîtîya eşîrên Hurriyî lidar bûyi bû.

Layî ko me li jor terxand, navçeyên Hurriya bi çiyayine gelek bilind hati bûn veqetîn. Lê dîsa di van navçeyan de zimanên heyî jî zimanê Hurriyan ne têvel bû. Zimanekî, ango tev êl û eşîr ziman an zarawayê wî zimanî bikar dianîn.

Mezopotamyaya jêrîn di sala berî miladê sê hazar salan de ji du kultura ra navendîtî kiriye. Yek ji van kultura, kultura Sumeriyan, yan din, kultura Samiyan yên herî pêşveçûyî bûn. Ev kultur jî vê hazar salî ve, ber bi bakur ve hêdî hêdî, bi gavine mîsoger cih guhert. Lê ew kultur li bakura Mezopotamyaya liqayî berxwedanan bû. Li Mezopotamyaya jorîn, kulutura Hurriyan hebû. Ev kultur, kultureke bxweser û ji aliyê eşîrên Arî, ango Hurri, Mittanî, Nahrî, Urartuyî, Lulu, Gutî û Kassiyân hati bû aferîn. Ev eşîr xwe jî kultura Sumer û Samiyan, ji ber vê yekê, vedandin. Kultura xwe derxistine pêş û di vî warî de rêxistinên xwe damezrandin. Dîsa ev eşîr yekîtîya xwe ya nijadî bihêz kirin û li zimanên xwe xwedî derketin. Zimanê xwe xistine zimanê kultura xwe. Tuxubên dewletên xwe xêz kirin û wî tuxubî parastin. Di nav vî tuxubî de, bi belgeyan ra, belgeyên zimanê Hurriyan jî derketine holê. Ev belge, di nav belgeyên Boğazköy, Marî, nameyên Tel Amarna, hin name û nivîsarên ko bi tîpên mîxî li Surî cih girtin. Em vî zimanî jî van belgeyan û yên herî giring, ji nivîsarên ko li Kerkük, Nuzî derketî holê cih digirin. Ev belge di derbareyî zimanê Hurriyan û eşîrên Hurriyî didine me. (4)

Herwekî,

1- Zimanê Hurriyan

Di nav nivîsarê ko cara pêşî derketî holê de nivîsarek heye ko ji heyama qiralê Hurriyan Taxîz Atal mayiye. Nivîsara vê belgeyê bi zimanê Hurriyê ye. Ev belge li gel kevnetiya xwe, belgeyeke kevnetirîn di derbareyî rêzimana Hurriyan e jî.

Zimanê Hurriyan ne bitenê jî navên dewlemend ko di nav nivîsarên Babil, Aqqad û Aşşuriyan de cih digirtin,

têne nasîn. Zimanê Hurriya bi tîpên mîxî yên Aqqad û bi tîpên Ugarîti hati bûn nivîsandin. Lê tîpên Ugarîti li gora vî zimanî bû. Ev nivîsar jî salên berî miladê 2200-1200 mayine. Zimanê Hurri di sêçika robara Xabur ta robara Diyala, bakura welatê Aşşur, ango bakura robarên herdu Zapan, ta çiyayên bakura Gola Wanê dihate axaftin.

Li bajarê Nuzî, Arrapxa û Alalax, bi tîpên mîxî û bi Aqqadiyêke tîkçûyî, hin belge derketine holê. Di nav nivîsarên van belgeyan de gelek wûşeyên Hurriyî hebûn. Lê gelek mixabin, di nav van belgeyan de belgeyên wêjeyî gelek hindik derketin. Belgeyên derketî li Alalax (bakura Surî) bi sadan, li Nuzî bi hazaran ne. Hin jî van belgeyan di texlîtê nameyan de bûn. Hêj naveroka van nivîsaran nehatine halibûn. Lê dîsa xwiya ye ko naverokên wan giring in.

Hin jî van nivîsaran di awayê fermanan de bûn. Fermanên ko ji bajarê Nuzî derketî, belgeyên salên berî miladê 1500-1350'an in. Zimanên wan belgeyan gelek dewlemend e. Ev belge derbareyî karê saraya qiralê dewletê didin. Tev ferman di saraya qiralê dewletê de, di ber pirsîyariya pismîrekî de dihatine parastin. Ferman herçend bi zimanê Hurriyan bî jî, bi zarawayê wê navçeyê ango zimanê herêmî hati bûn nivîsandin. Ev jî nîşeyî be dikî ko zarawa ji wî heyamî ve li welatê Kurdan dom dikin. Damezrîna wî zimanî jî dîsa li gora azinên zarawayê wê navçeyê bû. Sere navên ko di nivîsaran de dibuhurtin, navên Hurriyî bûn: Ev nav di belgeyên Ugarîti û bakura Surî de jî hati bûn bikaranîn.

Zimanê Hurriyan, layî ko emê di pêş de cih bidinê, zimanekî Hint-Ewropî bû. Ango zimanê Hurriyan, layî zimanên di vî qeflî de, zimanekî tawangbar bû. Wûşeyên wan bi lêkan, ango bi pêşgir, navgir û paşgir dihatine damezrîn. (5)

2- Zimanê Mittaniyan

Di van salên talî de belgeyek, di kolan û vedanan de derkete holê. Ev belge jî qiralê Mittaniyan Saussattarê yekemên (1470-1400) mayiye. Nivîsar di şesad (600) rêzî pêk hatiye û bi zimanê Hurriyî ye. Tê vê yekê ko Mittaniyî bi Hurriyî diaxiftin. Li gora

lêkolanzan Porckes, zimanê wê nivîsarê, zimanekî tawangbar e. Bi gotîneke din ev ziman jî bi lêkan, ango pêşgir, paşgir û navgiran damezriya bû.

Belgeyên hêja ji du bajarî derdike-tin. Yek ji van bajaran, bajarê Alalax ko li bakura Surî cih digirt, bajarê din, bajarê Nuzî bû ew jî li bakura bajarê Kerkük dima, bû. Di van bajaran bi tîpên mîxî yên Aqqadiyan hatine bikaranîn. Di nav van nivîsaran de jî nivîsarên wêjeyî hindik cih girtine. (6)

Nameya ko ji aliyê qiralê Mittanî, Tuşratta (1390-1352) ji qiralê Misirê Amenhotepê çaremîn ra nivîsandî belgeyek giring ya Hurrolojî ye. Ev name nivîsareke zanistîya Hurriyaye û bi zimanê Hurriyan hatiye nivîsandin. Tuşratta di nameya xwe de, serfiraziya xwe ko li hember Hîttîya raber kiri bû, ji qiralê Misiriyan ra dibêji. (6)

3- Zimanê Kassiyân

Zimanê Hurriyan, layî ko me li jor terxand, li sêçika robarên Xabur, Diyala û Gola Wanê de dihate axaftin. D destpêkê de Kassiyî di vê sêçikê de dijîn. Pişt ra koçî çiyayê Zaros, li navçeya Luristan bi cih û war bûn. Pêwanê Zimanê Kassiyân jî Hurriyî bû.

Di kolan û vedanan de gelek belge derketine holê. Hin jî van belgeyan, nameyên qiralê Hîttîyan in. Ev qiral, bi tîpên Aqqadî û zimanê Hurriyan, jî qiralê Kassiyân, Qadaşman Enlîlê yekemîn (1378-1374) û jî qiralê Kassiyân Barnaburîaşê duyemîn (1359-1333) ra hati bûn nivîsandin. Ev belge jî vê dîtinê rast dikî ko zimanê Kassiyân jî Hurriyî bû. (7)

Di derbareyî zimanê Hurriyan de gelek agahdarî nînin. Li gel vê tê zanîn ko di zimanên Kassiyân de hemanên zimanê Hint-Ewropa hene. Tê vê yekê ko zimanê Kassiyân, layî zimanê Hurriyan zimanekî tawangbar bû. (8) Dema ko Kassiyî daketine welatê Babil û li wir di ser pînsad salî jiyîyan zimanê wan bi zimanê Sumeriyan tîkel bû. Qiralê Kassiyân Karaîndaş nivîsarên xwe ji dîla zimanê Samiyan, bi zimanê Sumeriyan nivîsandiye. Bi vê yekê viyaye de zimanê Sumeriyan bi zimanê xwe ra bijiyenî. Pêwanê navên Kassiyî yên piştî vî qiralî bi navên Elamî û Sume-

riyan ra hatine bikaranîn. (9)

Di derbareyî zimanên eşîrên din yên çiyayê Zagros belge neketine destê min. Pêwenê emê nûha nikaribin di derbareyî vî zimanî de agahdarî bidin. Lê em karin vêna bibêjin ko ev eşîr jî bi zimanê Hurriyî diaxiftin. Navçeya zimanê Gutî û Luluyan herçend jî navçeyên Hurriyan cida bin jî, lê qeflên Hurriyî ji van çiyayen, bi Gutîyan ra dijîn. Tê vê yekê ko zimanê Gutîyan nêzîkî zimanê Hurri-Urartuyan bû. Di salên talî de ev eşîr lewma bi hêsanî bi Urartuyan ra yekî-tî lidar kirine. (10)

4- Zimanê Urartuyiyan

Zimanê Urartuyiyan ji aliyê şeniyê (xelk) ko li bilindcihên welatê Urartuyiyan de dijîn dihate axaftin. Ev welat ji rojhilat dirêjî Gola Urmiye, welatê Mannaiyan, ji rojava bajarê Xelfetî û Malatî, ji bakur bilindcihên bakura Gola Wanê, ji başur jî dirêjî jî navçeyên derdora robara Diyala û Hekarî, dibû.

Prof. Goetze zimanê Urartuyiyan zarawayekî zimanê Hurriyan dibînî. Li gora Benedict, Hurriyî û Urartuyiyî berî miladê di sala 2500'an de ji hev veqetiyane. Piştî vê bûyerê, angos piştî sala berî miladê 1600'an Urartuyî li derdora Gola wanê, rikinê nîjada xwe û dewleta Urartu damezrandin. Di zimanê Hurriyan û Urartuyiyan de lêkerên tewangê (flexion) layî hev in. Cihnav layî hev in. Di awayekî farah de wûşeyên herdu zimanan layf hev in. Di zimanê Urartuyiyan de pirhejmarî, layî zimanê Hurriyan e. Herwekî, di herdu zimanan de pirhejmarîya wûşeyan di peywistiyên de dibî. Nav bixweser pirhejmar nabin. Hege nav bixweser pirhejmariya xwe raber bikî, ew nav pirhejmar nabin. (11)

2- Berhevanîna Zimanê Hurri - Urartuyiyan.

1- Di awayekî farah de wûşeyên Hurri û Urartuyiyan Layî hev in. Herwekî:

| Hurriyî | Urartuyiyî | Wate |
|---------|------------|-------|
| favana | vavana | çiya |
| mann | man | bûyin |
| êza | êsa | ezman |
| arda | ardî-na | gund |
| eda | edî | tişt |
| sawala | sala | sal |

| | | |
|--------|--------|-------------|
| un | nun | hatin |
| henna | hena | nûha |
| aş | aş | runiştin |
| haz | haş | his |
| ukra | qura | ling |
| hûrada | hurada | şerger (12) |

2- Wûşesaziya herdu zimanan layî hev in.

1) Lêkên ko ji nava rengdêrîna radi-kişênin.

a- Hurriyî = (hha) b- Urartuyî = (oha)

Herwekî:

| | |
|------------|-------------------------|
| Hurriyî = | hijara-hha = zêrîn |
| | lûla - hha = biyanî |
| Urartuyî = | şu - oha = nû |
| Urartuyî = | tar- ae - u-oha = bihêz |

2) anna (di Hurriyî û Urartuyiyî de layî hev in)

Herwekî:

| | |
|-----------------|------------|
| marî - anna = | şerger |
| targum - anna = | rawakar |
| uşî - anna = | mîratxwer. |

3) a- Hurriyî = (zzî, azzî)

b- Urartuyî = (usa)

Herwekî:

| | |
|------------|----------------------------|
| Hurriyî = | aştu - azzî = tewrpirêk |
| Hurriyî = | targum - azzî = tewrawakar |
| Urartuyî = | al - usa = rêber |
| Urartuyî = | at - usa = ya bav. |

4) a- Hurriyî = (ae).

b- Urartuyî. (aje)

Herwekî:

| | |
|------------|---------------------|
| Hurriyî = | dadea = evîndar |
| Urartuyî = | tuaje = paqij. (13) |

3- Berhevanîna Kurdî - Urartuyî

Layî ko me li jor terxand, em nikarin Kurdî û Urartuyî ji aliyê wekheviya wûşeya bidine ber hev. Di navberê de ji kêmayî çar hazar salbuhurtine. Di mida van çar hazar salan de wûşeyê wî zimanî mirine, ji dêla wanan wûşeyine din, lê dîsa li gora rêzimana wî zimanê, cih girtine. Tiştê li talî mayî, rêzimana herdu zimanan, angos zimanê Urartuyî be teybetî yê Hurriyî ye. Pêwanê emê herdu zimanan ji aliyê hêmanên reziman bidine ber hev. Herwekî:

Kurdî jî layî zimanê Hurriyî an Urartuyiyî, zimanekî tawangbar e. Di damezrîna xwe de wûşe pêşgir, paş-

gir, navgir disitênin û bi wî awayî radikişin. Pêşgir, paşgir û navgir têne pêş, paş û naviya wûşeyan, ji nava rengdêrîna, ji rengdêrîna rengdêrîna, ji lêkeran lêker û ji nava nav radi-kişênin.

Di Kurdî de pirhejmarî layî zimanê Hurri û Urartuyiyan di peywistiyên de dibî. Nav bixweser pirhejmar nabin. Hege nav bixweser pirhejmariya xwe raber bikî ew nav pirhejmar nabin. Herwekî:

- Zarok ji dabistanê hatin. - Sêv di darê de hişk bûn.

Di van herdu hevokan de, navê (zarok) û (sêv) bixweser pirhejmariya xwe raber nakin. Lê ew herdu nav xwe bi pêxistiye (yüklem) hevokê pirhejmar reber dikan. Derî vî rawşî nav bi ti awayî xwe pirhejmar nakin. Hege bivên pirhejmar bibi, divê dawîneyên (hen), (an) û (in/ina) bisitênin.

Kurdî û Urartuyî ji aliyê veqetandek (tamlamax), layenan (cins) layî hev in. Herwekî:

Gundê Qerexan (Karahana) gundek jî yê bajarê wanê ye. Gundê Qerexan dikev rojavaya başura Muradiye. Li qerexa Gola Wanê de dimînî. Di vî gundî de nivîsarên qiralê Urartuyan, kurê Îşpunî Menuas (810-790) derketine holê. Yek ji van nivîsaran li ser nehîtekî kevira hatiye nivîsandin. Ji nivîsarê 23 rêz têne xwendin. Emê ji wê nivîsarê bitenê çar rêza bidin. Di wan rêzan de veqetandek û layenên nava hatine bikaranîn. Herwekî:

- 1- Hal-dî, nî-nî Uş-ma-şî-nî
Hal-di-e e-û - rî - (e)
- 2- Me-nu-û-şe Îş-pu-û-î-nî
e-hî-nî-ş (e)
- 3- Hal-dî, nî-li KA şî-dî-îş-tu-l (î)
- 4- URU Ar-şu, nî-û-î-nî-e
ba-du-sî-e.

Vergerandina van rêzan: Bi saya mazinayîye xweda Xaldî, jixwedayê efendî ra, ez, kurê Îşpunî Menua, di bajarê mazin Arşuiunî de deriyên Xaldî ava kir. (14)

Di vê nivîsarê de du veqetandek atine bikaranîn. Yek ji wana, Xaldî-e e-ûrî, yan din, Menu-û-şe Îşpuunî. Dema ko em bivên van veqetandek li gora rêzimana Kurdî bihivîsênin, emê wanan di awayê, Xaldiyê eûrî hu Menuayê Îşpunî de binivîsênin. Ger navê

Xaldî û nvê Menua bi sitandina dawîneya (e) layena xwe ya nêr raber kirine. Em wan dawîneya di taliya navê Xaldî û Menus de dibînin.

Di nivîsareke din li gundê Qerexan. Ji nivîsarê 25 rêz têne xwendin. Emê ji vê nivîsarê 6 rêza bidin. Di va rêzan de jî hin veqetandek cih girtine û navê van veqetandekin layenên xwe raber kirini. Herwekî:

- 1- Haln-di-nî-nî uş - ma - şî - nî
- 2- Hal - dî - e - e - û - rî (e)
- 3- Îş - pu - û - î - nî - şe
Sar - du - rî (hî - nî - şe)
- 4- Hal - dî - nî - lî KA şî - dî - îş - tu - a - (lî)
- 5- Hal - dî - nî URU ba - du - sî (e)
- 6- î - nî u - a - î te - rî - bî şu - r (f)

Vergerandine nivîsarê: Bi saya mazinaiya xweda Xaldiyê efendî, kurê Sardurîn Îşpunî, li bajarê Xaldî yê mazin, deriyên Xaldî ava kir. (15)

Di vê nivîsarê de veqetandekên Xaldiyê eurî, Îşpuniyê Sardurî hatine bikaranîn. Ev herdu veqetandek di daxwiyana veqetandekên Kurdî ne. Navê Xaldî xwe veqetandiye ser navê efendî, navê Îşpunî jî xwe veqetandiye ser navê Sardurî. Hege em bivên vê veqetandekê li gora rêzimana Kurdî binivîsênin, emê dîsa bibêjin Îşpuniyê Sardurî. Hege di veqetandeka Kurdî de tîpa tîkiliyê (y) hebî, ew jî li gora hin zarawayê Kurdî ne. Di hin zarawayê Kurdî ew tîpa tîkiliyê (y) nayê bikaranîn Herwekî ji dêla dayê, daê, ji dêla lawo, lao bikaranîn.

Herdu nivîsarên jor, ji aliyê derbirinê, layî hev in. Nivîsara yekemîn ji devê kesê yekemîn, yan din ji devê kesê duyemîn hatiye nivîsandin. Layî ko tê dîtîn, nivîsara yekemîn ya qiralê Urartuyîyan kurê Îşpunî Menuas, yan din ya kurê Sardurî Îşpunî (825-810) ye.

4- Berhevanîna zimanên din yên Hint - Ewropî û Kurdî

Derî Hurriyî û eşîrên Hurriyî, gelîne din Hint - Ewropî li Enedolê û rojhilata navîn de dijîn. Seba ko zemanên wan gelan, ango Sumerî, Elamî û Hîtîtiyan jî di nav qefla zimanên Hint - Ewropî de bûn, wanan jî dibêrin ser eşîrên ripinên Kurdan. Lê layî ko ji damezrîna zimanên wanan bêtîtin, ti tîkiliya wanan û êl û eşîrên

ripinên Kurdan nîne. Herwekî:

1- Emê embazên xwe ji veqetandekên zimanê Sumeriyî bidin.

Nîşe: giş=dar, gişhaşhur=dara sêvê, giştûg = dara kevotê, gişpêş = dara hêjîrê.

Layî ko di nebazên jor de hatî nîşekirin navî (giş) ango (dar) û navên din, di veqetanê de ti dawîne nesitandine. Di Kurdî dî de nava ko diveqetî dawîneya (a) disitêni. Pê ra jî navê li ser tîveqetî dawîneya tawangê ya (ê) disitênin. Ev dawîne di veqetandekên zimanê Sumerî de nehatine dîtî.

Nîşeyeke din ji veqetandekên zimanê Sumeriyî:

Nîşe: udukurra, mēşîna kuvî, uzkurra = bizina kuvî, anşukurra = kerê kuvî. Layî ko di nîşeyê de tê dîtîn wûsaya (kurra) ango (kuvî) tê paşîya navên (mēşîn), (bizîn) û (ker). Wan biveqetanê ji wekhevên wanandiveqetênî. Lê di veqetanê de di dawîne nesitandine. Pêwanê layena xwe ya mē an nêr jî raber nekirine. Ji ber vê yekê jî em nikarin zimanê Kurdan û Sumeriyî yek bihejmêrin. Bi teybetî jî em nikarin Sumeriya ripinên Kurdan bibînin.

2- Embaza me ya cidabûyîna zimanê Hîtîti wê di derbareyî pirhejmariya navan bî.

Dema ko navên Hîtîti perhejmar dibin, layî Kurdî an jî Hurriyî, Urartuyî dawîneya pirhejmariyê ne li taliya wûşeyê, di serê wûşeyê de cih digrî. Herwekî: Lêka pirhejmariyê di zimanê Hîtîti de (le) ye. Dema ko bivên wûşeyê pirhejmar bikin, wê lêkê di nînin serê wûşeyê. Nîşe: bînu=kur, le-bînu pirhejmariya wê, zuh=fotik, le-zuh, pirhejmariya wê wûşeyê ye. (6)

Têvelîyeke din dinavbera Kurdî û Hîtîti, an jî Hurriyî de di, serenavan de ye. Ti serenavên Hîtîti bi tîpa (r) destpênakî û tev serenav dawîneya (a) disitêni. Herwekî, navê bajarê wanan yê navendî Hattuşa ye. Ev nav jî Hattiyîyan sitandine. Di zimanê Hattî yan de ev nav Hattuş e. Lê dema ko ew nav buharte Hîtîtiya dawîneya (a) sitand, bû Hattuşa. Tê vê yekê ko dû tîvelîne bîngêhî de herdu ziman jî hev diveqetîn. Nexwe em nikarin Hîtîtiyan jî layî Sumeriyî ji eşîrên ripinên Kurdan bihejmêrin.

DAWER:

- 1- Doğu Anadolu ve Urartu Prof. Dr. Afif Erzen s: 15-17 Türk Tarih Kur. yay. Ankara
- 2- Anadolu Tarih Öncesi Araştırmaları Karma Projesi. 1963-1972 Çalışmalarına Toplu Bakış. Halet Çambel Robert J. Braidwood. s: 23-24 İstanbul Chicago Üniversitesi Ortak Çalışmaları.
- 3- Doğu Anadolu ve Urartular Prof. Dr. Afif Erzen. s: 18-27
- 4- Eski Doğu ve Ege Tarihinin Ana Hatları Dr. Arif Müfit Mansel s: 14 İst. Ün. Ed. Fak. Yay - İstanbul - 1945
- 5- Dîroka Kurda Torî r: 37-39
- 6- eb. r: 39,73-74
- 7- eb. r: 53-54
- 8- Eski Doğu ve Ege Tarihinin Ana Hatları Dr. Arif Müfit Mansel s: 13
- 9- age. s: 130
- 10- Kürt Kökeni Büyü Boylar Welatê Torî - Nêrgîza Torî s: 142 Koral Yayınları - İst. - 1991
- 11- Urartuların Kökeni ve Dilleri Kemal Balkan s: 519-521 Belleten. cilt : XLVIII. sayı: 191-192 Ankara - 1984
- 12- Hurro Urartian as an Eastern Caucasian Language. R. Kitzinger - München - 1986 s: 12-64 Çev: Welatê Torî
- 13- age. s: 68-69
- 14- Van Bölgesinde Bulunmuş Yeni Urartu Yazıtları Dr. Phil. A. M. Dinçol E. Kavaklı s: 8-9 Edebiyat Fak. Yay. İst. : 1978
- 15- age. s: 15-16
- 16- Çivi Yazıları Kaynaklara Göre Türkçe-Etice-Hurricce Arasındaki Bağlar Dr. Mustafa Selçuk Ak s: 563 Türk Tar. Kur. Yay. Ankara-1944

İSTANBUL KÜRT ENSTİTÜSÜ

Kürt

S o r u n u

ve

Demokratik Çözüm Önerileri Sempozyumu



avesta

Pirtûka Sempozyuma Gelsa Kurd û Çareseriya Demokratik,
ku di çarê reşemiyê de ji alî Enstîtuya Kurdî ve li Stenbolê
hatibû lidarxistin, di demek nêzîk de derdikeve.

